Samî Tan

Rêzimana Kurmancî

çapa berfirehkirî

ENSTÎTUYA KURDÎ
STENBOL 1992

Rêzimana KurmancÎ

Samî Tan

WEŞANÊN ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê / 56
Ziman /3

Rêzimana Kurmancî Sami Tan

Redaksiyun Aysel çetîn & Zana Farqînî
Mîzanpaj Xunav Altun
Berg Aysel Çetin

Çapa Yekemîn (Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî) Gulan 2005
Çapa Duyemîn Adar 20 II
Çapxane Gûn Matbaacihk
Heşyol Mah. Akasya Sk. ~o:23/A Kûçûkçckmecc / tSTANI:3UL Tel:
(0 212) 426 63 30

ISB:-.I 97X - 975 - 6282 - 54 -0

~) Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

ZEl'\D BiLiM KÛLTÛR EGiTiM BASIN YAYIN LTD.ŞTi.

Cibali Mah. Atatûrk Buhtan, Onli.i iş Merkezî, A Blok. Kat: 3 No: 21! 82
Unkapam- Fatih.! iSTANI1UL
Tel: (0212)621 8200 Fax: (0212)621 8237
Web: www.enstituyakurdi.org Mail: înfo@enstituyakurdi.org

NAVEROK

PÊŞGOTIN 11

PÊŞEK 13

PÊŞGOTI~A **ÇAPA YEKE;\1ÎN** 15

ZIMAI" Û ZIMA~Ê **KURDÎ** 21

Ji aliyê binyadê ve kurdî 22

Kurdî û farisî 26

Zaravayên kurdî 28

Ji aliyê teşe û dirûv ve zimanê kurdî 30

DENGANIYA ZIMANÊ **KURDÎ** 35

Rêziman 35

Dengsazi 35

Alfabeya kurdî 36

Dcngzanî 39

Dengên ku ji erebî derbasî kurdî bûne 41

Dengên lerzok li bişid 42

Dengên alîkar 43

Dubarekirina tîpekê 46

Nîvdengdêr û dengdêrên dirêj 48

Cudatiya denganiya kurdî û tirkî 52

Kîte 54

PEYVSAZÎ (MORFOLOJÎ) 57

Di kurdî de qertaf... 58

Qertafên kêşane 58

Di kurmancî de bêjeyên nû lt bêjesazî 61

Ji aliyê sazbûnê ve cureyên bêjeyan 62

Qertafên bêjesaz 64

Pêşgirên kurmancî 65

Pêşgirên resen 65
Pêş girên lêkersaz 66
Pêşgirên neresen 67
Paşgirên kurmancî 69
Paşgirên lêkersaz 72
Navbend 73
Navgir 74

WATENASÎ (scmantik) 75
Ji aliyê têkildariyê ve wate 76
Bêjeyên hemwate 77
Bêjeyên dijwate 78
Bêjeyên hevdeng 78

PEYVÊ~ **HEVRENG** 79
Cotepeyv 80
Di peyvan de kirpandin 81
Di lêkeran de kirpandin 82

ERGATÎVÎ 85
Di devokên kurmancî de têkçûna ergatîviyê ti6
Guhcrbarî 88
Tewang 89
Qertafên tewangê 90
Tewanga qertafên nebinavkirinê 91

CUREYÊN BÊJEYAN 93
Veqetandek 93
Veqetandekên binavkirî 94
Vcqctandckên ncbinavkiri 95

NAVDÊR 97
Li gorî mêjerê navdêr 97
Li gor! hestpêkirinê navdêr 98
Li gorî taybetiya heyberên ku nîşan didin 99
Peyvsaziya navdêran 99
Pêşgirên navdêrsaz 100
Navbcnd û navgirên ku navdêran pêk tînin 101
Paşgirên na vdêrsaz ..... I 0 I
Paşgirên ku navên cihan pêk tînin 102
Paşgirên ku navên alavan çêdikin 102
Hin paşgirên din ên ku navan çêdikin 103
Zayendên navdêran 104
Zayenda biyolojîk 104
Zayenda rêzimanî 1 05

avdêren nêr 107
avdêrên mê 1 08
Di navdêran de rnêjer 1 09
Bi tewangê diyarkirina mêjerê 111
Mêjera navdêrên xwerû 111
Di mêjcra navdêrên xwerû de alozî 112
Mêjera navdêrên ku nayên hejmartin 114
Navdêrên binavkirî û nebinavkirî .....11 ()
Gelemperîkirina navdêran 117
Peywira navdêran 117
Raveka navdêran 118
Tewanga navdêran 119
, eyîniya nevdêran 119

CÎNAVK 121
Li gorî peywirê cînavk 121
Li gorî zayendê cînavk 122
Li gorî mêjerê cînavk 122
Ji aliyê tewangê ve cînavk 123
Cureyên cînavkan 124
Cinavkên kesane 124
Cînavkên şanidanê 129
Cinavkên şanidanê yên xwerû 129
Cînavk şanidanê yên tewandî.. 129
Cînavka vegerok 131
Ilin aloziyên cînavka vegerok ..... \32
Cînavka xwe il xwedîtî 133
Cînavka qertaf 135
Cînavkên kesandinê 136
Cînavkên berbihevîn 140
Cînavkên lihcvxisti 142
Bi cinavkên lihevxisti lêkerên biwêjî 145
Cînavkên nebinavkirî 148
Cînavkên xwedîtiyê 149
Cînavkên girêkî 152
Cînavkên jimarin 153
Cînavkên pirsyarî 154

HEVALNAV 159
Ji hêla peyv saziyê ve hevalnav 160
1 Icvalnavên hevedudanî 160
Hevalnavên pêkhatî û qertafên ku wan pêk tînin 161
Ilevalnavên kompleks 164

Cureyên hevalnavan 165
Hevalnavên çawaniyê 165
Di hevalnavan de paye 167
Hevalnavên şanidanê 170
Hevalnavên şanidanê yên şibandinê 172
Hevalnavên jimarîn 173
Hevalnavên nebinavkiri 175
Hevalnavên pirsyariyê 175

HOKER 181
Peyvsaziya hokeran 181
Cureyên hokeran ..... I 82
Hokerên çawaniyê 182
1 lokcrên şanîdanê 183
Hokerên demê 184
Hokcrên cih LI berekê 184
l lokcrên çendanî CI hevrûkirinê 185
Hokerên pirsyar iyê 186

DAÇEK 187
Pcyvsaziya daçekan 187
Daçekên hevedudanî 188
Hinek daçekên din 190
Taybetiyên daçekan 191
Rista daçekên bingehîn 194
Daçek LI icwang 194

GIHA'IEK. I95

BAI\EŞAI'i 197
Rewşa banglêkirinê 198

JIMARNAV 199

H~JMARÊN HOKERÎN 201
Tcwanga jimarnavan 201
Raveka jimamavan 203

LÊKER 205
Taybetiyên sereke yên lêkeran 206
Rader 206
Kêşana lêkeran 209
Rayeka dema borî 209
Rayeka dema niha 213
Lêkerên pêkhatî 215
Rayekên ku dibin monernên bêjesaz 216

Ji aliyê pcyvsaziyê ve lêker 219
Lêkerên xwerû 220
Lêkerên nexwerû 246
Lêkerên pêkhatî û qcrtafên lêkersaz 246
Paşgirên lêkcrsaz 247
Lêkerên bi paşgira "-an" 251
Pêşgirên lêkcrsaz 251
Lêkerên bidaçek 255
Di lêkeran de rawe 256
Raweyên pêşkeri 257
Dema niha 258
Dema niha û dema fireh 259
Di devokên kurdî de dema niha 260
Dema niha ya berbiçav 260
Dema niha ya ncbcrbiçav 261
Dema bê 26l
Ketina pêşgira "bi-"yê 261
Çîrokiya dema bê 262
Dema bê ya nêzîk 262
Çîrokiya dema bê ya dûr 263
Çîrok iya dema bê ya nêzîk 264
Demên borî 265
Dema boriya têdeyî 265
Dema boriya dûdar 267
Di dema boriya dûdar de aloziyek ..... : 268
Çîrokiya dema boriya têdeyî 269
Çîrokiya dema boriya dûdar 27l
Dema boriya berdest 272
Awartcyên neyîniyê 273
Raweyên daxwazî 274
Di raweyên daxwazî de dirûvên lêkeran 274
Daxwazî - dema niha 274
Daxwazî - dema borî 275
Daxwazî - pêknehatî 275
Daxwazî - dema boriya dûr 276
Raweya fermanî 277
Neyiniya raweya fermanî 278
Amrazên raweyên daxwazî 280
Raweya xwestekî 280
Daxwazî - dema niha 280
Daxwazî- dema borî 280
Daxwazî - pêknehatî 281

Daxwazî - dema boriya dûr 281
Raweya bilanî 282
Raweya mercî (hckanî) 284
Hekanî bi raweyên pêşkeri 284
Hekaniya daxwazî 285
Raweya divêti 287
Raweya dibetî 289
Raweyên bi lêkerên alîkar 289
Raweya çêbiwar 292
Lêkerên alîkar 295
Di lêkeran de avanî 298
Lebatî û tebatî 299
Avaniya dançêker 301
IIEVOKSAZÎ 303
Hevok 303
I lêmanên hevokê 304
Kirde 304
Pêvcbcr 306
Têrker 308
Bireser 309
Cureyên hevokan 31
0
Ji aliyê wateyê ve hevok 310
Hevokên ragihandinî 310
Hevokên fermanî 3
10
Hevokên navborî 311
Hevokên erênî ..... 3 II
Hevokên neyîniyê 312
Hevokên pirsyariyê 312
Hevokên xwestekî 313
Hevokên baneşanî .....3 I
3
Li gorî rewşa pêvcberê hevok 314
Hevokên navdêrî 3
14
Hevokên lêkerî 314
Ji aliyê avasaziyê ve hevok 314
Hevokên xwerû 315
Hevokên hevedudanî 315
Hevokên hevedudanî yên serbixwe 315
Hevokên hevedudanî yên pevgirêdayi 316
Komek di hevokên hevedudanî yên pev giredayî de 317
Şahkornek .....3 I
8
Komeka alîkar 318

Cureyên komckên a1îkar. ..... 3\ fl
Ravek 320
Ravêkên navdêran 321
Raveka hevalnavan 322
Raveka cînavkan 323
Raveka hokeran 323
Ravekên zincirîn 324
Di hevokê de cih û peywira ravekê 326
Ravek wekî kirde 326
Ravek wekî bireser 326
Ravek wekî têrker 326
Ravek weki pêvcbcr 326
Di hevokên hevedudanî de ahenga deman 327
Hevokên hevedudanî yên serbixwe 327
Hevokên hevedudanî yên pevgirêdayi 328
Hevokên hevedudanî yên bi gihanekên "ku" û "kayê 328
Hevokên hevedudanî yên bi lêkerên alîkar 330
Hevokên hevedudanî yên bi cinavkên girêki ..... 33\
Hevokên demê 332
Hevokên diyarkirina armancê 336
Hevokên diyarkirina mercê 338
Di kurdî de hevoka veguhasti 339
Lêkera "gotin" di forma dema boriya dûdar de ..... 34\
Dema ku lêkera "gotin" dibe çirokiya demên borî "gotibû" 342
Lêkera "gotin" di forma çirokiya dema boriya dûdar de 343
Rêzbûna bêjeyan 344
Di hevokê de kirpandin 347
Dahûrandina hevokê 34R
RASTNrVÎS 349
Fonetîka kurdî û rastnivîs 350
eyîniya lêkera "axaftin'tê ..... 35\
Qcrtafên "bi-" û "bê-"yê ..... 35\
Guherîn ci veguherîna dengan 352
Pevguherîna dengdêran 359
Pirsgirêka "u" ci "û"yê 360
Pevguherîna dengdêrên kurt fl dirêj ..... 36\
Nîvdengdêr ci dengdêrên dirêj 364
Dcngderên dubare 365
Rastnivîsa veqatendeka ku cuda tê nivîsandin 367
Kurtkirina bêjeyan 367
Taybetiyên rastnivîsa pêşgiran 368

Al rabe li rastnivîs 369
Çi, kengê mezin tê nivîsandin? 369
Raveka navdêran ku serenavckê pêk tînin 373
Çi, kengê pê ve lî kengê cuda tê nivîsandin? 376
Rastnivîsa hejmaran 377
Rastnivîsa navên biyanî 378
XALBENDÎ (1 iqtcşanî) 381
Xal 382
Bêhnok 383
Pirsnişan 385
Xalecot 386
Xalebêhnok 386
Kcvanck 387
Kcvaneka çarçik 389
Dunik 389
Yeknik 389
Xêzek 390
Bangnîşan 390
Bendik 391
Sêxal 391
Dabir 392
Dubare 393
Dabeş 393
FERH[NGOKA TÊGIHÊN RÊZIMANÎ BI SÊ ZIMANA~ 395
ÇAVKANÎ 407

PÊŞGOTIN

Di ser çapa yekem a vê pirtûkê re pênc sal derbas bûn. Ev nêzî du salan e ku çapa yekemîn qediyaye û zêdetirî salekê ye ku ez liser çapa duyemîn dixebitim. Çima amadekirina vê çapê ev qas dem girt? Serê pêşîn xebata amadekirina çapa nû di ber gelek kar û barên din re hate kirin, gelek caran xebatên din nehişt ku ez vê xebatê bikim, lewre jî ev kar vema. Ji bilî ve yekê jî, pêwîstî bi venihartineke bi hûrbînî hebû, vê yekê jî gelekî dem girt. Her wiha di warê redaksiyonê de jî di çapa yekemîn de qelsî 0 lawazî pêk hatibûn, lewre me nexwest ev tişt were serê vê çapa nû jî. Ji ber van sedeman çapa nû ya pirtûkê hinde dem girt **li** dereng ma.

Di ve çapa mi de min hemû mijar ji nû ve di ber çavan re derbas kirin, hinek mijar hatin berfirehkirin, di hinek mijaran de guhartin pêk hatin. Her ku zanîn **li** ezmûna mirov di warê zimanî û rêzimanî de zêdetir dibe, asoya mirov firehtir û têgihîştina mirov kûrtir dibe, li gorî wê jî mirov dixwaze hîn bi hûrbînî mijaran hilgire dest.

Di pirtûka min a bi navê *"Waneyên Rêzimanê Kurmancî"* de bandora berhemên rêzimanî yên kurdî. bi taybetî bandora Celadet Bedirxan li ser min gelek bû. Di çapa yekemîn a vê pirtûkê de min hinekî bala xwe dabû berhemên zimanzaniyê û berhemên rêzimana kurdî yên bi zarava û zimanên din. Di vê çapê de min hinekî zêdetir bala xwe da berhemên zimanzaniyê ₒ rêzimana hinek zimanên din; bi taybetî jî rêzimana farisî, îngilîzî û tirkî. Ji xeynî wan, xebat û lêkolînên min ên di domana pênc salan de û nîqaşên ku li ser warên cur bi cur ên rêzimana kurdî pêk hatin ji bo tekûzkirina hinek mijaran bûn bingeh.

Nemaze xebata me ya di dema amadekirina seta hîndekariyê ya bi navê *"Hînker I-II-III '* de di warê ronîkirina gelek mijarên rêzimanî de bû alîkar. Her wiha xebatên Koma Lînguîstîkê yên ku eli bin banê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de pêk hatin, derfet da ku ez bala xwe zêdetir bidim hinek mijarên denganî, peyvsazi, watenasî û hevoksaziya kurdî.

Spasî û malavayî

Di amadekirina çapa nîl de piştgir û hevalbenda min a sereke hevala Aysel Çetîn bû; her mijara ku min xwend, wê jî carekê xwend, hem redakte kir, hem jî bi rexne ̧ pêşniyarên xwe xebat dewletmend kir. Her wiha piştre jî wê berga pirtûkê amade kir li di warê rûpelsaziyê de alîkarî kir. Ji ber vê yekê ez spasiyên xwe yên taybet pêşkêşî wê dikim.

Her wiha hevalê min ̧ hêja, zimanzan Zana Farqînî, pirtûk serdanpê xwend, hem şaşiyên ku bi ber çavên me neketibûn sererast kirin, hem jî bi rexne û pêşniyazên xwe pirtûk tekûztir kir. Her wiha di gelek warên rêzimanî de min ji gotar li xebatên wi sûd wergirt, ji ber vê yekê jî ez dibêjim mala te hezar carî ava.

Hevalê hêja Umîd Dernîrhan piştî derketina çapa yekemîn, pirtûk serdanpê xwendibû û gelek şaşi destnîşan kiribûn, dema ku min dest bi amadekirina çapa duyemîn kir, min pêşî ew şaşî sererast kirin. Lewre jî ez spasiyên xwe pêşkêşî wî dikim.

Her wekî ku min li jor jî daxuyand di domana amadekirina "Hinker'tan û di xebata Koma Lînguîstîkê de min derfet dît ku gelek mijaran zelaltir bikim. Ji ber vê yekê jî ez spasiyên xwe pêşkêşî beşdarên van xebatan dikim.

Bi taybetî hevala Ronayî Onen di her du xebatan de jî hebû, nemaze di dema amadekirina asta duyem û sêyem a Hîn kerê de cm her du bi hev re xebitîn, di vê demê de gelek tişt di serê min de zelaltir bûn. Lewre ez spasiyên xwe pêşkêşî wê dikim.

Ji bilî wan rêveberiya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ̧ hevalên TZPKurdî di warê amadekirina vê xebatê de piştevaniya min kir. ez malavahiya wan jî dikim. Ji van hevalan ez dixwazim keda hevala Xunav Altun ku rûpelsaziya pirtûkê kiriye bi bîr bînim fl spasiyên xwe pêşkêşî wê bikim. Her wiha cz spasiyên xwe pêşkêşî hemû kesen ku bi rexne û pêşniyazên xwe alîkarî dane min, dikim.

Di encamê de ez hêvî dikim ku vê pirtûkê hinek aliyên tarî yên rêzimana kurdî ronî kiribin li hinek alozî ji holê rakiribin. Hemû şaşî ̧ kêmasiyên di pirtûkê de yên min in, her kesê/a ku bala min bikişîne ser van kêmasî li şaşiyan dê min kêfxwes bike.

Samî
Tan

PÊŞEK

Yek ji stûnên zimanê nivîskî jî rêziman e ku ew li deng, teşe û binyata hevokê yên zimanekî dikole û rêzikên wî zimanî tespît dike. Ji lew re, ji bo zimanê nivîskî rêziman tiştekî pir girîng ê jênager e. Nemaze bi xebatên akademîk fl zanistî yên li ser *zimên,* hemû rêzikên zimên derdikevin holê û bi saya wan xebatan jî standardiya zimanê nivîskî pêk tê.

Samî Tan yek ji wan zimanzanan e ku salên dûr û dirêj c li ser rêzimana kurdî dixebite û serê xwe bi peyîtandin fl tespîtkirina rêzikên zimanê kurdî diêşîne. Birêz Tan ku gelek salan bi karê rojnamegeriya bi kurdî biliyaye û ji pratîka zimanê kurdî sûd wergirtiye, xebatên xwe yên li ser rêzimana kurdî ne bi zimanekî din lê bi kurdî dike ku ew jî yek ji dûajoyên nemir Celadet Bedirxan û Feqî Huseyn Sagniç e. Taybetiyeke din a Sami Tan jî ew c ku di warê zimanê kurdî de her tim xwe nû dike, her wiha xebatên xwe û lêkolînên xwe yên li ser zimanê kurdî jî kûrtir dike.

Tan pêşî xebatên xwe yên di vî warî de bi navê 'Waneyên Rêzimanê Kurmancî' pêşkêşî me kiribûn, lê ew bi wê nesekinibû û xebatên xwe yên li ser rêzimanê kûrtir kiribûn û piştre jî berhema xwe ya navborî ku ji aliyê naverokê ve dewlemend fl berfirehtir kiribû, îcar bi navê 'Rêziman fl Rastnivîsa Kurmancî' dabû çapkirin.

Lê çawan me di serî de diyar kir, ew di vî warî de her geşe bi xwe dide fl xwe nû dike û ez bi xwe jî şahid û guvahê vê yekê me. Niha jî bi xebata xwe ya bcrfirchkiri, ya sererastkirî û ji berê tekûztir, li

pêşberî me ye ku îcar berhem bi navê 'Rêzimana Kurmancî' tê pêşkêşkirin.

Di vê çapa nû ya berfirehkirî de hem mijar hatine zêdekirin hem jî şaşî û kêmasiyên berê hatine sererastkirin û bi vî awayî jî xebat hatiye edilandin û kemilandin.

Xebat û lêkonînên di warê zimên de bivê nevê bi temamî hev nagirin û der barê hin rêzikên zimên de ji hev cuda ne. Loma wekî her rêzimanzanî, Samî Tan jî der barê rêzimana kurdî de xwedî raman û angaştan e ku ev jî tiştekî asayî ye. Bi ya min a herî girîng ewe ku raman û angaşt xwedî palpişt delîlên beraqil bin û divê meriv jî bêyî pêşdarazî li wan angaşt û ramanan binêre û binirxîne ku j ix we helwesta zanistî jî ev c. Digel vî qasî ji bo navlêkirina rêzikên ziman jî, ji têgih termên ku hatine bikaranîn zêde, ravekirina mijar û rêzikan hîn bêhtir girîng e.

Di vê heyamê de ku daxwaza perwerdehiya bi zimanê dayikê ji berê bêhtir di rojevê de ye ûji bo pêkanîna vê xwestinê jî çalakiyên cur bi cur tên kirin û kurs tên lidarxistin, ez bawer dikim ku ev xebat dê pirtir bi kêr were û bibe kereseyckc hêja ya perwerdehî û hînkirina zimanê kurdî.

Zana Farqînî

PÊŞGOTINA ÇAPA YEKEMÎN

Di ser xebata me ya bi navê" *Waneyên Zaravayê Kurmancî"* re pênc sal derbas bûn. Wê demê bi tenê li hin saziyên mîna Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û rêxistinên HADEP'ê waneyên zimanê kurdî dihatin dayîn. Ew kar li derveyî qanûnên heyî bû, ji ber vê yekê jî polîsan çend caran avête ser saziyên kurdî û heta li rêveberên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji ber vê yekê doz hatin vekirin. Niha êdî kursên zimanê kurdî bi awayekî fermî hatine vekirin. Kesên ku wan kursan dibin sêrî, bawernameyên ku ji hêla midûrên perwerdehiyê ve hatine şanenavkirin werdigirin.

Digel vê yekê jî, ji wê demê heta niha berhemên ku bi kêrî hîndekarî û perwerdehiya bi zimanê kurdî werin, pir zêde nebûne. Ev xebata li ber destên we bi mebesta dagirtina valahiya di vî warî de hatiye amadekirin. Min pêşî bi mebesta berfirehkirina" *Waneyên Rêzimanê Kurmancî* dest bi xebatê kir, lê paşê xebat ji wê çarçoveyê derket; rengekî nû wergirt. Di wê pirtûkê de mijar wane bi wane hatibûn amadekirin û di dawiya her mijarê de hindarî hebûn. Xebat di çarçoveya pirtûkeke rêziman a klasîk de bû, mijarên zimanzaniyê zêde li ber çavan nehatibûn girtin. Lewre jî min biryar da ku berhemeke cuda û berfirehtir amade bikim. Ev berhem ji wê çarçoveyê hatiye derxistin, pê re jî ew hindariyên li dawiya mijaran hatine rakirin.

Ev xebata li ber destên wc, li ser çar stûnan hatiye avakirin: Dengzanî, peyvsazî, hevoksazî II rastnivîs. Lewma jî me navê *"Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî"* li vê pirtûkê kir. Piştî berhema xwe ya bi navê *"Waneyên Rêzimanê Kurmancî",* min dixwest xebatên nû li ser zimên pêk bînim, lê karê rojnamegeriyê rê li ber vê yekê girt;

nehişt ku ez li ser zimanê kurdî hûr bibim. Lewre jî ev xebat hinekî bi derengiyê ket. Xebata min a li ser vê pirtûkê bi qasî du mehan kişand. Di encamê de berhemeke wiha derket holê, ez hêvî dikim ku bi kêrî şagirt û mamosteyên zimanê kurdî were.

Spasî

Ezmûna min a li ser zimanê kurdî di nav rojnameyên Welat, Welatê Me û Azadiya Welat de pêk hat, lewre jî ez ji rêveber û xebatkarên van rojnameyan hînî gelek tiştan bûm, ez spasiyên xwe pêşkêşî wan hevalan dikim. Her wiha nîqaşên ku me li Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê li ser zimanê kurdî kirin di gelek waran de riya min ronî kir. Lewre jî di serî de gorbihuşt Mamê Feqî, ez spasdarî hemû beşdarên van nîqaşan im. Her wiha gelek nas û dostan jî dîtin **II** ramanên xwe yên li ser pirtûka *"Waneyên Rêzimanê Kurmancî"* ji min re şandin, di serî de mamoste Deharn Evdilfettah, ez spasiyên xwe pêşkêşî wan gişan dikim. Di dema amadekirina pirtûkê deji bo rexne û pêşniyazên wî yên ronîker, ez spasiyên xwe pêşkêşî Zana Farqînî dikim. Qahir Bateyî jî pirtûk seranpê xwend û şaşiyên ku bi ber çavên min neketibûn, sererast kirin, jibo vê keda wî ez spasiyên xwe pêşkêşî wî dikim. Her wiha ez spasiyên xwe yên taybet pêşkêşî hevala me ya hêja Aysel Çetîn dikim. Lewre wê hem di pêvajoya amadekirina pirtûkê de gelekî alîkariya min kir, hem rûpelsazî û bergsaziya pirtûkê kir. Li aliyê din, di dema xebata xwe ya du mehan de jibo aram û alîkariya wan, spasiyên xwe pêşkêşî dayik û bavê xwe; birayê xwe Yusufûjinbiraya xwe Songulê dikim.

Samî

Tan

b) JI ALIYE BINÊYADI VE MALBATÊN ZIMANAN






----------5008
Kurdiya Dêrîn
Pehlewanî
Kurmancî
1
500
1000
1500
Kirmanckî
Goranî
Hewremanî
Lekî
Kurmanciya Jorîn
Kurmanciya Jêrîn

ZIMA1\' Û ZIMANÊ KURDÎ

Berî ku em derbasî mijarên rêzimanî bibin, pêwîst e ku cm li ser zimên bi gelemperî û li ser zimanê kurdî bi taybetî çend tiştan bibêj in. Her wekî çawa ku peydabûna nivîsê mîna destpêka dîrokê tê pejirandin, pêkhatina zimên jî di domana pêkhatina mirovan de qonaxeke girîng û sereke ye. Ji ber ku zimên riya raguhastina peyaman ji kcsekî/ê bo kesekî/e din vekir; têkiliya di navbera mirovan de xurtir kir. Bi riya zimên mirovan ezmûn û serpêhatiyên xwe ragihandin hev û ev ezmûn ji nifşên berê derbasî nifşên nûhatî bûn. Xuya ye ku destpêkirina axaftinê di mêjiyê mirov û mêjûya mirovahiyê de şoreşeke mezin e.

Nexwe ziman çi ye? Mirov dikare bi sê awayên euda bersiva vê pirsê bide ku hemû jî têkildarî hev in û hev temam dikin.

j - Ziman navgîna ragihandinê ye. Mirov bi riya dengan hest û ramanên .xwe radigihînin hev.

2- Ziman dergûşa hemû afirandinên mirovan e, dergûşa çandê ye.

3- Ziman nîşaneya nasnameya hevpar e.

Ji ber van sedeman têkiliyeke xurt di navbera ziman, çand û nasnameyê de heye. Ji ber van sedemên ku me li jor rêz kirin, pêkhatina zimanên cuda bi xwe re bingeha pêkhatina çand, qewm û neteweyên cuda jî anî. Zimanên cuda, bûn sedem ku qewmên ji hev cihê derkevin holê. Netewe jî j i pêşketina qewman derket holê. Taybetiya sereke ya ku neteweyan pêk tîne jî ziman e. Lewre ji bilî xak û bazara hevpar ku piştî kapîtalîzmê derketine holê, tiştên din ên mîna dîroka hevpar, giyanê hevpar, çanda hevpar, gişt alîkariyeke mezin

ji zimên werdigirin. Bêyî zimên giyan û çandeke hevpar pêk nayê. Pê ve girêdayî zanaveke hevpar jî çênabe.

Di mercên îroyîn de ku mirov roj bi roj nêzî hev dibin, sînorên heyî hêdî hêdî ji holê radibin, di parastina reseniya gelan de rola zimên zêdetir dibe. Êdî kesên ku bi heman zimanî dipeyivin çi qas dûrî hev bin jî dikarin bi hêsanî bi hev re danûstandinê bikin û bêyî rakirina sînoran ji aliyê hest û ramanê ve yekîtiya xwe pêk bînin. Lewre jî girîngiya zimên zêdetir bûye. Ev yek ji bo gelên bindest hê girîngtir e. Ji ber ku niha li ser rûyê cîhanê nêzî heft hezar ziman hene, lê tê texmînkirin ku heta dawiya vê sedsalê nîvek ji van zimanan dê bimirin. Hejmareke kêm ji wan zimanan, derfeta wergirtina rengê zimanekî nivîskî bi dest xistiye.

Zimanê kurdî yek ji wan zimanan e ku kêm be jî ew derfet bi dest xistiye û pê wêjeyeke nivîskî derketiye holê. Van demên dawîn pê film têne kişandin, bi hezaran pirtûk, bi sedan weşanên peryodîk pê hatine weşandin. Bi dehan kanalên televîzyonê pê weş anê dikin û ew bi weşana di ser peykan re xwe digihînin kurdan.

Ji aliyê binyadê ve **kurdî**

Ziman bi du awayan têne senifandin;ji aliyê binyadê ve ûji aliyê form û teşeyê ve. Ji aliyê binyadê ve ziman kom bi kom jihev hatine cudakirin. Her wekî Hind-Ewropî, Hamî-Samî, Ûral-Altay û hwd. Koma herî mezin a zimanan, koma Hind-Ewropî ye. Zimanê kurdî jî di nava koma Hind-Ewropî de ye. Her wekî tê zanîn zimanên mîna îngilîzî, almanî, latînî, farisî, sanskrîtî jî di nav vê komê de cih digirin.

Dema ku mirov bala xwe bide hinek peyvên hevpar jî mirov dikare peywendiya zimanê kurdî **II** van zimanan bibîne.

Fransî	*Farîsî*	*Îngilîzî*	*Almanî*	*Kurdî*
terre	*eradi*	*earth*	*erde*	*erd*
astre	*sitare*	*star*	*stern*	*stêrk*
mêre	*mader*	*mo/her*	*mutter*	*mak*
avoir	*hes/en*	*have*	*haben*	*hebûn*

mon	*men*	*my*	*mein*	*mtn*
nan	*ne*	*no*	*nein*	*na*
mauvais	*hed*	*bad*	*bose*	*hed*
nouveau	*nev*	*new*	*nell*	*nll*
nam	*nam*	*name*	*nam*	*nav*
heut	*haşt*	*eight*	*aeh!*	*heşt*
male	*merd*	*man*	*mann*	*mêr*
duex	*do*	*two*	*zwei*	*du*
melle	*merd*	*man*	*mann*	*mêr*
parte	*der*	*door*	*tiir*	*deri*
.fllle	*dax/er*	*daughter*	*tochter*	*dot*
elif	*toxmê morx*	*egg*	*ei*	*hêk*

Zimanê kurdî ji zimanên Hind-Ewropî, di nava beşa zimanên îranî de ye. Zimanên îranî jî bi du awayan tên dabeşkirin; li gorî serdeman wekî serdema kevnar, serdema navîn û serdema nû. Li gorî erdnîgariyê; wekî zimanên bakurê Îranê, zimanên başûrê Îranê, zimanên rojhilatê Îranê û zimanên rojavayê Îranê. Zimanên rojavayê Îranê jî bi ser du koman ve tên dabeşkirin: Zimanên başûrê rojava û zimanên bakurê rojava. Kurdî di nav zimanên bakurê rojava de ye, farisî jî zimanekî başûrê rojava ye.

Li gorî dabeşkirina ku me kir, farisiya kevn, farisiya navîn tl farisiya nû li pey hev tên û di nava zimanên başûrê rojava de cih digirin. Her wiha zimanê medî, partî û zimanên îroyîn; kurdî, belûcî, tatî, gilêki, talîşî fl hwd. di nava koma bakurê rojava de cih digirin. Di vê komê de zimanê medî serdema kevnare, zimanê partî serdema navîn û zimanên din ên mîna kurdî, belûcî, tatî, gilêkî, talîşî serdema nû temsîl dikin.

Gelek zimanzan zimanê kurdî rasterast bi zimanê medî ve girê didin. Lê ji zimanê medî pir kêm peyv mane, ew jî ji çavkaniyên biyanî hatine wergirtin û navên cihan in. Lê belê ji bilî vê yekê jî belgeyek heye ku ji bo têkiliyeke rasterast a zimanê kurdî û medî dibe delîl û palpişt. Ev jî duayek e ku di sedsala 14 'an de hatiye dîtin, ew dua bi çend zimanên mîna erebî, farisî, tirkî û medî hatiye nivîsandin. D. N. MacKenzie li ser vê mijarê gotarek nivîsandiye. Dua bi zimanê medî bi vî rengî ye:

Pakê] xodê, pakê) zehm
Pakê] vêmerg, koy hatî xaçê. eş kirme. rehmetê ma.

Bi kurmancî:

Paqij xwedê. paqij zexm
Paqij bêmirin, kil halî xaçê. rehmetê bike li me.

Her wekî tê xuyakirin ev dua bi kurdî ye. Ev nîşan dide ku heta demekê zimanê kurdî wekî wekî "medî" hatiye binavkirin. Piştî vê mijarê em dikarin hinek bêjeyên zimanên kevnare û bêjeyên zimanê kurdî bidin ber hev, bi vî awayî jî têkiliya wan nîşan bidin.

Kurdî	***Medî***
beg	*baga*
birêz	*bireyzmen*
zor; pir	*zore*
seg, spa (kirmanckî)	*speke*
fire. zor	*firen*
şa, paşa	*xişayese*
perasû	*pirsiwa*

Kurdî	***Pehlewî***
biro. birû	*bir/Îg*
ke/tin	*ke/ten*
hembar	*hemhar*
bira, birader	*birader*
werzêr; kiştkal, cotyar	*werzîger*
giyan	*giyan*
ciwan	*cewan*
firezan	*firezaneg*
diro. derew	*diro*
dar	*dar*
ke/çik, kewçik	*kefçek*
gurçik. gurçîsk	*gurdek*
kilîl, sing	*kilîl*
sûr, sor	*sûxir*
hen ban. heban	*hen han*

Kurdî	Avestayî
engûs (tilî)	enguşt
ewr, hewr	ewre
esp, hesp	esp
kirêkar, karker	krîter
xume, hûme	xumbe
gen, genî, gend	gen
zawa, zava,	zimater
tij, tûj	leyze
bebir, bew!	he ıı'ı'
beraz	wera:::
befir, berf, vewr	wefr
warin, barîn	war

Ji zimanên îro, zimanên îranî yên mîna farisî û belûcî xizmên kurdî ne. Ji bo ku têkiliya zimanên îranî baştir were dîtin em ê hinek peyvên çend zimanên nûjen ên Îranî bidin ber hev:

Farisî	Mazandaranî	BelûçÎ	Kurdî
zîba.xoşçehreh	şamxdl, xeşnemd	şan; soherû	rind, ciwan
xûn	xun	hOI1	xwîn, goynî
mîn	mÎn	neyon	nan
averden	biyarden	durten, drag	anîn, ardene
berader	birdr	brdr hrds	hira
tarîk	siyo	(har	farî
doxter	kijd, dether	dohtir; duttag	dol. keç, çena
rLÎz	rezj	roç	roj.roz
kerden	hdkerden	kanag, kurtin	kirin, kere/ene
murden	mernen	mireg	mirin, men/ene
xar	xar	her	kel; her
toxmê marx	merqdna	heyg, heyk	hêk, hak
çeşm	bej, çeş	çem	çav, çim
peder	piyer	pit, piss	bav, pî
ters	teşepaş	turs, terseg	tirs, fers
xoş	xaar	waşt hoş	weş. xweş
ateş, azer	leş	deh, ds	agir, adil; ar
mahÎ	mahÎ	mahî, mdhîg	masî, mase
xo da	homa, xada	hwdû	xwedê, homa
dest	dess	dast	dest

dil, zerre	*dif, hatyr*	*dil*	*def*
ziman. ziwan	*zevan. zobdn*	*ziwan*	*zeba*
nav. name	*nam*	*num*	*n*
berz, bilind	*bwrz. buleand*	---	*nam*
jin, cenive	*jan*	*jhel1ya*	*bqlend, bare:*
sal. sere	*sal*		*sal*

Kurdî û farisî

.Ji ber ku der barê têkiliya kurdî û farisî de hinek angaşt hene ku dixwazin kurdî wekî zaravayekî farisî nîşan bidin, cm dixwazin li ser têkiliya kurdî lt farisî hinekî rawestin. Di nav zimanên îranî de farisî tekane ziman e ku her tim bûye zimanê desthilatiyê, lewre jî di gelek waran de ji zimanên din zêdetir derketiye pêş. Ji ber vê yekê gelek kesan xwestiye zimanên din ên Îranî wekî zaravayên farisî bibînin. Lê êdî diyar bûye ku zimanê farisî ji van zimanan bi tenê yek e, nikare hemû zimanan bigire bin baskên xwe.

Piştî vê destpêkê em werin ser têkiliya kurdî ₒ farisî. Kurdî ₒ farisî du zimanên ji heman binyadê ne. Ji ber vê yekê, ji gelek aliyan ve her du ziman nêzî hev in. Lê dîsa her du ziman ji gelek aliyan ve jî ji hev cuda dibin. Wekî mînak, di zaravayên Bakur ên kurdî de zayendî heye, lê di farisî de nîn e. Her wiha di kurdî de ergatîvî heye, lê belê di farisî de nîn e.

Dema ku mirov bala xwe dide peyvên kurdî ₒ farisî mirov dibîne ku peyv bi rêjeyeke pir zêde nêzî hev in. Gelek peyv bi guherîna hin dengan ji hev euda dibin. Dema ku mirov farisiya kevn lt zimanên pêşrewên kurdî dide ber hev jî ev yek bi awayekî zelal derdikeve holê. Em dikarin bi çend mînakan mijarê zelaltir bikin.

Dengên ku peyvên kurdî û farisî ji hev cuda dikin:

V/B

Dengê /b/ya farisî di kurdî de dibe /\'-""/

Kurdî	*Farisî*
şev/şew	*şeh*
bav/baw	*hab*
fUI'	*tab*
seH":	*sebz*

xew	*xab*
hevriş	*ebrîşet*
jîZ	*n*

Dengê *Izl* bi piranî di kurdî de dibe *Ij/,* lê awarteyên vê yekê jî hene. Bo nimûne di peyvên mîna *"jeng"* û *"zeng", "jîrek"* û *"zîrek"* de kurmancî her du deng jî di nava xwe de parastine.

Farisî	*Kurdî*
::ehr	*jehr*
raz	*ny'*
::en	*jin*
zîndeg	*./111*
	SIH

Di hin bêjeyan de Is/ya di kurdî de di farisî de dibe *lh/.*

Kurdî	*Farisî*
masi	*mahî*
des	*deh*
(kirmanckî)	*ahe*
asin	*n*
aşk	*ahû*
W(Ş)M	

Di gelek bêjeyan de beranberî *Iv/ya* kurdî di farisî de /şm/ an jî bi tenê *Iml* tê.

Farisî	*Kurdî*
çeşm	*çav*
damad	*zava*
gam	*gav*
nam	*nav*
	zrn

Cudatiyeke din a kurdî û farisî jî pevguherîna dengê *!zI* û *ldi* ye.

Kurdî	*Farisî*
zava	*dama*
zanis	*d*
t	*danist*
zere	*dil*
(kirmanckî)	*derva*
zerya	

V/XM

KurdÎ	*Farisî*
tov	*toxm*

Di dawiya vê mijarê de divê em bidin xuyakirin ku guherîna van dengan ne bi rêjeyeke ji sedî sed e. Gelek awarte di her du zimanan de jî hene. Her wiha cudatiya van dengan di kurdî de li gorî zaravayan jî diguhere.

Zaravayên **kurdî**

Wekî her zimanî, zimanê kurdî ji xwediyê zaravayan e.
Dabeşkirina zaravayên zimanê kurdî ji hêla kesên cuda ve bi awayên têvel hatiye kirin. 'Rojhilatnasên ku li nav kurdan geriyane, li ser zaravayên zimanê kurdî li gorî pêzanîna xwe lî berjewendiyên dewleta xwe gelek nirxandinên nerast jî kirine. Kurdan bi xwe jî li ser zaravayên kurdî helwesteke zanistî wernegirtiye, jê zêdetir bi hestiyarî tevgeriyane. Lê dîsa jî dabeşkirina zaravayan serê pêşîn ji hêla Şerefxanê Bedlîsî ve hatiye kirin. Wî di sedsala 16'an de di berhema xwe ya bi navê Şerefname de li ser zaravayên kurdî wiha gotiye:

"Civat lî hozên kurd bi ziman, tore ₒ rewşa xwe ya civakî dibin çar bir:

Bira yekem: kurmanc
Bira duyem; lor
bira sêyem; kelhûr
bira çarem: goran

Hinek li gorî erdnîgariyê zaravayên kurdî wekî kurdiya bakur, kurdiya başûr û kurdiya naverast dabeş dikin. Hinek jî zaravayên kurdi dikin du qism: *kurdiya bakur ₒ kurdiya başûr. ..*

Bi kurtasî zaravayên sereke yên kurdî ev in: kurmanciya jorîn, kurmanciya jêrîn, goranî (hewremanî), kirmanckî (dimilî), lorî ... Divê bê gotin ku hinek zanyar zaravayên kirmanckî û goranî wekî yek zarava dihesibînin ₒ hejmara zaravayên kurdî dadixin çaran. Lê bi baweriya min ev dîtin zêde ne zanistî ye.

Zaravayên kurdî her yek ji aliyekî ve ji yên din cuda dibe û di warekî de du heb ji wan nêzî hev in, di warekî din de du hebên din nêzî hev dibin. Bo nimûne, di warê tewangbarî, nêr û mêti û erga-tîviyê de zaravayên bakur; kurmancî û kirmanckî (dimilî) nêzî hev in. Lê di warê cînavk û kişandina lêkeran de îcar kurmanciya jêrîn (soranî) lt kurmanciya jorîn (kurmancî) nêzî hev dibin.

Dema ku mirov bala xwe dide hinek peyvan, îcar kirmanckî il kurmanciya jêrîn nêzî hev dibin. Zaravayê goranî il kirmanckî tê-kildarî hev in û zaravayên herî kevnare dixuyên. Her wiha kurman-ciya jêrîn ll kurmanciya jorîn jî têkildarî hev in. Ji van, kurmanciya jorîn ji ya jêrîn kevntir e. Di dîroka zimanê kurdî de qonaxa duyemîn pêk tîne. Kurmanciya jêrîn ku jê re soranî jî tê gotin, zaravayê herî nû ye.

Ji aliyê denganiyê ve kurdî dabeşî ser sê komên bingehîn; koma kurmancî (kurmanciya jorîn û kurmanciya jêrîn) lt koma goranî û kirmanckî il lorî dibe. Lê dîsa jî her zarava xwediyê hinek aliyên xweser e. Ji bo vê yekê em dikarin bi mînakan guherîna dengan a di sê zaravayan ango di kurmanciya bakur û kurmanciya başûr li kirmanckî de nîşan bidin:

V .W

Di vî warî de bi gelemperî kurmancî û kirmanckî nezî hev in, di soranî de dengê *"v"* di pir kêm peyvan de peyda dibe, ew peyv jî ji kurmancî hatine wergirtin. Lê di hinek mînakan kurmancî de lt kir-manckî nêzî hev dibin.

Soran	*Kirmanckî*	*Kurmancî*
şew	*şew*	*şev*
aw	*aw*	*av*
şnvan	*şi wane*	*şivan*
gawan	*gawan*	*gavan*

B-V

Dema ku mirov bala xwe dide zimanên kevn ên îranî, mirov dibîne ku di warê pevguherîna *"h-v"yê* de ji zaravayên kurdî kirmanckî nêzî avestayî ye. Lê kurmancî il soranî di vî warî de nêzî farisî dibin.

Soranî	*Kirmanckî*	*Kurmancî*
ba	*va*	*ba*
baran	*varan*	*haran*
befir	*vewr*	*berf befir*
bîst	*vîst*	*bîst*
bîr	*Vir*	*brr*
		M-V/W

Dengê *"m'* ya kirmanckî bi piranî di kurmancî de dibe "v" ₒdi soranî de dibe "ẘ",

Soranî	*Kirmanckî*	*Kurmancî*
çaw	*çim*	*çav*
henga	*gam*	*gav*
naw	*name*	*nav*
eme	*eno/ ena/ enê*	*ev*

Di zaravayên kirmanckî ₒgoranî de pevdenga kurmancî ₒsoranî *"xw"* bûye "ẘ".

Soranî	*Goranî*	*Kirmanckî*	*Kurmancî*
xoş	*weş*	*weş*	*xweş*
xwendin	*wanden*	*wendene*	*xwendin*
xwardin	*warden*	*werdene*	*xwarin*

Ji aliyê teşe û dirûv ve zimanê kurdi

Ji aliyê dirûv ve jî ziman têne senifandin. Her wekî zimanên yek-kîtcyî, mîna zimanê çînî û japonî. Di van zimanan de her kîteyek peyvek c. 1 linek ziman bi qertaf in. Di van zimanan de qertafên ku têne pêş û paşiya peyvê wateyeke nû didin peyvê, bi vî awayî peyv têne çêkirin. Bo nimûne zimanê îngilîzî zimanekî qertafi ye. Di îngilîzî de ji van qertafên bêjesaz re *"affix "* tê gotin, ji paşgiran re *"suffix "* fl ji pêşgiran re jî *"prefix "* tê gotin.

Wekî

pro-noun (cînavk)
sur-name (paşnav)
turn-ing (zivirîn)
speak-er. ..
(axivger)

Hinek ziman bi tenê qertafan digirin dawiya rayeka peyvan, pêşgir di wan zimanan de nîn in. Zimanê tirkî zimanekî bi vî rengî ye. Di tirki de rayeka peyvê ji bilî hinek guherînên biçûk, qet naguhere.

MÎnak: *Git-miş-ler-di. gid-ecek-ler-miş, soyle-ye-me-di-gin-den, yeşil-tik-ten-di, gûzel-lig-in-den-di ...*

Hinek ziman jî tewangbar in. Di van zimanan de teşe û dirûvê peyvê li gon kar û peywira ku bêje digire ser xwe diguhere. Tewangbarî jî rade bi rade ye. Wekî nimûne hinek ziman hene xwediyê tewangbariya tam in. Erebî yekji van zimanan e. Di zimanê erebî de hinek qalib hene, peyv li gorî wan qaliban teşe digire. Di peyvê de hinek deng sabît in, lê deng diguherin.

MÎnak: Ji *lktbl kitab, katib, kutub, mekteb, mektub* her wiha ji /klm/ *ke/am, kelîme ...*

Zimanê kurdî di vî warî de wekî gelek zimanên din ên îranî, hem zimanekî tewangbar e hemjî qertafan digire. Di kurdî de qcrtafhem pêşgir, hem paşgir û kêm caran jî navgir in.

Kurdî zimanekî tewangbar e. Cureyên guherbar ên peyvan ditewin, li gorî peywira ku digirin ser xwe dirûvê wan diguhere. Hin caran qertafan werdigirin, hin caran jî guhartin di nava wan de çêdibe. Di kurdî de cureyên bêjeyan ên mîna lêker, navdêr, cînavk. veqetandek, jirnarnav guherbar in. Navdêr û cînavk li gorî peywira ku digirin ser xwe, têne kişandin ango ditewin.

Bi riya tewangê zayend û mêj er tên nimandin. Lêker li gorî dem û kesan têne kişandin, nemaze di dema niha û raweya fermanî de rayeka lêkerê bi xwe jî diguhere.

Bo nimûne,

Kirin	*di-k- im*	*bi-k-e*
Şûşti	*di-şodi-*	*bi-şobi-*
n	*gir-Î*	*gir-e*
Girtin		

Her wekî me li jorê jî diyar kir, navdêr û cînavk li gorî peywira ku di nava hevokê de werdigirin ser xwe têne kişandin ango ditewin. Bi riya tewangê zayend û mêjera peyvê tê nîşandan.

Mînak:

Gulan pirtûkê dixwîne. Ez şivanî dibînim.
Xwendekar daran diçînin.

Her wekî ji mînakên jorîn jî diyar dibin *"tewang"* bi gelemperi bi riya wergirtina qertafên tewangê pêk tê, lê di hin navdêrên nêr de jî bi riya guherîna dengan pêk tê. Wekî nimûne;

Guherîna navdêran

hajar	*bajêr*
welat	*welê*
he	*t*
\'(11	*hevêl*
derî	*dêrî*

Ango di kurdî de qertaf hem tên pêşiya bêjeyê hem jî tên paşiya bêjeyan. Kêm be jî, hinek earan qertaf ek dikeve navbera du peyvan, wan digihîne hev fl wateyeke nû li wan bar dike. Her wiha hinek caran jî deng di nava peyvê de diguhere û peywira peyvê diguhêre.

Mînak (pêşgir)

kirin	*ve-kirin*
bav	*zir-bav*
tewş	*bele-tewş*
ker	*man-ker*

il1Îllak (paşgir)

sor	*sor-ing*
kêr	*kêr-Î*
sir	*sîr-ik*
zêr	*zêr-În*

Mînak (navgir)

ŞCW!'I	*şewat*
În	*xebat*
Xebitin	*lebat*
lebitîn	

Mînak (navbend)

germ+e+germ	*germegerm*
ser+an+ ser	*seranser*
kel+o+girî	*kelogirî*

TiP~N KURDi BI ALFABEYA FONETJK A NA VNETEWEYT (IPA)

Mînak (IPA)	Mînak (kurdî)	**IPA**	TIpên kurdî
[bav]	bav	[0]	a
[bar]	ber	[b]	b
[d3^{lh}]	cih	[d3]	c
[tfar]	çar	[tf]	ç
[tJ'av]	çav	[t1']	ç
[dar]	dar	Cd]	d
[barhsrn]	berhem	[3]	e
[hez]	hêz	[s]	ê
[and]	find	ff]	f
[grel]	gul	Cg]	9
[havm]	havîn	[h]	h
[dii]	dil	[1]	
[mv]	nîv	[1]	î
[3^{ar}]	jar	[3]	j
[khrerd]	kurd	[k^{h}]	k
[k\'rer]	kur	[k']	k
[Isv]	lêv	[1]	I
[mar]	mar	[m]	m
[nav]	nav	[n]	n
[nod]	nod	[0]	o
[ph$_{lr}$]	pir	[ph)	p
[pl'^{snd}3]	pênc	[p']	p
[qad]	qad	[q]	q
[k\'Hln]	kirin	[r]	
[khmn]	kirîn	er]	
[sev]	sêv	[s]	s
(flr]	şîr	ıı|	Ş
(th3V]	tev	[th]	t
[tîarr]	tarî	[t']	
[dce]	du	[re]	u
[bun]	bûn	[ul	û
[tîav]	tav	[v]	v
[wan]	wan	[w]	w
[xam]	xanî	[x]	x
['(ar]	xar	['{]	x
[j3k')	yek	∩|	y
[zer]	zêr	ez]	z

DENGANIYA ZIMANÊ **KURDÎ**

Rêziman

Her wekî ji wateya peyvê jî xuya ye, rêziman rêz û rêzikên zimên nîşanî mirov dide. Rêziman, lêkolîn û lêhûrbûna li ser rêz û rêzikên zimanekî xwezayî ye. Diyar e ku tu ziman ne bêrêzik e. Deng, kîte, peyv û hevok li gorî hinek rêz û rêzikan pêk hatine; rêziman van rêz û rêzikan nîşanî mirov dide. Di zimên de çar warên bingehîn bûne mijara vekolan û lêhûrbûna zimanzanan: Deng; teşe û cureyên peyvan; wateya wan û rêz û rêzikên pêkhatinê û rêzbûna wan.

Berê dema ku rêziman dihat gotin, bi tenê warên mîna peyv sazî (morfolojî) û hevoksaziyê (scntaks) dihatin bîra mirovan. Lê îro bergeha rêzimanê firehtir bûye, qadên zimanzaniyê yên mîna dengsazî (fonetîk), dengzanî (fonolojî), rastnivîs (ortografi), watenasî (semantîk), kirdarînasî (pragmatîks) ketine nava qada rêzimanê.

Lewma em ê bala xwe bidin warên mîna denganî (dengsazî û dengzanî), peyvsazî, watenasî û hevoksazî û rastnivîsa kurdî jî.

Denganî

Di vê beşê de em ê li ser taybetiyên dengên kurdî rawestin. Em ê dengên kurdî ji du aliyan ve; ji aliyê dengsazi û dengzaniyê ve hildin dest. Dengsazî li ser pêkhatin, pevgihaştin û deranîna dengên axaftinê radiweste, dcngzani li ser pergal û qalibên dengan radiweste.

Dengsazî

Di zanista zimanzaniyê de ji zanista lêkolîna pêkhatin, pevgihaştin, ravekirin û pêşkêşkirina dengên axaftinê re dcngsazî tê gotin. Di zimanzaniyê de dema ku mirov dibêje, *"deng"* mirov qesta dengên zimên dike.

Mirov dikare bi kurtasî *"dengên zimên"* wiha rave bike: Bayê ku ji pişika mirov derdikeve, diçe zengilorê, li vir bizavekê dide ta ango jiyên deng; ew deng bi alîkariya qirik, lêv, diran, ziman, arikê dêv û difina mirov dirûvekî digire. Deng dibin du bir: Dengdêr û dengdar. Dengdêr ew cure deng in ku bi serê xwe bêyî ku li cihekî bialiqin, rasterast ji devê mirov derdikevin.

Dengdar, bi tena serê xwe ji devê mirov dernakevin, jibo ku mirov karibe wan bi lêv bike pêdivî bi dengdêrekê heye. Dengdar bi alîkariya dengdêran tên dêrandin. Jixwe wateya dengdêrê jî ji wir tê.

Di zimanê kurmancî de 3 1 dengên bingehîn û pevdengek hene. Ji wan 23 heb dengdar, 8 heb dengdêr in. Ligel van dengan hinek deng hene ku wekî dengên bingehîn nehatine pejirandin û di nav alfabeyê de nehatine nîşandan, lê nîqaşa der barê wan de jî hê bi dawî nebûye.

Alfabeya kurdî

Deng bi alîkariya hin nîşaneyan (îşaret) tên nimandin. Ji wan nîşaneyan re *"tîp"* tê gotin. Her wekî me berê jî dabû xuyakirin, di zaravayê kurmancî de 31 dengên bingehîn û pevdengek hene, ew deng bi hin nîşaneyan hatine destnîşankirin ango ji wan re tîp hatine danîn. Li nik wan dengan gelek *"rengedeng"* hene, hê jî li ser wan lihevkirineke giştî pêk nehatiye.

Di vê xebatê de, em dê li ser rêça Celadet Bedirxan bimeşin, ji ber ku her lêkolîner û zimanzanê/a ku li ser navê sererastkirinê hinek gav avêtine, şaşiyek li şaşiyên heyî zêde kiriye. Heta ku saziyeke hevgirtî ya zimanê kurdî pêk were û li ser alfabeya kurdî mercên lihevkirineke giştî bi dest bikevin, çêtir e ku mirov hîmê ku Celadet Bedirxan daniye xera neke. Niha piraniya weşanên kurdî li ser şopa

Celadet Bedirxan dimeşin. Gelekên din jî hinek guhartinên biçûk tê de çêdikin, lê dîsajî bi awayekî giştî li ser vê rêçê ne. Em ê jî wisa bikin.

Wekî ku me li jor jî diyar kir, tîp nîşaneyên dengan in, mirov bi riya tîpan dikare dengan nîşan bide û mayinde bike.

Berî ku em tîpên kurdî rêz bikin, divê em bi bîr bixin ku di alfabeya latînî de tîp ji aliyê şêweyê ve dibin du cure; hinek ji wan hûr, hinek jî mezin tên nivîsandin. Di rêzimanî de ji tîpên hûr re *"hûrdek"* ji yên mezin re *"girdek"* tê gotin. Di alfebeya erebî de ev cudatî nîn e.

Di alfabeya kurdî de ev tîp hene:

l1pên girdek:

ABCÇDEÊFGHIÎJKLAINOPQRSŞTUÛVWXYZ

TIpên hûrdek:

a bcçdeêfgh i ijkl m nopqrsş

tuûvwxyz Pevdeng:

Ji dengê ku ji çend dengan hevedudanî ye re pev deng (dîftong) tê gotin. Di zimanê kurdî de pevdengek heye. Ew pcvdeng ji du dengdaran pêk tê. Pevdenga kurmancî eve: *xw*

Her wekî dengan, nîşaneyên wan jî wekî dengdêr û dengdar ji hev cuda dibin.

Dengdêr

TIpên dengdêr:

Di kurdî de 8 dengdêr hene, ji wan 3 heb kurt, 5 heb jî dirêj in.

TIpên dengdêr ev in:
a, e, ê, i, î, o, *u, û*

Di kurdî de dengdêrên kurt û dirêj ji hev cuda ne; wekî hinek zimanên din bi hin nîşaneyan naguherin. Di nava peyvê de kurtî li dirêjiya wan diyar e. Di hin zimanan de ev rewş cuda ye. Wekî mînak, di erebî de dengdêrên kurt bi tîpekê nayên nîşandan, bi hin nîşaneyên ku datînin ber dengdaran, tên nimandin.

Wekî din JÎ dengdêr li gorî cihê zimên ku deng jê derdikeve û li gorî tevgera zimên **ji** hev cuda dibin. Hinek dengji pêşiya zimên, hinekji nîveka zimên hinekjî ji dawiya zimên derdikevin. Di hinek dengan de ziman ber bi jor ve radibe, di hinekan de ziman razayî dimîne, di hinekan de jî serê zimên ber bi jêr ve diçe, nîveka zimên bilind dibe. Her wiha dengdêr li gorî tevgera lêvan jî ji hev cuda dibin.

Dengdêrên dirêj:

a, ê, Î, o, *û*

Dengdêrên kurt:

e, i. ıı

Li gorî cîderkê dengdêr

Pêşderkî: *Î,* ê, *e* Navderkî:

i, ∪

Paşderki: *û,* o, *a*

Li gorî awayê vebûna devê mirov

Gilover: *o,* ıı, *il*
Nîvgirtî: ı. i. *ê*
Vekirî: *a, e*

Li gorî asta derketinê

Dengdêrên bilind: *ı,* Lî, i, *u*
Dengdêrên navincî: ê, *o*
Dengdêrên nizm: *a. e*

Dengdar

Dengdarên kurmancî ev in:

bcçdfghjkl mnpq rsştvwxvz

Di kurmancî de 23 dengên dengdar hene. Dengdar bi sê awayan .İ i hev û din vediqetin.

1- Li gorî cîderka dengan
2- Li gorî şêweyê derketina dengan
3- Li gorî asta derketinê

Li gorî cîderkê dengdarên kurdî

Di kurmancî de 1 i gorî cîderkê ev dengdar hene.

Lêvkî: *b. m, p,* w "

Ev deng bi tevgera lêvan pêk tên. Di her sê dengên pêşîn (b, m, p) de her du lêv digihêjin hev, lê di dengê "w " de lêv nagihêjin hev.

Diranlêvkî: *f. v*

Ev deng bi tevgera diran û lêvan der tên. Diranên jorîn bi ser lêvên jêrîn de têne guvaştin.

Diranî: *t, d, s, z, 11*

Bi tevgera zimên a li ser diranên pêşîn pêk tên.

Pêşezmandevî: c, *ç. ş. j. y. l, r*
Ezmandevî û qirikî: *g, h, k, q, x*

Di kurmancî de li gorî awayê dcrxistinê deng ev in:

Girtiya hişk: *17. t, k, q*
Girtiya nerm: *b, d.* g
Fîzeka hişk: *f. s, ş*
Fîzeka nerm: *v, z, i.*
Herikiya lerzokî: *r*
Herikiya rexkî: *l*
Girtiya difinî: *m, n*
Nîvdengdêr: *y.* \1; *h*
Domdara hişk: *x*

Dengzanî

Dengzanî ango Ionolojî beşeke zimanzaniyê ye ku li ser pergala dengan a zimanekî / çend zimanan dixebite. Dengzanî bala xwe dide awayê kargeriya deng a di nava zimanekî yan jî di navbera zimanan de. Dengzani, dahûrandin û senifandina fonemên wî zimanî di zimên de jî pêk tîne. Her wiha bandora dengan a li ser hev û guherîna dengan a di zimanekî de jî dikeve nav qada dengzaniyê.

Di zimên de peyv li ser foneman ava dibe. Fonem biçûktirîn beşa axaftinê ye ku di pêkanîna wateyê de xwediyê peywireke diyarker e. Di zimên de bi tenê fonem wekî dengên bingehîn tên pejirandin.

Di kurdî de hinek deng hene, lê tevî ku alfabeya kurdî wekî alfabeyeke fonetîk Ui bo her dengî tîpek) hatiye pejirandin ji van re tîp nehatine diyarkirin. Hin deng her çi qas di kurdî de hene jî wekî dengên bingehîn nehatine pejirandin û ji wan re nîşane ango tîp nehatine destnîşankirin. Vê yekê bi xwe re nîqaşek daye destpêkirin.

Celadet Bedirxan dema ku alfabeya latînî amade kiriye, ew deng wekî rengedeng dîtine û ji wan re tu nîşane diyar nekirine, lê hê di wê demê de jî Osman Sebrî li dij wî rabûye û du niçik danîne ser ên nerm, bi wî rengî jiyên hişk cuda kirine. Îro jî hinek kes dixwazin bi awayekî van dengan di nava alfabeya kurdî de bi cih bikin. Ew dengên ku dibin mijara gengeşiyan ev in:

1- Dengên hilmî û nehilmî yên tîpên: *ç, k, p. t*

2- Dengên ku ji erebî derbasî kurdî bûne *eyn* **(t),** *he* (c) û *xeyn* (t)

3- Dengên "r"ya lerzok û "{"ya bişid.

1- Dengdêrên hilmî û nehilmÎ

Di kurdî de tîpên *"p,ç, t, k"* du dengên cuda nîşan didin, beşekji van hilmî (aspirative) ne, beşa din jî nehilmî (unaspirative) ne. Dengên hilmî ew deng in ku bi hilmê ji devê mirov derdikevin. Dema ku em dengên hilmî bi lêv dikin, heke em destê xwe bidin ber devê xwe, em ₔ hilmê rabihîzin. Di dengên hilmî de mirov bi dengê *"h"* yê dihese. Lewre jî zimanzan "h"yekê datînin ber dengên hilmî.

Hilmî	**Nehilmî**
çh (çar. çil, çûn)	*ç (çav, çiya, çem)*
kh (kel; kêr, ken)	*k (kur. kund, kanî)*
Ph (par; pel; pir)	*p (pênc, parî, pê/av (sol)*
th (tas, tevn, tor)	*((tarî, tenî, tîr)*

Di literatûra rêzimanî ya kurdî de ev her du deng wekî *"nerm"* û *"hişk"* ji hev hatine cudakirin. Me jî di çapa yekemîn a pirtûkê de wisa kiribû, lê di xebatên zimanzaniyê de ev her du deng wekî hilmî û nchilmî hatine senifandin, me jî ev yek tercîh kir.

Me di çapa yekemîn de navê rengedeng li van dengan kiribû, dema ku mirov bala xwe dide wan mirov dibîne ku ew gelek peyvan

ji aliyê wateyê ve ji hev cuda dikin, lewre jî ew *"fonem"* in. Ji ber vê yekê jî mirov nikare navê rengedeng li wan bike. Rcngcdeng ew deng e ku di wateya peyvekê de tu guhartinê pêk nayîne.

2- Dengên ku ji erebî derbasî kurdî bûne

Têkiliya dîrokî ya kurdî û erebî hiştiye ku hinek dengji erebî derbasî kurdî bibin. Di vî warî de divê bandora dînê îslamê û perwerdehiya medreseyan jî liber çavan were girtin. Her wiha dibe ku hinek deng ne ji erebî.ji asûrî-suryanî jî derbasî kurdî bûbin, lewre têkiliya kurdan **li** gelê asûrî hê kevntir e. Êdî ji ber çi sedemê be, niha di kurdî de *he* (eL *eyn* **(t) li** *xeyn* **(t)** a erebî di gelek peyvan de derdikevin pêşberî mirov. Ji van dengan *"xeyn'* bi tenê di wan peyvan de ku bi binyada xwe erebî ne derdikevin pêşberî mirov. Lê belê dengên "h' û "eyn" di hin peyvên kurdî yê resen de jî balê dikêşin. Wisa xuya dike ku wan dengan di gelek peyvan de cihê "h"ya kurdî girtiye. Her wiha *"h"ya* ku maye jî di hin peyvan de rengê *"h"ya* erebî wergirtiye. Ji ber ku "h"ya erebî hişktir e. Ji ber heman sedemê dengdêrên kurt ên mîna *"e* ", *"i"* ، *"u"* ku bi hêsanî têne pişaftin, bi alîkariya eyn **(t)** a erebî xwe radigirin.

	MÎntIk:
hesin	*hesin*
'ewr	*hewr*
'esman	*asîman*
çe'v	*çehv*
'işk (hişk)	*hişk*
hejîr	*hêj* if
hewş	*hewş*

Divê em vê ke bibêjin ku gelek bêjeyên erebî jî bi fonetîka xwe ketine nava kurmancî. Mirov dikare bêjeyên mîna *"erebî", "Elî", "umir", "ilm* ". *"Hesen* ", *"Helîm"* wekî mînak bide.

Lê ev dengên erebî di kurdî de nebûne fonem ango dema ku mirov li şûna wan dengên kurdî bi kar bîne, ji aliyê wateyê ve tu guhartin çênabe. Heta li hinek herêman li şûna wan, dengên kurdî têne bikaranîn.

Danerê alfabeya kurdî Celadet Bedirxan bi armanca ku wan den-

gan j i nav dengên kurdi veder bike, ew nexistine nav alfabeya kurdî. Li gorî min jî ev deng denganiya kurdî xera dikin, lewre jî bi tenê di deqên klasîk de, di dema tîpguhêziyê de bêne nîşandan bes e.

3- Dengên lerzok û bişid

Her wiha dengên *"1"* ʟî *"1"* jî bûne mijara gotûbêjan, hê jî gelek nivîskar di hin peyvan de cot *"1"* cot *"r* "yê bi kar tînin. Bo nimûne: *"Pir* "a ku wateya zehf dide, wekî *"pirr"* tê nivîsandin, her wiha peyva gelek jî bi du *"1* "yan mîna *"gel/ek"* tê nivîsandin. Ji van her du dengan dengê "r" di hinek peyvan de fonem e. Lê dengê "1" tu guhartinê di wateya peyvê de pêk nayîne.

Wekî encam mirov dikare li ser vê mijara dengên ku neketine alfabeyê wiha bibêje, di her zimanî de hemû deng nakevin alfabeyê, pirî caran bi tîpekê gelek deng têne nîşandan. Di kurdi de jî wisa bûye. Lê Mîr Celadet Bedirxan alfabeya kurdî wekî *"alfabeyeke fonetîk"* bi nav dike, ew jî tê wê wateyê ku ji bo her fonernê tîpek hatiye danîn, li gorî baweriya min, ev angaşta Mîr Celadet li gorî rewşa heyî têk diçe, lewre hinek dengên ku neketine al fabeyê bi awayekî berbiçav fonem in. Nexwe alfabeya kurdî ne alfabeyeke fonetîk e, heke em dixwazin alfabeyeke fonetîk pêk bînin, divê em çend tîpan li alfabeya xwe zêde bikin. Lê belê êdî alfabeya kurdî cihê xwe girtiye, zêdekirina tîpan dê bi xwe re hinek arîşeyên nû bîne.

Lewre jî mirov dikare di karê perwerdehî û lêkolînî de hinek nîşaneyanji bo wan bi kar bîne. Wek nimûne di pirtûkên perwerdehiyê de û di ferhengan de divê cudatiya wan bi awayekî bê nîşandan. Lê di zimanê rojane de pêdivî pê nîn e ku cudatî bikeve navbera wan her du dengan, ew ji bo zimên bargiranî ye. Her wekî çawa di erebî de zêr û zebcr hene, di dema perwerdehiyê de têne bikaranîn, lê di zimanê rojane de nayên bikaranîn.

Divê em bibêjin ku hê li ser dengzaniya zimanê kurdî xebateke xurt û zanistî nehatiye kirin. Heke em bikevin nava gund û bajarên kurdan. li gorî pîvanên dcngsaziyên li dengên ku di zimanê axaftinê de têne bikaranîn binêrin, cm dê rastî gelek dengan bên. Jibo nimûne, di kurdî de dengê *"n"* di hin peyvan de bi şid tê gotin.

Mînak:

geni
m
genî

Vê yekê heta niha bala tu zimanzanên kurd nekişandiye. Iewre kesî li serê nîqaş jî nekiriye fl di wan peyvan de *"n"* dubare nekiriye. Ji bilî vê jî di devokên kurmancî de hinek deng û rengedengên din jî hene. Bo nimûne, li hin herêman dengekî nêzî "ii"ya tirkî heye, her wiha di kurmanciya kurdên Meraşê de dengekî di navbera *"o"* û "o"yê de jî heye.

Her wekî me da xuyakirin heke mirov li ser dengan lêkolîneke dûr û kûr bike, dê gelek dengên din jî derkevin holê, îcar tu alfabe têrê nakin û kes nikare jê re klavyayê jî çêke. Her wekî Celadet Bedirxan ji Osman Sebrî re gotiye, her kes hewl dide ku hejmara tîpên xwe kêm bike, divê cm berevajî xelkê nekin. Li ser dubarekirina dengên ***"l"*** û "r"yê jî, bîr fl baweriya min bi vî rengî ye: Bi tenê ji bo jihcvcudakirina hinek peyvên yekreng, xwe li ser mirov ferz dike, lê heke em rabin li şûna hemû "r"yên Icrzok cot "r"yê binivîsin, em e nivîsandina kurdî gelekî dijwar bikin. Li hin cihan dibe ku em mecbûrî sê "r"yan bibin. I Ier wekî şerrrawestandin. Heçî ***"l"*** ye, li gorî baweriya min pêdivî bi nivîsandina cot *"J"yê* nîn e.

Dengên **alîkar** ango dengên **kclijandmê**

Di zimên de hinek deng hene, di navbera dengdêr û dengdaran de wekî pirekê têne bikaranîn. Ev deng her çi qas dengdar bin jî, di dema bilêvkirinê de wekî dengdarên din li cihekî naeliqin û bi hêsanî ji devê mirov derdikevin. Ji ber vê taybetiya xwe, nêzî dengdêran in. Lewre jî jivan dengan re nîvdcngdêr tên gotin.

Di kurmancî de du dengdêr li pey hev nayên. Dema ku du dengdêr tên ber hev, dengekî alîkar dikeve navbera wan fl wan digi-hîne hev. Gelek zimanzanên kurd bi bandora tirkî ji wan dengan re *"dengên kelijandinê"* dibêjin. Ji ber ku fêmkirina mijarê hêsantir dike, em e jî heman têgihê bi kar bînin.

Di zaravayê kurmancî de sê dengên ku bi vî karî radibin hene: *"y",* "w", ***"h",*** Dema du dengdêr tên ber hev, dengek ji van dikeve navberê û wan digihîne hev. Ji bo nîşandana rola wan tîpan mirov dikare çend nimûneyan bide:

"17": avahî, ronahî, şînahî, perwerdehî, xwezahî, keskahî, tenahî .
"y": rûyê min. xwezayî, bi vî awayî, piyê min, siya te, hêviya me .
"w": *duwemîn, xwesiwa le, cizrawî, ka wÎ, ewravvÎ. ..*

Ji van her sê dengan a ku hetî zêde lê bikaranîn *"y"* ye. Ew her du dengdarên din kêmtir têne bikaranîn. Divê cm bidin xuyakirin ku dengdara *"y"* têkildarî dengê "î"ye. Dengdêra *"h"* têkildarî dengên *"a-e"* ye û dengdêra "w " jî têkildarî dengê *"û-u"* ye. Ji ber vê yekê di alfabeya erebî de dengên *"y"* û *"î",* dengên *"a-e"û "h"* û dengên *"u"* û "iv" bi heman tîpan hatine nîşandan. Her wekî tê zanîn di zimanê ingilîzî de jî tîpa *"y"* hin caran di cihê tîpa "'('yê de tê bikaranîn.

Wekî regez di kurdî de du dengdêr nayêne ber hev, lê her wekî gelek rêgezan ev rêgez jî bi domana demê re têk çûye. Sedema vê yekê ya bingehîn têkçûna taybetiyeke din e. Di kurdiya kevn de peyvan bi dengdêran dest pê nekiriye. Lê belê wisa xuya dike ku di kurmancî de "h"ya ku cihê hinek dengên kurdiya kevn girtiye, bi domana demê re ji holê rabûye. Ji ber vê yekê jî peyvên ku berê bi dengdarekê dest pê dikir, niha bi dengdêrckê dest pê dikin.

Teşeya	*Teşeya kevn*
avêtin	*havêjtin*
anin	*hanîn*
erê	*herê*
eger	*heger*
aSan	*hêsan*
êrîş	*hêrîş*
êş	*hêş*
ewr	*hewr*
êdî	*hêdî*

Dema ku hinek peyv bi dengdêrê dest pê bikin, ev rêgez (qaîde) di hin rawe û deman de ji holê radibe. Lêkerên ku bi dengdêran dest pê dikin, li gorî hin dem û raweyan saz bibin, du dengdêr tên ber hev ci mirov nikare tîpeke kelijandinê jî bixe navbera tîpan.

Mînak:

Ïnan (anin) biîne (raweya fermanî)
êşîn diêşîne (dema niha)

ewr	*biewr (wekî rengdêr)*
avêti	*biavêje (raweya ferman*
n	*0*
ajotin	*naajo (dema niha, awayê*
	peyînî).

Ji ber vê yekê, meyla zimên ber bi wê yekê ve ye ku, ji vê aloziyê rizgar bibe ı bare xwe siviktir bike. Her wekîji mînakên jorê jî xuya dibe, di hinekan de dengê ku bi domana demê re ji holê rabûye, ji nû ve derdikeve holê. Bo nimûne, *"Înan"* di dema niha û raweya fermanî de dibe *"dihîne", "bihîne* ". Ew şêwe jî hê kurtir dibe û teşeya *"tîne* ". *"bîne"* digire. Wekî ku tê dîtin, di dema niha de *"d* dibe *"t".* Ew hêsan bûna peyvan, di gelek mînakên din de jî balê dikişîne:

Mînak:

biaqil	*baqil*
diavêj	*davêje*
e biajo	*(tavêje) bajo*
diêşîn	*dêşîne*
e	*(têşîne)*
naajo	*najo*
bijne	*bîne*

Di hinek peyvan de jî piştî ku dengê *"h"* ketiye, peyv ji dengdêra piştî wê jî rizgar bûye.

Histiran	*stran*
husto	*sto*

Her çi qas hewldana zimên **ji** bo rizgarbûna **ji** bargiraniyê hebe jî, ev pêvajo hîn negihîştiye qonaxeke tekûz, lewre jî aloziyên di vî warî de bandora xwe li rastnivîsa kurmancî dikin.

Her wiha hin caran dengdêra *"ı"* jî di navbera du dengdaran de rista tîpa kelijandinê pêk tîne. Tevî ku di kurmancî de du dengdarên ji hev cuda, heta hin caran sê dengdarên ji hev cuda têne ba hev jî, hin caran "i"yek dikeve navbera wan û wan ji hev vediqetîne. Bo nimûne, di dema boriya dûdar de dema lêker bi dcngdarê biqede **"i"** yek dikeve navberê.

Mînak:

Hatiye, xwarive, şûştiye, biriye, kiriye ...

Sedema vê yekê jî li gorî baweriya me, hem cînavka kesandinê ya kesê sêyem *"_e"* û hem jî qertafa dema boriya dûdar *"_e"* ye. Ji bo ev her du *"-e"* ji hev bêne cudakirin, "_e"ya dema boriya dûdar hatiye dirêjkirin û bûye *"<iye",*

Mînak:

CÎhan hate mala me.
CÎhan hatiye mala me.

Lê di kesê yekem de tiştekî wiha nîn e, lewre jî *"-e"* wekî xwe maye.

I~fÎnak:

Ez hatim mala we.
Ez hatime mala we.

Her çi qas di demên borî de "_e"ya kesê sêyemîn jiholê radibe jî rewş naguhere.

Mînak:

Wl nan .:ovm:
Wî nan xwariye.

Li gorî rêgezê diviya" *Wî nan xware* ." bihata gotin, her çi qas di hin devokan de ev form jî hebe, bi gelemperî wisa nehatiye gotin.

Dubarekirina tîpekê

Taybetiyeke din a zimanê kurdî jî ew e ku di kurdî de tîp xwe dubare nake. Yanê tu dengên ji hev û nêzî hev bi hev re nayên bilêvkirin. Di warê denganiyê de zêde nîqaş li ser vê mijarê nayên kirin. Ew yek ji aliyê piraniya zimanzanên kurd ve tê zanîn û peji-randin, lê di warê rastnivîsê de rewş diguhere. Celadet Bedirxan, dixwaze ku ji du tîpên wekî hev an jî nêzî hev (wekî "d" û "t") yek bê xistin û peyv bi tîpekê bê nivîsandin. Bi rastî jî bilêvkirina du tîpên **ji** hev û nêzî hev gelekî dijwar e. Yanê kurmanc nikarin bibêjin *"xurttir"* dibêjin *"xurtir".* Ligel vê yekê jî Îro gelek nivîskar û bikarhênerên zimanê kurdî ji bo nîşandana dengên lerzok van tîpan dubare dikin.

Li aliyê din, di hinek peyvên biyanî de jî, dubarekirina tîpekê

heye û ji bo parastina reseniya peyvê tîp dubare dibe. Tevî ku di peyvên kurdî yên resen de tîpa dubare tune ye jî, di hin peyvên hevedudanî de û di payeya hevrûkirinê ya rengdêran de û di hin rewşên din de du tîpên ji hev, li pey hev tên.

Celadet Alî Bedirxan jî li ser vê bingehê xwestiye ku ji du dengên ji hev û nêzî hev yek bê xistin.

Mînak:

Payeya hevrûkirinê

xurtir	*xurt-tir*	*xurt*
rastir	*rast-tir*	*rast*
kurtir	*kurt-tir*	*kurt*
rintir	*rind-tir*	*rind*
bilintir	*bilind-tir*	*bilind*
dewlementir	*dewlemend-tir*	*dewlemend*

Peyvên hevedudanî

Serokkoma r paşşîv	*serokomar paşîv*
yekkîte	*vekîte*
şerrawestandi n dehhezar	*şerawestandi n dehezar*
zimannasî	*zimanasî*
desttêwerdan	*des têwerdan*

Lê ev rêgez hin caran alozî û astengiyan derdixe pêşberî mirov. Ji ber vê rêgezê, mirov nikare du peyvan ji hev derxe. Heke li gorî vê rêgezê bê nivîsandin, mirov nikare şe-rawestandin û şer-rawestandin, ter-kirin (şilkirin) û terk-kirin (terikandin) ji hev veqetîne. Di rewşên wiha de, azîneke bikêr ew e ku mirov tîrekê bixe navbera her du birên peyvê û wekî *"terk-kirin* ", *"şer-rawestandin"* binivîse, lê dîsa jî ev kêşeyê bi temamî çareser nake. Rêbazeke din jî ev e ku mirov rastnivîs û denganiyê ji hev cuda bifikire, peyvan wekî *"wêne"* bibîne û nehêle ku wêne têk biçe, ango bilêvkirin û nivîsandin jihev cuda be. Ev bîr û baweriya duyemîn her ku diçe li bal rêzimanzan û nivîskarên kurd xurt û geş dibe. Lê dîsa hê lihevkirineke gîştî pêk nehatiye.

Xuya ye ku dema mirov li gorî vê rêgezê biçe, rayeka gelek peyvan diguhere. Her wiha ev rêgez, di warê perwerdehiyê de jî karê mirov hinekî dijwar dike. Lê divê mirov ji bîr neke ku ziman jixweber xwe hêsan û sadetir dike. Bo nimûne, bêjeya *"destmal"* di zimanê axaftinê de hema bêje di hemû devokan de bûye *"desmal* ".

Li aliyê din divê mirov bi bîra kesên ku li awayê resen ên peyvê digerin bixe ku zimanê kurdî jixwe zimanekî tewangbar e û tu peyv di nava hevokê de bi dirûvekî namîne, peyvek dikare di nava hevokê de dirûvekî wisa bigire ku mirov nizanibe ka ew ji ku hatiye.

Li vir ji ber ku mijara me ne rastnivîs e, em ₔ tiştekî teqez nebêjin. Tiştê ku aniha jibo me girîng e, aliyê dengsaziyê ye, ew jî her wekî me da xuyakirin, di kurmancî de dengê dubare nîn e. Kurmanc nikarin du dengên **ji** hev û nêzî hev li pey hev bi lêv bikin.

Nîvdcngdêr û dengdêrên dirêj

Di kurmancî de nîv-dengdêrên ku wekî tîpên kelijandinê jî tên bikaranîn, dema ku têne pêşiya dengdêrên dirêj ênji heman cîderkê û ciderka nêzî xwe, wê dengdêra dirêj kurt dikin. Li ser vê bingehê "v" bandorê li *"î"* dike, heta radeyekê tesîra wê li ser *"ê"* jî heye, Her wiha dengê "w" jî bandorê li dengdêra dirêj *"û"yê* dike,

Ji ber heman sedemê, dema ku *"h"* bikeve ber dengdêrên dirêj wan kurt dike, bi vepêçan dema ku *"h"* ji ber dengdêrekc kurt radibe, ew dengdêr dirûvê dengdêreke dirêj a nêzî xwe werdigire. Piştî vê agahdariya gişt em dikarin mijarê yek bi yek hilgirin dest.

"î" lî "ê"'ya berî 'y"'yê

Her weki me berê jî diyar kiribû, dengdara *"y"* wekî nîv-dengdêrekê tê pejiirandin û têkiliya wê rasterast bi dengê "j"yê re heye. Lewre dema ku *"î"* berî dengê 'Ji "yê tê, kurt dibe. Heman tişt ji bo têkiliya *"ê"* û 'Ji"êjî heta radeyekê tê pejirandin. Lê divê em bidin xuyakirin ku têkiliya *"ê"* û Oy' naşibe têkiliya *"î"* û *"y"ê,* dengê *"y"* bi qasî *"j"yê* bandorê li *"ê"* nake.

Di warê dengzaniyê de ev yekji hêla piraniya zimanzanên kurdî ve tê pejirandin.

Lê dema mijar tê ser rastnivîsê, nîqaşeke gur dest pê dike. Em dê vê nîqaşê û bîr II boçûna xwe ya di vî warî de bihêlin ji beşa rastnivîsê re.

''û ''ya berî ''w''yê

Têkiliya van her du dengan jî dişibe têkiliya ''î'' II *''y''yê.* Ji ber ku ''w'' nîvdengdêr e el cîderka wê jî nêzî ya dengê *''û''* û *''u''yê* ye, ew ''û''ya berî xwe ku dengdêreke dirêj e, kurt dike û dadigerîne ser *''u''* yê. Ev *''u''* jî ji ber ku dengdêreke pir lawaz e, bi hêsanî dadigire ser dengdêra'' *i* ''yê. Her kes bi hêsanî dikare biceribine fl bibîne ku piştî ''û''yê bilêvkirina dengê *''w''* ne pêkan e fl yek ji yekê dixwe.

MÎnak:

rû	*ruwê min*	*riwê min*
xwes	*xweSl/wa*	*xIVcsiwa*
û	*çarsuwa wan*	*çarstwa wan*
çllrsû	*bibuwa (bibûya)*	*bibiwa (biba)*
bûn	*tuwên me*	*ti wên me*
lû		

Li hinek herêmên Kurdistanê dema veqctandekê tînin dawiya peyva ku bi *''il'''yê* diqede, di cihê *''w'''yê* de *''y'''yê* wekî tîpa kclijandinê bi kar tînin el di bilêvkirina wê de tu arîşe namîne. Di cihê *''riwê''* min de ''rûyê'' min dibêjin.

Her wekî me di serî de jî got dengê '').1'''' jî nîvdengdêr e fl têkildarî dengdêra *''il''* û ''u''yê ye, ''û''ya ku dengdêreke dirêj e, dema ku berî ''w''yê tê kurt dibe. Dema ku kurt bel, dê vegere ser dengdêra kurt a nêzî xwe ku ew jî *''u''* ye. Lê ez nizanim jiber çi sedemê Celadet Bedirxan gotiye, berî ''wyê *''ıi''* nayê.

Li gorî baweriya min di vir de şaşiyek heye. Heke bigota, dengdêra *''u''* bi hêsanî dadigere ser dengdêra *''i''* yê zêdetir cihê xwe digirt. Wekî mînak li gorî baweriya min di telafûza peyva *''duwemîn''* de mirov tu zehmetiyê nakêşe. Lê di gelek peyvan de dengê *''u''* dadigere ser dengê'' i''yê. Ew jî jiber ku dengê'' *u''* li gelek herêman wekî dengdêreke ji dengê *''w''* û *''i''* hevedudanî, tê bilêvkirin û hîn percsandina xwe nebiriye serî wisa dibe.

MÎnak:

ti kes	*{li kes*
wisa	*wusa*
dil	*dul*
pir	*pur*
ki/gi	*ku*

"h " dengdêra berî xwe kurt dike

Ji ber ku tîpên nîvdengdêr tîpên berî xwe kurttir dikin, dema ew tîp jiholê radibin, dengdêreke dirêj cihê dengdêra kurt digire. Di pirtûka Feqî Huseyin Sagniç *"Hêmana Rêzimanê Kurdî* de ev rêgez wiha hatiye şîrovekirin: *"Gava li dawiya hinek peyvan "h" hebe ew "h" dikare bikeve û dengdêra kurt cihê xwe hide ya dirêj. Li gorî vê yekê He" dikare cihê xwe bide "a'i'vê. "i" cihê x"ve bide "Î'"yê ₒ "u" cihê xwe bide "0" yan jî "û '"yê. ₙ (Hêmana Rêzimanê Kurdi, 1:29)*

Seyda li ser vê mijarê çend mînakan jî dide wekî;

çav	*çehv*
sı	*sih*
rt	*rih*
cî	*cih*
xwar	*xwehr*
ho/an	*buhtan*
co	*cuh*
dot	*duht*
dirî	*dirih*

Hê gelek mînakên ku vê rêgezê nîşan didin hene. Di zimanê nivîskî de nezanîna vê rêgez û rêzanê dibe sedema tevlihevî û çewtiyan. Ji wan her du teşeyên peyvê neqandina yekê, zêde arîşeyan dernaxe pêşberî mirov, ji ber ku her du jî rast in. Yanê mirov dikare *"cih* ,. an jî *"Cî"* binivîse. Lê hin kes radibin *"cîh", "doh", "mîh"* dinivîsin, ev yek şaş e. Li gorî Celadet Bedirxan, *"h"* di zimanê kurdî de cihê gelek dengên Îranî girtiye, îro jî ew hêdî hêdî ji holê radibe. Bi vî awayî jî dengdêrên kurt cihê xwe ji yên dirêj re dihêlin.

Dengdêreke xweserî kurdî; "u"

Divê em hinekî jî li ser dengdêra "u"yê rawestin. Ji ber ku ew dengdêreke xweserî kurdî ye lt hinek taybetiyên wê jî hene. Ev dengdêreke kurt e lt bilêvkirina wê ji bo kesên ku bi kurmancî nizanin, hinekî dijwar e. Gelek kes wê wekî "ll'"ya tirkî bi lêv dikin, ew jî dibe sedema hinek çewtiyan, Ev dcng di destpêka bêjeyan de cih nagire, di hin bêjeyên mîna *"umir", "udî"* de bi alîkariya *eyn(!(t)* erebî xwe radigere. Di dawiya bêjeyan de jî pir kêm peyda dibe.

Li gorî Celadet Bedirxan ev dengjî ji tîpên "w" lt ***"i"*** pêk hatiye, lewre bi hêsanî diguhere, dibe ***"i"*** wekî *"tu / ti* н. *"çu / çi* ", *"ku / ki* ".

Li aliyê din gelek peyvên ku bi vê dengdêrê tên nivîsandin di teşeya *"wi"* de jî derdikevin pêşberî mirov, mîna;

xurt	
xu	
xuya	*xWIya*
xurandin	*xwirandin*

Lê bi gelemperî ev dɵng êdî ji awayê kevnar *"wi"* gelekî dûr ketiye û mirov nikare *"ıi"* bi dengên *"wi"* nîşan bide.

Her wekî Celadet Bedirxan jî diyar kiriye, ev deng ji bilî çend awartcyan, nayê dawiya peyvê lt bi piranî dikeve pêşiya dengdarên *"g", "h",* 'T', *"q",* "x"; wekî *hunda, hundir, guh, guher; gulat, gulok, guman, guzvan, kuç, kul, kulî, kum, kurt, kurm, qub, qul, qurç, qunders, qure, qurm, xubar: xurme, xw; xurdek, xurîn, xurt ...*

Taybetiya dengdêra "û 'yê

Dengdêra *"û"* di warê bilêvkirinê de dişibe "u"ya tirkî, yanê divê beranberî "u"ya tirkî "li"ya kurdî bê bikaranîn, lê gelek kesên ku ji tirkî derbasî xwendin û nivîsandina kurdî dibin di vî warî de şaşiyan dikin. Her wiha dengdêra *"û"* dengdêreke dirêj e, di kurdî de ji du dengên nêzî hev, dengê dirêj bi alîkariya bilindekê ango kumikê ji dengê kurt hatiye veqetandin. Wekî ***"i"*** **û",'**; *"e"* û "ê"; *"u"* û *"û"* ... Dîsa divê mirov bide zanîn ku di bilêvkirina tîpa "û"yê de li gorî: herêman dubendiyek heye. Li hinek herêman dengekî nêzî "û'"ya

tirkî heye, ev deng di alfabeyê de nehatiye bicihkirin. Lewre li şûna wî dengî jî *''û''* tê bikaranîn.

Lê hinek qîma xwe bi vê yekê nayînin, "ii"ya tirkî jî dixin nava alfabeya kurdî. Yanê hinek peyvên wekî *"bûk", "çûk". "bûn"* mîna *"bûk", "çûk* ". *"bûn"* dinivîsin. Hinekjîji ber baweriya ku ev dengê "U" ji du dengan *''w''* û "î" pêk hatiye, peyvên mîna *"bûn* ". *"çûk". "gûz* ". *"bûk"* wekî *"hwîn", "ciwik* ", *"gwîz", "bwîk"* dinivîsin. Lê bi baweriya min ev tişt şaş in.

Cudatiya denganiya kurdî û tirkî

Piraniya kesên ku dê ji vê pirtûkê sûdê wergirin, alfabeya tirkî dinasin, lewma jî pêwîst c ku cm cudatiyên deng û tîpên kurdî jiyên tirkî, bi wan bidin nasîn. Ji bilî çend dengan her du ziman wekî hev in. Li ser vê bingehê dema ku alfabeya kurdî ya latînî hatiye diyarkirin, pêdiviya kurdên Bakur li ber çavan hatiye girtin û tîpên nêzî yên tirkî hatine pejirandin. Dengên mîna "6" di kurdî de nîn e. Dengê *''il''* ji her çi qas di hinck devokên kurdî de hebe jî wekî *"fonem"* nehatiye dîtin ₒ jê re tîp nehatiye destnîşankirin. Dengê **"i"** di her du zimanan de wekî hev in, lê bi du tîpên cuda; di kurdî de bi "i"yê û di tirkî de bi "/"yê hatiye nimandin. Her wiha dengê "û"ya kurdî **li** "u"ya tirkî jî yek in, lê bi du tîpên cuda hatine nîşandan. Tîpa "/{"yê di kurdî û tirkî de du dengên jihev cuda nîşan dide. Her wiha tîpa *''i"yê* her çi qas di her du zimanan de hebe jî, du dengên ji hev cuda nîşan dide.

Ji bilî van hinek dengên kurdî di tirkî ne nîn in, ji ber vê yekê tîpên ku wan nîşan didin jî di tirkî de nîn in. Kesên ku ji perwerdehiya tirkî derbasî kurdî dibin, di xwendin û nivîsandina van dengan de zehmetiyê dikêşin, lewre jî divê em der darê wan de çend tiştan bibêjin. Dengên kurdî yên ku di tirkî nîn in ev in: *''q'', ''ê'',* "w", "x", *''ı'',* Tîpên kurdî yên ku di tirkî de nîn in jî ev in: "x", *''ê'',* "w", *''û'',* "q". Em yek bi yek li ser van dengan û hinek taybetiyên wan rawestin.

manî de jî bi pevdenga *"ch"* tê nîşandan. Pêwîst e em jibîr nekin ku xeyna **(t)** erebî jî di kurdî de bi vê tîpê tê nîşandan.

Mînak: Xezal, axa, xerîb ...

"Q": Ev jî dengdareke qirikî ye, wekî qafa (o) erebî ye, peyvên *"qenc* ", *"teqîn"* û *"req"* dikarin ji bo nasandina vê tîpê bibin mînak.

Li ser tîpên *"ê", "w", "û"* em berê hinekî rawestiyabûn. Lê bi taybetî kesên ku hînî fonetîka tirkî bûne, di telafûza wan de dikevin xeletiyan dikin, lewre jî mirov dikare bi kurtasî li ser wan çend tiştan bibêje.

Cûdatiya "v" û "w'yê

"X": Ev dengji qirika mirov derdikeve, mirov ji bo vê dcngdarê, mirov dikare mînakên wekî *"xurt* ". *"axîn" û "fax"* bide. Xêya *(t)* erebî cihê wê digire. Di zimanê îngilîzî de bi pevdenga *"kh"* **li** di al-

"W" nîvdengdêreke dulêvî ye. Ev deng bi tevgera her du lêvan teşeyê digire, li cihekî naaliqe. Ev wekî wawa (J) erebî ye. Cudatiya di nava wê û dengê "v"'yê de gelekî berbiçav e; ji ber ku "v" dengdêreke diranlêvî ye. Dema ku mirov *"v"yê* bi lêv dike, diranên pêşîn ên jorîn digihêjin lêva jêrîn û hinekî tê de têne çikandin. Lê dengê "w"bi tevgera her du lêvan pêk tê û her du lêv nagihêjin hev. "v"'ya kurdî hinekî nêzîkî '~f'yê ye.

Peyvên *"wan", "awa", "wir"* û *"ew"* dema digel peyvên *"van", "ava", "vir"* û *"ev"* bên gotin, cudatiya her du tîpan bi awayekî berbiçav derdikeve holê. Nemaze li hin herêmên kurmancîaxêv ên mîna Gever, Elk û Şemzînan û Qerqeliyê aloziyek di telafûzkirina her du dengan de heye. Li şûna *"vexwe* ", *"wexwe* ", li şûna *"veke" "weke"* tê gotin, li şûna *"veke"* jî *"weke",* ji *"av"ê* re *"aw"* tê gotin.

Di ware van her du dengan de zimanê kurdî û zimanê îngilîzî dişibin hev. Cudatiya van her du dengan di îngilîzî de nêzî kurmancî ye. Dema ku mirov peyvên mîna *"war* "(şer), *"walk"* (meşîn) *"wind"* (ba), *"wish"* (daxwaz) bi peyvên mîna *"verb"* (lêker), *"video", "travel"* (gerîn), *"love"* (evîn) rc hevrû bike, dê ev rastî derkeve holê.

Cudatiya "e" û "ê"'yê

"Ê" jî dengdêreke dirêj e, di navbera *"e"* û *"î"* de ye. Cudatiya di navbera wê û "e"yê de gelekî diyar e. Ji bo jihevderxistina her du dengan xwendina mînakên wekî *"êzing", "têr"* (dijwateya birçiyê),

"şêr" digel mînakên *"ez* ", *"ter"* (şil), *"şer"* (ceng) dikarin bibin alîkar. Kurd di telafûzkirina van her du dengan de tu zehmetiyê nakêşin, lê kesên ku piştre hînî kurdî bûne, nikarin van her du dengan ji hev cuda bikin. Van demên dawîn ji ber ku bandora zimanê tirkî li ser kurdî zêde bûye, nifşên nûhatî nikarin bi hêsanî dengê *"ê"yê* bi lêv bikin.

Cudatiya "u" û "û 'yê

"Û" bi gelemperî wekî "u"'ya tirkî tê xwendin. Mirov dikare ji bo wê van mînakan bide: *"bûk* ", *"hûn* ". *"şûn* ", *"şûr* ", *"kûr* ". Dengê "u"'ya kurdî dengdêreke taybet e, her wekî berê jî hate gotin, dengderêke kurt e, jibo wê jî peyvên *"guh* ", *"gund", "xurt* ", *"kul* ". *"du"* dikarin bibin mînak. Kesên ku ji tirkî derbasî, kurdî dibin, "u"'ya kurdî wekî "u"'ya tirkî bi lêv dikin, ew jî dibe sedema hinek tevliheviyan. Lewre jî divê tu car neyê jibîrkirin ku "û"'ya kurdî cihê "u"'ya tirkî digire.

Kîte

Kîte, ew beşa peyvê ye ku bi yek earê re ji devê mirov derdikeve. Kîte wekî yekineyeke girîng a dengzaniyê tê binavkirin, lê li ser ravekirina wê lihevkirin eke giştî nîn e. Li gorî ravekirina klasîk, ji bo her kiteyê pêdivî bi dengdêrekê heye. Dengdêrek dibe bi serê x we yan jî digel çend dengdaran, kîteyekê pêk bîne. Dengdar bi serê xwe nikarin kîte keyê pêk bînin.

Di kurdî de kîteyek di be ku ji yekdengî heta çar dengan be, ev kîte dikarin peyvekê, daçek û qerfatekê pêk bînin. Çend mînakên kîteyekc pênedengî jî hene, lê li ser wan lihevkirineke giştî nîn e. Em ₑ wan mînakan jî li xwarê bidin.

Kîteya yekdengî: IJer dengdêrek kîtcyekê pêk tîne, ji van dengdêran hinek, wekî pêşgir; a-şûjin, paşgir; kêr-Î, veqetandek; ba v-ê min, daçek û gihanekên mîna "û" û "ê" pêk bîne.

Du dengên ku kîteyekê pêk tînin, dikarin gelek bêje, daçek û qertafan pêk bînin.

Mînak: av, aş , êş, at: ax, În, JÎ, tî. pê, tê, çû, rû, ra, ki'. pi, mi. se, ga, çi, tu, e1V. wî, ka. ma, vi, tû. hê. mû, to, ku ...

Sê dengên ku dibin kîteyek, hinek bêje û daçek û qertafan pêk tînin.

Mînak: ast, lew, şev, kar, şer, têr, mêr jêr. ŞÎn, çûn, ran, xan, şan, şeh, şar; şûr, Sîl; mîl; tîr, tîn, hîn, kul, gul, kel, ka!, ker. kes, mer, hêr, bar. tev, tas, nas, zir, vir, jîn ...

Çar tîp jî dikarin kiteyekê pêk bînin **II** di kurmancî de gelek bêjeyên yek-kiteyî ku ji çar tîpan pêk tên hene.

Mînak: merd. tewr, text, gewr, tirs, pirs, çewt, nerm, rast, qenc, renc, hişk, peşk, sext, rext, bext, kort, kurt, newq, qurq, pûrt, xewn ...

Her wekî me di destpêka mijarê de jî diyar kir, çend peyv hene ku ji pênc dengan pêk tên. Lê hinek kes wan wekî peyvên dukîteyî qebûl dikin û wisa dinivîsin.

Mînak: stand. şkeft. stran, şkest ...

Di kurmancî de vekîtandin li gorî dengdêran tê kirin, wekî *ra-hûn, şa-ki-rin, der-xis-tin, hil-ge-ran-din, he-ram-ba ..* Dema ku peyvek tê vekîtandin dibe ku qertaf û rayeka peyvê jihev parçe bibe. Mînak peyva *hil-ger-andin* ji sê hêmanên ku bi tîrê ji hev hatine veqetandin pêk tê. Lê dema ku bê vekîtandin, wekî *hil-ge-ran-din* dibe çar kîte.

Her wekî me li jor jî bi mînakan nîşan da peyvek dibe ku yekkîte yî be anjî reng e ku bibe pirkîteyî jî. Peyvên xwerû yên kurdî bi giranî yek-kîte yî û dukiteyi ne û kêm caran dibin sêkîtcyî û çarkîteyî. Peyvên pirkiteyi bi piranî peyvên pêkhatî û hevedudanî ne.

Mînak:

Yekkîteyî: aş, baş, kar, dev, sext, berg, ceng. stran ...

dukiteyî: gu-lan. he-val, hev-kar, ho-gir. bê-je, tev-ger;

ba-hoz ..

sêkîteyî: cen-ga-wer. dil-bi-rin, dest-ke/tin, ra-gir-tin, ser-keftin, hil-gir-tin, da-ke-tin, ser-hil-dan, bex-te-war. ten-ge-zar. şa-neşîn, tol-hil-dan ...

çarkiteyi.qe-rni-ran-din, pe-yi-tan-di, hil-ge-ran-din. bex-te-warî, te-men-kur-tî, hil-hi-jar-tin, ke-ser-kû-rî, ten-ge-za-rî

pênckîteyî: te-men-di-rê-jî, ber-he-/av-ki-rin ...

PEYVSAZÎ

Peyvsazî ango morfolojî di zimanzaniyê de beşek e. Bi riya vê beşa zanistê, mirov reng û dirûvê bêjeyan, cureyên wan û rêz û rêzikên pêkanîna bêjeyan nas dike. Di vê mijarê de em ê li ser van aliyên bêjeyên kurmancî rawestin.

Pêşî em diyar bikin ka peyv ango bêje, çi ye? Peyv ku jê re *"bêje"* jî tê gotin, ew tişt c ku ji kîteyekê yan çend kîteyan pêk tê û xwediyê wate û peywirekê ye. Hest û ramanên mirov bi riya peyvan digihêjin mirovên din.

Her wekî çawa fonem yekeya herî biçûk a dengan e, morfem jî yekeya herî biçûk a peyvan e. Di kurdî de jî wekî gelek zimanên din morfem dibin du cure; morfernên watedar û morfemên erkdar. Cureyên peyvan ên mîna navdêr, rengdêr û lêker morfemên watedar in. Cureyên peyvan ên mîna daçek, gihanek, cînavk, qertafên kêşanê û qertafên bêjesaz jî morfemên erkdar in.

Morfemên erkdar jî dibin du cure; hinek ên mîna gihanek û daçekan serbixwe ne, hinek ên mîna qertafên bêjesaz û qertafên kêşanê jî qertafi ne. Lê belê hinekên awarte jî hene, bo nimûne ve-qetandek hinek caran dibin qertaf hin caran jî bi serê xwe wekî cÎ-navk derdikevin pêşberî mirov. Her wiha morfemên kesane jî dema ku piştî lêkeran tên dibin qertaf, lê dema ku piştî rengdêr û navdêran tên dibin morfemên serbixwe.

Piştî ravekirina mijarê êdî em dikarin bi çend mînakan mijarê ze-laltir bikin. Dema ku em "biaqiltir"dibêjin em qala peyvekê dikin ku ji sê morfeman pêk hatiye. Peyva *"biaqiltir"* ji pêşgira *"bi-",* bêjeya *"aqil"* û ji qertafa payeya hevrûkirinê ya rengdêran *"-tir"ê* pêk hatiye.

Di kurdî de qertaf

Di kurdî de qertaf dibin du cure; qertafên bêjesaz û qertaf ên kêşanê.

Di beşa pêkanîna peyvan de em ê bi berfirehî li ser qertafên bêjesaz rawestin. Heçî qertafên kêsanê ne, dê di cihê pêwîst de werin ravekirin û nasandin. Lê divê em cudatiya wan bizanin da ku em bikarin wan ji hev derxin. Qertafên bêjcsaz ji peyvekê peyveke nû pêk tînin, wateyeke nû didin peyvê. Her wiha hin caran pê re cureyê peyvê jî diguhere. Wekî mînak, bi qertafekê rengdêrek dibe navdêr, an jî navdêrck dibe lêker û hwd. Her wekî çawa rengdêra *"nveş"* bi paşgira *"-i"* yê *dibe"xweşi'* fl bi vî rengî jî dibe navdêr.

Qertafên kêsanê

Qertafên kêşanê, wateyeke nû li peyvê bar nakin. bi tenê rewşa wê diguhêrin. Bi kurtasî qertafên kêşanê ev cure qertaf in ku tu wateyê li bêjeyan zêde nakin, li şûna wê, bêjeyan ji aliyê dem, kes, rawe, mêjer û zayendê ve temam dikin. Qertafên kêsanê jî wekî qertafên bêjesaz du cure ne; hinek pêşgir in, hinek jî paşgir in.

Qertafên kêsanê yên kurmancî ev in:

1- Qertafa dema niha *"di-"*

Mînak:

diçim, dikim, didim, dixwazim, dibêjim

... 2- Qertafên raweya fermanî

c) *"bi-"* (pêşgira raweya fermanî)

d) Paşgirên raweya fermanî: *"_e"* (yekjimar), *"-in"* (pirjimar)

Mînak:

Yekjimar: biçe. bixwe. bide, bigire ....

Pirjimar: biçin, bixwin, bidin, bigirin

3 Cînavkên kesandinê (nîşaneyên kesandinê)

- -un , -[, -e , -[n

Mînak:

a)

Ez dikim.

Tu dikî.

Ew dike.
Em dikin.
Hûn dikin.
Ew dikin.

4- Qertafên payeyê yên rengdêran

a) Payeya rûberkirinê *"-tir"*

b) Payeya rajorîn *"<tirîn"*

Mînak:

baştir! baştirîn
berztir! berztirîn
xweştir! xweştirîn

5- Qertafên gazîkirinê

a) *"-o"* (yekjimar û nêr)

b)*"-êl'* (yekjimar û mê) c) *"-ino"* (pirjimar)

Minak:

hevalo, birako, dengbêjo ..

hevalê, xwîşkê, stranbêjê .

hevalino, karkerino, cotkarino ....

6- Qertafên tcwangê

a) *"-ê"* (yekjimar û mê)

Minak:

Gurgîn Bêrîvanê dibîne.

b) **''-f'** (yekjimar û nêr)

Mînak:

Gurgîni Bêrîvan dît.

c) *"<an"* (pirjimar)

Mînak:

Bêrîvanê ji şivanan re got.

7- Qertafên demên borî

a) Qertafên dema boriya dûdar *"<iye"* (yekjimar), *"_e"* pirjimar

Mînak:

hatiye / hatine, gotiye / gotine, xwestiye / xwestine, dîtiye / dîtine,

kiriye/ kirine ...

b) "di" dema boriya berdest (çîrokiya dema niha)

Mînak: dihat, digot, dixwest, didît, dibir, dikir ....

8- Qcrtafên raweya daxwazî

a) *"-a"* (paşgira raweya daxwazî)

b)*"bi-"* (pêşgira raweyên merc û daxwaziyê)

Mînak:

Bigota, bikira, bida, bistanda, bifirota, bixwesta ... 9- Qertafên neyîniyê

a) Qertafa neyîniyê ya raweya fermanî *"me-"*

Mînak:

meke, meçe, mexwe, mede, megire, megirî .... b) Qertafa neyîniyê ya dema niha *"na-"* ***Mînak:***

nakim, naçim, nadim, naxwim, nagirim, nastînim ... c) Qertafa neyîniyê ya dema bê *"ne-"*

Mînak:

dê neke, dê neçe, dê neyê, dê negire, dê nestîne ... d) Qertafa neyîniyê ya demên borî */ne-/*

Mînak:

neçû, nekir, nedîtibû, nedixwest ...

e) Qertafa neyîniyê ya hinek lêkerên awarte */ni-/*

Mînak:

nikarim, nizanî.

10- Qertafên nebinavkirinê (nenas iyê)

"-ek" Ev qertaf tiştekî binavkirî dike nebinavkirî, ew bingeha xwe **ji** hejmara yek digire.

Mînak:

darek, pirtûkek, helbestek, diyariyek ...

Ev qertaf dema ku ravekê pêk tîne, vcqetandekên *"-a"* û *"_ê"* digire, dibe *"-eka"* û *"ekê"* ew jî bi domana demê re guherîne bûne "-*eke"* û *"eki'* lê formên pêşîn jî di hin devokan de hatiye parastin.

Mînak:

Heva/eke min hat. Hevalekî min hat.

Ev qertaf dema ditewe, qertafên tewangê *"-ê"* û *"-1'* digere, dirûvê *"<ekê"* û *"-ekP'* werdigire.

Mînak:

Hevalekê got.
Hevalekî got.

"<in"

Ev qertaf hin tiştên binavkirî dike nebinavkirî, ji bo nîşandana pirjimariya nebinavkirî tê bikaranîn, bingeha xwe ji rengdêra nebinavkirinê *"hin"* digire.

Mînak: darin, mirovin, gulin, hevalin ...

Ev qertaf dema ku ravekê pêk tîne, veqetandeka *"-ên"* digire dibe *"<inên"* ew jî kurt dibe dibe *"-ine".*

Mînak:

Hevaline min hatin.

Her wiha qertafa "-in" di dema tewangê de jî qerta fa tewangê *"-an"ê* digire û dibe "<inan"

Mînak:

Carinan mirov rastiyê baş nabine.

Di kurmancî de bêjeyên **nû** û bêjesazî

Bi gelek awayan peyv li kurdî zêde dibin. Em dikarin hinek rêbazên pêkhatina peyvan wiha rêz bikin:

1- Peyvekji aliyê wateyê ve diguhere û wateyeke nû digire. Hin caran jî wateya peyvê bi domana demê re fireh an jî teng di be. Carinan jî ligel wateya bingehîn wateya duyemîn û sêyemîn jî pêk tê.

Bo nimûne lêkera *"girtin"* di kurdî de tê çend wateyan. Wekî din peyva *"welat"* berê xwediyê wateyeke teng bû. Ji bo her kesî cih û warê wî *"welat"* bû, lê îro *"wela!"* ji bo kurdan hemûyan yek e.

2- Wekî hemû zimanan, zimanê kurdî gelek peyv ji zimanên din wergirtine.

3- Du yan jî zêdetir peyvên serbixwe têne ber hev û peyveke nû pêk tînin.

4- Peyvek qertafan digire û peyveke nû pêk tê.

5- Peyveke hevedudanî, qertafan digire û peyveke kompleks pêk tê.

Ji aliyê sazbûnê ve cureyên bêjeyan

Di xebata xwe ya bi navê *"Waneyên Rêzimanê Kurmanci"* deji aliyê peyvsaziyê ve min bêje kiribûn sê cure: *"xwerû", "hevedudanî" û "pêkhatî",* Bi domana demê re min dît ku gelek bêje hem pêkhatî û hem hevdudanî ne. Bêjeyên bi vî awayî gelek bûn û bi vê dabeşkirinê ew li holê diman. Piştre dema ku min bala xwe da dabeşkirina hinek zimanzanan, min dît ku ew pêşi kirine du bir:
"Xwerû" lî *"nexwerû* ". Her wiha bêjeyên nexwcrû jî kirine du pişk:
"Hevedudanî" lî *"pêkhatî* ". Ev dabeşkirin çêtir e, ji ya ku min berê kiribû û pirsgirêka dabeşkirina bêjeyên ku hem hevedudanî ne hem jî pêkhatî ne. Li hêla din hinek bêje, bi serê xwe bêje ne, lê belê li cihinan rista pêşgir û paşgiran pêk tînin.

Di encamê de divê em li ser senifandina bêjeyan jî çend tiştan bibêjin. Senifandina bêjeyan bi kêrî hêsankirina mijarê tê. Wekî din divê mirov sînorên hişk nexe navbera cureyên bêjeyan. Yanî bêjeyek dikare hem pêkhatî be, hem jî hevedudanî be. Bêjeyeke hevedudanî hi hêsanî dikare paşgirekê yan jî pêşgirekê wergire.

MÎnak: hilgerandî, çavreşî, porxelekî, hechecok, çermesorik, daxistî. ragirtî, pclweşandî, veqetandek, serjêrkî, bcrepaşki, dest-pêkî, raborandî. ..

Iler wiha divê mirov sînorên hişk nexe navbera peyvên pêkhatî û hevedudanî jî. Bêjeyek dikare bi domana demê re wateya xwe ya bingehîn winda bike û bi tenê rista qertafeke bêjesaz bigire ser xwe. Hin caran ev pêvajo bi temamî neçûye serî, lê dest pê kiriye. Lewre

jî hin caran dibe ku mirov di binavkirina hin peyvan de dijwariyê bikêşe. Wekî mînak, peyvên mina *"dêr'* û *"bed'* niha di rewşeke wiha de ne. Wateya peyva *"dêr'* a di ferhengê de terî û boçik e. Di hinek biwêjan de jî wekî çêr tê bikaranîn. Lê peyv hêdî hêdî wateya xwe ya bingehîn **ji** dest dide û wekî pêşgirekê derdikeve pêşberî mirov.

Mînak: dêlegur. dê/eseg, dêlemar. dê/eperk..

Her wiha peyva *"bed'* jî hema bibêje wateya xwe ji dest daye. Li şûna wê bêjeya erebî *"xerab"* hatiye di zimanê kurdî de kon ve-daye. Bêjeya "bed" jî wekî pêşgir derdikeve pêşberî mirov.

Mînak: bedbext, bedmebest, bedmirov, bednam, bednav, b edn iya. bed paye, bedpeyker ..

Ji bilî van mînakan jî gelek peyvên ku di vê rewşê ne hene ev gotin ew nayê wê wateyê ku tu sînor di navbera bêjeyan de nîn in,ez dibêjim heke mirov xeta wan sînoran pir hişk nekê şe baştir e.

Peyvên xwerû: Ev cure peyv her wekî ji navê wan jî diyar c, ji hêmanekê pêk hatiye û dema ku ji hev bê xistin, wateya xwe j i dest dide. Ev peyvên sade ne û tu qertaf bi wan ve nebûne.

Mînak: Azad, dest, hest, roj, şel; kan, jan, Sal; ketin, jeng, ew, hiş, kar; ker, pez, rez, das, masî, ga, ken, gul, bêr, bar; ceng, reng, jeng, tÛl~ (tl; kêm ...

Peyvên nexwerû: Bêjeyên nexwerû ew cure peyv in ku ji çend hêmanan pêk hatine. Ew hêmanên ku wan bêjeyan pêk tînin, hin caran peyvên serbixwe ne, hin caran bêjeyeke serbixwe û qertafek têne ba hev û bêjeyeke nû pêk tînin. Iler wiha carinan jî qertaf tên pêşî yan jî paşiya bêjeyekê û bêjeyeke nû pêk tînin. Gelek caran jî bêjeyek hem pêşgirê hem jî paşgirê werdigire.

Bêjeyên nexwerû di nava xwe de du cureyên sereke pêk tînin: Peyvên hevedudanî û pêkhatî.

Peyvên hevedudanî: Peyvên hevedudanî ji çend hêmanên ser-bixwe pêk tên. Dema ku mirov wan ji hev bike, her peyv xwedî wateyeke serbixwe ye, ew peyv ku li gorî rêz II rêzikên zimên digi-hên hev, peyveke nû pêk tînin. Ango pirî caran wateya peyva nû ji yên ku wê pêk tînin gelekî dûr e.

1- Du navdêr têne ber hev navdêrekê yan jî rengdêrekê çêdikin. *MÎnak: kerbav, cankûçik, darhinar, des tav, pozberan, gûhesin, sertac, gulbihar, destbira. birajin (jinbira), jinap, kurap, kurxal, marmasî, segmasî, rihteşî, dilkevir, şorbeşîr, avdew, kundirmast, malzarok, malgîsin, malgolik, ma/gule ...*

2- Navdêr û rengdêr têne ber hev, navdêr û rengdêrekc nû pêk tînin. *Mînak: destdirêj, çavreş, guhbel, devçepel, çavpehn, porxelek, çavbelek, lingxwar. çavsor. dilreş, totikvala, destbelav, behnteng, porsot; şevreş, destkurt, pozbilind, kumsor, serrût. rûreş, stuxwar. devbelaş. bargiran, aqilsivik, sorgul, bedbext, serhişk, kezîzer. enîbeş, bextereş. germav, berfemot* ..

3- Her wiha navdêr û rengdêr dema ku lêkerekê wergirin, dibin lêkerên hevedudanî.

MÎnak: sorkirin, reşkirin, reşbûn, xweşkirin, geşkirin, balkişandin. bêhn vedan. kurkirin, valakirin, germkirin, sarkirin, tengkirin, kurtkirin, dirêjkirin, badan ...

4- Kêm caran jî du rengdêr têne ber hev û rengdêreke nû, hin caran jî navdêreke nû pêk tînin.

MÎnak: reştarî, reşhelek (name), keskesor. sorgevez, belekreş, beleksor. ..

Peyvên pêkhatî: Ev cure peyv in ku bi alîkariya qertafên bêjesaz pêk hatine. Peyveke xwerû yan jî hevedudanî qertafekê yan jî çend qertafên bêjcsaz werdigire û bi vî awayî peyveke nû derdikeve holê . .1 i vê peyva nû re *"peyva pêkhatî"* tê gotin. Her wekî me li jorê jî diyar kir, peyvên pêkhatî bi alîkariya *"qertafên bêjesaz"* têne darişţin. Piştî vê ravekirina gelemperî, êdî cm dikarin bala xwe bi hûrbînî bidin mijarê, ji bo vê yekê jî divê em hinekî qala *"qertafên bêjesaz* " bikin.

Qertafên bêjesaz

Di kurdî de peyv bi alîkariya hinek qertafan pêk tên. Jivan qertafan re qerfa tên *"bêjesaz"* tê gotin. Qertafên bêjesaz her wekî ji navê wan jî diyar e, dema têne pêşî yan jî paşiya peyvan, wateyeke nû didin wan. I Tinekji wan qertafan bi dawiya peyvê ve dibin,ji ber

vê yekê ji wan re *"paşgir"* an jî *"parkît"* tê gotin. Hinek qertaf jî dikevi n ber peyvan, ji wan re jî *"pêşgir"* an jî *"pêrkît "* tê gotin.

Mirov dikare qertafên bêjesaz jî wekî hinek morfemên din bike du bir; qertafên bêjesaz ên resen û qcrtafên bêjesazên demdemî. Lê divê em ji bîr nekin ku qertafên bêjesaz ên kurdî bi piranî berê peyvên serbixwe bûne, bi domana demê re wateya wan hatiye jibîrkirin û ji peyvên watedar dageriyane morfemên peywirdar.

Qertafên bêjesaz ên resen bi xwe ne xwediyê tu wateyê ne, heke di demên berê de wateyeke wan hebe jî, ew wate jibîr bûye. Hin caran jî wateya wê qertafê di zaravayekî zimên de ji bîr bûye, lê di zar-aveyekî din de tê zanîn. Bo nimûne peyva *"têkoşîn"* ji du hêmanan pêk hatiye; *"tê" û "koşîn* ". Li vir *"koşîn* " xebitîn e. *"Têkoşîn ". di tiştekî koşîn* e. Ji bo kurmancî *"tê"* bi xwe jî **ji** du hêmanan pêk hatiye daçeka *"di"* û cînavka qertafi *"-ê".* Lê belê di soranî de ev binyada *"tê"* nayê zanîn, bi tenê wekî pêşgirekê tê nasîn.

Her wiha pêşgira *"zir-"* ku di peyva *"zirtilî", "zirbav "* de derdikeve pêşberî me, jibo kurmancan tu wateya wê nîn e, lê di zaravayê dimilkî de *"zûr"* derewe. Bi dimilkî dibêjin, *"Ti zûrî kena"* ango tu derewan dikî. Jixwe pêşgira *"zir-"* jî wateya derewê dide peyvê. Ne dûr e ku têkildarî *"vir"* a kurmancî be. Lê bi gelemperî qertafên bêjesaz bi serê xwe ne xwediyê wateyekê ne yanjî wetaya wan hatiye jibîrkirin.

Hinek qertafên bêjesaz jî xwediyê risteke cuda ne, lê hin caran bi karê bêjesaziyê radibin. Bo nimûne qertafa neyînîyê di peyvên mîna, *"nexweş* ", *"neyar", "netê* ", *"netê* ", *"newêrek", "nezan"* de pêşgir e. Ji ber ku bi wê, peyvên nû derketine holê. Her wisa daçeka *"bi"* jî di peyva *"bikir"wiha* ye.

Pêşgirên ku rmancî

Pêşgir ew cure qertaf in ku têne ber peyvê û wateyeke nû li peyvê bar dikin. Pêşgir bi xwe ne xwediyê tu wateyê ne, yanjî wateya wan a bingehîn hatiye jibîrkirin. H in caran jî digel ku wateya wan tê zanîn jî, ew qertaf bi karê pêşgirekê radibe, lê bi xwe ne pêşgir e.

Pêşgirên resen

1- Hinek pêşgirên din jî hene ku zêdetir navdêr û rengdêran çêdikin, wekî *"zir-", "tele-", "man-", "bele", "çele-", "xele-"* û

"kele". Em dê li ser fonksiyon fl wateya ku ew pêşgir li peyvan dikin tiştekî nebêjin, ji ber ku di mijara têkildar de em dê li serê rawestin.

/zir-/: *zirbav, zirdest, zirdiran, zirbapîr; zirbar. zirberaz, zirbira, zirfistiq, zirgizêr; zirhinar; zirkar; zirnexweş, zirtilî, zirtivir: ..*

/tele-/: *telereşî, telexewî, telebext, telerîşk ...*

/bele-/: *beletewş, beleban, befeçek, beleder; belefire, belegoşk, be/eguh, belehewr. belevîç. belexwat; belezîz ...*

/kele-/: *keleşêr. kelepor, kelebab, kelebacok, ke/ebest, ke/e-mamik, kelerim, kelereş, kelevajî ...*

/xele-/: *xelenêr. xelexwar. ..*

/man-/: Ev pêşgir hin caran wekî *"ma"* **li** *"mê"* jî derdikeve pêşberî mirov, peyva mak ango dayikji vir tê. Di kurmanciya nûjen de /mak/ jî hêdî hêdî rengê pêşgirekê digire.

Mînak: *Manga, manker; makerê, makezagon, makeşar, makeşêr; makeziman, makurk, makmij, mêkew, mêkund. ..*

Her wiha rayeka dema niha ya hinek lêkerên xwerû morfemeke nû pêk tînin, ew morfem hin caran dibin qertafbi peyvekê yan jî bi qertafckê dibin û peyveke nû pêk tînin.

Mînak: ı îravêj, dûrbîn, bîner, dengbêj, bêjer, barkêş, hînker; hi/gir. ..

Pêşgirên lêkersaz

Hin pêşgirên mîna *"çê* ", *"ra-", "da-", "hil-", "ve-", "wer-"* û *"rû-"* jî hene têne ber lêkeran û lêkerên nû pêk tînin.

/çê-r: Ev pêşgir di kevn de têkildarî rengdêra *"çê"* ango qenc **li** baş e. Lê ji wateya xwe ya bingehîn dûr ketiye, peywira pêşgirekê girtiye ser xwe.

Mînak: *çêkirin, çêbûn ....*

/ra-/: *rabûn, rakirin, raxistin, raborîn, ragirtin, ragihandin, raguhastin, raspartin, rabestan, rabezîn, rakêşan, raçandin, radan, rahiştin, rahejandin, raketin ...*

/da-/: *dadan, daketin, dagirtin, daxistin, daweşandin, dabestan, daborîn, daqurtandin, dabirîn, dahatin, dahanîn, dagerîn, dakişîn, daweşandin ...*

/hil-/: *hilgirtin, hildan, hi/anin, hilhatin, hilsengandin, hilpekandin, hilavêtin, hilavistin, hilberandin, hilbestin, hilbûn, hilkirin, hilbijartin, hilborîn, h ilcin iqin, hi/çinîn, hilçûn, hilfirîn, hilkeftin, hilgavtin, hi/gerîn, hi/hiştin, hi/kelîn, hilkulin, hi/kutan, hilpişkîn, hilweşandin, hilkişin ...*

/ve-/: *vebûn, vekirin, vedan, vegirtin, vegerandin, vexwendin, vegotin, veşartin, vehiştin, veman, vema/an, veşûştin, vekêşan, veguhastin, veguherîn, vehatin, vehewandin, vehesan, vehûnan, veçirandin, ve jenandin, veketin, veqetandin ...*

/wer-/: *wergirtin, wergerandin, werçerxan, werçûn, werdan, werfirandin, wergirtin, werkirin, werkutan ...*

/rû-/: *rûniştin, rûdan, rakirin ...*

Mijareke din heye ku pêdivî bi ronîkirina wê heye. Carinan di berhemên hinek zimanzanan de *"-vê"* jî wekî pêşgirekê derdikeve pêşberî mirov. Bi min ew ji cînavka lihevxistî *"pê-"* hatiye. Lê belê, ji aliyê wateyê ve vêxistin û vêketin hinekîji binyada xwe dûr ketine.

Jixwe dema ku mirov bala xwe dide mînakên wekî *"vêxistin"* û *"vêketin* ", mirov dibîne ku ew ji *"pêxistin"* û *"pêketinê"* hatine, bingeha wan jî daçeka *"bi"* ye. Pevguhcrîna dengên *"b"* û "v"yê ne tiştekî seyr e, gelek mînakên din jî hene ku pevguherîna van her du dengan nîşan didin.

Mînak:

birêkirin		*virêkirin*
bi êk re	*pêk re*	*vêk re*

Pêşgirên neresen

Her weki me li jor jî da zanîn hinek daçek, hoker tevî ku di bingeha xwe de ne pêşgir in jî, peywira pêşgiran bi cih tînin. Pêşgirên neresen ên sereke ev in:

1- *"bi-"ya* ku cihê paşgira *"dar"ê* digire, *"bê"ya* ku wateyeke

dijberî wateya "bi"yê dide peyvê û qertafa neyînîyê *"ne-"* di hin peyvan de karê pêşgirekê bi cih tînin, lewre jî dibin pêşgir.

/bê-/: Ev di rastiya xwe de daçek e, lê dema ku tê ber navdêran wan dike rengdêr û rista pêşgirekê bi cih tîne.

Mînak: *bênav, bêber, bêdeng, bêzirav, bêwar, bêserûber, bêtixûb, hêzar. bêxêr, bêbav; bêgav, bêhest, bêhêz, bêkêr. bêber. ..*

Ibi-/: Ev jî daçek e, lê dema ku tê ber navdêran hinek peyvên nû çêdike, ji navdêran rengdêran çêdike. Her wekî me li jor diyar kir, cihê paşgira *"<dar"* digire, wekî nimûne: *biber, biav, bideng, bikeser. bibext, bixêr; biceger, bireng, binas ...*

Li hin cihan jî wekî pêşgireke cihêreng jî derdikeve pêşberî mirov.

Bo nimûne: *bikir (kiriyar), bikuj (kujer), bibir (bivir) ...*

/ne-/: Ev jî daçeka neyînîyê ye, lê li hin cihan rista pêşgirekê hildigire ser milên xwe.

Mînak: *nexweş, neçar; neyar, neçê, nezan, nerast, nebaş, nesax, nedîtî ..*

Her wiha ew dikare di peyvan de bi rengê "na-" û "ni-" jî derkeve pêşberî mirov. Bo nimûne, nabîn di wateya "kor" de hatiye bikaranîn û di berhemên klasîk de jî cih girtiye.

2- Hokerên cih ên mîna *"der-", "ber-", "bin-", "ser-"* û *"nav-"* jî wekî pêşgir derdikevin pêşberî mirov.

/der-/: *derketin, derçûn, dermal, dercaw, derbûn, derdan, derdaw, derdest, deraqil, dergistî, deranîn û derhatin, derhest, derhişî, derkirin, derling, derpê, derpoş ...*

/ber-/: *berstû, berpal, bermalî, berdan, bernav, berroj, berbang, berkoz. be/pirs, berbûk. hervang, berav, berbar; berbaran, berbawerî, berbend, berbext, berhijêr. ..*

Ibin-/: *binzik, binpê, binbar; bincil, binerd, bindest, binav, hinban, binbelg, binbêder. binbêjing, binbisk, binçeng, binderî, binemal, binkiras. binfilitî ...*

/ser-/: *serbaz, serbar, sertar, sertac, serwext, sersal, serçavî, serkanî, serbizêr; ser govend, serbêjingî, serbijîşk, serbilind, serfiraz, serborî, sercerd, sercil, serçeq, serçong, serdem, serdest, serkeftin, serdeste, serdor, serdilk.:*

Inav-/: *navmil, navsere, navmal, navber, navnêrî, navran, navpişt, navpîl, navqed, navroj, navbêj, navneteweyî, navçav, navdest, navkil, navteng, navxweyi.:*

Paşgirên kurmancî

Paşgir ew cure qertaf in ku tên dawiya bêjeyekê û wateyeke nû didin wê. Paşgirên resen jî bi serê xwe ne xwediyê tu wateyê ne, bi tenê wateyekê didin bêjeya ku pê ve dibin. Di kurmancî de hejmara paşgiran gelekî zêde ye. Berevajî pêşgiran, paşgirên ku rengdêr û navdêran çêdikin gelekî zêde ne, lê paşgirên ku lêkeran çêdikin gelekî kêm in.

/-a/: *beza, zana, nebîna, reva, kara, fehma ...*

/-ahî/, /-a'· •.. î1, *I-ayî/:* Ev her sê paşgir têkildarî hev in, dengên *"17"*, "w" û "v" dengên kelijandinê ne, ew ketine navbera *"a"* û "i'"yê, li gorî dengên berî xwe dengê kelijandinê diguhere. Li vê derê qertafa bingehîn *"-i'"* ye, ew ên din dengên alîkar in.

Mînak: *dû ra h î/dû ray* î, *ronahî/ ronayî, ewrayi/ ewrawî, rêwî, bawî, lawî ...*

Divê bê gotin ku ji van tîpên kelijandinê ya ku herî zêde tê bikaranîn tîpa *"y"* ye. Piştre tîpa *"h"* tê bikaranîn û herî kêm jî "w "tê bikaranîn.

I-e/: şane, nîşane, pare, xane, bêje, rêje, şande, şîre, dane, nerme,
awarte, bende, bere, çêre, birûske, hizmare ...

/-ak/: *civak, honak, mînak, ronak, sêlak, şilak.:*

I-al/: heval, delal. çenga!, kendal, tenga1 ...

I-ane/: mêrane, merdane. şêrane. dostane, tirane ...

I-anîl: mêranî, ciwanî, xortanî, piranî, mehani. jinanî, keçanî, bûkanÎ...

/-ar/: *mirar. guhar; kovar, komar; kêmar; cotar; gotar, xewm; nivîsar, kevnar ...*

/-asa/: *hûtasa, dêwasa, perasa, qerasa .*

/-asî/: *kêmasî, kurtasî, tengasî, kirdasî .*

/-at/: *civat, gulat ...*

Ev paşgir zêde ne karîger e.

I-atîl: mirovatî. kirîvati, xwişkatî

I-awer/: *cengawer, dilawer, cemawer, pêlawer. .. I-bar/:*

xem har, guhêrbar, dîtbar; tawanbar; gunehbar I-

bend/: *nalbend, kemerbend, sazbend, solbend ..*

I-çe/: derîçe, deryaçe, baxçe, navçe, xalîçe, xwençe, na/çe, nfvçe ...

I-dank!: Ji lêkera danîn û paşgira *I-k!* pêk hatiye.

Derzîdank. kildank, çaydank

I-dar/:

Ev qertaf têkildarî rayeka dema niha ya lêkera *"daşten"* a farisî xuya dike.

Kardar. maldar, kovandar, rêzdar, qerzdar. birfndar, xwîndar: ..

Ide/: talde, diyarde, piyade, gêjde, kirde, revde ...

I-dêr/: *çavdêr. dengdêr, navdêr, rengdêr. ..*

I-ek!: kulek, çilek, dizek, serek, pişlek, birek, tirek.fisek, si/ek. .. /-

ende/: *kujende, balende, firende, dirende, mayende*

Ev paşgir hin caran wekî /-indel jî derdikeve pêşberî mirov. /-

er/: koçer; bêjer, kujer, pêjer. ..

I-êr/: qilêr; gelêr, dilêr, şilêr.:

I-gar/: *rojgar, şûngar; yadîgar. pêgar. ..*

I-geh/: pêgeh, bergeh, wargeh, şargeh, nîşangeh, kargeh, girtîgeh, bingeh. ..

I-istan/: *gulistan, daristan. moritijstan. xerîbistan, şaristan ...* I-xane/: Ev paşgir bi xwe paşgireke hevedudanî ye. Ji hêmanên *"xan"* û *"-e"* pêk hatiye.

Mînak: *dermanxane, mêvanxane, karxane, dersxane, pirtûk-xane. meyxane, nexweşxane, nivîsxane ...*

I-gÎn/: lezgîn. xwazgîn, mizgîn, sergîn. xemgîn ...

-ng/: Ev paşgir di bingeha xwe de "<ng" ye, lê li gorî rewşê bi dirûvê "<ing", "-eng", "<îng" û "-ang" jî derdikeve pêşberî mirov.

Mînak: *nêzing (nezîk), êzing, daring, rojing, ko ling, girÎng, kereng, bêjing, soring, çolang, gedeng, zavang, birang, xweying. ..*

/-îJ: Ev paşgir bi van peywiran radibe:

1- Ji navdêran navderêke din çêdike: kêrî, nêrî, serî, derî, kerî.:

2- Ji lêkeran, rengdêran ango raweya çêbiwar çêdike: Keti, şûştî, xistî, biraştî, bijartî, kelan di, helandî, mirandi, kuştî, qelaştî. ...

3- Rengdêr û hokeran dike navdêr: sarî, germî, kalî, tehlî, tûjî, gêjÎ, bllindî, xweşÎ, derengî, lezgînî. ...

4- Mensûbiyetê nîşan dide: botî, serhedî, xerzi, semsûrî, sêrtî, mêrdînî, qafqasî. silivî, gundi, bajarî, hewremanî.:

5- Navê zimanan pêk tîne: kurdî, tirkî, almanî, erebî, forisî, ingilîz; ...

I-în/: zêrin, zîvîn, şirîn, darîn, kevirîn, goştîn. ..

I-înî/: ça vîn i. kurdînî. goştînî. keçînî, dilînî, hevalînî., lawînî..

/-inc*/*: *serinc, gazinc, qolinc, sarinc ...*

I-îç/: spîçk, sorîçk, zerîçk. ..

I-încek/: pirîncek, marfncek...

I-îne/: yekîne, tevîne, çavîne ...

/-ij*/*: *paqij, mêwij, lavij ...*

I-oşkJ: beqmaroşk, dapîroşk. ..

I-tîl: nezantî, merivtî, hirati, hevaltî, kerîtî, aştî, xayintî, kurdîtî.: I-ikJ: kêrik, darik. keçik, jinik, sîrik, pîrik, kalik, xweşik. dayik, berxik, karik, guharik, berik, lihêfik ...

I-kJ: binkirask, bincilk, berdi!k, berçavk, jêderk. ..

I-kar/: Ev bi xwe bêjeyeke watedar e, lê di van mînakan de bi karê paşgirê radibe.

Mînak: cotkar; xebatkar, goş kar, serkar. xwendekar, nivîskar. ..

I-kî/: devkî, nivîski, serserkî, çitikî, paşpêkî ...

I-lao/: moze/an, kuçelan.borelan, mare/an, berdelan ...

I-lka/: hasûlka, pişilka, xwezilka, hêdîka ...

I-mend/: bawermend, hunermed, aqilmend, dewlemend. ..

I-nak/: *tirsnak, xeternak, derdnak, endişenak. ..*

/-okJ: *kenok, şermok, qeşmerok, revok, qelîştok, bezok, qelînok, şekirok, gezgezok, xaşxaşok. xaplnok, şevşevok, pitpitok bilbilok, dilok, xalxalok. mijmijok, binefşok, bazinok, bizmarok, teyrok, benok, benîştok, dudevok. ...*

I-ole/: *hişkole, tira le, pirole, girole. rîxole ...*

I-onekJ: tirsonek, bizdonek, fisonek. ..

/-or/: gulor, gilor, kilor, gincor. ..

I-oxl: dayox, firoş tox, kirox, gotox ...
I-oyîJ: şeroyî, şermoyî, germoyî..:

I-saz/: Ev qertaf jî bingeha xwe ji rayeka dema niha ya lêkera farisî *"saxten'tê* werdigire.

MÎnak: çeksaz, diransaz, dermansaz ...

I-baz/: Ev paşgir têkildarî lêkera hevedudanî *"bazdan"a* ku tê wateya govendgirtin û dîlkirinê ye.

Mînak: *rimbaz, serbaz, canbaz. hîlebaz ...*

1-f1d/: şerûd, sirûd. ..
I-ûn/: kaşûn, dijûn, gerdûn, qelûn, şitûn ...
I-ûr/: destûr, bilûr, şilûr; qabûl: rencûr. ..
/-van/: *aşvan, dergevan, baxçevan, gavan, şivan, mêvan, mazûvan, rezvan, tenûrvan, nêçîrvan. tembûrvan, bilûrvan, berxvan ...*
I-war/, /-wcr/: şalwar; berwar; xwendewar, serwet: .. I-waz/: Ev qertaf jî bi peyva *"awaz"* re têkildar e.

Minak: şaşwaz, cihêwaz ...

I-yar/: *bext yar; pirsyar. cotyar, kiryar. şandyar, zanyar, firoşyar; kuştyar. biryar. ..*
I-il/: zengil, gungil, çepil, çîkil. dîkil, çakil ... I-île/: şepîle, tep Île, zerîle, arîle ...
/-Îskl: *Çlmçilîsk; pêpelîsk. pêyîsk ...*

Paşgirên lêkersaz

Ev cure paşgir du hebin; *"-în" "<andin",* Bi van her du paşgiran ji rengdêr, navdêr, lêker û bêjeyên ne kurdî lêker têne çêkirin. Paşgira *"<in"* lêkerên negerguhêz, *"<andin"* jî lêkerên gerguhêz pêk tîne. Her wiha çend heb paşgirên din ên mîna *"<ijîn"* û *"<ijandin", "<isîn"* û "-*isandin"* bi baweriya me ew jî têkildarî *"<în"* û *"-andin"* În.

Mînak:

Ji rengdêran: sorandin, xweşandin, tengijandin, repisandin, xemilîn, xemilandin, dirandin, keskandin ...

Ji navdêran: kelin / kelandin, revîn / revandin, firîn /firandin, çêrîn / çêrandin, gerîn / gerandin, kenîn / kenandin, livîn / livandin, êşîn / êşandin ....

Ji lêkeran: kişîn / kişandin, guherîn / guherandin, nivîsandin, gihîn / gihandin, mirin / mirandin, pijîn / pijandin, şewitîn /şewitandin.. .

Ji kokên bêjeyên biyanî: elimîn / elimandin, helin / helandin, acizîn / acizandin, sekinîn / sekinandin, şêwirîn / şêwirandin, herimîn / herimandin, cihenimin / cihenimandin, bihecîn / bihecandin, heyirîn / heyirandin, meşîn / meşandin ...

Ji bilî van paşgiran gelekên ku em bi ser ve nebûne hene.

Divê bê gotin ku di kurmancî de bi alîkariya rayeka dema niha ya lêkeran jî gelek paşgir bi dest dikevin.

Ji kirinê /-ker/: *karker, zêrker; ZÎvker, çêker, têrker.*
.. Ji avêtinê /-avêj/: *tîravêj, rimavêj, ronavêj. ..*
Ji rêtinê /-rêj/: *avrêj, xwînrêj ...*
Ji kêsanê l-kêş/: *şûrkêş, qelûn kêş, cixarekêş, esrarkêş ... Ji birinê l-ber/: rêber. rêncber; dilber. ..*
Ji mêtin l-mij/: xwînmij, şîrmi] ...
Ji sotinê /-so.i/: *dilsoj, malso] ..*
Ji malaştin l-mal/: destmal, pêşmal. ..
Ji kuştinê l-kuj/: *agirkuj, mêrkuj, hêvîkuj. ..*
Ji kotin l-koj/: hestîkoj. darkoj ...
Ji tiraş tinê l-tiraş/: *dartiraş, sertiraş*
... Ji peht inê l-pêj/: *aşpêj, nanpêj ..*
Ji gotinê /-bêj/: *dengbêj, çîrokbêj, stranbêj.*
.. Ji biraştinê l-birêj/: *goştbirêj. ..*
Ji xwarinê l-xur/: *goştxur; giyaxur; nanxur; kurtêlxur. ..*

Navbend

Navbcnd ku bi îngilîzî jê re *"interfix'* tê gotin, ev cure qertaf in ku dikevin navbera du peyvan û wan digihînin hev, bi wî awayî dibin navgîna dariştina peyveke nû. Di kurdî de fonemên *"-e-", "-an"* vê peywirê bi cih tînin.

"-e-"

Mînak: germegerm, zingezing, şîregerm, tîremar. reşeba, kurtedem, saregerm, çirkeçirk, kurtepist, xuşexuş, gijegij, tiretir; şingeşing, darebî. rengereng. kurtenûçe ...

"-an"

Mînak: *seranser, beranber. ..*

Her wiha daçeka "bi" jî hin caran peywireke nêzî navbendê hildigire ser xwe lê ew *"bi"* bi serê xwe tê nivîsandin.

Mînak: *Ser bi sel: der bi der, cur bi cur. ..*

Di vî warî de gihaneka *"Lî"* jî xwediyê erkeke balkêş e. Ew gihanek bi awayê *"o"* dikeve navbera du peyvan û dibe navbend, her wiha heman *"o"* tê dawiya peyvê jî. Peywira wê nêzîkî "circumfix" ango dorgirê ye.

Mînak: *serobino, şaşomaşo ...*

Navgir

Navgir ku bi îngilîzî" jê re *"infix"* tê gotin dikeve nava peyvê û wateyeke nû dide wê. Di kurdî de dengê *"-a-"* dikeve nava hinek lêkeran ûji wan navdêran çêdike.

	Mînak:
şewa!	*şewitîn*
xebat	*xebitîn*
jelat	*filitîn*
weşan	*weşîn*
serad	*seridin*
geran	*gerîn*
hewan	*hewîn*

Wekî encam li ser rêbaza dariştina peyvan divê em çend tiştan bibêjin. Di kurdî de her çi qas me gotibe, pêşgir (pêrkit), paşgir (parkît) û heta navbend lt navgir jî hene, giranî li ser paşgiran e. Bi taybetî navdêr ₒ rengdêrên pêkhatî bi alîkariya paşgiran hatine dariştin. Piraniya pêşgirên di kurdî de lêkeran pêk tînin. Her wiha piraniya rengdêr û navdêrên di kurdî de hevedudanî ne, lê hejmara lêkerên hevedudanî kêm e. Hejmara paşgirên ku lêkeran pêk tîninjî ji çend heban nabore.

WATENASÎ

Lêkolîna di warê wateyê de di nav xebatên zimanzaniyê de warekî taybet e. Ji vî warî re watenasî tê gotin. Zimanzanên ku li ser vî warê zimanzaniyê radiwestin, ji aliyê wateyê ve li ser peyvan, komekan û hevokan lêkolînê dikin. Her peyv xwediyê wateyekê ye û peyamekê radigihîne mirovan. Heke mirov bi awayekî din bibêje, her peyv xwediyê xwebêjekê ye. Watenasî nîşan dide ka xwebêja bêjeyekê çi qas xurt c, ji aliyê wateyê ve peyv çendî kûr û berfireh e û hwd.

Watcnasî **li** ser wateya têgihî ya peyvê radiweste. Ew wate bi domana demê re pêk hatiye û wateya bingehîn e. Wek nimûne dema ku em dibêj in, *"g1ll"* kulîlkeke rengîn ku bi gelemperî rengê wê sor e, tê bîra mirov. Wateya wê ya sereke eve. Ji ber reng û bêhna xwe, *"gur'* di hinek wateyên mecazî de jî hatiye bikaranîn. Bo nimûne, gelek helbestkaran jibo evîndara xwe peyva *"gul"* bi kar aniye. Wateya bingehîn a peyvan li gorî bikarhêneran naguhere, piraniya bikarhêneran li ser wê wateyê li hev dikin. lê wateya ku li gorî bikarhêner biguhere dikeve nav hewana warekî din e zimanzaniyê ku ew jî *"pragmatîk'* e.

Wateya bingehîn ji bo bikaranîna rast a peyvê dibe alîkar. Hin caran peyvek ji al iyê hevoksaziyê ve cihê xwe digire lê belê ji aliyê wateyê ve cihê xwe nagire. Mînak: dema ku yek bibêje, *"Pirtûkê darek çand."* Ji aliyê peyvsazî û hevoksaziyê ve ev hevok ne çewt e, lê di warê watcnasiyê de hevokeke wisa nayê pej irandin. Lewre *"pirtûk"* ne tiştekî zindî ye, nikare darê biçîne. Lê belê heke mirov wateya wê ya mecazî bi kar bîne, mirov dikare bibêje, *"Vê pirtûkê*

serê vî xortê ciwan xwar." Dema ku mirov peyvan li gorî wateya bingehîn û taybetiyên heyberên ku nîşan dide dabeş bike, wê demê rê li ber bikaranînên nelicih digire.

Ji bilî wê divê mirov ji aliyê wateyê ve bala xwe bide peywira ku ew di nava hevokê de bi cih tîne. Li gorî vê yekê, dema ku em dibêjin, *"Zarokan kevir avêt."* Lêkera di vê hevokê de tcvgerekê nîşan dide. Dema ku mirov ji aliyê karîgeriya watcyî ve li vê hevokê binêre, dibîne ku *"zarok"* li vir *"bikir"* in, *"kevir"* di vê hevokê de *"pêkir"* e. Dema ku em bibêjin, *"Zarok kevir bi destê çepê avêt."* Li vê derê *"destê çepê"* navgîn e. Dema ku di lêkerê de bizaveke çalak nîn be, wê demê *"taqîker"* cihê *"bikir"* digire. Di hevoka *"Xecê deng bihîst,"* de *"Xec"* tu tiştî nake, bi tenê tiştekî dijî, lewre jî *"jiyet"* e. Dema ku hêmaneke hevokê cih nîşan bide, peywira cih pêk tîne, di hevoka *"Pirtûk li sel' maseyê ye."* de *"mase"* cih e. Heke bûyer ji cihekî ber bi cihekî din ve be, cihê destpêkê *"jêderk",* cihê dawiyê *"armanc"* e.

Her wiha di hevoka *"Hogir bi balajirêji Amedê çû Tehranê"* de *"Hogir"* bikir e, *"balafir"* navgîn e, *"Amed'* jêderk e ◻ *"Tehran"* jî *"armanc"* e. Ji dabeşkirina bi rengî ya hêmanên hevokê re di watenasiyê de *"pîşeyên wate yî"* tê gotin.

Ji aliyê têkildariyê ve wate

Dema ku mirov bala xwe dide wateya navê hcyberekê, bivê nevê mirov têkildarî heybercke din dinirxîne ango mirov bi heybereke din re hevrû dike û li gorî wê disenifine. Gava ku em dixwazin peyvê rave bikin, cm hewl didin ku wê peyvê bi alîkariya hinek peyvên din rave û pênasc bikin. Em vê yekê jî li gorî hinek taybctiyên tiştan û têkiliya wan bi tiştên din re, pêk tînin. Bi vî awayî mirov dikare *"xwehêj"a* peyvekê destnîşan bike. Ji bo zelalkirina mijarê em dikarin mînakeke bi vî rengî bidin:

kulîlk	mih	xort	jin	mêr	
	+		+	+	gihîştî
		+		+	nêr
		+	+	+	mirov
+	+	+	+	+	giyanewer

Ev rêbaz di pênasckirin û senifandina hemû peyvan de bi kêr nayê, lê belê dîsa ji **ji** bo ravekirina gelek peyvan dibe alîkar.

Têkildarî vê mijarê hinek têgihên mîna" *peyvên hemwate", "peyvên dijwate", "peyvên hevdeng", "peyvên hevreng", "cotepeyv"* hene. Em li ser wan jî hin tiştan bibêjin.

Bêjeyên hemwate

Peyvên *"hemwate"* ew eure peyv in ku ji aliyê wateyê ve yek hev in. Di her zimanî de ji ber sedemên cuda peyvên hemwate hene. Hin caran jêderka peyvan ji hev euda ye. Ew peyvên hemwate ji çavkaniyên cuda hatine û ketine nava zimên. Her wekî ku çawa gelek peyv ji ber ola îslamê ji erebî ketine nav kurdî. Pirî caran ew peyvên hemwate bi hev re têne bikaranîn.

Divê neyê jibîrkirin ku hemwatcbûna du peyvan nayê wê wateyê ku ew her du peyv ji sedî sed wekî hev in. Pirî earan cudatiyeke pir biçûk di navbera wan de heye. Hin earan peywira wan ji hev cuda ye. Gelek caran ji du peyvên hemwate, yek di hevokekê de cihê ya din nagire.

Dema ku mirov bala xwe dide zimanê kurdî, mirov dibîne ku gelek peyvên hemwate hene. Sedema vê yekê pirbûna zarava û devokên kurdî ye. Jiber vê sedemê jibo her tiştî çend navên cuda hene. Ji bo zelalkirina mijarê em çend nimûneyan bidin.

Mînak:

heftreng, keskesor. bûka baranê, qozeqer; kevana
dawûd. soberî, ajneberî, melevanî. ...
peyivîn. axaftin. şorkirin, qezikirin. ..
bişirîn, beşişîn, besimîn. ..
karîn, kanin, şiyan.
kesk, .'lewz, kihû.
xwestin, viyan.

Pirbûna peyvên hemwate ji bo kurdî dewlemendî ye, lê bi rewşa xwe ya heyî ji bo kurdan alozî û bargiraniyê pêk tîne. Heke ziman bi awayekî siruştî yekgirtina xwe pêk bîne, dê ev peyv werin moxilkirin û her wiha dê bi domana demê re ev peyvên hemwate peywirên cuda

bigirin ser xwe û karîger bibin. Bo nimûne, ji pênc peyvên hemwate yên ku *"keskesor"ê* nîşan didin, dibe ku yek bibe têgiheke esmannasiyê, yek bibe têgiheke wêjeyê, yek jî bibe têgiheke hunerê û hwd. Bi vî rengî ev peyv hêza derbirînê ya zimên zêde dikin.

Bêjeyên dijware

Peyvên dijwate ji wan peyvan re tê gotin ku wateya wan li dijî heve. Peyvên dij wate du cure ne; peyvên dijwate yên *"pîvanber"* û yên *"nepîvanber",* her wekî peyvên *"kurt û dirêj", "mezin û biçûk"* û hwd. Di peyvên pîvan ber de, *"pile"* hene. Her wekî *"mezin/ mezintir/ mezintirîn", "biçûk / biçûktir! biçûktirîn".* Lê di peyvên dij wate yên nepîvanber de ev taybetî nîn e. Her wekî, *"ketin û rabûn", "ken û girt', "şîn û şahî", "birin û anzl(' ...* Divê em neyîniya peyvekê wekî dijwateya wê peyvê nebînin. Ji ber ku peyvên mîna *"qenc û neqenc", sivik û nesivik"* ne dijwate ne. Lê peyvên mîna *"giran û sivik", "qenc û xerab"* dijwate ne. Berî ku em dawî li vê mijarê bînin, em dikarin çend mînakên din jî bidin:

çûn	*hatin*
xemgîn	*kêfxweş*
rabûn	*rûniştin*
birin	*anîn*
qencî	*xerabî*
bilind	*nizm*
ser	*spî*
jiyan	*aşti*
ronahî	*mirtn*
	tarî ....

Bêjeyên **hevdeng**

Hinek bêje jî hene ku ji aliyê teşe û dirûv ve wekî hev in, lê wateya wan ji hev cuda ye. Di kurdî de bêjeyên bi vî rengî bi qasî bêjeyên hemwate ne zêde bin jî, peyda dibin.

Bo nimûne bêjeya *"xal"* bi sê wateyan derdikeve pêşberî mirov; birayê dayikê "xal", wekî niqte "xal" û hemwateya şanikê "xal". Her wiha bêjeya *"gelek"* di wateya *"xelkek"* de, *"gelek"* di wateya

"pir" de jî derdikeve pêşberî mirov. Mînakên din jî bêjeya *"her "e ,ew jf* wekî ***"pêşi",*** wekî *"zad",* wekî *"kevir"* û wekî *"xalîçe"* derdikeve pêşberî mirov. Bêjeya *"bîr"* jî hem wekî *"hafiza"* hem jî wekî *"çal"* derdikeve pêşberî mirov.

Mînak:

hûr (biçûk) rovî	*hûr (weki hûr û rovî)*
(wekî ajal) şîn	*rovî (rodî)*
(hêşîn)	*şîn (şina miriyan)*
çek (sîleh)	*çek (kinc)*
tû] (kêra tûj)	*tûj (Îsota tÛJ)*
dem (wext)	*dem (dema çayê)*

Gelek bêjeyên hevreng bi riya zayendê ji hev têne cudakirin. Wek nimûne bêjeya *"dar"* dema ku *"dara ter"* be mê ye, lê dema dar hişk be nêr e.

Mînak:

dara tûyê	*darê hişk*
nava min	*navê min*
bera me	*herê me*
xala giring	*xalê min*
kara me	*karê me*

Peyvên hevreng

Hinek bêje jî her çi qas dengê wan ne yek be jî, awayê nivîsandina wan yek e. Em dikarin van peyvan wekî *"hevreng"* bi nav bikin. Peyvên hevreng ji ber du dengên ku heman tîpê hatine nîşandan, pêk hatine.

Mînak:

gur (gurg)	*gur (wekî agir gur)*
pir (pire)	*pir (gelek)*
ker (heywana barkêş)	*ker (kesê ku nabihîze)*
teng (sewiye)	*teng (dijwateya bêjeya fireh)*
çil (40)	*çil (wekî çilek)*
ter (hîç)	*fer (şil)*
kal (zebeşê kal)	*kal (ka/emer)*

Cotepeyv

Di warê watenasiyê de mijareke mayî jî mijara eotepeyv e ku bi îngilîzî jê re *"biword"* hatiye gotin. Di axaftina rojane de gelek caran cotcpcyvên mîna *"qirş* lî *qar, "dar û ber", "erd* lî *zevî", "gil* lî *giha", "kul* lî *derd", "êş* lî *azar", "hiş û aqil", "ar* lî *namûs", "ked* lî *emeg", "cil* lî *berg", "mal* lî *milk", "cih* lî *war", "şûn û war", "şin* lî *girî", "ken û girî," "kevir* lî *kuç", "pûş* Lî *pelax", "dar û devî", "teyr* lî *tilûr* ", *"çek û sîleh", "kend* lA *kosp", "çol û çiv"* û hwd. bi ber guhên mirov dikevin

Dema ku mirov bala xwe dide cotepeyvan, mirov dibîne ku hinek j i ",'an hemwate ne. Her wekî *"çek û sîleh", "hiş* lî *aqil", "bext* lî *miraz", "cejn* lî *îd", "cih* Lî *mekan".* Ji van peyvan yek bi kurdî ye, ya din jî bi erebî ye. Hin caran dibe ku her du jî bi kurdî bin, her wekî *"ap* Lî *mam", "cî* Lî *nivîn", "rind û qenc".* Hinekan wateya wan nêzî heve: her wekî *"dar* lî *ber", "erd û zevî", "dar* lî *dev?', "ben* lî *ta", "berfû baran", "ba* ₀ *bahoz", "bisk* lî *kezî", "çek û rext", "tund û tûj"* ... Hinek dijwate ne her wekî *"kend û kosp", "xwar ûjor"," sin* lî *şahî", "çak* lî *xerab" ... Mirov* dixwazin bi vî awayî wateya peyvê xurt bikin, bi alîkariya du peyvan têgiheke gelemperî bi dest bixin, her wiha dema ku vê yekê dikin hem ji aliyê wateyê ve hem jî ji aliyê denganiyê ve peyvên têkildarî hev dineqinin.

Cotepeyvên hemwate: Bi du peyvên hemwate, wateya peyvê tê xurtkirin. Her wiha, sedema ku peyveke kurdî ligel yeke erebî hatiye bikaranîn, bandora perwerdehiya medreseyan e. Ji ber ku di medreseyan de ders bi erebî bûn, lê belê bi kurdî dihatin şîrovekirin. Gava mirov bala xwe dide şêwaza mele yên medreseyan mirov vê yekê bi awayekî zelaltir dibîne. Dema her du peyv jî bi kurdî bin ar-manc xurtkirina wateyê ye. Her wekî *"zar û ziman", "ap û mam", "mak û dayik", "zarok* lî *biçûk" ...*

Cotepeyvên dijwate: Bi du peyvên dij wate kurdan xwestiye têgiheke gelemperî bi dest bixin. Pirî caran jî bi dubarekirina du peyvên dijwate, mirov dixwaze tiştekî texmînî bibêje. Wekî peyva *";;.û* zî *dereng", "dûr* îı *nêzîk", "xwar û jor", "yar û neyar", "xêr* Lî *şer", "kêm-zêde", "pir-hindik" ...*

Cotepeyvên nêzwate: Bi alîkariya du peyvên nêzwate, kurdan

xwestiye têgiheke berfirehtir bi dest bixin. Dema ku em dibêjin *"dar û ber* "qesta me têgiheke ji her dukan firehtir e. Dema ku em dibêjin *"çol û çiya"* em qala hemû cihê çolter dikin. Her wiha *"kevir û kuç", "dar û dev!", "gil û giha"* jî armanca me bidestxistina têgiheke gelemperî ye.

Hin caran jî her du peyv ne ji aliyê wateyê ve lê belê ji aliyê deng ve nêzî hev in, bi hev re rêzbendckê pêk tînin li pey hev tên. Ji wan jî dîsa armanc pêkanîna têgiheke gelemperî ye. Dema ku ji aliyê wateyê ve nêzîkiyek hebe jî, dîsa nêzîkbûna denganî jî li ber çavan tê girtin. Ji ber ku ahenga denganî peyvê xurt dike. Her wekî *"zor û bor", "xan û man", "ax û ox", "bext û text", "bêtir û çêtir", "deng û reng", "car û har", "xêr û bêr", "dar û ber" ...*

Di peyvan de kirpandin

Di kurmancî de kirpandin her tim ne li heman cihî ye. Dema ku peyv xwerû bin kirpandin li ser kîteya dawîn e, lê hin caran kirpandin dikeve ser kîteya berî wê jî. Çi kurt çi dirêj hemû dengdêr dikarin kirpandinê bigirin ser xwe. Di kurmancî de kirpandin bi tenê di hişkatiya wê de guherînê çêdike, ji bilî wê di reng fl cîderka dengdêrê de tu guhartinê pêk nayîne. Dengdêr çi kurt çi jî dirêj be, di dema kirpandinê de wekî xwe dimînin. Di peyvên yekkîte de her tim kirpandin (derblêdan) li ser dengdêrê ye.

Mînak: *ba. ga, rê, pê. ro, se, ar, av ol. êl, bav, mal, kon, kar, ker, mêr, jin. gîsk, peşk. mişk. nîr, bîr; berx, kurd, qul, cil, mil. dil. soı~ mor, dor, kor, sel, ber, der. ..*

Di peyvên pirkîteyî de kirpandin bi gelemperî li ser kîteya paşîn e.
Mînak: *bizin. çivîk, gîsin, hesin, nogin, quling, golik. kolos, selik, tevir; eylo, nêrî, serî, berek, kirin, birin, mirin, kuştin, hiştin, ketin. conega, hevaltî, tirsandin, gerandin, qelaştin. daristan, serkarî, derbedarî. CÎnartî. belengaz, nihêrîn, hevkarî, xeniqandin, derman, gerden, wekî. hemî, darbest, serhevîrk, destnivêj, nanûzik.*

Di hemû navdêr û rengdêran de kirpandin bi giranî dikeve ser kiteya dawîn. Piraniya hêmanên rêzimanî (yên mîna -ek, -ê, -a) ku bi navdêran ve dibin bandorê li kirpandina peyvê nakin.

Her wekî;

Mirov	*mirovek*
Gund	*gundê*
Mal	*me mala*
	wan

Di vî warî de pertafên pirjimariyê *"-ên"* û *"<an"* awarte ne. Di ravek û tewangê de kirpandin dikeve ser wan.

Mînak:

mala kurdan
mirovên
azadîxwaz

Di peyvên hevedudanî de kirpandin

Peyvên hevedudanî dema ku di rewşa xwerû de bin, kipandin dikeve ser kîteya dawîn a hêmana paşîn.

MÎnak: cotkarî, havîngeh, virker.

Di warê peyvên hevedudanî de xaleke din a balkêş jî heye. Peyvên hevedudanî **ji** ber ku ji du hêmanan pêk tên, kirpandina di hêmana yekemîn de jî tê parastin, lewre jî du kirpandin di wan peyvan de pêk tên.

Mînak: esmandev. sîngebend, seyrangeh, herêna,

keskesor ... Di lêkeran de kirpandin

Lêker dema ku rader bin wekî navdêran kirpandin dikeve ser kîteya dawîn. Her wekî; *hatin, gotin, xwestin, şûştin, firotin, girtin, birîn, firîn, gerandin ...*

Lê dema ku têne kişandin kirpandin dikeve ser kîteya dawîn a rayeka dema borî.

Mînak: *hatin, gotin, ketin, xwestin, birin, girtin. gerandin, kişandin ...*

1- Di neyiniyê de kirpandin dikeve ser pêşgirên neyiniyê (na-, ne-) her wekî; *naçim. neçû, nexwara ...*

2- Pêşgirên mîna "ve-", *"da-"* û *"wer-"* kirpandinê digirin ser xwe.

Mînak: *hildidin, vedixwim, daqurtand, wergerand ...*

3- Pêş girên raweyî yên mîna *"di-"* û *"bi-"* kirpandinê digirin ser xwe.

Minak: *dipeyive, bixaive, bike, dide ...*

4- Lêkerên di forma raweya çêbiwar de dema ku lêker dukîteyî be kirpandin dikeve ser kiteya dawîn. Lê belê dema ku lêker sêkîteyi yan jî jê zêdetir be, kirpandin dikeve ser kîteya berî ya dawîn.

Mînak: *kuştî, hatî, ketî, çûyî, kelandî. firandî, zivirandf. ..* Qertafên kêsanê bandorê li cihê kirpandinê nakin, kirpandin her tim li ser kîteya dawîn a rayeka lêkerê ye.

Mînak:

Ez hatim	*ez*
Tu hatî	*bihatama tu*
Ew hat	*bihatayî ew*
Em	*bihata*
hatin Ew	*em bihatana*
hatin	*ew bihatana*
Ez geriyam	*ez*
Tu geriyayî	*bigeriyama tu*
Ew geriyaye	*bigeriyayî ew*
	bigeriyaya

Di pirtûka Celadet Bedirxan û Roger Lescot a rêziman de hatiye gotin ku cihê kirpandinê di kurdî de pir ne birêkûpêk e û ev nirxandin hatiye kirin: *"Divê neyê jibîrkirin ku di kurdî de kirpandin pir zêde ne birêkûpêk e, ji ber vê yekê ji bo hemû rêzikan mînakên awarte hene. "*

Bo nimûne: jîrkî, avî, pale wî, îro ...

Her wiha D. N. Mackenzie di xebata xwe ya bi navê *"Kurdish Dialect Studies (Lêkolîna Zaravayên Kurdî)"* de gotiye, *"Materyalên kil li ser zaravayên kurdî bi dest ketine,* çi *yên li vir hatine pêşkêşkirin, çi Jî yên berê hatine çapandin, ji bo ravekirina rêbaza kirpandinê bingeheke pêwîst pêk nayînin. "*

ERGATÎVÎ

Berevajî tirkî ku zimanekî nomînatif-akuzatîf e, kurdî zimanekî ergatîv - absolûtîv (xweru-tewandî) e. Di zimanên ergatîv de di hevokên bi lêkerên gerguhêz de lêker dikeve bin bandora bireserê. Ango lêker li gorî bireserê tê kişandin û kesandin. Ergatîvîteya kurmancî şikestî ye, ango ergatîvî tenê di dema borî de diyar dibe. Ergatîvîteya kurmancî her wiha hem tewanga kesan a lêkeran hem jî cînavkan diguhere. Ji bo zelalbûna mijarê ez pêdivî bi dayîna hinek mînakan dibînim. Di zimanên ne ergatîv de lêker her tim di bin bandora kesê ku wî karî dikin ango kirdeyê de ye. Weki mînak em dikarin li tirkî binêrin.

Ben elma yedim.
Ben elmalart yedim.
Ben elmayt yerim.
Ben elmalart yerim. Ben elmayi yiyecegim. Ben elmalart yiyecegim.

Her wekî diyar e, di hemû deman de lêker li gorî kesê yekemîn hatiye kişandin.

Lê di kurdî de rewş diguhere. Em îcar bala xwe bidin kurdî ka heman hevok di kurdî de çawa têne kişandin:

Min sêv xwar.
Min sêv xwarin.
Ez sêvê dixwim.
Ez sêvan dixwim.
Ez dê sêvê bixwim.
Ez dê sêvan bixwim.

Her wekî ji mînakan jî diyar dibe di demên borî de lêker di bin bandora bireserê ango *"sêv"ê* de ye. Mêjera *"sêv"ê* ji lêkerê tê fêmkirin. Em mînakeke din jî bidin da ku mijar zelaltir bibe.

Ben seni gordûm. Sen beni gordûn.
Biz sizi gordûk.
Siz bizi gordûnûz.
Ben seni gorûyorum.
Sen heni gorûyorsun. Ben seni gorecegim.

Li vir jî her wekî diyar e, lêker tim li gorî kirdeyê ango kesê ku dibîne hatiye kişandin. Tu caran li gorî kesê ku hatiye dîtin nayê kişandin. Lê di kurdî de rewş cuda ye. Di dema niha û dema bê de kurmancî jî wekî tirkî ye.

Ez le dibînim.
Tu min dibînî.

Ez dê le bibînim.
Tu yê min bibînî.

Te ez dîtim. Min lu dîtî.

We ez dîtim. Me tu dîtî.

Lê gava ku mirov tê ser demên borî rewş ji binî ve diguhere. Lêker dikeve bin tesîra bireserê.

Her wekî me li jor jî da zanîn, bi riya ergatîviyê lêkerên gerguhêz û negerguhêz ji hev cuda dibin. Di zimanê ku bi temamî ergatîv in de, lêkerên gerguhêz di hemû deman de di bin bandora bircserê de ne. Lê ji ber ku kurmancî bi tenê di demên borî de dikeve bin bandora bircscrê jê re niv-ergativ hatiye gotin. Di kurmancî de tewanga navdêr. cînavk û veqetandckan, hebûna du kom cînavkan têkildarî' vê meselevê ye.

Di devokên **kurmancî** de têkçûna ergatîviyê

Di hin devokên kurmancî de ergatîvî ji holê rabûye. Ev yek bi

du awayan pêk hatiye. Li herêmên di bin bandora tirkî de lêkerên gerguhêz di dema borî de jî wekî demên din li gorî kirdeyê têne kişandin. Bo nimûne, li şûna *"Min xwest ez te nas bikim.", "Ez xwestim te nas bikim."* tê gotin. Her wiha li şûna *"Min nan xwar.", "Ez nan xwarim."* tê gotin. Ev cure têkçûna ergatîviyê li Kurdistanê zêde ne berbelav e, li hinek deverên Amedê bi ber çavan dikeve. Lê awayekî din ê têkçûna ergatîviyê heye ku li seranserî Kurdistanê berbelav e fl di gelek devokên kurmancî de heye. Ji vê formê re di îngilîzî de *"double oblique"* ango *"cot-tewangî"* tê gotin. Di van devokan de têkçûna ergatîviyê bi awayekî din pêk tê. Di demên borî de lêkera gerguhêz li şûna ku bikeve bin bandora bireserê û li gorî wê were kişandin, lêker bi serê xwe dimîne û qertafên kesane nagire. Di van devokan de di demên borî de hem kirde hem jî biresera lêkerên gerguhêz têne tewandin, kirde û bireser ne bi nîşaneyên morfolojik lê belê li gorî rêzbûna xwe ango bi awayekî sentaksî ji hev têne cudakirin. Wekî mînak, li şûna *"Te ez dîtim.", "Te min dit."* tê gotin. Her wekî me li jor jî diyar kir, kirde û bireser ji awayê rêzbûnê ango bi awayekî sen taksî ji hev têne veqetandin.

Mînak:

Min wî dît. (Min ew dît.)
Wî min dît. (Wî ez dîtim.)

Di vê formê cot-tewangî de di demên borî de mêjer û zayenda bireserê jî bi riya tewangê tê nîşandan.

Mînak:
Min sêvan xwar. (Min sêv xwarin.)
Zînê Gulê dîtiye.

Ev form di gelek devokên kurmancî de heye û ligel ku di zimanê nivîskî de wekî formeke rewa nehatiye pejirandin jî gelek kes vê formê dixin zimanê nivîskî, lê li gorî baweriya min ev form di rêzimana kurmancî de tevliheviyên mezin pêk tîne û bi tu awayî divê nekeve zimanê nivîskî. Kesên ku vê formê nas nekin bi tu awayî nikarin mebesta bêjer fêm bikin û nikarin kirde û bircserê ji hev cuda bikin. Tiştekî din jî heye ku divê em ji bîr nekin; ergatîvî taybetiyeke zimanê kurdî ye û wî ji zimanên din cuda dike, lewre jî divê wekî nîşaneyeke xweserî û reseniya kurdî were parastin.

Guherbarî

Di nava hevokê de hêmanên guherbar dirûvê xwe diguherînin, hinek tîp ji wan dikevin, hinek tîpên nû bi wan ve dibin, di nava wan de hinek tîp bi hinekên din tên guhartin.Hinek cureyên peyvan jî naguherin, her tim wekî xwe dimînin, j i vê yekê re jî neguherbarî tê gotin. Ji vê taybetiyê re guherbarî tê gotin.

Di kurmancî de cureyên peyvan ên wekî; *"navdêr", "veqe-tandek* ". *"CÎnavk* ", *"jimarnav ", "lêker* ", *"rengdêr" û "hoker"* guherbar in. Bo nimûne, lêker li gorî dem û kesan têne kişandin. Her wiha navdêr û cînavk û qismek rengdêrên ku di bingeha xwe de cînavk in ₒ hinek hokerên cih ku di rastiya xwe de navdêr in, ditewin. Li aliyê din cureyên bêjeyan mîna, *"daçek", "gihanek" û "baneşan"* neguherbar in û di nava hevokê de her tim wekî xwe dimînin. Her wekî balê dikêşe, cureyên bêjeyan ên erkî ne guherbar in, lê belê cureyên wateyî guherbar in. Li vir divê ez têbîniyekê der barê rengdêr û hokerên resen jî diyar bikim. Her çi qas Celadet Bedirxan ew wekî *"neguherbar"* destnîşan kiribin jî ji ber ku di dema payedariyê de qertafan digirin ew jî guherbar in.

Bo nimûne:

haş, baştir, baştirîn
lezgîn, lezgîntir; lezgîntirîn
berz, berztir; berztirîn
hêdî, hêdîtir; hêdîtirin

Her cureyê bêjeyê guherbariya wê bi awayekî ye. Heçî lêker in,

li gorî dem, kes û mêjerê têne kişandin. Nimûne:

kirin: dikim, bike, bikira, kiribû, kiribûya ...
xwarin: bixwe, xwaribû, dixwar, dixwim, bixwara ....
dîtin: dîtim, dîtî, bidita, didît, dibîne, dê bibîne ...
kêşan: dikêşim. bikêşe ...
hejandin: dihêjîne, bihêjîne ...

 Guherbariya navdêr û cînavkan bi alîkariya tewangê pêk tê.

Tewang

Her wekî me li jorê diyar kir, guhcrbariya hin cureyên bêjeyan bi alîkariya tewangê diyar dibe. Em pêşî binêrin ka tewang çi ye. Serê pêşîn em bala xwe bidin wateya peyva *"tewang"ê.* Peyva *"tewang"ê* peyveke hevedudanî ye, ji rayeka dema niha ya lêkera *"tewandin'lê "tew"* û paşgira *"ang"ê* pêk hatiye. Tewandin (çemandin) xwarkirina tiştekî. Di îngilîzî de wekî *"oblique"* hatiye destnîşankirin. Celadet Bedirxan tewang bi vî rengî rave kiriye: *"Zimanê kurdmancî zmanekî tewangbar e. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe namînin li li gora cihê ko di qisetê de dikevin e, û wezîfa ko li ser xwe digirin têne tewandin li hin parkit bi wan ve dibin an hin tîpên wan bi tîpen din diguhêrin."* (Elfabêya Kurdî û Bingehên gramera kurdmancî, r. 57)

Wisa diyar dibe ku Celadet Bedirxan. *"tewang"* di wateya teng a kêşana hinek cureyên peyvan de bi kar aniye. Ji bo tewanga gelemperî wî navê *"guherbarî"* bi kar aniye. Dema ku mirov bala xwe dide xebatên zimanzaniyê, tewang di wateyeke berfirehtir de tê bikaranîn. Tewang bi wateya xwe ya gelemperî bi mebesta nîşandana dem, kes, rawe, zayend û rewşê, guherîna teşe û dirûvê bêjeyan e. Tewanga ku di îngilîzî de jê re *"inflection/Tnflexion"* tê gotin ji bo nîşandana kategoriyên rêzimanî yên mîna dem, rawe, bang, kes, mêjer, zayend û rewşê ye. Ew jî dibe du beş;

1- Kêşana lêkeran ango *"conjugation"*
2- Tewanga navdêr, cînavk û rengdêran jî ango *"declension"*

Her wekî me diyar kir, di rêzimana kurdî de peyva *"tewang"ê* bi tenê ji bo beşa duyemîn hatiye bikaranîn. Ji ber ku di kurdî de cihê xwe girtiye, cm jî peyva *"tewang"* di wateya ku Celadet Bedirxan bi kar aniye de bi kar bînin û kêşana lêkeran jê cuda bikin. Di kurdî de armanca tewangê nîşandana rewşa navdêran e. Di kurdî de navdêr (cînavk, veqetandek, hinek rengdêr) di sê rewşan de derdikevin pêşberî mirov:

1- Rewşa xwerû (direct case)

Di vê rewşê de di bêjeyan de tu guhartin çênabe. Bêjeyên xwerû bi serê xwe nêtar in, rnêjcra wanjî dema ku bi serê xwe bin ne diyar e, lê di nava hevokê de ji lêkerê tê fêmkirin. Her wiha zayend û mêjera wan di ravekê de bi alîkariya veqetandekan tê nîşandan.

2- Rewşa banglêkirinê (vocative case)

Di vê rewşê de navdêr hinek paşgiran werdigirin û bi wan paşgiran zayend û mêjera navdêran diyar dibe. Qertafên rewşa banglêkirinê ev in: "-o *tyekjimar; nêr),* "-ê *(yekjimar, mê), "-ina" (pirjimar).*

MÎnak:

Hevalo.'
Hevalê.'
Hevalino!

3- Rewşa tewandî (oblique case)

Mijara ku em ê bi berfirehî li ser rawestin jî rewşa tewandî ye.
Di vê rewşê de bêje tûşî hinek guherînan dibin. Ev guherîn bi du awayan pêk tê; peyv hinek qertafan werdigirin an jî di nava wan de hinek deng diguherin. Bi vî awayî di hevokê de kirde û bireser ji hev cuda dibin, her wiha zayend û rnêjera wan jî diyar dibe.

Di kurmancî de tewang bi du awayan pêk tê:

1- Bêjeyên ku ditewin hinek qertafan digirin, bi vê yekê jî zayend û mêjera wan tê fêmkirin.

Qertafên tewangê:

I-ê/: Bi alîkariya vê qertafê, navdêr, cînavk û veqetandekên mê têne nîşandan.

Navdêr:

Darê nebire.
ZÛ1ê porê xwe şeh kir
Berzan sêvê dixwe.

CInavk:

(E)wê ez ditim.
Ez (e) vê
naxwazim. Kîjanê li
te xist?

/-î/: Mirov dikare bi vê qertafê jî navdêr, cînavk û veqctandekên nêr nîşan bide.

Mînak:

Navdêr:
Hesenî gûz anin.
Ez nanî dixwim.
Ez hevalî dibînim.

Cînavk:

Ez (e)wî dibînim.
(E)vî karê xwe nekiriye.
Kîjanî got?

/-an/: Bi alîkariya vê qertafê mirov tewanga navdêrên pirjimar pêk tîne.

Mînak:

Navdêr

Ez hevalan dibînim.
Gundiyan qesrek lêkir.
Ji textan deriyek çêkir.

Cînavk:

Ez (e)wan nabînim.
Kîjanan ev kar kir?
Çendan nan nexwariye'!
Hinekan ev qeşmerî kiriye.

Tewanga qertafên nebinavkirinê

Di kurmancî de ne tenê navdêr û cînavk, qertafên ncbinavkirinê *"-ek"* û "- *in"* jî ditewin ango qertafên tewangê werdigirin û dibin *"-ekê"* (yekjimar / mê), *"<ekî"* (yekjimar / nêr) û *"<inan"* (pirjimar).

Qertafa nebinavkirinê ya bêjeyên nêr "-ekî"

Hevalekî ji min re got.
Dostekî ev qencî bi min kir.

Qertafa nebinavkirinê ya bêjeyên mê "<ekê"

Gulekê bide min.

Sêvekê bixwe.

Qertafa nebinavkirinê ya bêjeyên pirjimar "sinan"

Hevalinan Îşev geleki xebat kir.

Ez dêji bo malê darinan bînim.

2- Li hin herêman kurmanc navdêrên nêr bi awayekî din ditewînin. Heke di wan bêjeyan de dengên *"e"* û *"a"* hebin, ji wan her du dengan *"a",* "e"ya kîte ya dawîn a bêjeyê bi dengê *"ê* "yê tê guhartin. Li van herêman bêjeyên ku tê de *"a"* û *"e"* nîn bin, navdêrên nêr nayên tewandin.

Bozên nan xwar.

Berzan çû ber

pêz. Eyşan çû ser

xêni.

Apê min ji bajêr hat.

Si vên pez çêrand.

Rêgeza tewangê: Di lêkerên gerguhêz de jibo veqetandina kirde û bireseran, navdêr, cînavk û qertafên nebinavkirî ditewin. Tewang di hevokê de li gorî demê diguhere. Di dema niha û dema bê de kirde (subje) xwerû ye, bireser ditewe. Di demên borî de berevajî vê yekê ye, îcar bireser xweru ye, kirde ditewe.

Girtin:

Gul diyariyê digire.

Gul dê diyariyê bigire.

Gulê diyarî girt.

Gulê diyarî girtiye.

Bozan dêrî digire.

Bozan dê dêrî

bigire. Bazên derî

girt.

Bazên derî girtiye.

Bozan deriyan digire.

Gul diyariyan digire.

Jinan derî girtin.

CUREYÊN BÊJEYAN

Di hevokê de peyv li gorî peywira ku pêk tînin, ji hev vediqetin. Di kurmancî de deh cureyên bêjeyan hene: *"Navdêr* ". *"veqetandek* ", *"rengdêr (hevalnav)* ", *"CÎnavk* ", *"lêker* ", *"i imarnav* ", *"hoker (hevalkar)* ", *"daçek* ", *"gihan ek* "û *"baneşan* ".

Veqetandek

Di kurmancî de du peyv bi alîkariya hinek qertafan bi hev ve têne girêdan ango têne îzafekirin, ji wan qertafan re veqetandek (zêder) tê gotin. Bi riya veqetandekê tiştek ji yên din ji aliyê zayend û mêjerê ve tê veqetandin, jiber vê sedemê ji wan qertafan re veqetandek hatiye gotin. Yanê di dema ravekê (îzafe) de mirov zayend û rnêjera bêjeyan jî nas dike.

îro her çi qas veqetandek bi gelemperî wekî qertaf derdikevin pêşberî mirov jî, ew wekî morfemên serbixwe têne pejirandin. Dema mirov baş lê dikole, mirov rasterast têkiliya wan bi cînavkên kurdî re dibîne. Dema ku ew bi tena serê xwe tên bikaranîn, cihê nav dêrê digirin. Bo nimûne, di vê gotûbêjê de

- Ev pirtûka kê ye?

- Amin e.

Di bersivê de veqetandeka *"a"* yekser cihê pirtûkê digire. Celadet Bedirxan jî li ser binyada veqetandekan ev nirxandin kiriye:

"Şaneka tarîxî

Gramêra jrensizi dibêje ko zmanêfrensizî veqetandekên xweji pronaveke latînî girtine. Gelo me yên xwe, ev bêjeyên hûr, ji kû gir-

tine? Li gora tedqîqatên ko heta niho min çêkirine, me Jî veqetandekên xwe ji hin pronavan girtine, lê ne ji pronavine biyanî, ji pronavine xwe. Belê, veqetandekên me yên binavkirî ji pronavine me ên işarki bi der hatine. Herwekî pêşdetir dê bête gotin, "yê, ya, yên" pronavine işarki ne û veqetandekên me ên binavkirî ji wan hatine pê. Di esl û bingehî de gava ev pronav diketin pêşiya navderêkê û dibûn rengdêrine îşarkî "di "yek dikete navbera wan û navdêrê. Mesela gotina "Hespê Soro" di eslê xwe de "Hespê di Soro" ye. (Elfabêya Kurdi ıîBingehên gramera kurdmancî, r. 68)"

Di kurmancî de ew veqetandek dibin du cure; yên binavkirî û yên ncbinavkirî:

Veqetandekên binavkirî

I-ê! yekjimar û nêr:

Hevalê min hat.
Gundê me li ber behrê ye.
Xaniyê wan çarqatî ye.
Birayê min te baş nas
dike.
Deriyê me ji te re her tim vekirî ye.
Apê min duhji bajêr hat.
Kalikê teji Amedê hatiye.

!-al yekjimar û mê:

Hevala min hat.
Xwişka min çû bajêr
Dayika wîjê hez dike.
Meta min li vê taxê
ye. Dara gûzê hişk
bûye. Ava kaniyê
diherike.

I-ênl pirjimar:

Hevalên min hatin.
Çavên wî *reş in.*
Pirtûkên min pir in. Tiliyên
wî qerisîne. Guhên kalikê
wi ker bûne.

Veqetandekên nebinavkirî

Celadet Bedirxan qertafên *"-elC'* û *"-in"* ku wateya nenasiyê didin bêjeyan wekî *"veqetandekên nebinavkirî'* bi nav kirine. Lê her wekî wî bi xwe jî destnîşan kiriye, di kunnanciyê de navdêr dema ku bi tena serê xwe bin binavkirî ango nas in. Ew bi alîkariya qertafên "*ek"* û *"-in"* dibin nebinavkiri. Her wiha ew qertaf paşê veqetandckên binavkirî digirin û dibin veqetandekên nebinavkirî. Her wekî diyar e, ev qertafa *"-ek"* bingeha xwe ji cînavka nebinavkirî *"yek"ê* werdigire. Her wiha bingeha qertafa "-in"ê jî cînavka nebinavkirî *"hin"* e. Lewma jî qertafên *"-ek"* û *"-in"* bi xwe ne veqetandek in, qertafên nenas iyê ne.

Bi kurtasî cm dikarin bibêjin ku veqetandekên nebinavkirî her yek di bingeha xwe de ji du hêmanên cuda pêk hatiye. Wate; qertafên *"-ek"* û *"-in""* qertafên nebinavkirinê ne, dema ku ew veqetandekên binavkirî *"o", "ê"* û *"ên"* digirin, dibin *"-eka", "-ekê", "<inên",* bi vî awayî jî ravekê pêk tînin ango dibin veqetandckên nebinavkirî. Lê belê ev dirûvê wan ₔ resen îro her çi qas di hinek devokan mabe jî, di zimanê nivîskî de bi rengê *"<eke", "ekî"* û *"ine"* tê bikaranîn. Her wiha heman qertafên nebinavkirî *"-ek"* û *"-in"* qertafên tewangê *"<î", "-ê"* û *"<an"* werdigirin û dibin *"<ekî", "<ekê"* û *"<inan",*

Mînak:

I-ek/: hevalek, gûzek, darek. mirovek, tiştek, keçikek. .. /-
in/: *hevalin, gûzin, darin, mirovin, tiştin, keçin, stranin ...*

Her wekî tê zanîn mirov li şûna *"hevalin"* dikare bibêje, *"hin heval"* jî. Ji al iyê wateyê ve tu cudatî di navbera her du gotinan de nîn e. Ev her du qertaf dema ku veqetandekên binavkirî "<ê", "_a" û "-ên" digirin, dibin veqctandekên nebinavkirî.

Dirûvê resen	*Dirûvê guhartî*
/-ekal *(mê û yekjimar)*	/-ekel *(mê û yekjimar)*
I-ekê/ *(nêr l yekjimar)*	/-ekî/ *(nêr û yekjimar)*
I-inênl (pirjimar)	/-ine/ *(pirjimar)*

Mînak:

/-eke/:	/-ekî!:
guleke sor	*xaniyekî*
dareke sêvê.	*biçûk.*
maleke li pala gund. şûneke xweş.	*deriyekî fireh. çiyayekî bilind. darekî stûr..*

/-ine/ pirjimar:

Hevaline min ji gund çûn. Maline taxê hilweşiyan. Darine baxçeyê me hişk bûne. Guline baxçeyê me geş bûne. Saline dirêj derbas bûne.

NAVDÊR

Navdêr ango nav tiştekî bi mirov dide nasîn, ew tişt dibe ku tiştekî giyanewer be yan jî ne giyanewer be; her wiha dibe ku tiştekî razber be yan jî şênber be; ew tişt dibe ku serenav be yan jî hevenav be. Hin caran jî dibe ku navê komelî be. Mirov dikare navdêran wiha dabeş bike:

1- Li gorî mêjera xwe navdêr

a- Yekjimar

Di kurmancî de navdêrên yekjimar dema ku xwerû bin, nêtar

in.

Di dema ravekê de zayenda wan diyar dibe. Dema ku binavkirî bin tu qertafan nagirin, lê dema ku nebinavkirî bin, qertafa *"-e~'* digirin. Wekî dinjî yekjimariya navdêran bi alîkariya tewang û veqetandckê tê nîşandan. Ligel yekjimariya navdêran zayenda wanjî diyar dibe.

MÎnak (veqetandek):

Meta min hat.
Bavê min çû
zozanan. Xw iş keke
min heye. Birayekî
wê hatiye.

Mînak (tewang}:

Gulê biçîne.
Dêrî veke.
Gulekê bide
wê.

b- Pirjimar

Di kurmancî de ji bo diyarkirina pirjimariya navdêrên xwerû tu qertaf nîn in. Lewre jî dema ku navdêr bi serê xwe be, pirjimar nabe.

Mêjera navdêrên xwerû di hevokê de di bi alîkariya lêkerê tê nîşandan.

Mînak:

Zarok hat.
Zarok
hatin.

Wekî din mêjera navdêran bi alîkariya tewang û veqetandekê diyar dibe.

Mînak (veqetandek):

Xwişkên min dilovan in.
Mirovine baş hatin mala me.

Mînak (tewang):

Gulan av bide.
Hevalinan bîne
malê.

c- Komenav

Ev cure navdêr komekê nîşan didin, tevî ku bi xwe piraniyekê di nava xwe de dihewînin jî, lê wekî yekjimar têne pejirandin. Bo nimûne *"gef".* Dema em dibêjin, *"gelê min",* em qala pir kesan dikin, lê navdêr bi xwe yekjimar e, ji bo ku em vê peyvê bikin pirjimar divê qertafên pirjimariyê pê ve bikin. Her wiha dema ku em dibêjin *"netewe"* jî heman tişt pêk tê. Ji bo zelalkirina mijarê em çend mînakên din jî bidin.

Mînak: gel, netewe, pez, naxir; şênî, artêş, garan, ...

2- Li gorî hestpêkirinê navdêr

a- Navdêrên şênber: Navên heyberên ku mirov dikare bi pênc lebatên sehekê (dîtin, bihîstin, çêştin, bêhnkirin û pêlandin) hebûna wan pesend bike, şênber in.

Mînak: dar, çiya, kevir, serheng, îsot, sar inc, tevşo, pîvaz, mêr, jin, hesp. das, hes ti, kûsi, kêrguh, gustîl, bazin, hesin, gelî, newal, sosin. ..

b- Navdêrên razber: Hebûna wan cure navdêran nayê rabihîstin, lê ji hebûna wan tê bawerkirin. Ew tiştên hestî ne.

Mînak: evîn, bawerî, rûmet, xem, tirs, hiş, azadî, aramî, daxwaz, hêvî, dem, helwest, qencî, guneh ...

3- Li gorî taybetiya heyberên **ku** nîşan **didin**

a- Serenav

Ew cure navdêr e ku yekta ye, li ser rûyê cîhanê jê yek heye. Serenav di nava hevokê de, bi tîpa girdek dest pê dikin. Bi hinek xweseriyên xwe ji yên din vediqetin.

Mînak: Ferat, Zap, Êzdîn, Gulistan, Şêr go, Neteweyên Yekbûyî, Partiya Civaka Azad, Tirkiye, Rojnameya Welat, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Agirî, Sêrt ...

b- Hevenav

Ew cure navdêr in ku navê komekê ye ku ew kom ji ber hin taybetiyan di bin wî navî de gihîştine hev. Dema mirov dibêje *"dar",* heyberek tê ber çavên mirov. Ji ber hin taybetiyên wê, ew nav lê hatiye kirin, lê gelek cureyên *"dar"ê* hene, wekî *"sinc", 'Wi", "spîndar"* û hwd. Ew jî di bin sîwana hevenava *"dar"* de hevenavên din in. Hevenav di nivîsandinê de ji bilî destpêka hevokê bi tîpên hûrdek dest pê dikin.

Mînak: çiya, hirç, mar, das, hesin, giya, kulîlk, xanî, rastkêş, depreş, pênûs, jêbir, lênûsk, tembûr, kevan ...

Peyvsaziya navdêran

Ji aliyê peyvsaziyê ve navdêr ji hev cuda dibin. Hinek ji wan, xwerû hinek jî ncxwerû ne. Heçî yên nexwerû ne, hinek ji wan pêkhatî û hinek jî hevedudanî ne. Her wekî di mijara cureyên peyvan de hate gotin, navdêrên xwerû jî jihev nabin, ên pêkhatî bi alîkariya paşgir, pêşgir û navgiran pêk hatine, yên hevedudanî jî ji çend hêmanên serbixwe pêk hatine.

Navdêrên xwerû

Navdêr kuji hêmaneke tenê pêk hatine, navdêrên xwerû ne.ji bo dikare wekî navdêrên sakar jî bi nav bike, navdêrên xwe dema ku parçe bibin, wateya xwe ji dest didin.

Navdêrên xwerû: aş, nav, meh, roj. kes, temen, tav, tas, kum, ker, şev, kul, dev, lêv, sêv, rav, mar, dal; ser, ax, zevî, cot, berx, bext, rext, ceng, kon, mal, gel. ..

Navdêrên nexwerû

Navdêrên nexwerû ji bilî navdêrên xwerû hemû cure navdêran digire nava xwe. Mirov dikare navdêrên nexwerû wekî navdêrên hevedudanî, pêkhatî û kompleks dabeş bike. Ji ber ku navdêrek dibe ku hem hevedudanî, hem jî pêkhatî be; navdêreke hevedudanî dikare qertafan wergire. Her wiha navdêreke pêkhatî jî dibe ku bi peyveke din re bibe yek û navdêreke nû pêk bîne. Mirov dikare navdêrên bi vî rengî wekî navdêrên kompleks bi nav bike.

Navdêrên hevedudanî: Avaşîn, heftreng, keybanû, dotmam, dotmîr; pisxaltî jinti, marmasî, dûvpişk, kêrguh" avdev, destav, germav, beroş, serêş, serçav. birazavajtnbira, kurap, destbira ...

Navdêrên pêkhatî: aşvan, mehanî, kesayetî, nanxur; ker van, şevger, rojî, tevger; kêrî, derî, bivir, koling ...

Navdêrên kompleks: keskesor, serêşî, dûvmeqesk, şevşevok, rojnamegerî, nûçegihanî.:

Qertafên navdêrsaz

Pêşgirên Navdêrsaz

/zir-/: Tiştê derewîn nîşan dide û ji navekî navekî nû çêdike.

Mînak: zirbav, zirçen, zirtilî, zirgizêr; zirdest, zirdiran, zirberaz, zirhinar; zirtivir; zirkar, zirbira ...

/kele-/: Ew jî derewînbûna tiştekî nîşan dide ûji nav û rengdêran navekî nû pêk tîne.

Mînak: keleş êr (dîk), kelepij, kelezûr, kelemamik, kelerim, kelebab, kelevajî. ...

Iman-/, *Ima-I, /mê-/:* Ev pêşgir hin caran wekî ma û mê jî derdikeve pêşberî mirov, peyva *"mak"* ango dayikji vir tê. Di kurmanciya nûjen de *"mak"* jî hêdî hêdî rengê pêşgirekê digire. Ev pêşgir ji bo nîşandana tiştên mêza tê bikaranîn.

Mînak: manga, man ker, maker, makezagon, makeşar; makeşêr. makeziman. makurk, makmij, mêkew, mêkund. ..

Her wekî me di mijara peyvsaziyê de jî diyar kir, gelek caran hokerên mîna *"ser-", "bin-", "ber-", "nav-"* û daçekên mîna *"hi"* û *"hê"* û *"ne-"* jî karê pêşgiran pêk tînin.

!bi-/: *bikir; bivir, bikuj ...*
!ne-/: nexweş. neyar. ..
!ber-!: *berdest, berbang, berêvar; bermal*
... !bin-!: *binkirask, bincilk, binzik ...*
!ser-!: serbaz. serheng, serçavi.:
!nav-!: *navmil, navmal, navçav ...*

Navbend û navgirên **ku** navdêran pêk

tînin *lal:* Ev navgir **ji** lêkeran nav çêdike.

Ji weşinê weşan
ji xebitîne xehat
ji filitînêfelat
ji hewînê hewan
ji qewimînê qewam

le/: Ev navbend dikeve navbera du navdêran an jî navdêrek û rengdêrekê, wan digihîne hev û ji wan navekî nû pêk tîne.

Mînak: kurtenivîs, dare bî, kalemêr. jinebî, keskesor. zirtemêr. şengebî, kurtepist ...

Paşgirên navdêrsaz

Di kurdî de paşgirên ku navdêran pêk tînin gelek 10. Em ê hinekên ku pif têne bikaranîn, li vir bidin.

I-îl ji navan navan çêdike.

Mînak: kêrî, kerî, derî, serî, şênî ...

Ji nav û rengdêrekê navekî razber pêk tîne.

Mînak: bilindî, sorî. keskî, sewzÎ, çakî, delalî, hevalî ...

Paşgirên /-ayîJ, /-ahîJ, /-awîJ, */-tîl,* /-îtîJ, /-ao/ û /-înîJ ji navdêrên şênber ên razber pêk tîne.

/-ayî/, /-ahîJ, /-awî/:/ Ev her sê paşgir ji bingehekê tên, dengên *"y", "h"* û *"w"* dengên alîkar in, lewre jî em ê wan bi hev re hilgirin dest.

Mînak: sînahî, ewrawî, keskayi ...

/-tÎ/, /-îtî/, /-atî/: Ev her sê paşgir jî têkildarî hev in.

Minak: kurdîtî, mirovatî, hevaltf...

I-îni/: Ev paşgir ji navdêr û rengdêran navdêreke din çêdike

ango
ji tiştekî mefhûma wê çêdike.

Minak: biçûkîni, kurdînî, birayînî ...

/-çe/ ji navekî navekî din pêk tîne, wateya biçûkiyê dide navdêrê.

Mînak: baxçe, xalîçe, deryaçe, na/çe, xwençe, derîçe, navçe ...

/-ik/ ji navdêr û rengdêrê nav çêdike. Dema ji navekî yekî din çêdike, yê berê biçûk dike. Hin caran ji bo nîşandayina delaliya tiştekî jî tê bikaranin.

Mînak: sorik, kêrik, tûrik, berik, darik, karik ..

Paşgirên ku navên cihan pêk tînin

/-xane/: *girtîxane, dermanxane, pirtûkxane ...*
/-geh/: *dezgeh, dergeh, çêregeh, dadgeh, bergeh ...* /-istan/: *gulistan, moristan, şaristan, goristan, daristan ...*

Paşgirên ku navên alavan çêdikin

/-ing/ Ji rayeka dema niha ya lêkerê navê alayekê çêdike.

Mînak: Koling (tevir), bêjing (ji bêjtinê). tewang (ji tewandinê), rêjing (ji rêjtinê) ...

Ev paşgir j i hinek rengdêr û navdêran navdêreke nû pêk tîne. *Mînak: soring, rojing, daring, êzing, giring, ziving* ...

Ev paşgir di hin peyvan de wekî *"eng",* di hin peyvan de jî wekî *"Îng"* û *"ng"* derdikeve pêşberî mirov.

Mînak: kereng, xweyîng, birang, şaheng ...

I-ekl Ev paşgir ji rayeka lêkerê ya dema niha ûji navdêrekê navê alavekê çêdike.

Mînak: birek, badek, pêçek, serek, piştek, xurek. ..

/-dank/ Ji navekî navê alavekê pêk tîne. Ev paşgir bi xwe wekî paşgireke hevedudanî xuya dike. Dibe ku ji *"dan"* û "/C'yê pêk hatibe.

Mînak: Kildank, derzîdank, xwelîdank, guldank, kewdank, kardank, mizdank, çaydank. ..

Heman pa~gir di mînaka *"kadin"* de wekî /-dînl derdikeve pêşberî mirov, lê di zaravayê soranî de *"kadan "* e.

/-ar/: Ev paşgir ji navdêran navdêreke nû pêk tîne. Her wiha hin caran jî ji rayeka lêkeran navdêrê pêk tîne.

MÎnak: girar. guhar, cotar, mirar. kirar ...

Hin paşgirên **din ên ku** navan çêdikin

I-al/: *heval. delal . .*
/-ak/: *civak, birak . .*
/-anî/: *mêranî, jinanî, dostanî. ..*
/-asi/: kêmasî, tengasî (j i rcngdêrê navan çêdi ke)
... /-k/: *binkirask, berçavk, cinavk ...*
I-or/: kilor, gilor ...
/-bat/: *malbat, sazbat ...*
/-de/: diyarde, *talde ...*
/-e/: deste, bêje, rêje. beste, şane, xane ...
/-inc/: Ev paşgir ji rengdêr û navdêran navekî nû pêk tîne.

Mînak: sarinc, qolinc, gazinc ...

I-Ian/: Wateya cih û hêlînê dide bêjeyê

Mînak: kundelan, dûvelan, mîzelan, berdelan ...

I-ok/: Ev paşgir jî wateya xweşkok iyê çi biçûkbûnê dide navdêran.

Mînak: *kuçkok, xw iş kok, gundok, xecok, şemamok, tîrok ...*

/-menĬ/: *çapemenî, şilemenî, teqemenî, sotemeni, xurdemeni.:*

Ev paşgireke zaravayê soranî ye, van salên dawîn ketiye nav kurmancî ıî bi berfirehî tê bikaranîn.

Zayendên navdêran

Di kurmancî de du cure zayend hene. Cureyê yekem di hemû zimanan de heye ıî zayenda biyolojîk e. Ji mirov û ajalan hinek nêr in ıî hinek jî mê ne. Zayenda duyemîn jî ya rêzimanî ye. Di kurmancî de ji bo navdêrê zayendek heye.

Zayenda biyolojîk

Ev cure zayend di hemû zimanan de heye. Her wiha di kurdî de jî heye. Her wekî me li jor jî destnîşan kir, ji ajal ıî mirovan hinek nêr in, hinek jî mê ne. Zayenda hin giyaneweran jixweber tê zanîn.

	Mînak:
Mê	*Nêr*
keç	*kur*
jin	*mêr*
mehîn	*hesp*
xwişk	*bira*
met	*ap*
dayik	*bav*
xaltî	*xal*
mirîşk	*keleşêr*
diş	*bûra*
bûk	*zava*
xesû	*xezûr*
mih	*beran*
bizin	*nêrî*
çêlek	*ga*
dotmam	*pismam*

Mînak: *kuçkok, xw iş kok, gundok, xecok, şemamok, tîrok ...*

/-menĪ/: *çapemenî, şilemenî, teqemenî, sotemeni, xurdemeni.:*

Ev paşgireke zaravayê soranî ye, van salên dawîn ketiye nav kurmancî ıî bi berfirehî tê bikaranîn.

Zayendên navdêran

Di kurmancî de du cure zayend hene. Cureyê yekem di hemû zimanan de heye ıî zayenda biyolojîk e. Ji mirov û ajalan hinek nêr in ıî hinek jî mê ne. Zayenda duyemîn jî ya rêzimanî ye. Di kurmancî de ji bo navdêrê zayendek heye.

Zayenda biyolojîk

Ev cure zayend di hemû zimanan de heye. Her wiha di kurdî de jî heye. Her wekî me li jor jî destnîşan kir, ji ajal ıî mirovan hinek nêr in, hinek jî mê ne. Zayenda hin giyaneweran jixweber tê zanîn.

	Mînak:
Mê	*Nêr*
keç	*kur*
jin	*mêr*
mehîn	*hesp*
xwişk	*bira*
met	*ap*
dayik	*bav*
xaltî	*xal*
mirîşk	*keleşêr*
diş	*bûra*
bûk	*zava*
xesû	*xezûr*
mih	*beran*
bizin	*nêrî*
çêlek	*ga*
dotmam	*pismam*

Hinek navdêr jî hene bi xwe nêtar (notr) in, lê zayenda wan bi alîkariya hin peyv û qertafan diyar dibe. Mirov dikare bi alîkariya peyvên nêr û mê zayenda wan diyar bike. Wekî *hirçê nêr/ hirça mê, kewê nêr! kewa mê, pisîngê nêr! pis înga mê ....*

Her wiha hinek peyv û pêrkîtên ku bi mebesta diyarkirina zayendê tên bikaranîn hene. Wekî *dêl, mak, man, mê, nêr, pis, dot.*

Mînak: *dêlegur, nêrekew, mêkew, manga, maker; pismam, dotmam, jinbira, jinap ...*

Zayenda hinek peyvên nêtar jî bi riya tewang û veqetandekê diyar dibe. Bo nimûne heval peyveke nêtar c, mirov di nava hevokê de bi riya tcwang û veqetandekê zayenda wê nas dike.

Mînak:

Hevalê gOL.
Hevalekê got.
Hevala min.
Hevaleke min.

Ji van hevokan mirov fêm dike ku ew heval jin e. Lê dema me got,

Hevalî (hevêl) got.
Hevalekî got.
Hevalê min got.
Hevalekî min got.

Wê gavê tê zanîn ku mirov qala hevalekî mêr dike.

Zayenda rêzimanî

Cureyê duyemîn ê navdêran di binyada xwe de ne xwediyê tu zayendê ne, lê kurmancan ew wekî nêr anjî mê diyar kirine. Lewre jî hinek zimanzan wê wekî "zayenda derewîn" jî bi nav dikin. Zayenda van navdêran bi riya tewang û veqetandekan tê nasîn. Divê neyê jibîrkirin ku zayenda siruştî (biyolojîk) jî bi riya tewang û veqetandekê tê nimandin.

Her wekî tê zanîn peyvên mîna *"kevir, dar, xanî, behîv, sêv, pênûs,*

pirtûk, qeşa, derî, kêrî, tîr, çek, al, kerî, gul, kul, gel, wefat, gelî, çiya, mijar; bext" di rastiya xwe de ne xwediyê tu zayendê ne. Lê di kurmancî de hinek ji van mê ne, hinek jî nêr in. Ji van peyvan *"xani, derî, kerî, bext, welat, gelî, çiya"* nêr in, lê bêjeyên *"behîv, sêv, pênûs, pirtûk, qeşa, tir, çek, al, gul, kul, mijar"* mê ne.

Bi riya** tewangê **zayenda bêjeya nêr:

Xênî
bişo. Dêrî
veke.
E:. ê vî bextî çi bikim?
Wî kerî bîne.
Ez dê herim welêt.
Ji çiyê dake te
xwarê.

Bi riya** tewangê **zayenda bêjeyên mê:

Dara behîvê hişk
bûye. Gelo tu sêvekê
naxwî? Wê pênûsê
bide min. Wê qeşayê
bihelîne.
Bi lirê hevîr vekir.
Birayê min çekê
dikire. Wê alê rake.
Neyaran xaniyê me hilwesand.
Jiyan mina gulekê xweş e.
Te heta roja iro deriyê mala me
venekiriye. Şiyên keriyê pez bire nin darê.

Bi riya** veqetandekê **zayenda bêjeyên nêr:

Gelo çima bextê min wiha reş e?
Kê welatê me xiste vê rewşê!
Bûyera Geliyê Zîlan çi ye!
Çiyayê welatê me pir bilind in.

***Zayenda navdêrên mê bi riya** veqetandekê:*

Sêva sor ji gişan xweştir e.
Pênûsa te bi kêrî nivîsandinê nayê.
Pirtûka xweji bo çend rojan bide min.

Qeşaya li ser banî paqij bike.
Dayika min fira xwe dixwaze.
Dengê çardexura te em
tirsandin. Ala her welatî bi
rengekî ye.
Tu di baxçeyê jiyanê de guleke sor
Kula dilê te pir giran e.
Mijara vê pirtûkê çi ye?

Li ser navdêrên ku di binyata xwe de ne xwediyê zayendekê ne, rêz û rêzikek tune ye. Lewre jî zayenda wan tê jiberkirin. Ev yek ne tenê ji bo zimanê kurdî wisa ye.ji bo zimanên din ên mîna fransî, almanî jî wisa ye. Kesên ku hînî van zimanan dibin divê zayenda bêjeyan jî ji ber bikin. Di ferhengan de li ber bêjeyan ligel cureyê wan, zayenda wan jî tê nivîsandin.

Divê bê gotin ku di kurmancî de li ser zayenda hinek peyvan dubendî heye, li hin herêman peyvek mê ye, li yeke din nêr e. Bo nimûne, peyvên mîna *por, erd, tişt, wext, hefte, rih û hwd.* li hin herêman wekî mê, li hinekên din jî wekî nêr tên bikaranîn. Ji bilî vê yekê hin peyvên hevreng bi alîkariya zayendê ji hev cuda dibin. Wekî bêjeya *"dar"* dema ku *"dara fer"* be, mê ye, lê dema ku tê birîn dibe *"darê hişk",* dibe nêr.

Ji ber ku ji bo diyarkirina zayenda rêzimanî rêgezek tune, hinek zimanzanên kurd lîsteya tiştên nêr û mê daye.

Navdêren nêr

1) Hemû hevenav û serenavên giyanewerên nêr.

MÎnak: Azad, bav, xal, bira, ap, pisman, xezûr; zava, Gurgîn

... 2) Hejmara yek ne tê de hemû jimarnav.

MÎnak: duyê şevê, çarê adarê, şeşê êvarî, sedê min ...

3) Navên rengan dema wekî navdêr bên bikaranîn.

MÎnak: zerê gûzan, sorê sêvan, keskê tari, şînê behrê

....

4) hirî, liva, hêk, lorik, toraq ne tê de, hemû berên ku ji sewalan bi dest dikevin.

Mînak: *goştê mirîşkan, çermê maran, dohnê goştî, dûvê mihan, hingivê Dêrsimê, şîrê mihan, mastê me, dewê birûn, firoyê çêlekê, toyê mastî, rûnê nivişk. ..*

5) *Cîwa* ne tê de hemû navên metalan nêr in.

Mînak: *zêr, ziv, hesin, sifir, pola*

6) *şemamok* ne tê de hemû berên bîstên. ***Mînak:*** *zebeş, petêx, qiti, kundir, ..*

Navdêrên mê

1) Hemû hevenav û serenavên giyanewerên ku zayenda wan mê ye, mê ne.

Mînak: *Zîn, Zelal, xwişk, xesû, dê, bûk, diş, dotmam ...*

2) *Kon, xani, axur* ne tê de, hemû navên cih û wargehan mê ne.

Mînak: *jûr; qonax, hêwan, km geh, hewş, dêr, mizgeft, nivîsgeh, gom, ..*

3) Makîneyên ragihandinê mê ne.

Mînak: *erebe, balafir; firoke, kelek, keşti, kamyon, otobûs, ducerxe, ..*

4) *Ezman û ewr* ne tê de hemû heyberên fezayî û qewmînên atmosferî mê ne.

Mînak: *heyv, stêrk, zipik, xusî. pûk, babelîsk, hahoz ...*

5) *Garis, genim, ceh, tirî* ne tê de, hemû navên celebên beq leyan, fêkî û sewzeyan mê ne.

Mînak: *hinar, sêv, bîhok, guhij, xox, mewîj, pîvaz, livir, kartol, bacan, firengî. ..*

6) Serenavên cografîk hemû mê ne.

Mînak: *Ewropa, Mêrgahmed, Amed, Dêrsim, Rûsya ...*

7) *Gund, bajar, welat, erd, çiya, zozan, çem, delav, gil; zinar, kendal* ne tê de hemû navên cografik.

Mînak: bîr. gol, tengav, kendav, newal, parzemîn, cihuk, kanî, herêm, deva ..

8) Amûrên muzîk û bûroyê giş mê ne.

Mînak: def, dahol. bilûr, mase, kursî, daktîlo ...

9) Lêker dema wekî navdêr tên bikaranîn giş mê ne.

Mînak: hatina min, çûna te, xwarina baş, dîtina wt...

10) Navê roj, meh û salan, danên rojê giş mê ne.

Mînak: Duşemi, avrêl, roj, hefte, meh, berbang, navroj, êvar. ..

11- Navdêrên ku bi paşgirên mîna "-î", *"<hî", "<ahî", "<atî",* "-*yeû", "-înî', "-tî'* giş mê ne.

MÎnak: *mêraniya •. vi, mêvandariya wan. firehiya malê, kêmasiya hevalan, hevaltiya hin kesan, mamostetiya wî. ..*

Mirov nikare bibêje ku ev lîs te tekûz e, dibe ku hinek awarteyên (îstisna) ku di vê lîsteyê de cih negirtibin hebin, ev lîste bi tenê ji bo ku fikir û ramanê bide hatiye nivisandin. Lewre jî mirov nikare vê lîsteyê wekî rênîşandêreke tekûz bibîne.

Di navdêran de mêjer

Mêjer ew tişt e ku pirjimarî û yekjimariya navdêran nîşan dide. Di zaravayê kurmancî de mêjcra navdêran bi alîkariya tewang û veqetandekan diyar dibe. Mêjera navdêrên xwerû bi alîkariya kişandina lêkeran diyar dibe.

Her wekî berê jî hatibû gotin, paşgirên ku wekî veqetandek têne binavkirin, tiştan ji aliyê zayend û mêjcrê ve ji yên din cuda dikin. Veqetandekên binavkirî *"_a"* û *"-ê"* navdêrên yekjimar û veqetandeka *"-ên"* jî navdêrên pirjimar dinimînin. Dema ku em dibêjin *"mirovê baş"* an jî *"mirova haş"* mirovek bi tenê, tê bîra mirov, lê dema yek bibêje, *"mirovên baş* ", tê zanîn ku çêlî pif kesan hatiye kirin. Bi riya veqetandekê mêjcra bêjeyan wiha tê destnîşankirin.

Veqetandekên binavkirî

/-a/: yekjimar û mê *dara*

gûzê ...
sêva sor. ..

gula geş ...
hevala baş
...

/-ê/: yekjimar lt nêr

geliyê kûr. ..
çiyayê bilind. ..
aşê avê ...
gundê me ...

I-ên/: pirjimar

darên behîvê ...
çiyayên bilind. ..
hevalên haş ...
bajarên kurdan ...

Veqetandekên nebinavkirî

Veqetandekên nebinavkirî dema ku piştî navdêran tên mêjera

wan
jî nîşan didin.

/-eke/ :yekjimar lt mê

hevaleke baş .
ma/eke mezin .
saleke dirêj.
.. rojeke
xweş ...

/-ekî/: yekjimar û nêr

hevalekî baş .
gundiyekî me .
birayekî te ..
destekî min .

/-ine/: pirjimar

hevaline baş
... sa/ine dirêj.
.. maline
mezin. ..
guline geş .
ro}mexweş .
kurine çak. ..
rûpe/ine spî.
...

Bi tewangê diyarkirina mêjerê

Di kurmancî de tewang ji bilî diyarkirina zayendê, mejera navdêrê jî nîşan dide. Di kurmancî de navdêra xwerû yekjimar e. Tewanga navdêrên yekj imar zayenda wan nîşan dide.

Minak:

Zînê av vexwar. Zînê sêv xwQI: Derwêş sêvê dixwe. Kamîran dêrî vedike.

Li vir bêjeyên ku hatine tewandin ango *"derî", "sêv", "Zîn"* yekjimar in. Pirjimariya wan bêjeyan bi alîkariya qertafa *"-an"* pêk tê.

Minak: *Derwêş sêvan dixwe. Zîn deriyan vedike. Bazirganan fêkî anîn. Mafdaran mal kirî.*

Her wiha dibe ku bi riya tewanga qertafên nebinavkirî jî mêjer bê nîşandan.

Yekjimar:

Hevalekî got. Birayekî ew anî. Xwişkekê ez dîtim. Gundekî dikire.

Pirjimar: *Hevalinan ew bir. Li gundinan dar pir in. Şivanan pez bire çolê.*

Mêjera navdêrên xwerû

Ji bilî vê di kurmancî de navdêr dema neyên tewandin an jî veqetand ekê negirin, mêjera wan bi alîkariya lêkerê tê nîşandan. Navdêrên ku pirjimar in qertafên pirjimariyê digirin, lêkerên yekjimar jî qertafên yekjimariyê digirin.

Yekjimar	*Pirjimar*
Şivên berxik anî.	*Şivên berxik anîn.*
Bavo bizinek kiriye.	*Bavo çar bizin kirîne.*
Zozanê sêv xwar.	*Zozanê sêv xwarin.*
Apo dar çand.	*Apo dar çandin.*

Mêjera navdêrên nebinavkiri bi alîkariya qertafên nenas iyê *"-ek"* û *"-in"* pêk tê.

Yekjimar	*Pirjimar*
Kevirek	*Kevirin avêtin.*
avêt. Darek	*Darin çandin.*
çand.	

Di mêjera navdêrên xwerû de alozî

Mêjera navdêrên xweru, heta ku ew di nava hevokê de neyên bikaranîn, diyar nabe, ji ber vê yekê jî hin caran astengî derdikevin pêşberî mirov. Bo nimûne, Firat Cewerî ji ber vê yekê nekariye pirtûka John Steinberk a bi navê *"Of Men and Mice (Fareler ve Însanlar)* " li gorî awayê resen bi pirjimarî wergerîne, lewre jî wekî *"Mişk û Mirov"* wergerandiye. Belkî mirov bi awayê *"A Mişk û Mirovan"* wergerîne, pirsgirêk çareser dibe. Lê her kêşeya ku ev rewş wê derdixe, wiha bi hêsanî çareser nabe.

Pirsgirêka sereke dema ku ev rewş û rêgeza ergatîvî digihêje hev pêk tê. Her wekî me di beşa crgatîviyê de jî diyar kir, di hin devokan de ergativi têk çûye, her tişt tevlihev bûye, lewrejî li şuna *"Min sêv xwarin* ", bi awayekî şaş "Al *in sêvan xwar* ", tê gotin.

Kesên ku bi van devokan xeber didin, pirî caran bi devoka xwe dinivîsin jî. Ji ber ku di van devokan de ergatîviya kurmancî têk çûye û lêker her tim li gorî kirde tê kişandin, di demên borî de gava ku kirde yekjimar be, bêyî ku guh bidin mêjera bireserê, lêkerê jî dikin yekjimar. Bi vcpêçan dema ku kirde pirj imar be dîsa bêyî ku guh bidin mêjera bireserê lêkerê dikin pirjimar.

Ji bo zelalbûna mijarê pêwîst e em çend mînakên şaş bidin û piştre jî rastiya wan.

Mînak:

Apê min û bavê min dersdariya medresên dînî dikirin ...

Divê lêker li gorî bireserê bê kişandin, li vir bireser "dersdarî" ye û yekjimar e, lê xwediyê hevokê lêker li gorî kirde (apê min û bavê min) kişandiye.

Awayê rast:

Apê min û bavê min dersdariya medreseyên dînî dikir.

Di dersan de Nûbara Ahmedê Xanî JÎ ligel hin kitêbên Kurdî dihatin xwendin.

Li vir jî nivîskar bi şaşî li şûna *"Nûbara Ahmedê Xanî", "hin kitêbên Kurdî"* wekî bireser dîtiye, lê bireserê *"Nûbara Ahmedê Xanî"ye,* diviya lêker li gorî wê bihata kişandin.

Lewre jî hevok divê wiha be:

Di dersan de Nûbara Ehmedê Xanîjî ligel hin kitêbên kurdî dihat xwendin.

Berpirsyarên Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê daxwaz ji min kirin ku ez beşdari semînereke li ser Ahmedê Xanî bim ...

Di vê hevokê de jî bireser daxwaz e û ew ji yekjimar e, lewre jî divê lêker yekjimar be, ango divê hevok wiha be:

Berpirsyarên Komeleya Niviskarên Kurd li Swêdê daxwazji min kir ku ez beşdarî semînereke li ser Ehmedê Xani bibim ...

Min hemû eserên ku li ser Mem û Zinê û Ahmedî Xanî rawestiyane xistiye nav wan.

Li vir jî bireser (eserên li ser Mem û Zînê û Ehmedê Xanî) pirjimar e, lewre jî divê lêker pirjimar be û awayê rast e hevokê eve:

Min hemû eserên ku li ser Mem lî Zinê il Ehmedi Xanî rawestiyane xistine nav wan.

Eyşe Şanêji malbata xwe rexneyên tund dîtiye.

Di vê bevokê de bireser (rexneyên tund) pirjimar e, lewre jî divê lêker pirjimar be.

Eyşe Şanê ji malbata xwe rexneyên tund

dîtine. Kurdan dengê xwe bilind kirine.

Her wiha di vê hevokê de jî tiştê ku hatiye bilindkirin ango bireser *"deng"* e, ew jî yekjimar e, ji ber vê yekê pêwîst e, lêker jî bibe yekjimar.

Kurdan dengê xwe bilind kiriye.

Ev hevokên şaş ji berhemên kesên pispor hatine wergirtin. Heta yek ji wan xwediyê berhemeke li ser zimanê kurdî ye. Ev jî nîşan dide ku aloziya di vî warî de aloziyeke cidî ye fl divê mirov li ser vî tiştî serê xwe biêşîne.

Hêjayî gotinê ye ku zaravayê kirmanckî (dimilî) xwediyê der-feteke baştir e. Lewre di vî zaravayê kurdî de navdêrên xwerû bi alîkariya qertafa "-î"'yê tên pirjimarkirin. Bo nimûne heke hevokên,

Ehmedî sêv xwar.
Ehmedî sêv xwarin
Bi kirmanckî dibin
Ehmedî say werd.
Ehmedî sayî werdî

Di devoka Rojhilat a zaravayê kurmanciya xwarê de pirjimariya hin bêjeyan bi bêjeya *"gef'* tê nimandin. Bi baweriya min kurmanc jî dikarin ji vê bêjeyê sûdê wergirin û bi vî awayî dikarin navdêrên xwerû bikin pirjimar. Jixwe ev bêjeya *"gel"* bingeha xwe ji geleka kurmancî digire.

Di hin gotinan de bêjeya *"gel"tê* bikaranîn. Hin caran ji bo nîşandana navdêrekê bi gelemperî bêjeya pirjimarkirî tê îzafekirin. Her wekî *"apanê* wf ", *"xalanê te* ". Hinek caran li şûna *"xezûranê wî", "xezûrgelanê wî"* tê gotin. Dîsa dema ku em dibêjin, *"gelî hevalan* ", *"gelî birayan* '.' em heman bêjeyê bi kar tînin.

Yekjimar	***Pirjimar***
mirov	*mirovgel*
dal'	*dar gel*
pirtûk	*pirtûkgel*
zarok	*zarokgel*

Mêjera navdêrên ku nayên hejmartin

Mêjera navdêrên ku nayêne hejmartin, ji mêjera navdêrên ku têne hejmartin cudatir e. Ev cure navdêr tim yekjimar têne hesibandin.

Mînak:

Min taştê xwar.
Min goşt kirî.
Wî av vexwar.
çay vexwar.

Ji van navdêran hinek jî tim pirjimar in. Mirov dikare di vî warî de *"simbêl"an* wekî mînak bide.

Mînak:

Mêrik simbêlên xwe badan.
Berber simbêlên min kur kirin.

Hinek caran jî pirjimariya wan navdêran bi alîkariya hevalnavên binavkirî tê kirin.

Mînak:

Min hinek goşt kiri.
Piçek av vexwar.

Hin earan jî bi alîkariya hin navgînan tên pîvan û hejmartin.

Mînak:

Min tasek av vexwaJ:
Çayger îskanek çay da wt.
Seyranê kîloyek goşt kirî.
Wan du kîlo penêr kirîn.

Di hin devokan de *"-in"* bi qertafên zayendê "-['" û *"-ê"* tên tewandin.

Minak:

Avinê hide min.
Naninî bikire.
Goştinî bixwe.
Penêrinî bîne.
TÎl-înÎ têxe selikê.

Li vir jiber ku ev navdêr nayêne hej martin, tewanga wan wisa tê tewandin. Her wekî ji mînakan diyar e, li şûna *"hinek goşt", "hinek av* ". *"hinek nan* "; *"goştinî", "avinê* ", *"naninî"* hatiye gotin.

Navdêrên binavkirî û nebinavkirî

Di kurmancî de navdêrek dema bi tena serê xwe hate nivîsandin, binavkirî ango nas e.

Dema ku mirov bibêje.

Zilam hat.
Keçik çû.
Me lawik dit.

Her wiha jî dema em dibêjin;

Min lawik dît.

Darê pelên xwe
weşandin. Gul çilmisÎ.
Keçikê porê xwe da ber meqesê.

Navdêrên di van mînakan de giş qala kes û tiştên nas ₒ binavkirî dikin.

Navdêrên binavkirî bi alîkariya qertafên nenasiyê *"<ek"* û *"-in"* tên bidestxistin.

Ji van qertafan *"-ek"* her wekî diyar e j i cînavka nebinavkirî *"yek"* tê û navdêra yekjimar dike nebinavkiri.

Mînak:

Hevalek hat.
Minji te re malek ava kir.
Bi ser xwarinê de tasek av
vexwar. Xwedê deriyek lê vekir.
Ew hi seriyek sîr nake.

Her wiha qertafa *"-in"* jî ji cînavka nebinavkirî hin tê û bêjeyên pirj imar û nenas nîşan dide.

Mînak:

Hevalîn hatin.
Wl' avin vexwm:
Me darin anîn.
Lêwik gulîn kirîn. Keçikê
pirtukin xwendin.

Gelemperîkirina navdêran

Di kurmancî de navdêr tên gelemperîkirin û bi vî awayî dibin nebinavkirî. Gelemperikirin bi vî rengî pêk tê; navdêr tê dubarekirin, gihaneka "û" dikeve navbera navdêra dubarî û tîpa "m" cihê tîpa yekemîn a bêjeya duyemîn digire.

Mînak: Tişt û mişt, kinc û mine, ser û mer, dest û mest, tilî û milî ... Digel vê rêbazê di hin bêjeyan de jî dîsa bêje tê dubarekirin, gihanek dikeve navbera wan û îcar tîpa navîn a bêjeya duyemîn bi "û"yê tê guhartin.

Mînak: Kes û kûs, naz û nûz, pars û pûrs ....

Peywira navdêran

Di nava hevokê de navdêr bi karekî dadikeve, bi gotineke din peywirekê digire ser xwe, guherînên ku di wê de çêdibin jî **li** gorî peywira ku girtiye ser xwe pêk tîne. Di nava hevokên bi lêkerên gerguhêz de navdêrek an kirde ye, yan bireser e. Heke mirov bi awayekî din bibêje, yan karê ku tê kirinji aliyê navdêrê ve tê kirin, yanjî ew kar li ser wê pêk tê. Bo nimûne dema em bibêjin *"Zozanê sêv xwar"* li vê derê du navdêr hene; navdêra serenav *"Zozan"* û navdêra hevenav *"sêv"* e. Di hevokê de *"Zozan"* kirde ye, lewre kar ji aliyê wê ve tê kirin, lê navdêra hevenav *"sêv"* bireser e, lewre ew kar tê serê wê, yanê tiştê ku tê xwarin *"sêv"* e.

Di hevokên bi lêkerên negerguhêz de navdêr dikare bibe hoker jî.

Qenco diçe Amedê.

Li vir Amed bûye hokera cih.

Gavan ji ber naxirê tê.

Li vir *"naxir"* bûye hokera cih.

Ji bo ku mirov di nava hevokê de kirdeyê bibîne, divê mirov ji lêkerê pirsên *"kî/kê"* û *"çi* "yekê bipirse, bersiva wê kirdeyê destnîşan dike.

Wekî mînak, di hevoka *"Bazên kevir avêt"* de em dema bibêjin, *"Kê kevir avêt?"* bersiva wê yekcar kirdeyê dide pêş, ew jî *"Bozan"* c. Ji bo diyarkirina kirdeya hevoka *"Azad nên (nanî) dixwe"* jî divê mirov ji lêkerê pirsa *"kî nên dixwe"* bipirse, bersiva wê jî dîsa *"Azad"* e. Ji bo diyarkirina bircserê mirov divê pirsên *"ki", "kê"* û *"çi"* arasteyî lêkerê bike. Dema ku mirov di hevoka *"Zînê av anî"* de pirsa çi arasteyî lêkera anîn bike, bersiva wê bireser ango "av" xwe dide dest. Dema di cihê wê bireserê de, mirovek hebe, wê demê, pirsa me dibe, kî, yanê dema hevoka me *"Zînê Azad anî"* be, pirsa me jî dibe *"Zinê kî anî?",* her wiha bersiva wê jî dîsa *"Azad"* c. Gava di hevokê de bireser tewandî be wekî, *"Zîn Zozanê tîne",* wê demê pirsa me jî dibe *"Tin kê tîne?* „ Her wekî tê dîtin, bersiva wê jî *"Zozan"* e.

Wekî encam, mirov dikare bi çend nimûneyan, dawî li vê mijarê bîne.

ZÎnê xanî malaşt. (Kê çi malaştî
) Soro firaqan dişo. (Kî çi dişo?)
Mazlûm/î) doz bi pêş xist. (Kê çi bi pêş xisti)
Gundiyan dar çandin. (Kê çi çandin?)

Raveka navdêran

Di ravekê de navdêr hin caran raveker û hin caran jî raveber in.

Mînak:
Bavê Zînê ...

Li vir *"Zîn"* raveker, *"bav"* raveber e, her du bi hev re raveka navdêran pêk tînin.

Destê birayê te ...

Di vê ravekê de *"dest"* raveber, *"bira"* hem raveber, hem jî ravekcr e ...

Gûzên dara apê Hesen. ..

Di vê ravekê de *"gûz"* raveber, *"dar* "hem raveker, hem ravebcr, *"ap"* hem ravcker, hem raveber û *"Hesen"* jî raveker e.

Tewanga navdêran

Jiber ku di mijara tewangê de bi awayekî gelemperî em li serê rawestiyan, em e bi berfirehî mijarê hilnedin dest. Her wekî berê jî hate gotin, bi riya tewangê zayend û rnêjera navdêrê tê nîşandan. Di hevokên bi lêkerên gerguhêz de di demên niha û bê de navdêrên bireser ditewin.

Mînak:

Gul avê vedixwe.
Zîn dê kincan
bişo.

Di demên borî de kirde ditewe.

Gulê av
vexwar. Şivên
pez anî.

Navdêrên ku li dûv daçekekê tên ditewin. Lê belê daçekên ku hokerên hevedudanî pêk tînin, navdêra piştî xwe natewinin. Her wekî *"Azad bi lez û bez çû dibistanê."*

Gulan ji darê ket.
Zarokan li Bêrîvanê xist.
Hogir li hevalan temaşe dike.

Di ravekê de raveker ditewe.

Mînak:

guliyên darê
porê dayikê
berê êş (aşî)
xwişka birayekî
dara sêvê
bûka malekê
doza mirovan
mala hevalinan

Neyîniya navdêran

Di navdêran de neyînî bi alîkariya hokera *"ne"* tê nîşandan. Ew daçek bi tena serê xwe berî navdêrê tê nivîsandin.

Mamoste:

Ez ne mamoste
me. Tu ne
mamoste yi. Ew ne
mamoste ye. Em
ne mamoste ne.
Hûn ne mamoste
ne. Ew ne mamoste
ne.

Şagirt:

Ez ne şagirt im.
Tu ne şagirt î.
Ew ne şagirt e.
Em ne şagirt În.
Hûn ne şagirt in.
Ew ne şagirt in.

Her çi qas di hin devokan de piştî navdêran *'nin'* û *'nin'* tê danîn û bi awayê *"Ez mamoste nîn im.* " neyînî tê kirin jî ew yek aloziyan pêk tîne, lewre *"nîn"* tê wateya nebûn û tunebûnê.

CÎNAVK

Her wekî ji wateya peyvê jî tê fêmkirin, cînavk di nav hevokê de cihê navdêran digirin,ji ber vê yekêjê re cînavk hatiye gotin. Di cînavkan de jî zayend, mêjer û tewang hene. Ji ber ku ew cihê navdêran digirin, taybetiyên navdêran derbasî wan jî dibin. Li gorî navdêrên ku cihê wan digirin, cînavk jî yan nêr an mê, an jî nêtar in. Her wiha li gorî navdêrên ku cihê xwe didinê, cînavk jî yekjimar an jî pirjimar in. Dîsa di nav hevokê' de, cînavkek an kirde yan jî bireser e. Di ravekê de cînavkên tewandî raveker in, cînavkên xwerû jî raveber in. Taybetiyeke sereke ya cînavkan jî tewangbariya wan e. Piraniya cînavkan ditewin û bi vî awayî cihê navderên tewandî digirin.

Wekî têbiniyekê mirov dikare rewşa cînavka vegerok *"xwe"* destnîşan bike. Di kurmancî de ev cînavk ne guherbar e. Cînavka *"xwe"* tu qertafan nagire û tê de tu guhartin pêk nayên. Ev yek hin caran di warê wateyê de aloziyan derdixe holê.

Li gorî peywirê cînavk

Di nava hevokê de cînavk carinan cihê kirde carinan jî cihê bireserê digire. Bo nimûne:

Di hevoka *„Min ew dû"* de *"min"* kirde, *"ew"* bireser e.

Di hevoka *"Ez wê dibînim"* de îcar, *"ez"* kirde û *"wê"* bireser e.

Di hevokên bi lêkerên negerguhêz de ji ber ku bireser nîn e, cînavk tim cihê kirdcyê digire.

Ew çû malê.
Ez ji gund hatim. Hûn ketin.
Ev reviya.

Di ravekê de cînavk:

bavê min
diya te
apê wî
xwişka wan

Di van mînakan de cînavk her tim ravcker e.

eza porkur
ezê reben
ewê ehmeq
ewên
qesmer

Di van mînakan de cînavk bûye raveber, lê ew giş mînakên awarte ne.

Li gorî zayendê CInavk

Cinavkên xwerû giş nêtar in, ji bo diyarkirina zayenda cînav kê divê bê tewandin, an jî veqetandekê bigire.

Jj cînavkên tewandî jî cînavkên kesên sêyemîn *"wî"* û *"wê* ", cînavkên şanidanê *"vî"* û *"vê* ", cînavkên pirsyarî *"kijanî'* û *"kîjanê",* cînavkên ncbinavkirî *"yeki"* û *"yekê"* bi zayend in, yên mayî nêtar in.

Nêr: *wî, vî, kijanî, yekî ...*

Mînak:

Wî ew xwest.
Kîjanî wisa got?
Yekî ev tişt anîn.

Mê: *wê. vê, kîjanê. yekê ...*

Mînak:

Wê keçik bir.
Vê zarok anîn.
Kîjanê ew xwest!
Yekê ew tişt kil:

Li gorî mêjerê CÎnavk

Ji cînavkan hinek pirjimar, hinek jî yekjimar in. 1 Iinek jî cihê her du mêjeran jî digirin. Bo nimûne, ji cînavkên kesane sê heb yekji-

mar, sê heb pirjimar in. Her wiha di nav cînavkên din de hinek yekjimar, hinek jî pirjimar in. Ji bo zelalkirina mijarê çend mînak:

Yekjimar: Vi, vê, wÎ, wê, ez, tu, yek, yekî, yekê, kijanê, kîjanî, ki, kê ...

Pirjimar: Van, wan, em, hûn, hin, hinekan, çaran, çendan

... Mêjera cinavkên *"ev", "ew"* ji lêkerê tê fêmkirin.

WÎ ew/ev bir.
WÎ ew/ev birin.
Te ew/ev xwar.
Min ew/ev nexwarin.
Nîşe: Ji lêkerên pirsyarî "kî" û "kê" di bingeha xwe de yek} imar in, ji bo nîşandana pirjimariyê ew tên dubarekirin.

Minak:

Kî hat'! (yekjimar)
Kî û kt hatin? (pirjimar)
Kê got? (yekjimar)
Kê û kê got? (pirjimar)

Ji aliyê tewangê ve cînavk

Her wekî me li jor destnîşan kir, cînavk cureyekî bêjeyê yê guherbar û tewangbar e. Di hevokên bi lêkerên gerguhêz de cÎ-navkên tewandî cihê navdêrên tewandî digirin. Her wekî me berê jî gotibû, navdêra ku pişti daçekê were ditewe, cînavka ku bikeve cihê wê navdêrê jî cînavkeke tewandî ye. Dîsa di ravekê de raveker her tim tewandî ye.

Xwerû: Ez, tu, ew, ev, kî, kijan, hinek, çend, yek. ..

Tewandî: Min, te, wî, ~vê, wan, van, kê, yekî/ê. çendan, çaran, hinekan. ..

Pişti daçekê cînavk

Te li min nihêrî.
Ez bi te dizanim.
Me j i wan re
got.

Em bi wî re çûn.
Min ji wê re diyariyek stand.
Xezal ber bi wê ve meşiya.
Delil bi ser wî de çû.

Di ravekê de cînavk

diya min
xelata we
hevala xwişka min
destê te
mamosteyê me
pênûsa wî pirtûkên
wê gazinên wan

Cureyên cînavkan

Piştî van agahiyên giştî, mirov dikare derbasî mijara, cureyên cînavkan bibe.

1- Cînavkên kesane
2- Cînavkên şanîdanê
3- Cînavka vegerok
4- Cînavka qertafî
5- Cînavkên kesandinê
6- Cînavkên
berbihevîn 7 -
Cinavkên lihevxistî
8- Cînavkên nebinavkirî
9- Cînavkên xwedîtiyê
10- Cînavkên girêkî
11- Cînavkên jimarîn
12- Cînavkên pirsyarî

Cînavkên kesane

Mijara heri berfireh, cînavkên kesane ye. Cinavkên kesane, di nav xwe de dibin çend bir. Pêşî mirov dikare cînavkên kesane bike du bir; *"xwerû"* û *"tewandî":*

Tewand	*Xwerû*
min	*ez*
te	*tu*
wî/wê	*ew*
me	*em*
we	*hûn*
wan	*ew*

Di nav van de *"ez* ", *"tu* ", *"ew"* cihê navdêrên xwerû yên yekjimar digirin, *"em* ", *"hûn", "ew"* cihê navdêrên xwerû yên pirjimar digirin. Li aliyê din, cînavkên *"min* ", *"te* ". *"wi/wê"* cihê navdêrên tewandî yên yekjimar, *"me* ", *"we* ". *"wan"* jî cihê navdêrên tewandî yên pirjimar digirin.

Cînavkên xwerû cihê navdêrên xwerû digirin û li ser lêkerê bandora wan rasterast e. Lêker li gorî cinavkên xwerû tê kesandin. Kesandina cinavkên xwerû bi alîkariya cînavkên kesandinê *"im", "î", "e"* û *"in"* pêk tê.

Ez
im.
Tu yî.

Ewe.
Em in.
Hûn
in. Ew
in.

Her wekî me got, lêker tim di bin bandora cînavkên xwerû de ye. Dema ku cînavka xwerû kirde be lêker li gorî kirdeyê tê kişandin, dema ku bireser be, li gorî bireserê.

Di lêkerên negerguhêz de ji ber ku bireser nîn e, di hemû deman de kirde ji cînavkên xwerû pêk te.

Mînak:

Hatin (dema niha)

Ez têm.
Tu têyî.
Ew tê.
Em tên.
Hûn tên.
Ew tên.

Ketin (dema borî)

Ez ketim.
Tu ketî.
Ew ket.
Em ketin.
Ew ketin.

Di lêkerên gerguhêz de li gorî deman cihê cînavka xwerû diguhere, lê bandora wê ya li ser lêkerê naguhere.

Dîtin (dema niha)

Ez le dibînim.
Tu min dibîni.
Ew min dibîne.
Em wê dibînin.
Hûn me dibînin. Ew wan dibînin.

DÎtin (dema borî)

Min tu dîtî.
Te ez dîtim.
Me hûn dîtin.
We ew dît.
Wî ew dîtin.
Wan em dîtin.

Di cinavkên kesane de tewang

Her wekî me berê jî diyar kiribû cînavkên kesane du kom in, komek ji wan cihê navdêrên tewandî, komekjî cihê navdêrên xwerû digire. Rêgeza ku me di mijara tewangê û di destpêka mijara Cî-navkan de gotibû, **ji** bo cînavkên kesane jî pêk tê.

Mînak:

Elî şivên (şivanî) nas nake. Ew wî nas nake.
Şivan Zînê nas nake.
Ew wê nas nake.
Şivan gundiyan nas nake. Ew wan nas nake.

Ger em demê biguhêrin, dê cihê navdêra tewandî û pê re jî cihê cînavka tewandî biguhere, ew e jî li gorî wê rewşê teşeyê bigirin.

Bazên (Bozanî) şivan nas nekir
Wî ew nas nekir.
Bozên (Bozani) şivan nas nekirin.
Wî ew nas nekirin.
Xezalê şivan nas nekir.
Wê ew nas nekir.
Xezalê şivan nas nekirin.
Wê ew nas nekirin.
Gundiyan qeraş nas nekir.
Wan ew nas nekir.

Di cînavkên kesane de zayend

Di zaravayê kurmancî de, di cînavkên kesane de zayend pir kêm bûye. Di kurmancî de roja îro di kesê yekjimar e sêyemîn de bi tenê di cînavkên tewandî de zayend maye. Di zaravayê dimilkî de di Cînavkên kesê sêyemîn e yekjimar de hem di yên xweru de hem jî di yên tewandî de zayend maye.

Di dimilkî de

O
vano. A
vana.

Lê di kurmancî de her du gihîştine hev bûne:

Ew dibêje.

Şaneke dîrokî: Dema ku mirov bala xwe dide cînavkên kirmanckî "a" ıi "o" mirov dibêje qey cînavka kurmancî "ew "cînavkeke pêkhatî ye. Cînavka "ew" Îro di hinek devokên kirmanckî de Jî heye. Dibe ku di kurdî deji bo nîşandana her du zayendan her du CÎnavk "a" û "o" anîbin ber hev û "ao" derketibe holê. Lê divê ez diyar bikim ku ev tenê pêşbîniyek e, ji bo peyîtandina vê pêşbiniyê lêkolînên qadî û hinek belgeyên kurdiya qedîm pêwîst in.

Di cînavkên kesê sêyem awayê tewandî de di kurmancî de zayend heye.

Mînak:

Wê got.
Wî ez dîtim.
Wê baxçeyekava
kir. Wî bostan av
da.
Wê av vexwar.
Wî li televîzyonê temaşe kir.

Tiştekî din î balkêş heye ku divê teqez bê gotin. Her wekî me di mijara tcwangê de da zanîn, bi riya tewangê zayend û mêjera navdêr û cînav kê tê nîşandan. Lê dema ku mirov bala xwe bide koma Cî-navkên kesane, cînavkên koma duyemîn ji bilî cînavka kesê sêyemîn roleke wan a wisa nîn e. Her wiha bi awayê ku em dizanin têkiliyeke rasterast di navbera her du koman de jî xuya nake. Yanê tu têkiliyeke rasterast di navbera *"ez"* û *"min* "; *"tu"* û *"te* ": *"em"* û *"me* "; *"hûn"* û *"we"* de nîn c. Lê digel vê yekê jî cînavkên koma duyemîn cihê navdêrên tewandî digirin.

Berî ku ez dawî li vê mijarê bînim, min divê li ser forma kevn a van cînavkan hin tiştan bibêjim. Di hin çavkaniyên kevn de û di hin hevokan de cînavkên kesane bi rengên cur bi cur derdikevin pêşberî mirov. Bo nimûne; di pirtûka D.N: Maekenzie *"Kurdish Dialect Studies-I"* de bi vi rengî derdikevin pêşberî mirov:

Koma duyem	*Koma yekem*
(e)min	*ez*
(ette	*etû*
(e)wî	*ew*
(e)me	*em(a)*
(engo), we, (e)wan	*engo/hing ewran)*

Awayê ku me li jor da, êdî rengekî standart di zimanê nivîskî de girtiye. Dibe ku hinek ji wan bi me hinekan xweş bên, ji bo yekgirtina kurmancî divê em dev ji hin tiştên xwe yên *"xweşik"jî* berdin.

Cînavkên şanîdanê

Ev cure cînavk, tiştekî nîşanî mirov didin. Wate, ev cînavk dûr ll nêzîk iya tiştekî diyar dikin. Balkêş e, di kurmancî de, cinavkên şanidanê yên bi "I!"'yê cihê nêzîk, ên bi *"w"yê* jî tiştê li dûr pêşberî mirov dikin. Cînavkên şanidanê mîna yên kesane du cure ne; yên *"xwerû"* yên *"tewandî* ". Her wiha cinavkên şanîdanê hinek *"nêr"* in, hinek *"mê"* ne, hinek *"p Îl.Jim ar* " 0 hinek jî *"yekjimar"* in,

Cinavkên şanîdanê yên xwerû

Ev cînavkên xwerû yên şanîdanê du heb in, her wekî li jor jî hate gotin, tiştê ku lê şanîdan li gorî dûrî fl nêzîkiyê **ji** hev cuda dikin. Cînavka ku dikeve dewsa tiştê nêzîk *"ev"* e, ya ku tiştê dûr dinimîne jî, *"ew"* e.

Cinavkên xwerû **ji** hêla zayendê ve nêtar in. yekjimarî fl pirjimariya wan ji cinavkên kesandinê diyar dibe.

Dema mirov bibêje: *"Ev haş e."* tê zanîn ku ev tişt, yekjimar û nêzîk e.

Dema yek bibêje: *"Et, haş in."* wê çaxê tiştên ku tên şanîdan nêzîk e, lê pirjimar c.

MÎnak:

NêZÎk (yekjimar) *Nêzik* (Pirjimar)

El' *hal.*	!:" *halin.*
Ev ki re?	*Ev ki ne!*
El' *li* \ı'î *dixe.*	*Ev li wi dixin.*
Dûr (Yekjimar)	*Dûr* (Pirjimar)
Ew hat,	*Ew hatin.*
Min el\' anî.	*Min el\' anin.*

Cînavk şanîdanê yên tewandî

Her wekî ku berê jî hatibû gotin, cinavkên şanîdanê tewangbar in fl weki navdêran ditewin. Li vir cînavkên me yên şanidanê "CI"' Û *"ew"* jî ditewin û **li** gorî zayend LI mêjcra xwe hil) qertafan digirin.

ev evî (nêr/nêzîk) evê (mê/nêzîk) evan (pirjimar/nêzik)

ew ewî (nêr/dûr) ewê (mê/dûr) ewan (pirjimar/dûr)

Piştre jî "e"ya destpêka wan ketiye, ev bûye; *"vî", "vê", "van"* û ew jî bûye *"wi"", "wê", "wan".*

Mînak:

NêZÎk	*Dûr*
Vî mala xwe bar kit:	*Wîji min re got.*
Vê trimpê/ ajot.	*Wê pirtûk xwendin.*
Van ji me re stranek got.	*Wan karê xwe nekir*

Li gorî zayendê cînavkên şanîdanê

Nêr: vî, wî
Mê: vê, wê

Li gorî mêjerê cînavkên şanîdanê

Yekjimar: vî, wî, vê, wê
Pirjimar: van, wan

Di cînavkên şanîdanê de bêjeyek heye ku wateya şanîdanê xurt dike. Ev bêje hem tê dawiya cînavkên şanîdanê hem jî tê dawiya rengdêrên şanidanê.

Mînak:

Ev ê han dibêje. Ew e han diçe.
Vê ya han ez şandim. Wê ya han dît.
VÎ yê han xwes t.
WÎ yê han got.
Ev ên han dixwazin. Ew ên han diçin. Van en han an.
Wan en han kir.

Di cînavkên şanîdanê yê xweru de jî xalek heye ku divê em li serê rawestin. Dema ku mirov bala xwe dide zimanê devkî mirov dibîne ku li dawiya cînavkên xweru yên şanîdanê, ev fl ew le/yek an jî "a"yek heye. Ango di zimanê devkî de *"eve"* û "ewe " yan jî *"eva"* û *"ewa"* tê gotin. Ev deng *"ela"* dema ku cînavkên şanidanê

yên xwerû dibin rengdêr bi navdêrê ve dibin. Her wekî *"ev mirove/a", "ev gunde/a",* lê ev dengji aliyê peywirê ve tiştekî li cînav kê zêde nake, ji gelek devokan jî veder bûye, lewre di zimanê nivîskî de cih negirtiye.

Cînavka vegerok

Di tirkî de jê re *"donûşlii zamir* ", di xebatên bi îngilîzî de jê re *"reflexive"* û di hinek xebatên bi kurdî de jî *"cînavka vegerok"* hatiye bikaranin. Ji ber vê yekê em ₑ jî bi vî rengî bi nav bikin.

Cînavka *"xwe"* ji aliyê zayendê vc nêtar e, hem cihê navdêrên mê hem jî yên nêr digire. Her wiha j i aliyê mêjerê ve jî ew cînavkeke bêlayan c. Yanê ew hem cihê navdêrên yekjimar hem jî cihê navdêrên pirjimar digire.

Pêwîst e ku mirov hinekî jî li ser peywira vê cînavkê raweste. Di hevokê de heke, kirde û bireser heman kes be, di cihê bireserê de *"xwe"* tê bikaranîn. Heke kesê ku bipeyive û kesê ku qalê tê kirin ango kirde û bireser (subje û obje) heman kes bin, hingi *"xwe"* cihê bireserê digire.

Gava karê ku yek dike li wî/wê vegere *"xwe"* tê bikaranîn. Dema yek li awêne yê dinihêre, dibêje: *"Ez xwe dibînim"* nikare bibêje; *"Ez min dibînim."* Dîsa mirov nikare bibêje, *"Wî ew dît."* lewre heke wisa bê gotin, dê tevlihevî çêbibe, dê hinek bibêjin ka wî yekî/e din dîtiye, lewre jî divê bibêje, *"Wî xwe dît.* "Her wiha dema ku bireser bi awayekî têkildarî kirdeyê be, ew têkilî jî bi riya cînavka *"xwe"* tê nîşandan, li wê derê *"xwe"* dibe raveker.

Mînak:

Zozanê birayê xwe dît.
Kevok bi hevala xwe re çû bajêr.
Delîl li xwişka xwe nêrî. Dewletê
kevir li gûzeka xwe xist.

Di hevokên ku bi lêkerên negerguhêz têne sazkirin de cînavka *"xwe"* bi alîkariya daçekan, wateya kirdeyê xurt dike. Her wiha di ravekê de jî cînavka *"xwe"* her tim raveker c.

Hatin:

E:: hi xn'c *halim.*
Tu bi xwe hatî.
E"I' bi xwc hal,

Gotin:

Me hi xwe got,
We bi XH'e got.
Him hi xwe go).

Di ravekê de CÎnavka "xwe"

~V(; dira xwe dît.
IVî xalê xwc nas nekir.
Ell' 17e J; ser hemdê .'(we InÎ.

Hin aloziyên cînavka vegerok

Her wekî tê zanîn bi riya tewangê jî em zayend ll mejcra navdêran dinasin. Cînavka vegerok *"xwe"* di vî warî de ji cinavkên din vediqete, ji ber ku cînav ka *",\,wc"* cinavkcke nêtar c. Ew tu qertafên mêjer, zayend **li** kesandinê nagire, Ligel vê yekê jî ev cînavk hem cihê navdêra nêr, hem jî cihê navdêra mê digire. Her wiha ew hem dikeve cihê navdêra yekjimar. hem jî dikeve cihê navdêra pirjimar.

MÎnak:

Hı(~ *di* uı\'(:'ı/leyc *de li* .\'\t'(' *temaşe kil:*
tYi di ({\VCl/(Cn.-' *de li X11'e temaşe kir. Wan*
di ml'êne::l'(~ *de li xwe temaşe kil:*

Her weki jl mînakan jî diyar dibe. di van hevokan de reng ll dirûvê cînavka *"xwe"* qet naguhere, her tim wekî xwe dimîne. Li al ıyê din cînavka ".nrc" cihê navdêrên xwerû û tewandî jî bi heman awayî digire

MÎl1aA (tewandî):

Ez xwe dibînim.
Tll nve dihÎl1P
E\ı' xwe dibîne.

Em xwe dibînin.
Hûn xwe dibînin.
Ew xwe dibînin.

I Ter weki ji mînakan diyar e, cînavka *",nve"* li vir cihê navdêreke tewandî girtiye. Iê lu guhartin tê de çênebûye.

Mînak (xwerû):

Min xwe dÎf.
Te xH'e dît.
Wî/wê xwe dît.
/vfe xwe dil.
We xIn' dît.
T1'an xwe dît.

Ji mînakan jî tê fêmkirin ku cînavka "xwe" ji aliyê mêjerê ve her tim yekjimar e. Li gorî rê? II rêzika ergatîviyê, di demên borî de lêker dikeve bin bandora bireserê (objcyê). Li vir jî lêker li gorî cînavka "vwe" hatiye kişandin, lewre jî her tim yekjimar maye. Heke li şûna cînavka ".nve" navdêr an jî cînavkeke din hebûya, dê lêker li gorî hejmara wê bihata guhartin.

Mînak:

Min du sh'
xwarin. Te sêvek
xwm;

Cînavka xwe û xwedîtî

Di kurmancî de xwedîtî ji bi alîkariya veqetandek 0 cînavkan pêk tê.

Mînak: êmin, ê te, e wî/wê, ême. êwe, ê wan, cl min. a te. a vvÎ/wê. ame, awe. a wan. Cn min. Cn te, ên wF/wê, ên me, ên we. ên wan ...
Ji bilî *van* cînavkên kesane 0 şanidanê, bi cînavka *"xwe"* xwedîtî jî tê destnîşankirin.

Mînak: ê.-nve, cl xwe, ên xwe ...

Di dema xwedîtiyê de ev nêtarbûna cînavka *"xwe"* bi xwe re hinek aloziyan tine. Nemaze di devoka Semsûr, Meletî tI Efrînê de cînavka "xwe" di şûna kesên sêyemîn de jî tê bikaranîn.

Nimûne:

Navê xwe çi ye?
Bavê xwe kî ye?
Navê bavê xwe çi *ye?*
Pirtûkê rengê xwe sor
e.

Ji bo ku rista vê cînavkê başţir bê famkirin, divê em hinekî li ser xeletiyeke ku li herêmine Kurdistanê tê kirin, rawestin, Di kurmanciya derdora Semsûr û Meletiyê de mirov dibîne ku cînavka *"xwe"* di cihê cînavkên wî/wê de jî tê bikaranîn. Wekî mînak li wan herêman yek dikare bibêje; *"Navê xwe çi ye?",* Xuya ye ku ew bikaranîn ne di cih de ye. Dema ku mirov pirsa *"kê"* arasteyî lêkerê bike, bersiv dê vê çewtiyê bide dest. Gava em bipirsin; *"Navê kê çi ye?"* dê bersiv *"wî/wê"* be, Me di vê bi straneke gelêrî ya ji herêma Semsûrê vê çewtiyê nîşan bidin.

Lo /0 berxê bar e
Miyê berx e, bizinê kar e
Karî ku tu dikî ne tu kar e
Pêşî ŞÎRÎn e. paşiya xwe tim zirar e.

Di vê mînakê de jî xeletî diyar e. Li vir "xwe" cihê kar digire, kar bi kirde re ne heman kes e, lewre jî divê di cihê *"xwe"* de "wî" bihata bikaranîn.

Xwezî aloziya ku ev cînavk derdixe holê, bi şaşiya li jorê bisînorkirî bûya, lê mixabin ne wisa ye. Hin mînak hene ku bi rastî jî mirov nikare ji navê derkeve.

Nimûne: Bager û bavê xwe çûn bajêr

Heke mirov ji aliyê watcnasiyê ve 1 i vê hevokê binêre, dikare bibêje ku gelo ev hevok çendî di cihê xwe de ye? Aya dibe ku em bibêjin, *"Bager û bavê wî çûn bajêr"?* Cînavka *"xwe"* di zaravayê kirmanckî (dimilkî) de jî nêtar e, lewre di hin devokên kirmanckî de jî ev alozî heye. Li şûna ku *"Nameyê aye çik o?", "Nameyê êy çik o?", "Nameyê xo çik o?"* tê gotin. Lê di zaravayê kurmanciya jêrîn (soranî) de rewş cuda ye. Ji ber ku cînavka "xwe" jî wekî navdêran cînavkên qertafi yên xwedîtiyê *"-m", "-1", "-y", "<man", "<tan", "<yan"* digire. Ev paşgir di farisî de jî hene, bi tenê li şûna

"-y" û *"<yan"* a soranî *"-ş"* û *"<şan"* hene. Wate di soranî û farisî de xwedî bi alîkariya van paşgiran pêk tê. Mînak Soranî: *"destim, destit, des ti, destiman, desttan, destiyan.* "Ev paşgir têne dawiya cînavka *"xwe"* û xwedîtiyê nîşan didin.

Mînak: xom, xoy, xoman, xotan, xoyan

Hevokên ku di zaravayên Bakur de aloziyê derdixin, di soranî de bi vî rengî ne:

Nawi xoy çî ye? Bawkî xoy kam e? Nawî bawkî xoy çi ye! Pirtûk rengî (xoy) sor e.

Wekî encam em dikarin bibêjin ku nêtarbûna cînavka *"xwe"* di zaravayên Bakur ên kurdî de bi xwe re hinek aloziyan tîne. Jiber ku cînavka *"xwe"* natewe, di demên borî de mirov nikare zayend û mêjera bireseran bi cînavka *"xwe"* nîşan bide. Her wiha di dema xwedîtiyê de jî, ji ber ku cînavka *"xwe"* qertafên xwedîtiyê nagire, hin caran mirov nikare pê kesên sêyem nîşan bide. Lewmajî di hevoka *"Bager û bavê xwe çûn bajêr"* de kirde nikare bandorê li cînavka *"xwe"* bike.

Heke mirov hevokê bike *"Bager û bavê* wî *çûn bajêr"* îcar wate tam cihê xwe nagire. Heke navdêr û cînavkên kurmancî jî wekî soranî û zimanê farisî qertafên wê yên xwedîtiyê hebûna, dê ev pirsgirêk derneketana, lê mixabin zaravayên Bakur ên kurdi ji vê derfetê bêpar in.

Cînavka qertati

Ev cînavk cihê kesên sêyemîn ên yekjimar *"wi/wê"* digire. Taybetiya vê cînavkê ev e ku wekî qertaf bi dawiya lêkeran ve dibe û cihê kesên sêyemîn ₒ yekjimar digire. Ev cînavk ji aliyê zayendê ve nêtar e. Li şûna ku yek bibêje, *"Min gote wÎ/wê* ", dibêje, *"Min gotê."* Ev cînavk jî bi tenê cihê navdêrên tewandî digire û di dema gotûbêjê de ji bo kurtkirina axaftinê tê bikaranîn. Lê belê ji bo ku cînavk cihê navdêrê bigire divê di navbera navdêr û cînavkê de peyveke din nîn be.

Di pirtûka Qanatê Kurdo de ev wekî *"cînavka kurtkirî "* hatiye navandin. Li ser bingeha vê cînav kê jî mirov dikare çend tiştan

bibêje. Celadet Bedirxan ev cînavk di nav cînavkên bireser de nîşan daye. Der barê binyata wê de tiştek negotiye, lê dibe ku ji qertafa tewandinê ya zayenda mê jî hatibe, lewre ew "-ê"ya *"ewê"* bi xwe jî qertafa tewangê ya zayenda navdêrên mê ye.

Mînak:

Min tasek av dave wî/wê.
Min dayê.
Ez dibêjime wi/we.
Ez dibêjimê.
Min şande gund.
Min şardê.
Ez difiroşime
Ez difiroşimê.
wi/wê. E IV Çîl
[H' *çûyê.*
Amedê

Her weki j i mînakan jî diyar c. cînavka qertaf her tim cihê biresere digire. tu caran cihê kirdeyê nagire. Lê ew bi hêsanî dikare cihê hokera cih bigire. Her wekî di mînaka *"Ez çûmê"* de jî diyar e.

Ev: hale malê'!
I fatê.
Wî nan xiste tûr?
Belê, nan xistê.

Lê divê di navbera hokera cih û lêkerê de daçek nîn be. Heke daçek hebe. ew cînavk rola xwe nalîze.

Cînavkên kesandinê

Li gorî hinek zimanzanan, ew ji lêkera bûn tên. Celadet Bedirxan, wan wekî lêkera *"bûn"* bi nav dike, Fêrgîn Melîk, navê *"cinavkên paşginkiri"* li wan kiriye. Ilindek kes jî navê *"parkîtên kesandinê"* li wan dikin. Murad Ciwan ew di nav *"cînavkên kesane"* de hesibandine. Di farisî de ji van cînavkan re *"şînase"* tê gotin. Peyva *"şînase"* rayeka dema niha lêkera *"şînaxten"* ango *"naskirin"ê* hatiye bidestxistin.

Lê bi baweriya min ew her çi qas di nîşandana rewşa mirov û nasandina kesan de ango di hevokên navdêrî de lêkera *"bûn'tê* di nava xwe de dihewînin jî, ji lêkera *"hûn"* cudatir in. Ev yek di hevokên lêkcri û demên borî yên hevokên navdêrî de xwe bi awayekî zelal nîşan dide.

Minak:

Ez baş im.
Tıı baş 1.
Ew huş e.
Em baş in.
Hûn baş
in. EH' *baş*
in.

Li vir cînavkên kcsandinê lêkera *"hûn"* jî di nava xwe de dihewînin.

Lê di dem û rawcyên din de lêkera bûn. bi awayekî xwe nişan dide.

Mînak:

F.:: baş bim	*1:::. de' baş*	*Ez baş*
Tıı baş bi.	*bim. Tıı .V(' haş*	*bûm. Tu*
Ew baş be.	*hÎ. Ew . haş be.*	*haş bûyî.*
Em baş bill.	*Em ê haş bin.*	*Ew haş bû.*
		Em haş bûn.

Di hevokên lêkcri de bêyî lêkera *"bûn"* jî li dawiya lêkeran dih digirin.

Ez diçim.
Tıı diçî.
Ew diçe.
Em diçin
Hûn diçin
Ew diçin.

Ev cure cînavk, weki paşgir bi dawiya lêkeran ve dibin. Cînavkên kesandinê bi lêkeran ve dibin, lê ji navdêr Cl rengdêran cuda tên nivîsandin.

Bo nimûne:

ez Im
tu yi
eH'e
em in
hun in
ew in

Dema ku ev cînavk bi navdêran anjî rengdêran re tên bikaranîn, du dirûvên ji hev cuda digirin; heke navdêr/rengdêrên ku berî wan tên, bi dcngdarê biqedin vî dirûvî digirin:

Ez mirov im.
Tu mirov î.
Ew mirove.
Em mirov in.
Hûn mirov
in. Ew mirov
in.

Dcma navdêr/rengdêr bi dengdêrê biqede, wê demê teşeyê wan cînavkan jî diguhere. Wekî mînak; dema ew li pey rengdêra *"bajari"* bên, dirûvê wan wiha dibe.

E::: bajarî me.
Tu bajarî yî.
Ew bajarî ye.
Em bajarî ne.
Hûn bajarî
ne. Ew bajarî
ne.

Pişti lêkeran dirûvê cînavkên kesandinê wiha ye:.

Ez diçim.
Tu diçî.
Ew diçe.
Em diçin.
Hûn diçin.
Ew diçin.

Li vir xaleke girîng heye. Her wekî berê jî hatibû daxuyandin, cînavk jî li gorî peywira ku digire ser xwe, diguhere. Li hin cihan cînavkên xwerû kirde ne, li hin cîhan jî bireser in. Cînavkên kesandinê her tim li gorî cînavkên xwerû tên bikaranîn; heke kirde ji cînavkên xwerû be. lêker li gorî kirdeyê cînavkên kcsandinê digire, heke bireser be, îcar cinavkên kesandinê li gorî bireserê têne dawiya lêkeran.

Wekî mînak:

Ez nên dixwim.
Tu nên dixwî Ew
nên dixwe. Em
nên dixwin. Hûn
nên dixwin. Ew
nên dixwin.

Di mînakên li jor de cînavkên xwerû kirde ne, bireser navdêrck e. Lê dema ku ew kom cînavk bibe bireser, îcar cînavkên kesandinê bi bireseran re lihevkirî ne.

Bo nimûne:

Te ez
birim. Min
tu birî.
wî ew bir.
Te em birin.
Min hûn birin.
Wê ew birin.

Li hin herêman lêkerên kesê sêyemîn wekî kesê duyemîn tên kişandin. Yanê li cihê ku bibêjin: *"Ew diçe* ", dibejin *"Ew diçî",* Heke mirov bi awayekî din bibêje; li nik kesê sêyemîn *"ew"* cînavka kesandinê ya kesê duyemîn **''-f'** tê bikaranîn.

Her wiha li hin herêman jî berevajî vê yekê, digel cînavka kesane ya kesê duyemîn cînavka *"tu",* cînavka kesandinê ya kesê sêyemîn "*e"* tê bikaranîn. Yanê *"Tu dibîne!* ", *"Tu diçe!",* tê gotin.

Ew her du form ji xelet in. Xeletiyên bi vî rengî divê bi tu awayî wekî tiştekî rewa neyên pejirandin, lewre ew rêzikên zimên têk dibin **li** dibin sedema tevliheviyên mezin.

Xaleke din jî wekî *''-it''* bikaranîna cînavka kesandinê ya kesê sêyemîn e. Xuya ye ku ev form di kurmanciya berê de hebûye û niha jî di hinek devokan de tê bikaranîn. Ji ber ku ev form tu alozî û tevliheviyan di zimên de pêk nayîne, hêdî hêdî dikeve zimanê nivîskî jî. Lê zehmet e ku pişti vê demê cihê xwe di zimanê nivîskî de bigire. Di dîwanên wêjekarên klasîk ên kurd de ev forrn bi xurtî

hatiye bikaranîn. Em dişên ji Dîwana Melayê Cizîrî çend beytan wekî mînak pêşkêş bikin:

Yar divê hakim bitin qewlê reqîban guh nedit
Şahê mi/ke; dilberê dêla 'ilek muxtar bit
***
Mehbûb hi dil bit me bi efra: çi hacet
'Enqa bi xwe hêtin fir ıî perwaz çı *hacet*

Dema ku mirov bala xwe dide cinavkên kesandinê yên hin zimanên din mirov dibîne ku ji bo her kesî cînavkek heye. Mirov dikare di vî warî de farisî "vekî nimûne bide. Lê mixabin di kurdî de her sê cînavkên kesandinê yên pirj imar yek in. Ev yek kurmancî di warê hêza derbirînê de qels dike. Ji ber vê rewşê mirov ji bêgavî ligel cinavkên kesandinê, cînav kên kesane jî bi kar bîne. Lê belê di hin devokên kurmancî de cînav ka kesandinê ya kesê yekem *êl* pirjimar *"în"* c. Li şûna *"Em haş in.",* di van devokan de *"Em baş În."* lê gotin. Ev form di klasîkên kurdî de jî heye. Bo nimûne Ehmedê Xanî di şahkara xwe ya bi nav **II** deng *"Mem ıl Zîf1"ê* de wiha gotiye:

,\[u!ûmê te IJlî kil em nezan În
Qedrê wî emanetî nizanîn (1: /54)
***
Xeffar e ku em kirîn gunehkar (1: /56)
***
Sed mafe gerçî em xirab În
Emma]i Ie naumîdi nabîn (1: *150)*

Di soranî de jî cînavka kesandinê ya kesê sêyem *êla* pit jimar *"În"* e.Ez nizanim ka çima Celadet Bedirxan tevî ku ev form li herêma Cizîrê heye jî, ew tercîh nekiriye?

Wekî encam cm dikarin bibêjin ku di kurmancî de heke bêyî cînavka kesane v"ere bikaranîn, cînavka kesandinê *"in"* bi tenê cihê kesê sêyemîn *êl* pirjimar digire. Her wekî lêkerên *"hatin". "gotin", "çûn", "birin"* wateya kesê sêyemîn *êla* pirjimar didin.

Cînavkên berbihevin

Ev cure cînavk du heb in: *"hev"* û *"êk* ". Cînavka *"êk"* bi tenê li herêmên Behdînan û Hekarî tê bikaranîn. Li herêmên din *"hev"* tê

bikaranîn. Ev cure cînavk têkilî û danûstandina piralî dinimîne. Her wekî çawa ku cînavka *"-ê"* bi tenê kesê yekjimar dinimîne, bi tu awayî nikare kesên pirjimar biniminc, ew jî nikare kesê yekjimar binimine, Wate. gava ku yekî got: *"Em birayên hel' in"* an jî got:
"Em biravên (3Λ *in* ", tê zanîn ku li holê ji yekî zêdetir kes hene û ev Cînavk têkiliya van kesan rave dike.

Li vê derê pêwîst c ku mirov çend têbîniyan li ser binyata wan cînavkan bibêje. Ji wan cinavkan'Yx" her wekî diyar e,ji hejmara *"yek"* hatiye. Di nava hevokê de ew' bi awayê *"êk* Lî *du",* "êk zî *din" û "N .. ıî di"* jî derdikeve pêşberî mirov. DiY<H e ku ew peyvên *"dıı* ". *"din", "di"* jÎ têkildarî hejmara *"du"* ne. Li gorî daxuyandina Celadet Bedirxan cînavka *"hev"* jî ji hejmara *"jew";* ")'c11"'a kirmanckî (dimilî) hatiye, Lê belê elema ku mirov bala xwe dide zimanê farisî mirov rastî bêjeya *"hem / hem dÎger"* tê ku heman wateya *"hev / hev* lî *du"yê* dide, Lewma jî mirov dikare bibêje ku her du peyv têkildarî hev in, Her wiha di farisî de cînavka "yek diger" ji heye di zimanên din de Jî ev cînavk beranberî heman hejmaran hatiye bikaranîn. Di îngîlîzî de *"each-other "* jî di wateya *"êk* ıî *du"* de ye.

il1Înak:

Me li hel' nihêrî. lê me hev ₒdin nas nekir.
Em pismamên êk ₒdu ne.
E\\' birayên hel' in.
Van li hel' ₒdu xistiye.
Ew hi hev ₒdin re çûne malê.
Kes li rewşa hev napirse.
Em xwişk ıî *birayên êk. in.*
Em hi hel' du re mezin hûn.

Her çi qas di bingeha vê cinavkê de cînavka hevedudanî .... *"ev* ıî *dıı",* *"êk ₒdıı"* hebe jî, êdî *"hev"* Ll.... *êk"* bi serê xwe têrî derbirîna wateya gişti dikin. lewre jî êdî bi tena serê xwe têne bikaranîn.

Mînak:

We kengê hev nas
kir? Em kurapên êk in.

Hûn xizmên hev in.
Malên we nêzî hev in?
Bi hev re mezin bûne.
Ew xwişk û birayên hev in.

Cinavkên lihevxisti

Ev cure cînavk, cînavkên hevedudanî ne û ji du hêmanan pêk hatine. Ji bo ku mirov vê mijarê zelal bike, pêwîst e mirov hinek agahiyan li ser daçekan bide. Daçek ew tişt in ku di nav hevokê de bi serê xwe tu wateyê nadin, lê hevokê ji hin aliyan ve sergihayî dikin ango pozîsyona bêjeyan diyar dikin.

Di kurdî de daçekên bingehîn ev in: *"li", "ji", "di", "bi".* Hinek ji wan daçekan bi paşdaçek in, wekî *"bi ... re* ", *"ji … re* ", *"hi ... ve* ", *"ji ... ve" û "di ... de* ". *"di ... re* " ... Pêşdaçeka *"di"* ji bilî hinek lêkerên biwêjî bêyî paşdaçek nayê bikaranîn, lê yên din bêyî pêşdaçek jî dibin.

Ev daçek bi du cînavkan re dibin yek û cînavkên lihevxistî pêk tînin:

1- Bi cînavkên berbihevîn cînavkên lihevxistî

Daçek û cînavkên berbihevîn (êk / hev) dibin yek û cureyekî cînavkên lihevxistî pêk tînin. Cînavkên lihevxistî yên ku bi vî awayî pêk tên jî ev in:

ji + hev = jey

Ev avahî jev ketiye.
Te tiştekîjevketi aniye.

bi + hev = pev

Pevxistina van tiştan ne hêsan
e. Ew çawa pev ketin.

li + hev = lev

Ev çi qas fev hatine.
Wan kaxizan tev bixe.
Levdana wan tiştekî sosret
hû.

di + hev =tev

Hûn tev hatin.
Tev mede, bila bikele.

ji + êk = jêk

Evîndaran jêk nekin. Destên me jêk bûn. Em jêk cuda kirin.

bi + êk = pêk

Ez ê vî karî pêk bînim.
Karê ku pêk hat, ne baş e.
Ez û Zozan, em ê pêk ve biçin.

li + êk = lêk

Hûn kengê lêk hatin? Gelekî lêk çûne.
Hûn li hemberî me têk çûn.
Te dît, me çawa ew têk birin.

di + êk = têk

2- Cînavkên lihevxisti bi daçekan û cînavka "ê"

Ev daçekên navborî bi cînavka *"_ê"* ve digihêjin hev û cînavkên lihevxisti derdikevin holê.

ji + ê = jê

Mînak:
-Te ji wê re çi got?
-Min jê re rastî got.
-Teji wî çi xwest?
-Min jê alîkarî xwest.

di + ê = tê

Mînak:

-Di malê de çend kes hebûn.
- Tê de çar kes hebûn.

- Tu di daristanê re derbas bûvî?
-Belê. ez tê re derbas bûm ıî hatim.
-Di mala we de çendjûr hene?
- Tê de sêjûr hene.

hi + ₑ = pê

Mînak:

- Te bi wî pereyî çi kirî?
-Afill pê pirtûkek kirî.
-Ki bi Zo;,anê re Ç'll?
-Hesen pê "1.' <"lÎ.

li + ê = lê

llt1Inak:

- [ıf keng(~ li hotelê mavi?
-Ez sala çûyÎ lê mam.
-Gelo dê cvfistan li Zînê were.
-E::. bawer dikim dê lê were.

Di daçekên bi paşdaçek de, paşdaçek wekî xwe dimîne **II** dîsa wekî berê tê dawiya pêşdaçekê. Yanê *"i! wi/wê re"* dibe *'jê re, di* m; *de"* dibe *"fL> de* ", *"bi wi/wê ve"* dibe *"pê ve* "II hwd.

Dema yek bibêje: *Te li \-l'i/we nihêrt?* Tu dikarî bibêjî: *Belê min h; nihêrî.* Pêwist nake ku tu careke din bibêjî: *Min li wi'/wê nihêrî.*

ll!ÎJ1ak:

Min ji Elî re got.
Min ji wî re got,
Min jê re got.
1:.::: li malê
rûniştim. Ez lê
rûniştim
- Ewji gund hat?
- Belê ewjê hal
- Te ji wî re pênûsek anî?
- Erê. min jê re ani.
- Te di malê de kes dil?
- Min tê de mirovek dil.

- Tu bi wî re peyivî?
- Ez pê re peyivîm.
- Teji wî re nan anî?
- Min jê re anî.

Ev cure CÎnavk bi tenê cihê kesên sêyemîn ên yekjimar digirin. Cihê kesên sêyemîn ên pirjimar *"wan"* nagirin.

Yanê gava yek bibêje: *Teji wan re got?* Mirov nikare bibêje: *Min jê re got.* Divê mirov bibêje: *Min ji wan re got.* Lê di zimên de meyleke wisa heye ku vê pîvanê binpê bike, gelek nivîskar di cihê navdêr û cînavkên pirjimar de jî van cînavkan bi kar tînin.

Bi cînavkên lihevxistî lêkerên biwêjî

Bi alîkariya cînavkên lihevxistî gelek lêkerên biwêjî pêk hatine. Ev cure lêker ji çend hêmanan pêk hatine, cînavkên lihevxistî wateya wan sergihayî dikin. Ew cure lêker jî du cure ne; hinek ji wan bi alîkariya cînavkên lihevxistî yên bi daçek û cînavkên berbihevîn, hinek jî bi cinavkên lihevxistî yên bi daçek û cînavka *"ê"* pêk hatine.

Em pêşî bala xwe bidin lêkerên biwêji yên ku bi alîkariya cînavkên lihevxistî yên bi daçek û cînavkên berbihcvîn pêk hatine. Wekî; *"pêkhatin* ", *"pêkanîn* ", *"têkçûn ". "têkdan" "pevçûn* ", *"pevxistin* ". *"tevgerîn* ". *"jevketin* ". *"lêkxistin ", "têkbirin* ". *"têkdan" û hwd.* Hinek ji wan cînavkan wekî yên din bi hêsanî ji hev nabin, çawa ku mirov bêje: *"Ew her du mirov têk çûn, tev çûn, pêk ketin"* mirov nikare bibêje: *"ew her du mirov di êk yan jî di hev çûn, bi êk ketin"* lewre ev lêkerên biwêjî ne û wateyeke nû li wan bar bûye. Lê di cihê *"pevketinê* de mirov dikare bibêje; *"Ew mirov bi hev ketin. "*

Mînak:

Pêkhatina vê bûyerê, karê me tevlihev
kir. Kê ev kar pêk anî?
Bi têkoşina me planên qirêjî têk çûn.
Di *lêkdana duh de sê kesan jiyana xwe ji dest*
da. Li gundê me du malbat pev çûn.
Tevgera me azadiya mirovan dixwaze.
Me ew kes têk birin.
Têkdana vê bernameyê hi kêrî me nayê.

Mirov dikare lêkerên biwêjî yên ku bi alîkariya cînavkên lihevxistî yên bi daçek û cînavka *"ê"* pêk hatine jî wiha rêz bike:
"Destpêkirin, têhilatin, têfirandin, têgihîştin, têhildan, têderxistin, têwerdan, têwerbûn, pêketin. pêxistin, pêlîstin, pêzanîn, pêhesîn, serjêkirin, jêbirin, pênivisîn, lênivîsin, lêtemaşekirin, lênihêrtin, pêrabûn, pêşabûn, têgerîn, lêketin, lêkirin ıîhwd. "

Her wekî me berê jî got, ev lêker ji çend hêmanan pêk hatine. Heke mirov wekî nimûne lêkera *"destpêkirln'ê* dahûrine, dê bê dîtin ku ji navdêra *"dest",* ji daçeka *"bi"* ji cînavka *"_ê"* û ji lêkera *"kirin"* pêk hatiye. Ev lêkerên li jor giş ji çend hêmanan pêk hatine û mirov dikare wan jî wekî *"destpêkirin"ê* dahûrîne,

Dema ev cure lêker têne bikaranîn, bi berdewamî çewtiyek tê kirin. Ji bo ku rê li ber vê çewtiyê bê girtin, divê neyê jibîrkirin ku di wan lêkeran de cînavkên lihevxistÎ cihê navdêrekê digirin. Lewre ew bi tu awayî nikarin tevî navdêrê bêne bikaranîn.

Ji bo ronîkirina mijarê mirov dikare vegere ser mînakên li jor. Dema ku em navdêra *"kar"* bixin cihê *"pê"* ya destpêkirinê, cînavka *"ê"* ji holê radibe û daçeka *"hi"* jî vedigere dirûvê xwe yê resen.

Lewre mirov nikare bibêje: *Min dest pê kar kir,* divê mirov bibêje: *Min dest hi kartî) kir.*

11-1Înak:

têhilatin:

-Ev kinc di wt walîzî hilnayên.
-Tê hi/tên.

têfirandin:

Min kevirek têfirand.

têgihîştin:

-Tu tê gihîştî ka ez çi dibêjim.
-Ez baş di gotinên te digihêjim.

têderxistin:

Te tê derxist ka ez kÎ
me? Erê. tu apê Hesen
Î.

pêketin:

-Gelo agir bi daristanê ket?
-Erê, pê ket.

pêxistin:

-Tu nikarî êgir bi pûş bixî?
-Ez dikarim pê bixim.

serjêkirin:

Gelo tu wê çêlekê serjê nekî nabe?
Wekî wisa ye, ez serjê nakim.

jêbirin:

-Wê nivîsê ji depreşê bibe.
-Baş e, ez dê jê bibim.

pênivîsin:

-Wê pênûsê bide min ku ez pê helbestekê binivîsim.
-Fermo pê helbesteke xweş binivîse.

lênihêrtin:

-Ew li çi dinihêre?
-Qey tiştek dîtiye, lê dinihêre.

pêşabûn:

- Tu bi bextê xwe şa nabî?
-Ez çima pê şa nebim?

têgerîn:

-Di belayekê geriya.
-Gelo bela tê geriyaye, an ew di belayê geriyaye?
-Bela tê geriyaye.

lêketin:

-Llngê te li kêvir ket?
-Mixabin, lingê min lê ket.

lêkirin:

11111 ii xwe re xaniyek lêkir.

Di vê lêkerê de *"lê-"* êdî rengê pêşgirekê wergirtiye, tiştê ku cihê wê girtiye jî hatiye jibîrkirin. Lê dema mirov bibêje," *min av lê kir û agir vekuşt* ", mirov dizane ku av li êgir kiriye.

Cinavkên nebinavkirI

Ev cînavk cihê tiştên nenas digirin. Ji ber vê yekê ji wan re "cf-*navkên nenas"* jî hatiye gotin. Dema ku mirov bibêje: *"Kesek hat."* Li vê derê *"kes"* cihê tiştekî digire, lê reng û dirûvê wî tiştî ji hêla me ve nayê zanîn. Gava *"Yeki erebeya me biriye."* bê gotin, li ser kesê ku ew kar kiriye agahiyên mirov nîn in. Lê yekî ku ew kar kiriye heye. Cînavkên nebinavkirî gelek in.

Yek. hin. hinek. tu, kes, kesek, her kes, hemû kes, ewk, çîk, filan, bêvan, hemû, her yek, piçek, hîç, qet, pir, gelek, gişk, çend. ..

Ev cînavk jî wekî hemû cînavkan ditewin; hinek ji wan li gorî zayendê, hinek jî li gorî mêjera xwe ditewin. Bo nimûne, cînavka *"yek"* li gorî zayendê ditewe. Yanê em dibêjin; *"Yekî nan xwariye.* ", *"Yekê nan xwariye.* "Li aliyê din cînavka *"hin"* dibe pirjimar û mirov dibêje, *"Hinan nan xwariye* .,

Ev cure cînavk hem dibin kirde, hem jî dibin bireser. Mînak; dema ku yek bibêje: *"Yekî yek dîtiye.* " Li vir "yekî" kirde û "yek" jî bireser e. Her wiha em dema bibêjin, *"Hinekan ji hinekan re gotiye were vir.* " Li vê derê, *"hinekan"a* di serî de kirde û ya din jî bireser e.

Mînak;
Hin dikin, hin jî dixwin.
Tiştek bi kesî nebûye.
Kes bi kesî re naçe.
Guhê xwe nede gotina filan û bêvanî.
Ewko ji min re got.
Ewkê mala xweji vir bar kiriye.
Çiko armanca xwe ji min re
negot. Kuro te bi xwe re çîk JÎ
neanî. Kesî tu tişt neda.
Kesekî (tuyan) ji te re negot"!
Tu kes tiştekî wiha nake.

Hemû tên li me diqelibin.
Her kes ketiye derdê xwe.
Giş li benda keysa xwe ne.
Her yek bi aliyekî de çûye.
Yekî ji yekê re got, meçe!

Tewanga cînavkên neblnavkirl

Her wekî me di serî de jî got, cînavkên nebinavkirî ditewin, bi vî awayî mirov zayend û rnêjera tiştan nas dike.

Mînak:

Yeki ji min re got.
Yekêji min ev pirtûk
xwest. Hinekan ev kar
kiriye. Hinan karê xwe
nekiriye.
Her kesî ber mala xwe paqij kiriye.
Tu kesî alîkariya wi nekiriye.
Gelekan karê xwe qedandiye.
Gişkan bi hev re soberî kiriye.

Li cihê ku cînavkên nebinavkirî xweru bin, wekî cînavkên din mêjera wan bi kesandina lêkerê tê nîşandan.

Mînak:

Yekji bajêr hat.
Gelekji bajêr hatin.
Hinek dixwazin bizanin.
Tu naxwazin bibînin.
Hemû diçin serdana gundê cîran.

Cînavkên xwedîtiyê

Di kurdî de bi serê xwe cînavkên xwedîtiyê nîn in. Lê belê veqetandek û hin cînavkên bireser digihêjin hev, ji wan cînavkên xwedîtiyê pêk tên. Ji van cînavkan re Reşîdê Kurd *"bernavên arizî"* gotiye, Celadet Bedirxan jî ji wan re *"pronavên xwemalîn"* gotiye.

Veqetandekên binavkirî *"a",* Hê" û *"ên"* digel cînavkên kesane yên tewandî; *"min", "te", "wÎ/wê", "me", "we", "wan",* cînavkên

şanîdanê *"vî", "vê", "van",* cînavka *"xwe",* cînavkên bcrbihev in; *"hev û êk"* tên û cînavkên xwedîtiyê pêk tînin:

amin, a te, awî/wê, ame, awe, awan

Ev pirtûk amin e.
Ev lênûsk a te ye.
Ev mal a me ye.
Pênûs a we ye.
Dara sêvê ya wan e.

aVÎ, avê, avan

Dara gûzê ya vî ye.
Sêva sor a vê ye.
Mala mezin avan e.

êmin, ê te, ê wî/wê, ême, êwe, ê wan

Ev xanî yê me ye.
Xaniyê bilind ê te ye.
Goştê hêrandi yê wVwê ye.
Ev tevir ê we ye.
Deriyê vekirî yê wan e.
ê vî, ê vê, ê van

Tevir ê vî ye.
Ev derî yê vê ye. Ev hesp ê van e.

ên min, ên te, ên wî/wê, ên me, ên we, ên

wan *Ev dest ên min În.*
Ev gûz ên te ne.
Pênûs ên wî/wê ne.
Kanî yên me ne.
Daristan ên we ne.
Darên mişmişan ên we ne. ên vÎ, ên vê, ên van
Ev dar ên vî ne.
Ev gul ên vê ne.
Baxçe yên van in.

Nişe: veqetandekên binavkiri "ê ", "a ". "ên" dema kil peyva berî lVan li dengdêrê hi yek dibin "y 'e ", "va ", lî "yên"

Di kurmancî de cînavka vegerok *"xwe"* ji ber ku ji her alî ve nêtar e, bi qasî cinavkên din nikare ligel veqetandekan cînavkên xwedîtiyê pêk bîne. Di soranî de ew tişt pêkan e, ji ber ku cînavka xo bi cînavkên qertafi tê kesandin, wekî *"xom* ". *"xo!* ". *"xoy", "xoman* ". *"xotan* ". *"xoyan* ". Dîsa jî hin caran cînavkên xwedîtiyê pêk tîne û hin caran jî wateya xwedîtiyê ya cînavkên din xurt dike. Vê yekê jî bi alîkariya daçeka *"bi"* dike.

Mînak:

Ev pirtûk a min bi xwe ye.
Dara gûzê ya me bi xwe ye.
Pirsgirêk ên me bi xwe ne.
Gelo te deynê "rwe neda? Min ₑ xwe da.
Te hevala xwe neanî? Min a xwe anî.
Min navê xwe jê re got, lê wî yê xwe ji min re negot.
Min solên xwe ji piyê xwe kirin, wê yên xwe ji piyê xwe nekirin.

Di kurmanciya berê de ji bo nîşandana xwedîtiyê daçeka *"di"* hatiye bikaranîn.

Mînak:

mala di min
gundê di me
hevalên di wan

Ev daçek niha bi tenê di hin devokan de digel veqetandeka pirjimarî tê bikaranîn.

Her wekî

Malêd me, di hin devokan de bûye *malêt me.*
Zarokêd me yan jî *zarokêt me.*

Di zaravayê dimilkî de jî ev *"di"* ya ku em qalê dikin, hin earan digel cînavk û hokeran derdikeve pêşberî mirov.

Mînak:

Dey (di ey) vat. (Wî got.)
Nameyê daye (di aye) çik o? (Navê wê çi yer)
"Di her" bûye *dot (ali).*

Cinavkên **girêkî**

Cînavkên girêkî du hevokan bi hev ve girê didin. Ev cînavk komekên hevokên hevedudanî digihînin hev. Bo nimûne: *"Min mirovek dit. Ew mirov birayê hevalê min bû.* " Mirov dikare van her du hevokan bi alîkariya cînavkên girêkî *"ku", "a ku"* bi hev ve girê bide: *"Mirovê **ku** min dit, birayê hevalê min bû.* "Heke pirjimar be, her wekî *"Te ji min re tiştin gotin. Ew tişt rast derketin."* Îcar divê em cînavka "ên ku" bi kar bînin û bibêjin, *"Tiştên **ku** te ji min re gotin, rast derketin. "*

Heta niha *"ku"* tena serê xwe wekî cînavk dihate binavkirin, Celadet Bedirxan û gelek kesan jî wisa kiriye. Min bi xwe jî di çapa yekem de wisa bi nav kir, lê piştî nîqaş û lêhûrbûnan ez gihaştim wê baweriyê ku *"ku"* bi tena serê xwe nabe cînavk, ew jî wekî cînavkên xwedîtiyê wateya xwe ya cînavkiyê ji veqetandekan werdigire, lewre jî divê mirov *"ku"yê* bi tenê wekî cînavk bi nav neke, wê tevî veqetandekên *"ê* ", *"a", "ên"* wekî *"ê ku", "a ku", "ên ku"* hilgire dest. Dema ku mirov wisa lê dinêre, cînavkbûna wê zelaltir x we dide dest.

Mînak:

*Ê **ku** hat, birayê min e.*
*A **ku** te dit, jinbira min e.*
***Ên ku** vegeriyan, êdî*
neçûn.

Cînavka girêkî hin caran dibe kirde, hin caran jî dibe bireser. Mîna, di hevoka *"Kesê **ku** ez dîtime, giliyê min kiriye"* de kirde, di hevoka *"Keçika ku te dît, ji gundê me ye"* de bireser pêk aniye .. Wekî encam em dikarin çend mînakên din rêz bikin:

*Dersa **ku** min xwend, dijwar bû.*
*Şagirtê **ku** beşdari pêşbaziyê bû, bi ser*
*ket. Mirovê **ku** hat dostê min bû.*
*Kesê **ku** xerabiyê bike, xerabiyê*
*dibine. Kesê **ku** dixebite, bi ser*
dikeve.
*Xaniyê **ku** te kirî, li taxa me ye.*
*Darên **ku** we birîn. ên me bûn.*

Di bikaranîna cînavka girêkî de du şaşiyên sereke balê dikêşin. Hinek nivîskar *"ku"yê* wekî bargiraniyckê dibînin û dixwazin jê riz-

gar bibin. Lewre jî li cihê pêwîst *"ku"yê* bi kar naynin. Bi baweriya me ew kes li şûna ku kil bikin kor dikin. Ji ber ku bêyî *"ku"yê* mirov nikare tu hevokên hevedudanî bi hev ve girê bide.

Lê em rastî hevokên wiha tên:

Mirovê hat xalê min e.
Gundê hatiye şewitandin ◌ xalanê min e.
Bi baweriya me ev hevok şikestî ne û divê bi vî rengî bin:
Mirovê ku hat, xalê min e.
Gundê ku hatiye şewitandin ◌ xa/anê min e.

Şaşiya duyemîn jî ji ber wergerandinaji zimanê tirkî tê, di zimanê tirkî de bi alîkariya paşgirên mîna *"-ip"* û *"-en"* mirov dikare hevokên gelek dirêj ava bike, lê di kurmancî de ev derfet nîn e, hevokên dirêj, fêmbariya wê dikujin. Di hevokekê de *"ku"* çi qas zêde bin, ew qas sext û dijwar dibe.

Lewre jî li şûna ku mirov bibêje, *"Doza parlamenterên berê yên DEP ◌ê yên ku ji nû ve têne darizandin, bi sedema ku parlementer tevli rûniştinê nebûn, hate paşvexistin.* ", çêtir e ku mirov bibêje, *"Doza parlamenterên DEP ◌ê hate taloqkirin. Parlamenterên ku ji nû ve dihatin darizandin beşdarî danişînê nebûn, lewre jî dan iş în hate taloqkirin. "*

Cînavkên **jimarîn**

Jimarnav jî gelek caran cihê navdêran digirin û bi vê yekê jî dibin cînavkên j imarîn. Cinavkên jimarîn bi eslê xwe j imarnav in, lê rola ku pêk tînin, rola cînavkan e. Ji bilî hejmara "yek" hemû hejmar dibin cînavkên jimarîn, hejmara "yek" cînavka nebinavkirî ye. Tewanga cînav kên jimarîn jî wekî jimamavan e. Yanê ji 2'yan heta 19'an bi *"-an"ê* ditewin. Piştî wê bi "-f'yê ditewin. Di hejmarên duxaneyî de tewang li gorî hejmara dawîn e.

-Gelo çendan ev karê xerab kiriye?
-Çaran kiriye, çaran jî lê temaşe kiriye.

Di vê diyalogê de hejmarên "çar" cînavk in.

Pêncan gotiye em naçin ser karti).
Sisiyan karê xwe baş kiriye, lê diduyan baş nekiriye. Çilî kiriye, çaran xwariye.

PenGÎ hatine, his! û pêncan xwe amade kiriye, lê bîst û pênc ne amade ne.

Cinavkên pirsyarî

Cînavkên pirsyarî di nav hevokê de pirsa cînavkên din dikin û bi vî awayî wan bi me didin nasîn. Ango, mirov bi alîkariya pirsên ku arasteyî lêkera hevokê bike, dikare cînavkan nas bike.

Heke kirde û biresera hevokê bi xwe cînavk bin, mirov dikare bi alîkariya wan pirsan cînavkên din jî nas bike. Cînavkên me yên pirsyarî her yek cureyekî cînavkê bi me dide nasîn.

Kî / kê: Cînavkên ku pirsa kesan dikin ev her du ne. Yek ji wan xwerû ya din jî tewandî ye. Cînavka xwerû *"kî"* pirsa peyva xwerû dike, ya tewandî *"kê"* jî pirsa peyva tewandî dike. Yanê dema yek bibêje; *"Kî dixwe?",* dê bersiva wê jî navdêr an jî cînavkeke xwerû be; *"Zozan dixwe",* an jî *"Ew dixwe" .*

Dema cînavka me ya pirsyarî tewandî be, yanê pirsa *"Kê xwar? "* be, dê bersiva wê jî cînavk an jî navdêreke tewandî be. Li gorî pirsa jorîn dê bersiv wiha be: *"Zozanê xwar"* an jî *"Wê xwar"* be.

Ev her du cînavk li hin deran dibin kirde, li hin deran jî dibin bireser. Bo nimûne, dema ku em bibêjin, ***"Ki kê dibîne?"*** di vê hevokê de ***"ki"*** kirde, *"kê"* bireser e. An jî "kî" pirsa kirde, "kê" jî pirsa bircserê dike. Heke em bibêjin, *"Kê ki dît?"* îcar, *"kê"* dibe kirde, *"kî"* dibe bireser. Li ser van her du cînavkên pirsyarî çend mînak:

Kî kê dibîne? *ElÎ Zozanê dibîne. Yanê ew wê dibîne.*
Kî çi dixwe? *Zozan nên dixwe. Ew wî dixwe.*
Kî **ji** kê sêvan distîne? *Gulçinji Zînê distîne. Ewji wê distîne.* Kî hat? *Ez hatim.*
Kê got? *SÎdê,. got. Wî got.*

Çi: Cînavka *"çi"* pirsa tiştan dike ango heke kirde yan ji biresera hevokekê ne kesek lê tiştek be, wê demê bi "çi" pirsa wî/wê tê kirin. Cînavka **"çi"** cînavkeke nêtar e, hem pirsa kirde hem jî ya bireserê dike.

Mînak:

Eyşanê pirtûk xwend.
Eyşanê çi xwend?
Pirtûk xwend.

Gundiyan dar birîn.
Çi bi ?
Dar birin.

ÇijirÎ?
Eylofirî.

Te ji dukanê çi kirî?
Min kîloyek şekir kiri.

Her çi qas tewandina van cînavkan ne tiştekî asayî be jî, li hin cihan tewandina wan pêkan e. Mirov dikare çend mînakan jî bide:

Wekî; *Çiyê hêk kir? Mirîşkê hêk kir. Çiyê ceh xwar? Kerê xwar.*

Kîjan: Cînavka *"kijan* ", ji aliyê peyvsaziyê ve hevedudanî ye. Ji çend hêmanan pêk hatiye, wekî *"kî-ji-wan".* Taybetiyeke vê cînavkê ya din jî tewangbariya wê ye. Ev cînavk, qertafên tewangê digire û li gorî zayend û mêjerê diguhere.

Mînak:

Kîjanê got!	*(mê,*
Kîjanî got?	*yekjimar)*
Kîjanan got?	*(nêr, yekjimar)*
	(Pif jimar)

Ev cînavk jî dikare bibe kirde yan jî bireser. Wekî nimûne, di hevoka, *"Kîjanê kîjan dîtiye?"* de, *"kijanê'* kirde û . *'kîjan* " jî bireser e. Cînavka *"kîjan"* pirsa cinavkên şanî danê dike.

Mînak:

Kîjan hal?
Ev hat.

Kîjan dibêje'!
Ewa han dibêje.

Kijanê kirî.
Vê ya hanê kirî.

Kîjanî got?
Vî got.

Kijanê got?
Vê got.

KÎjanan dît?
Van dît.

Kîjanî nedît?
Wî nedit.

Kîjanê nekir.
Wê nekir.

Çend: Cînavka *"çend"* pirsa cînavkên jimarîn dike. Wekî nimûne,

- Çend çûn, çend man?
- Çar çûn, şeş man.

Cînavka *"çend'* jî cînavkeke hevedudanî ye. Ji du hêmanan *"çi"* (*"1 "hendê* pêk hatiye. Ev peyva *"hend'* îro zêdetir wekî *"hind'* tê bikaranîn û di wateya *"evqas"* de ye. Ev cînavk di bingeha xwe de pirjimar e. Lewre jî mirov nikare bibêje *"çend hat?"* divê mirov bibêje; *"Çend hatin?"* Ew li gorî rnêjerê ditewe, lê li gorî zayendê natewe. Ew jî dikare di nav hevokê de hem pirsa kirdeyê, hem jî pirsa bireserê bike. Mirov dikare peywira ku ew digire ser xwe û rêgeza tewandina wê di nav van hevokan de destnîşan bike:

Çend çendan
dibînin? Çar sisiyan
dibînin.

Çendan çend
dîtin? Çaran du
dîtin.

Di hevoka yekemîn de ji ber ku dema niha ye, *"kirde" (çend)* xwerû maye, *"bireser" (çend)* tewiyaye. Di hevoka duyemîn de jî, *"kirde" (çendan)* tewiyaye, lê *"bireser" (çend)* wekî xwe maye. Her wekî j i bersivan jî xuya ye, cînavka çend pirsa jimarnavan dike.

Bo nimûne:

Çendan dît? *Çaran dît.*

Çendan xwar? *Dehan xwar.*

Çendan kirî? *Pêncan kirî.*

Çendan ev kar kir? *Çilî ev kar kir.*

Di cînavkan de neyînî

Di cînavkan de jî neyînî her wekî navdêr û rengdêran bi alîkariya daçeka /ne/ tê nîşandan. Ew daçek tê pêşiya cînavkan û ncyînîbûna wan nîşan dide.

Mînak:

Kesê ku tu qalê dikî ***ne*** *ez im. Ew ku min dit* ***ne*** *tu bûyî.*
Kesê ku ez li hêviyê me, ***ne*** *ewe. Daxwaza min nejî we ye.*
Derdê min ***ne*** *hûn in.*
Birayê min ***ne*** *çar in. sisê ne.*
Gotinên min neji we re ne.
Axaftina min ***ne*** *ji bo yekî tenê ye. Sonda wî neji bo hinekan e.*

HEVALNAV

Her wekî ji nav jî diyar e, *"hevalnav"* tê ber navdêran û reng, dirûv û teşeya wan vedibêje; hin caran hejmar û mêjera wan vedibêje. Celadet Bedirxan bi mebesta ku rengê navdêrekê didêre jê re gotiye *"rengdêr* ".

Gelek kesan jê re *"hevalnav"* gotiye. Di zaravayê soranî de jî jê re *"awelnaw"* dibêjin ku tê wateya *"hevalnav"ê.* Bi baweriya mejî peyva *"hevalnav"* zêdetir di cihê xwe de ye. Ji ber ku ew hevaltiya navdêrê dike, navdêrê j i gelek aliyan ve bi mirov dide nasîn.

Hevalnav ji aliyê wateyê ve du bir in; *"hevalnavên* çawaniyê" û *"hevalnavên diyarkirinê* ". Hevalnavên ku di binyata xwe de hevalnav in, ew reng, dirûv û teşeyên navdêran didêrin û yên ku di binyata xwe de tiştekî din in, lê dema dikevin beriya navdêrê hinek taybetiyên navdêrê ji me re vedibêjin, ew jî hevalnavên diyarkirinê ne.

Bo nimûne, gava em dibêjin; *"reş* ", *"kinik", "çavşîn"* tiştek tê ber çavên mirov. Yanê ev peyv kesekê/î yan jî tiştekî bi mirov didin nasîn, wekî; *"kera reş* ". *"lawikê kinik* ", *"keçika çavşîn* " ... Ev giş hevalnavên çawaniyê ne.

Hevalnavên diyarkirinê çendanî û mêjcra tiştan bi awayekî teqez an jî ne teqez nîşan didin.

MÎnak:

Ev mirov haf.
Wê keçikê nan xwest.
Hinek mirovan gazî me kir.
Çar avahiyên wî *hene.*
Kijan zilamî got!
Çend berxik hene?

Ji cureyên hevalnavan bi tenê hevalnavên çawan iyê yên resen in, ew cure hevalnav ji bilî qertafên payeyê tu qertafan wernagirin û di nav hevokê de nayên guhartin.

Lê hevalnavên diyarkirinê di bingeha xwe de cînavk fl jimarnav in, wekî hevalnavên şanîdanê,jimarîn û nebinavkirî guherbar in. Ew cure cînavk ditewin, heta navdêran jî bi xwe re ditewînin.

Minak:

Vi mirovi got.
Vê keçikê
nvest. Van
daran bîne.

Ji hêla peyvsaziyê ve hevalnav

Ji aliyê peyvsaziyê ve hevalnav jî wekî cureyên din ên bêjeyan dibin du birên sereke; *"xwerû"* fl *"nexwerû"* yên nexwerû jî dibin du cure: *"hevedudanî", "pêkhatî",*

Hevalnavên xwerû, hêmanekê tenê di nava xwe de dihewînin. Wekî; *na. tûj, reş, spî, kesk, jîr; berz, xweş, şor, kal, pir, qenc, pak, zer, bilind, belek, baş, çê. heja, kesk.* ...

Dema ku mirov wan hevalnavan parçe bike, tiştekî watedar ji wan demakeve.

Hevalnavên hevedudanî

Hevalnavên hevedudanî ji çend hêmanên serbixwe hatine pê. Peyvên ku wan pêk tînin jî bi serê xwe xwediyê wateyekê ne, lê heval nava nû wateyeke nû digire. Her wekîji mînakan jî diyar dibe, yek ji wan peyvan ku ev hevalnav pêk anîne bi serê xwe xwediyê wateyekê ne. Bo nimûne di heval nava *"pozbilind"* de hem *"poz"* hem jî *"bilind"* watedar in

Hevalnavên hevedudanî bi çend awayan pêk tên:

1- Navdêrek tê ber hcvalnavekê û hevalnaveke nû pêk tîne:
Hevalnavên hevedudanî bi piranî bi vê rêbazê pêk hatine.

Minak: çavreş. cangiran, destsivik, pozbilind, payeherz, navno, porspî, porkej. devçepel, guhbel, serşûnik, diranpîj, meşwerdek, parîmezin ...

2- Her wiha hin earan jî hevalnav berî navdêrê tê û bi vî awayî hevalnaveke nû pêk tê.

Mînak: *kêmxwê, pirbêj, têrxwê, têrtijî, kêmaqil, xweşmêr, bilindwar, kalemêi; pîrejin. ..*

3- Hin earan jî du navdêr têne ber hev û hevalnavekê pêk tînin.

Mînak: *serteşî, gerdenbilûr, bejnrihan, devgirêz, devşikeft, pozberan, devşorbe, ziktêr, destgopal, diranpîj, çavxezal, cegerxwîn. ..*

4- Hin earan daçekek tê ber navdêrekê yan jî dikeve navbera du navdêran û hevalnavekê pêk tîne.

Mînak: *likar, jîp iya, lirê, nelirê, jidil, devliken, devbixwîn, rûbimast, dilbikul, çavligoşt, bejnlihev, dilbiêş, babidev. çavlirê, destodev ...*

Hevalnavên pêkhatî û qertafên ku wan pêk tînin

Hevalnavên pêkhatî bi alîkariya peyveke watedar û qertefan pêk tên. Wekî mînak; *"tirsonek ,, "gundi", "jîrek* ". *"bengî", "navdar* ". *"watedar* " ...

Her wekî ji mînakan jî diyar e, peyvên *"tirs* ", *"gund", "jîr* ", *"beng", "nav"* bi xwe bêjeyên watedar in, lê qertafên *"<onek", "* ***ek",*** *"<î", "<dar"* **wateyên nû dane wan.**

Pêşgir

Hin paşgir û pêşgir hene ku hevalnavan pêk tînin, pir kêm in. Em ₔ çend hebên ku bi piranî têne bikaranîn, hildin dest. Em pêşî bala xwe bidin pêşgiran:

lho-/: ji rayeka lêkeran a dema niha hevalnavan çêdike.
Mînak: *hozan, hogir, honas, hoker, hodar. ..*

Izir-/: Mezinbûn û resenbûna taybetiyeke neyînî nîşan dide.
Mînak: *zirker (kerê rastîn), zirdîn ...*

Ikele-/ digel navdêran hin hevalnavan jî çêdike,
Mînak: *kelepir (vanê ne pîr), kelejin, ke/emê}: ..*

/qeş-/: Ev di bingeha xwe de ji bêjeya qaşo tê lê wekî pêşgir jî cih girtiye.
Mînak: *qeşmer. ..*

Daçekên *"bi-"* û *"bê-"* û hokerên mîna *"ser-", "bin-", "ber-"* tên ber navdêran û pê hevalnav çêdibin.

Ibi-/: binav, bibext, bihêvî, bimirûz, dilbikul, biceger. bişans, bikeser; bijan ...

/bê-/: bêbext, bêhêvî, bêqidûm, bêceger, bêbawer, bêteşe, bêaqil, bêşans ...

Bi hokerên cih ên mîna *"ser", "bin"* û *"ber"* jî gelek hevalnav pêk tên.

Mînak: serdest, bindest, berdest ...

lçele-I ji hevalnav ekê hevalnaveke din pêk tîne.
Mînak: çelexwar, çelewîç

Daçeka neyiniyê *Ine-I* li vê derê rola pêşgirê bi cih tîne.
Mînak: nezan, nexweş, nemir, neçar, newêrek ..

Hevalnava *Ibed-I* jî di kurdî de êdî rengê pêşgirekê wergirtiye.
Mînak: bedbext, bedbîn, bedawaz, bednav ...

Paşgir

Di kurdî de wekî navdêran, hevalnavên pêkhatî jî bi alîkariya paşgiran têne dariştin.

I-î/: Ji lêkeran hevalnavan çêdike. Ji van hevalnavan re lêkerên di rewşa raweya çêbiwar de tê gotin.
Mînak: ketî (ketin), lewitî (lew itîn) , *peritî (peritin), xwestî (xwestin) ...*

Her wiha I-î/yeke din heye, mensûbiyetê nîşan dide ew jî heval-navan çêdike.

Mînak: gundî, bajarî, xerzî, botî, mirdêsî, reşî, silivî ... *I-al*

ji rayeka lêkerê ya dema niha heval navê çêdike. *MÎnak:*

beza (bezîn), zana (zanîn) ...

/-gînl digel navdêran hevalnavan jî çêdike.
Mînak: lezgîn, xemgîn. ..

I-asa/: ji navan hevalnavan çêdike.
Mînak: dêwasa, qerase, hûtasa ...

/-awer/: ji navan hevalnavan çêdike.
Mînak: *cengawer, dilawer, giyanewer. ..*

/-ak!: **ji** navan hevalnavan çêdike.
Mînak: *ronak, sêlak, şilak ...*

/-ane/: ji navan hevalnavan çêdike.
Mînak: *jinane, mêrane, şêrane, aştiyane ...*

/-bar/: ji rayeka lêkeran hevalnavan çêdike.
Mînak: *dîtbar; xwarbar, guherbar, guhêzbar. ..*

/-dar/: ji navdêran hevalnavan çêdike.
Mînak: *ma/dar, baldar; watedar: ..*

/-mend/: ji navdêran hevalnavan pêk tîne.
Mînak: *bawermend, hunermend, aqilmend. ..*

/-e/: ji lêkeran hevalnavan çêdike.
Mînak: *xwende, bende, bijarte ...*

/-ek!: Ji navdêr ₀ hevalnavckê, hevalnaveke nû çêdike. ***Mînak:*** *ZÎrek, dizek, çi/ek, kulek, tirek, fisek,* ...

/-În/ ji navdêran hevalnavan çêdike.
Mînak: *zivîn. zêrîn, darin, şirîn, germîn, sarîn. ..*

/-ok!: Ev paşgir hin caran navdêran hin caran jî hevalnavan çêdike.
Mînak: *şermok, tirsok, qerfok, kenok, revok. ..*

/-nakl ji navdêran hevalnavan çêdike.
Mînak: *tirsnak, xeternak, derdnak, xemnak ...*

/-onekl ji navdêran hevalnavan pêk tîne. ***Mînak:*** *tirsonek, bizdonek ...*

/-yar/ ji navdêran hevalnavan çêdike.
Mînak: *hişyar, bextyar, bihizyar. zanyar. ..*

/-ele/: ji navdêran hevalnavan çêdike. ***Mînak:*** *rewtele, çenge/e ...*

/-ezar/: ji navan hevalnavan çêdike.
Mînak: *şermezar, tengezar, dexesezar.*
..

I-ar/: Ev paşgir digel navdêran hevalnavan jî pêk tîne.
Mînak: mirar, xewar, kevnar. ..

Hin paşgirên din ku hevalnavan çê~ikin:

*I-ûdl şerûd. .. I-col nîvco ... I-ganl bazirgan ... I-ijl paqij, lavij . 1-azl tolaz ... I-werl hunewer, serwer. .. l-oxJ dayox, çûndox, kirox . 1-*oyîl *şermoyî, germoyî.:*

I-êr/: ji navdêran hevalnavan çêdike.
Mînak: dilêr, gelêr. ..

I-ik/: digel navdêran wateya biçûk û delalokiyê dide hevalnavan.
Mînak: kinik, reşik, xweşik. ..

Rayeka dema niha ya hin lêkeran ji wekî paşgir hevalnavan pêk tînin.

I-kuj/: mêrkuj, hêvîkuj, mirovkuj.. I-
mêj/: xwînmêj. şîrmêj. ..
I-rêj/: xwînrêj, avrêj, xwêdanrêj. .. I-
ker/: zêrker, derewker; hêsanker. ..
I-revÎn/: *xemrevîn, dilrevin ...*
I-xwaz/: xêrxwaz, aştîxwaz, azadîxwaz, şerxwaz, dilxwaz ...
I-bir/: rêbir, hêvîbir ..
I-xur/: *kedxur, kurtêlxur, bertîlxur, malxur, mîratxur. ..*
I-avêj/: *peravêj, dûravêj, kurtavêj. ..*
I-bêj/: *pIrbêj, xweşbêj. ..*
I-bîn/: *dûrbîn, çakbîn, hûrbîn, bedbîn, tengbîn ...*
I-gir/: alîgir, pişţgir, destgir. ..
I-firoş/: *we!atfiroş, aqilfiroş, xwefiroş, agahifiroş ....*
I-kêş/: şûrkêş, balkêş, zehmetkêş, tîrkêş, xemkêş ...
I-xenêq/: *gurxenêq, pezxenêq ...*

Divê neyê jibîrkirin ku gelek qertafên bêjesaz ku hevalnavan çêdikin, di heman katê de navdêran jî çêdikin. Lewre hinek qertafan di her du cihan de jî cih girt.

Hevalnavên kompleks

Di pêkanîna hevalnavan de carinan hinek rêbazên cuda jî tên bikaranîn. Gelek hevalnavên nexwerû hem hevedudanî hem jî pêkhatî ne. Hin caran du bêjeyên hevedudanî têne ba hev heval-

naveke nû pêk tînin, her wekî peyva *"serîhildayî"* hin caran heval-naveke hevedudanî qertafekê werdigire û dibe hevalnaveke nû. Bo nimûne, *"sergewezî",* Ji bilî vê yekê jî hinek rêz û rêzikên pêkanîna hevalnavan hene.

1- Carinan jî bi dubarekirina hevalnavan bi guherîna gihaneka "û" bi awayê "o" û bi cihkirina tîpa *"m"* li destpêka peyva duyemîn, hevalnavcke nû tê çêkirin.

Mînak: *soromoro, xwaromaro, şaşomaşo, kevnomevno, şînomîno, reşomeşo ...*

2- Bi dubarekirina navdêrê û alîkariya paşgira "-î" jî hevalnav têne çêkirin.

Mînak: *gulgulî, qulqulî, kerkerî, xelekxelekî, gincirginciri, xalxalî, parçeparçeyî ....*

3- Hinek rêbazên din hene ku wateya heval navê xurt dikin.

Mînak: *çiksayî, çîlspî, sorgevez, sipsor; kip kes k, ripreş*

Ċureyên hevalnavan

Hevalnav dibin çend celeb. Mirov dikare bi awayekî giştî di bin van sernavan de wan ji hev cuda bike:

1) Hevalnavên çawan iyê (wesfin)
2) Hevalnavên şanîdanê
3) Hevalnavên pirsyariyê
4) Hevalnavên nebinavkirî
5) Hevalnavên jimarîn

Hevalnavên çawaniyê

Hevalnavên çawaniyê her wekî ji navê wan jî diyar e, çawaniya navdêrê nîşan didin. Ev hevalnav bi du awayan bi navdêrê re têkildar dibin; bi alîkariya veqetandekê wekî *"mirovê baş* ", *"keçika bedew* ", *"xortê jêhatî* ". *"kesê qure ". "zaroka şûm ". "dara hişk ", "xaniyên kevirî ...* "û bi alîkariya lêkera *"bûn"* mîna *"Ev dar hişk e.* ", *"Xaniyê me.fireh e.* ", *"Hevalên min jêhatî ne.* ", *"Birayê min serhişk e. „*

Mirov dikare ji mînakan jî fêm bike ku hevalnavên çawaniyê hevalnavên resen in. Ew di nava hevokê de ji bilî qertafên payeyê tu qertafan nagirin û di wan de tu guherîn çênabe. Ew ji aliyê zayend û rnêjerê ve neguhêrbar in. Ew qertafên tcwangê nagirin, veqetandekên ku piştî hevalnavan tên jî jixwe ne veqctandekên hevalnavan in, ew veqetandckên navdêran dubare dikin, zayend û mêjera navdêra wê nîşan didin. Lewre jî divê ji hevalnavên çawaniyê cuda bên nivîsandin. Bo nimûne, gava em dibêjin; *"Heva/a di/geş a jîrek."* Veqetandeka "a" ne veqetandeka hevalnava *"di/geş"* e, lê veqetandeka *"heval"* e.

Hinek kes dema du hevalnavên li pey hev rêz dikin, veqetandeka duyemîn dikin *"<î",* yanê dibêjin: *"hevala çeleng î delal".* Ev bikaranîn çewt e, jiber ku **''–f'** veqetandeka navdêrên nêr e, lewma jî mirov nikare li pey navdêrên mê bi kar bîne. Qertafa "-,' cihê *"-ê"* digire, lê tu car nikare cihê *"-a"yê* bigire.

Jixwe di hin devokan de li şûna veqetandeka *''-ê''* qertafa *"-1"* tê bikaranîn. Mînak, li cihê ku bibêjin *"Bavê min got.",* dibêjin; *"Bavî min got.* " Ji ber vê egerê mirov dikare bibêje; *"Hevalê delal î ciwanmêr haf.* ", lê nikare bibêje, *"hevala delal* î *xweşik",* divê mirov bibêje, *"hevala delal a xweşik",* carinan jî *''a''* dibe "e"ev hevok bi rengê, *"hevala delal e xweşik"* derdikeve pêşberî mirov.

Mînak:

Hevala min a çeleng baş dixebite.
Birayên min delal in.
Dayika niştîman li ber dilê min ezîz e.
Dara gûzê ya bilind sî daye dora xwe.
Karika biçûk winda bûye.
Birayên min ên mezin /i dor xwarinê civiyane.
Xwişka min a çavşîn çûye gund.
Warê xweş warê me ye.
Mirovê pîr hurmetkar e.
Hespê spî xweş dibeze.
Erdê hişk, asîmanê dûr.
Min yek ji rindikan dît.

Di hevalnavên çawaniyê de mijarek jî neyînîkirina wan e. Neyînikirina hevalnavan bi alîkariya hokera *"ne"* tê kirin. Ew berî hevalnavan tê û neyîniyê nîşan dide.

Mînak:

Ev xwarin ne xweş e. Ew gotin ne hêja ye.
Ev zilam ne qenc bû. Ev keçik ne bedew e. Ev kes ne ciwan e.
Ev welat ne pir sar e.
Zarokên we ne bicûk in. Ew mirov ne camêr e.

Di zimanê devkî de li şûna *"ne"* piştî hevalnavê *"nîn"* an jî *"nin"tê* bikaranîn, her wekî *"Ev welat pir sar nîn e.* ", *"Ev çiya bilind nîn e.* " lê bi baweriya min ev aloziyê pêk tîne, ji ber ku *"nîn"* nîşaneya nebûn û tunebûnê ye. Lewre jî divê ev form di zimanê nivîskî de neyê bikaranîn.

Di hevalnavan de paye

Di hevalnavên resen ango hevalnavên çawaniyê de paye heye. Ji ber vê yekê me mijara payeyê piştî hevalnavên çawan iyê danî. Paye asta navdêr û rewşa wan a li hemberî navdêrên din nîşan dide. Di kurrnanciyê de sê payeyên bingehîn hene: *"payeya asayî", "payeya hevrûkirinê"* û *"payeya berztirîn* ".

Em dikarin bi mînakekê mijarê rave bikin. Peyva *"bilind"* heval-naveke di payeya asayî de ye. Dema em bibêjin; *"Dara gûzê bilind e"* ev li ser pîvanên bilindiyê tu tiştî nabêje, tê zanîn ku li gorî pîvanên giştî ew dareke bilind e. Lê dema dareke din hebe, mirov wan her du daran bide ber hev, wê gavê mirov ji yekê re dibêje *"Ev dar ji ya din bilindtir e.* " Heke dareke j i hemû darên beyî bilindtir li holê hebe, wê gavê divê mirov bibêje; *"Ev darji hemûyan bilindtir e* ", *"Dara herî bilind eve".*

Ji bill van şêweyan mirov dikare bi awayê *"Dara bilindtirin ev e."* jî bibêje. Ev şêweyê dawîn her çi qas ji zaravayê kurmanciya jêrîn (soranî) hatibe wergirtin jî, niha di zimanê nivîskî de bi berfirehî tê bikaranîn.

Payeya asayî:

Di vê payedariyê de rewşa asayî ya hevalnavê heye. Hevalnav li vê derê qertafan wernagire û tu bêje nayên ber hevalnavê.

hevalê baş
gundê xweş
mala fireh
xaniyê textîn
keçika çavreş
Ev heval haş e.
Ev xanî fireh e.
Ev avsar e.

Di rewşa asayî de paye bi gelemperî tê nîşandan. Dema me got, *"mirovê baş"* em qala başiyeke asayî dikin.

Payeya hevrûkirinê:

Di vir de çend tişt bi hev re têne hevrûkirin. Du tişt an dê mîna hev bin û bi qasî hev bin an jî yek j i wan dê bi taybetiyeke xwe jiya din kêm an jî zêdetir be. Hevrûkirina tiştên dişibin hev bi alîkariya hinek hokerên pileyî yên mîna, *"bi qasî hev, hindi hev, wekî hev, mina hev"* tê kirin. Hevrûkirina tiştên ji hev cudatir jî carinan bi alîkariya hokerên pileyî yên mîna *"hinekî, gelekî, piçekî. .. „* û bi piranî jî bi alîkariya paşgira *"-tir"* pêk tê. Em ₚₑşî ji bo tiştên dişibin hev hin mînakan bidin:

Mînak:

Ew bi qasi te mezin e.
Bi zimandirêjiya xwe wekî hev in.
Bejna we hindî heve.
Pênûsa te ne ewende sor
e. Çîroka wî *pir xweş bû.*
Bejna wî zêde bilind hû.
Şîva êvarî ecêb xweş bû.

Bi awayekî gelemperî payedariya hevrûkirinê bi paşgira *"<tir"* tê nîşandan.

Ew ji te biçûktir e.
Sêvji hêjîrê xweştir e.

Beybûnji Sosinê ciwantir e.
Ga ji bizinê girantir e.

Payeya berztirîn:

Payeya berztirîn di kurmanciya gelêrî de bi alîkariya hokcrên pileyî *"herî û tewrî"* pêk tê. Lê di zimanê nivîskî de ligel van hokeran paşgira *"<tirîn"* jî tê bikaranîn. Ev paşgir di zaravayê kurmanciya jêrîn de û di zimanê farisî de heye, lê hê nû ketiye kurmancî.

Mînak:

Gûzên herî xweş li Gûzereşê hene.
Temenê dirêjtirîn li welatên pêşketî ye.
Şêvên tewrî xweş li Xelatê bi dest dikevin.
Darên herî bilind li ber avê ne.
Mirovên kiniktirîn li Çînê ne.

Em çend mînakan jî ji her sê payeyan bidin:

Birayê min biçûk e.
Ez jê mezintir im.
Kekê min mezintirînê me ye.
Tirî xweş e. lê sêv ji tirî xweştir e.
Fêkiya xweşiktirîn xox e.
Îsotên aliyê me tûj in. Lê yên Mêrdînê tûjtir in.
Îsotên herî tûj li Rihayê peyda dibin.

Divê bê zanîn ku radeya payeya hevalnavan bi xwe jî heye û ew pîvan bi hejmaran û bi hevalnavên nebinavkirî têne nîşandan.

Mînak:

Piçekî mezin e.
Hinekî mezin
e. Gelekî
mezin e. *Pir*
mezin e.
Pir û pir mezin e.
Çar salan ji te mezintir e.
Du bihostanji te dirêjtir e.
Sê gavan ji zeviya mefirehtir e.
Heta tu bêjî bes mezin e.

Ew ji gelekan mezintir e.
Ewji hemûyan mezintir e
Ew geleki ji ya din mezintir e.
Bi qasî serê derziyê ne girÎng e.

Carinan diyarkirina payeya herî zêde bi awayekî din jî pêk tê. Qertafa dengê pêşîn ₑ rengdêrê tê pêşiya qertafa *"-ip"ê* bi vî awayî xurtbûna radeya rengê hevalnnavê tê nîşandan.

Mînak: nipnû, rip reş , sipsar. kipkesk, hiphişk, xipxweş, sipsor; zipzer. çipçê ...

Dema mirov dibêje, *"nipnû"* wisa tê zanîn ku pir nû ye. Ev yek ji bo mînakên din jî wisa ye, di hin bêjeyan de ew *"<ip"* bi awayên din jî derdikeve pêşberî mirov, her wekî *"vitûvala* ", *"vikûvala"* û *"virtûvala* ", lê forma bi gelemperî bi *"ip"ê* tê çêkirin.

Hevalnavên şanîdanê

Ev hevalnav, bi xwe cînavkên şanidanê ne. Cînavkên me yên şanîdanê *"ev",* "ew" dema ku ev dikevin ber navdêran wan nîşanî mirov didin, dibin hevalnavên şanidanê. Gava em bibêjin, di hevoka *"Ev çû mala xwe.* ₁ de *"ev"* cînavk e, lewre cihê kesekî girtiye, wî nîşanî mirov dide, lê dema ku mirov heman hevokê bi şêweyê *"Ev heval çû mala ,nve.* ₙ saz bike, wê demê *"ev"* dibe hevalnav. Heval-navên"ev" û *"ew"* hevalnavên xwerû ne û tên ber navdêrên xweru.

Mînak:

Ev gundî duh ji bajêr hatin.
Ev heval ji min re navê xwe
nabêje. Ev malji mala me xweşik/il'
e.
Ev kurik xwarziyê min e.
Ew kurik şagirtê min e.
Ev re: ₑbavê min e.
Ew re: ₑbavê min e.

Her wekî ji mînakan jî diyar e, hevalnava *"ev"* navdêrên nêzîk, *"ew"* jî yên dûr nîşan dide. Pirjimariya wan jî bi alîkariya lêkerê û cinavkên kesandinê tê zanîn.

Mînak:

Ev pêlav baş e.
Ew pêlav haş
in. Ev sêv sar e.
Ew sêv sor in.
Ev çakêt nû ye.
Ew kinc nû ne.
Ev gore kevn in.
Ev kum kevn e.
Min ev *sêv xwm:*
Te ew sêv xwarin.
Ev mirov diçin bajêr.
Ev keçik diçe dibistanê.
Ev keçik diçin dibistanê.

Her wekî me di mijara cînavkan de jî dabû xuyakirin di zimanê gelêrî de *"eve/eva"* û *"ewe/ewa"* tê gotin, ji bo yên pirjimar jî *"evana/evene"* û *"ewana/ewene"* tê gotin. Dema ku ev cure cînavk dibin rengdêr ew qertaf derbasî navdêrên piştî xwe dikin. Dema ku mirov bala xwe dide cînavkên zaravayên din mirov dibîne ku ev formeke kevnare ye. Bo nimûne di soranî de jî cînavka şanîdanê *"eme"* ye. Lê vê formê di zimanê nivîskî de cih negirtiye, ji ber ku ew paşgir wekî bargiranî hatine dîtin, ji holê rabûne.

Mînak:

Ev mirove/ev mirova diçe.
Ev mirovana/mirovene diçin.
Ev tişte/ev tişta baş e.
Ev tiştana/tiştene baş in.
Ew kesana/kesene diçin ku derê?
Ew gundana/gundene bi destê kê hatin wêrankirin?

Di hin devokan de pirjimariya hevalnavan bi veqetandekan jî tê nîşandan.

Mînak:

Ev mirov yê baş e.
Ev pêlav yên baş
in. Ev sêv ya baş
e.

Tewanga hevalnavên şanîdanê

Ev hevalnav, her wekî di mijara cînavkên şanîdanê de hate gotin, ditewin; qertafên tewangê *"-P', "-ê"* II *"<an"* digirin 0 *"ev"* dibe; *"evi"* (nêzîk-nêr), *"evê"* (nêzîk-mê), *"evan"* (nêzîk- pirjimar).

Ew jî dibe; *"ewî"* (dûr-nêr), *"ewê"* (dûr-mê), *"ewan"* (dûr-pirjimar). Di zimanê nivîskî de "e"ya destpêkê dikeve, ew jî dibin;

"vî", "vê", "van"; "wî", "wê", "wan".

Ev cure hevalnav navdêrên tewandî nîşanî mirov didin. Taybetiyeke hevalnavên şanidanê yên tewandî ev e ku bi xwe re navdêrên li pey xwe jî ditewînin.

Mînak:

Min ji wî hevalî re got.
Wê hevalê ji min re
negot.
Wan hevalan li mala me nan
xwm~ Vê keçikê ez nedîtim.
vî lawikî têr nan nexwar
Van rebenan çi digot?

Rêgeza gişтî ya ji bo tewangê ji bo hevalnavên şanîdanê jî derbas dibe. Yanê di lêkerên gerguhêz de, di demên borî de kirde, di demên niha û bê de jî bireser ditewe.

Mînak:

Min ev heval dit.
Wî hevalî ez
dîtim.
Ez van hevalan dibînim.
Ew heval min dibînin.
Vê keçikê nan ani.
Ev keçik pirtûkan time.

Hevalnavên şanîdanê yên şibandinê

Celebeke din a hevalnavên şanîdanê heye ku mirov dikare wekî *"hevalnavên şanîdanê yên şibandinê"* bi nav bike. Her wekî; *"wiha* ", *"wisan* ", *"wilo* ", *"halo* ", *"werê* ", *"hani", "weta* " ...

Ev eure hevalnav mirov dixin tengasiyê ji ber ku bi hinek taybetiyên xwe ew dişibin hevalnavên nebinavkirî jî. Her wiha ji ber ku hevalnava pirsyarî *"çawa"* pirsa van hevalnavan dike, mirov dibêje qey hevalnavên çawaniyê ne. Lê çawaniya ku ew nîşan didin nebinavkirî ye.

Di encamê de dema ku mirov baş bala xwe dide wan, mirov dibîne ku aliyê nîşandanê girantir e. Ji ber vê yekê me navê hevalnavên şanîdanê yên şibandinê lê kir, lewre taybetiya wan li gorî tiştê ku tê şibandin diyar dibe. Li aliyê din, ji aliyê peyv saziyê ve ev hevalnav balkêş in. Dema ku mirov ji aliyê peyvsaziyê ve bi hûrbînî li wan dinêre mirov dibîne ku ew jî ne xwerû ne, bi alîkariya hevalnavên şanîdanê pêk hatine.

"Ewê ha" bûye *"ewha"* û paşê jî bûye *"wiha" "Ew san"* bûye *"ewsan"* û paşê jî bûye *"wisan" "Ew lewn "* bûye *"ewlo"* û paşê jî bûye, *"wilo" "Ew tewr"* Bûye *ewtewr tî* paşê jî bûye *"weta"*

Ji ber ku guherîn ji mêj ve pêk hatiye, bingeha wan hevalnavan hatiye jibîrkirin. Ev hevalnav dema ku hevaltiya navdêran dikin, hevalnav in, lê dema ku tên ber lêkeran û awayê kar nîşan didin, heval kar ango hoker in.

Mînak:

Ez mirovekî wiha nas
nakim. Te tiştekî wisa
gotiye?
Zîn tiştekî wiha nake.
Zarokên wilo li serê mirov dibin bela.
Culeke wilo da min, kuleke halo di dilê min de çêkir.
Hevalnavên jirnarîn

Jimarnav dema tên ber navdêran, dibin hevalnavên j imarîn. Ji ber ku navdêran ji hêla jimarê ve bi me didin nasîn. Weki mînak; dema em bibêjin *"Çar gundiyan nan xwar",* hejmara *"çar",* taybetiyeke gundiyan ango hejmara wan bi me dide nasîn. Lewre jî dibe hevalnav. Mirov dikare bi çend mînakan mijarê zelaltir bike:

Mînak:

Çar xwişkên wî hene.
Du pismamên wî *hatin.*
Pênc hevalên wî pê re
çûn. Çil keziyên xwe şeh
kirin. Du mihan hikire.
Heft riyan bide ber
x\Ve. Çaryek nanî
bixwe.
Ji pêncan yekê xwarinê min xwar.
Du gîskan bifiroşe.

Hevalnavên jimarin li gorî taybetiyên jimarnavan ji hev cuda dibin.

1- Bi jimamavên bingehîn hevalnav:

Mînak:

Çar hevalên min hatin alikariya min.
Du bûkên mala apê min hene.
Pênc xwarziyên min bi hev re
dixebitin. Bi tîrekê du nîşan hildan.
Ciwanan li ber dibistanê bîst dar çandin. Di
tewleyê de sed mehîn û pêncî hesp hene.
Kî dikare şazdeb qesr û qonaxan di deh salan de ava bike?

2- Jimamavên rêzin berevajî jimarnavên bingehîn piştî navdêran tên û bi veqetandekan rêza navdêran nîşan didin.

Mînak:

Di *salnameya kurdî de meha yekê (yekemîn) adar*
e. Di dersa çaran (çaremîn) de mamoste nexweş
ket.
Min gava pêncan (pêncemîn) avêt, ez gihîştim ber
dêrî. Di hejmara sedî (sedemin) de min xwe ji bîr kir.
Ez negihîştim hevalê sihî (sihemîn) da ku wî hişyar hikim.

3- Bi hejmarên şikestî ango dabeşkirinê hevalnavên jimarîn

Mînak:
Min du nan û nîv anîn malê.
Bozên çaryek kîlo goşt kirî.
Ji sisiyan duyê xwarinê wi xwar.

Hevalnavên nebinavkirî

Cînavkên nebinavkirî dema ku têne ber navdêran dibin hevalnav. Mînak, gava em bibêjin, *"Hinek mirov hatin vir.* ", têtе zanîn ku mirovin hatine, lê hejmara wan ne diyar e ango nebinavkirî ye. Her wiha dema ku em bibêjin, *"Min piçek xwarin xwar"* jî dîsa mîqdara xwarinê ne diyar e. Ji hevalnavên wiha re nebinavkirî hatiye gotin.

Mînak:

Hin berx li mêrgê diçêrin.
Gelek kar hatin kirin.
Her zarokek bi aliyekî ve reviya.
Filan hevalî ji min re got.
Tu mirov bêyî welat nikare bijî.
Hemû gundî ji hozekê ne.
Çend heval hatin mala me.
Birek mirov li wir in.

Hevalnavên pirsyariyê

Ev cure hevalnav tên ber navdêran û ji wan pirsa hevalnavan dikin, ji ber vê yekê ev nav li wan hatiye kirin. Her yek ji hevalnavên pirsyarî pirsa cureyeke hevalnavan dike.

Hevalnava pirsyarî ku pirsa hevalnavên çawaniyê dike *"çawa"* ye. Di hevoka *"Zozan hevaleke baş e "* de ji bo naskirina heval navê divê em pirsa *"çawa"* arasteyî navdêrê bikin. Yanê em bibêjin; *"Zozan hevaleke çawa ye?"* Bersiva wê dê jixweber *"baş"* be. Her wekî tê zanîn *"baş"* li vê derê heval nava çawaniyê ye.

Di kurmancî de ji bilî peyva çawa gelek peyvên ku xwediyê heman wateyê ne, hene. Wekî; *"çito* ", *"çilo* ", *"çerê* ". I Jer wekî çawa em di mijara hevalnavên şanîdanê yên şibandinê de jî li ser rawestiyabûn, bêje hevedudanî ne. Ew ji bêjeya *"çi"* û peyvên *"awan, lewn û tehr"* pêk hatine. Her çi qas di zimanê devkî de ev peyv giş bên bikaranîn jî, di zimanê nivîskî de bi giranî *"çawa* tê bikaranîn.

Mînak:

Li bajêr bihayê nên giran

e. Bihayê nên çawa ye?

Giran e.
Zinar hevalekî qenc e.

Zinar hevalekî çawa

ye? Qenc e.
Dara gûzê bilind e?

Dara gûzê çawa

ye? Bilind e.

Her weki **ji** mînakên li jor jî diyar e, heval nava çawa yeke xwerû ye û natewe. Jixwe hevalnavên ku pirsa *"çawa"yê* dikin jî xwerû ne, ji ber ku ew ji aliyê mêjer û zayendê ve ne guherbar in.

Hevalnava pirsyarî ya ku pirsa hevalnavên nîşandanê dike *"kîjan"* e.

Mînak:

Ev hevalji gund nû hatiye.
Kîjan hevalji gund nû hatiye?
Ev heval.

Vî hevalîji min re navê xwe negot.
Kîjan hevalî ji te re navê xwe
negot? Vî hevalî.

Wan kûçikan nanê şivên xwm:
Kîjan kûçikan nanê şivên xwar?
Wan kûçikan.

Ew mirov cihê xwe nizanin.
Kîjan mirov cihê xwe nizanin?
Ew mirov.

Hevalnava pirsyarî *"kîjan"* navdêra li dûv xwe ditewîne. Bo nimûne:

Kîjan hevalî got?
Wî hevalî got.

Kîjan mirovan rexne li we girt?
Wan mirovan rexne li me girt.

Kîjan keçikê navê xwe negot?
Wê keçikê navê xwe negot.

Pirsa hevalnavên şanîdanê yên şibandinî jî bi hevalnava *"çawa"* û hinek hemwate yên wê tê kirin. Ew jî hevalnavên mîna; *"wiha ". "wisan* ". *"wilo* ", *"halo* ... ne.

Mînak:

Ez hevalekî wiha
me. Hevalekî çawa?
Hevalekî wiha me.

Xebata me her roj wisa
ye. Xebata me çawa ye?
Wisan e.

Ew nanê halo
naxwe. Nanê çilo
naxwe? Nanê halo.

Bajarî mirovên wilo ne.
Bajarî mirovên çilo ne?
Mi ro vên wilo ne.

Hevalnava ku pirsa hevalnavên jimarîn dike *"çend"* e. Mirov bi alîkariya *"çend"ê* hejmara tiştekî hîn dibin.

Mînak:

Du sed karker ji kar hatin avêtin.
Çend karker ji kar hatin avêtin?
Du sed karker.

Du bira bi hev re ketin şer.
Çend bira bi hev re ketin şer?
Du bira.

Pênc zevî hatin avdan.
Çend zevî hatin avdan?
Pênc zevî.

Çar hezar gund hatin valakirin.
Çend gund hatin valakirin?
Çar hezar gund.

Hevalnava *"çend"* jî wekî *"kijan"ê* navdêrê ditewîne. Ji ber ku çend pirsa tiştên pirjimar dike, mirov bi riya tewanga çendê mêjera navdêrê hîn dibe.

MInak:

Çend zi/aman simbêlên xwe kur
kirin? Tu çend gavan diavêjî?
Ez sê gavan diavêjim.
Ew çend nanan
dixwazin? Ew sê nanan
dixwazin.

Ji hevalnavên pirsyarî *"çi qas"* pirsa hevalnavên kuji aliyê mêjerê ve nayên hejmartin dike. Hevalnavên nebinavkirî yên ku hejmara wan ne teqez e bi *"çi qas "ê* tên pirsîn. Çend mînak ji bo vê hevalnava pirsyarî:

Çi qas xwarin
ma? Piçek xwarin
ma.

Çi qas karê me hate kirin?
Hinek karê me hate kirin.

Her wiha hin caran hevalnavên **j** imarin jî bi çiqasê tên pirsîn.

MÎnak:

Çi qas dar hatin birîn?
Sed dar hatin birin.
Çi qas mirov gihîştin cihê kar?
Du sed mirov gihîştinê.

1 [er wiha bi hevalnava çiqasê asta payeya heval navê jî tê

pirsîn. *MÎnak:*
Çi *qas mezin*
e? Pir mezin e.
Çi qas dirêj e?
Piçekî dirêj e.

Tewanga çiqasê derbasî navdêrê

dibe. ***Minak:***

Çi qas goşti bikirim?

Çi qas avê vedixwi?

Nîşe: *Tiştê ku xuya dike peyva "qas" ji "qiyas "a erebî hatiye, bêjeya xwerû bi kurdi "çend" e, ewjî ji peyvên "çi" û "hend'tê pêk hatiye. "Hend" Îro hi gelemperî bi dirûvê "hind" tê bikaranîn, bêjeya hevrûkirinê ya kurdî ewe. Ji bilî "çend'tê, di peyva "ewende" de JÎ heman mantiq heye. Peyv ji "ew" û "hende" pêk hatiye. Cinavkên neblnavkirî "hin* ", *"hinek" û qertafa nebinavkirinê "-in* ***"]!*** *ji heman peyvê tên.*

HOKER

Bêjeyên ku wateya lêker, hevalnav, hokerên wekî xwe ji aliyê dem, cih, bergeh, rewş, sedem, rêje û hejmarê ve temam dikin *"hoker"* in. Bi tenê bêjeyên kuji binyadî hoker in peywira hokeriyê bi cih naynin. Digel wan navdêr, hevalnav, komek, ravek jî carinan peywira hokeriyê bi kar tînin. Ji ber ku hoker bi gelemperî hevaltiya lêkerê ango *"kar"* dike jê re *"hevalkar"* jî tê gotin.

Peyvsaziya **hokeran**

Hoker jî mîna bêjeyên din di nav xwe dibin du cure; *"xweru* u *"hevedudanî".* Ji ber ku hoker bi piranî di bingeha xwe de hevalnav û navdêr in, zêde cudatî di navbera wan û navdêr û hevalnavan de jî nîn e. Bo nimûne, hokerên cih bi piranî navê cihekî ne. Her wiha hokerên demê jî navekî demekê ne. Li aliyê din hokerên çawaniyê jî bi piranî hevalnav in. Digel vê yekê jî hinek xweseriyên peyvsaziya hokeran jî hene. Hoker jî mîna bêjeyên din dibin du eure; hokerên xwerû û hokerên nexwerû.

Xwerû: zû, hêdî. duh, niha, pêr, par, paş. pêş, dor. hîn. vir, wir, pir. ..

Nexwerû: Îro. Îşev. bi şev. bi roj, nîvro. befir pêr, şeva din, roja çûyî, bi vir de, bi wir de, wê de, beri nîvro, piştî nîvro, serêvarki, êvarî, berbanga sibê ...

Hoker bi çend awayan pêk tên; bi alîkariya daçekan û bi alîkariya pêşgir û paşgiran. Divê neyê jibîrkirin ku di hokerên hevedudanî de her peyv bi serê xwe tê nivîsandin.

1- Bi alîkariya daçekan:

Mînak: *bi şev, bi roj.]i niha ve, ji niha û bi şûn de,.Ji Îro pê ve, di malê de. di nav re, di ser re.]i bin ve, mîna canik û camêran, fena keran ...*

2- Bi paşgir û pêşgiran

Mînak:

Pêşgir:

Iî-/: îşev, îro, Îsal ...

paşgir:

lkîJ: serêvarki, nîvrokî, binfiskî. tireki, serserkî, paşpêki, citikî. ...
I-ka/: *hêdîka, zûzûka, hêjka ...*
I-ane/: mêrane, jinane, şêrane ...

Cureyên **hokeran**

1) Hokerên çawaniyê
2) Hokerên demê
3) Hokerên cih û berekê
4) Hokerên pirsyariyê
5) Ilokerên şanîdanê
6) Hokerên çendaniyê

Hokerên çawaniyê

Hokerên çawan iyê, bi piranî hevalnav in, lê çawaniya lêkerê nîşan didin. Bo nimûne. dema ku mirov dibêje; *"Hevala xweşik zû dimeşe.* '', li vê derê *"xweşik"* her weki berê jî hatibû diyarkirin, taybetiya *"heval'lê* bi me dide nasîn, ji ber vê yekê jî hevalnav e. Lê dema ku em bibêjin: *"Hevala me xweşik dimeşe",* Li vê derê *"xweşik"* çawatiya meşê bi me dide nasîn, lewre ji hoker e. Hinek hokerên ku têkildarî demê ◌ awayê pêkanîna kar in, di bingeha xwe de jî hoker in.

Minak: zû, dereng, hêdî, bi lez, rasterast, nerasterast, çarmêrkî, paşpêki, citiki, zûzûka. hêdîka, bi dizîka, qestîlka, bi zanayî. bi nezanî ...

Ji bo zelalkirina mijarê em çend hevokên bi hokerên çawaniyê pêşkêş bikin.

Mînak:

Tu mîna keran xebiti ûwan jî mîna guran xwm:
Min mîna şêran fi ber xwe da.
Pismamê te wekî qralan dijî.
Şîva .nve xwar û zûzûka ji malê
derket. Şivan paşpêkî li kerê siwar
bûye. Zarok citikî li erdê kel.
Bozan hi dizîka çûye bajêr.
Hevalek çarmêrkî rûniştibû.
Ez bi çarlepkî çûm.
Çivîk bilind firiya.
Heval karê xwe bi rêk û pêk
dike. Birayê min navê xwe zû
dibêje. Pirsgirêkê nerasterast
bibêje.
Ez bi lez ji vir dûr ketim.
Kalemêr hêdî dimeşin.
Ew heval pir tûj xeber dide.
Hema wê gotinên xwe rasterast li nav çavên wî
dan. Vê sibehê em hi derengî çûne km:

Hokerên şanidanê

Hokerên sanidanê bi nîşandana karekî awayê pêkhatina wî karî vedibêjin. Ev hoker du cure ne, hinek ji wan karên diyar û nêzîk, hinek jî karên dûr û nediyar nîşan didin.

Hokerên şanîdanê yên ku karên nediyar û dûr nîşan didin ev in: *"wisa* ", *··ll'i lo* .', *"werê* " ...

Hokerên şanîdanê yên ku karên diyar û nêzîk nîşan didin jî ev in: *"wiha", "halo", "henî" ...* Di mijara hevalnavan de em li ser peyv saziya wan rawestiyabûn, lewre jî cm ₔ heman tiştî dubare nekin. Niha em dixwazin çend mînakan bidin.

Mînak:

Min ji te re wisa negot.
Wiha kir û wiha xwar.
Tu jÎ li min halo meke.
Te werê gotibû min.
*Çawa bir, wisa **ji** anî.*
Çawa kir, wilo jî xwar.
Te çilo got, min wilo jê re dubare kir.

Divê bê gotin ku di zimanê nivîskî de ji wan hokeran *"wiha"* û *"wisa"* herî zêde têne bikaranîn, ên din kêmtir têne bikaranîn.

Hokerên demê

Her wekî **ji** nav jî diyar e, ev cure hoker dema kar nîşan didin. Mirov ji van hokeran derdixe ku ev kar kengê çêbûye. Dema ku mirov bibêje *"Îro ezji gund hatim", "îro"* di vê hevokê de hokera demê ye. Hinek hokerên demê ev in: *duh, îro, nîvro, serê sibê, piştî nîvro, serêvarkî, ber bi êvarî, ji sibê heta êvarî, pêr, par, isal, Îşev. ..*

Mînak:

Duh hevalê min hate vir.
Sibe ez ê herim ba hevalê xwe.
Di meha gulanê de ez bêm
Berêvarkî were cem min.
Roj bi roj doz geştir dibe.
Her gav tiştekî derdixe.
Sal bi sal karê me ber bi başiyê ve diçe.
Roja duşemê ev bûyer qewimî.
Serê sibehê diçe kar, piştî nîvro vedigere.
Ez pêr çûm bajêr, ez duh vegeriyam.
Par zewicî, îsal kurek jê re çêbû.
Ez ê serêvarkî ji kar vegerim.
Ew ê îşev werin mala me.

Hokerên cih û berekê

Navê vî cureyî ji taybetiya wî dide dest. Yanê ev cure hoker, cih

û bergeha karê ku tê kirin, nîşan dide. Bo nimûne, gava yek bibêje, *"Ez ber bi malê ve diçim"* li vê derê *"ber bi ... ve"* berek kar nîşan dide û *"maf"* jî cih nîşan dide, lewre jî *"ber bi ... ve"* hokera bcrekê û *"mal"* jî hokera cih e.

Hinek hokerên cih ev in: *derve, hundir, li dûv, bi ser de, bi pêş ve, bi şûn ve, bi wir de, wê de, ji hundir, li derve, ji dûr ve, li nêzîk, li gelî û zozanan ....* Her wiha divê bê gotin ku hemû navên cihan ligel daçekan dikarin bibin hokerên cih.

Mînak:

Ez bi wir de çûm.
Ew diçe gundê me.
Mamoste ji dibistanê tê.
Ew stranan li tomargehê tomar dike.
TuF were hundir.
Ew derket derve.
Hinekî bi wir de here.
Me çend kevir danîne ser hev.
Zozan û Sorgul li nik hev rûniştin.
Tu hatî nêzîkî min.
Ew Îro naçe dibistanê, dê here seyrangehê.
Zarok kete xwarê.
Xoce li dûv kerê dimeşiya.

Hokerên çendanî û hevrûkirinê

Ev cure hoker mêjer û radeya karê ku tê kirin nîşan didin. Mesela, di hevoka *"Karmend gelekî meşiyan"* de *"gelekî"* hokera mêjerê, miqdara *"meşînê"* ango karê ku tê kirin, nîşan dide. Em ji wê fêm dikin ku ew kar heta kîjan radeyê çêbûye.

Lê di vir de tiştekî ji sedî sed diyar tune ye. Di hevoka *"Ez zêde kar dikim"* de pîvana *"zêde"* ne diyar e, belkî ligorî meşa her rojê zêde be, yanjî li gorî meşa hinekên din zêde be. Çend hokerên çendaniyê: *"kêm, zêde, pir, hindik, gelek, ecêb, pir kêm, herî kêm. heri zêde. zehftirîn, zêde zêde. heta radeyekê, piçekî, kêmtir. qet, pir pir hindik ... "*

Mînak:

Ev heval kêm dipeyive, lê yê din pir dipeyive
.. Bi qasi hûteki dixwe.
Dehe deh gûzan dixe
{ûran. Karker pir dixebitin.
Hûn ji me zêdetir xwarinê dixwin.
Herî zû ew diçin.
Te gelekî ez
êşandim. We zêde
zêde xwar. Herî kêm
ew xebitiye. Hûn qet
nexebitîne.
Car caran bi min re xwarinê dixwe.

Hokerên pirsyariyê

Ev hoker jî pirsa hokerên din dikin. Hokerên pirsyariyê ev in: *"çawa. çi. kengê.* çi *wext, li ku. ji ku, bi ku ve,* çi *qas, weki'* çi ... "

⤵ Ier wekî xuya ye her yekji wan, pirsa cureyekî hokerê dike. Bo nimûne hokera *"çawa"* pirsa hokera çawan iyê dike. Dema cm bibêjin, *"Çûk çawa difire]"* bersiva wê hokereke çawaniyê dide dest. Ew jî dikare hokereke wekî *"nizm* ", *"bilind"* û hwd. be. Yanê *"Çûk bilind difire" yan* jî " *Çûk nizim difire."*

Nimûneyên din,'

Tu ji ku têyî? Ezji malê têm.
Tu bi ku ve diçî? Ez ber bi dibistanê ve diçim.
Kendal bi çi dizane? Ew bi gelek tiştan dizane.
Mala we li ku ye? Mala me li Ruhayê ye.
Xwişka te ji kijan hêla bajêr tê'! Ji bakur tê.
Ew çi wext ji gund derketiye? Ewparji gund derketiye.
Kalikê le kengê hale malê? Îro serê sibê hate malê.
TII ji kengê vir de li vir î? Ji duh êvarê vir de, li vir im.
Şêrko mîna çi direve'! Ew mîna kêrguhan direve.
Zozan çawa dimeşe? Baş dimeşe.
Te çawa nîşanî min da, min jî wisa kil:

DAÇEK

Daçek ji cureyên bêjeyan ên erkî ne. Daçekên xweru bi xwe ne xwediyê tu wateyê ne, lê di nav hevokê de beşên din ên peyvê ji aliyê wateyê ve sergihayî dikin. Dîsa daçek ji aliyê wateyê ve *iwekhevi, dijberî, sedem, cih û bergek)* di navbera peyvan de têkiliya wateyî pêk tînin. Daçek ne ji ber wateya xwe, lê ji ber peywira ku bi eih tînin, wekî peyv tên hesibandin. Bo nimûne, bêjeya ***"li"*** bi serê xwe ne xwediyê tu wateyê ye, lê bêyî wê mirov nikare eih û pozîsyona heyberan diyar bike.

Peyv saziya **daçekan**

Daçek, her wekî çawa dikarin bi serê xwe di nav hevokê de eih bigirin, dikarin digel hoker û gihanek û hwd. daçekên nû pêk bînin. Daçekên resen bi piranî xweru ne û daçekên din jî bi alîkariya wan têne bidestxistin. Her wiha bi alîkariya daçekan jî hin cînavk, rengdêr, hoker û lêkerên biwêji têne pêkanîn. Her wekî ji gotinên me yên heta niha jî tê fêmkirin daçek jî du cure ne: *".nverû"* û *"hevedudanî".* Daçekên resen, ên xwerû ne.

Daçekên xwerû

Daçekên xwerû hinek ji hêrnanekê pêk hatine û berî navdêrê tên, hinek ji wan ji du hêmanan pêk hatine; ji pêşdaçek II paşdaçekan, ev her du hêman bêjeyê digirin nav xwe. Daçek rewş II pozîsyona navdêrê diyar dikin.

MÎnak: li, ji, hi, ji, bê, di ... de, di ... re, ji ... re, ji ... de, hi ... re, bi ... de, hi '" ve û hwd.

Daçekên hevedudanî

Daçekên hevedudanî bi piranî **j** i daçekekê ûji bêjeyeke ku cih û pozîsyonê nîşan didin pêk hatine. Her daçekeke resen komek daçekên hevedudanî çêdike.

Iii!: li paş, li ser, li bin, li dor, li ber, li nav, li kelekê, li pey, li dûv, li pişt, li jêr; li jor; li pêşberî, li şûna, li xwarê, li raserî, li cem, li nik, li hinda, li dij, li hemberî, li gel...

Minak:

Ez li ber malê rûniştim.
Ew li dûv min hat.
Em li paş te rawestiyan.
Hinek li dor mala me digerin.
Li kêleka wî *.yekî porspî*
hebû. Li pişt mala wan qesrek
heye. Li pey xwe menihêre.
Ew ligel me haf.
Pirtûk li ser maseyê ye.
Hesen li kêleka wî
rûniştim.

Ibi!: bi dûv, bi pêş, bi bin, bi sel; bi dor, bi rex, bijar; bi pişt, bi ber. .. Minak:

Lingê wî *bi ber kevirekî ket.*
Bi dûv min meke ve.
Hevind di vê lîstikê de bi bin avê ketiye.
Ez bi nav wan neyaran ketim.
Bi ser avê ket û soberi kir.
Bi jor ket û hat.
Bi min ew kar naçe sêrî.

Iji!: ji pêş, ji paş, ji ber, ji dor, ji aliyê ... , ji nêzîk, ji dûr, ji pişt, ji bin, ji ser, ji bo, ji bilî ... , ji dêl ve, ji nav, ji kêleka ... , ji cem, ji navbera ... , ji pêşberî .... , ji hember. ji dijî ..

Ji ber erebeyê xwe da
ali. Ji pişt wi dermekeve.
Ji aliyê wî bayekî xurt tê.

Ji kêleka wî rabe.
Ji dor wan vekişin.
Ji paş Çiyayê Qaf derket.
Ji hêla çepê ve lê xist.

ldi .... del: di ber de, di bin de, di nav de, di pêşiyê de, di kêlekê de, di ser de ...

ldi .... re*l*: *di ber re, di ser re, di bin re, di dor re, di nav re, di kêlekê re, di paş re, di pêş re, di jor re, di jêr re ...*

Mînak:

Zozan di ber xaltîka xwe re derhas
bû. Xwarin di ber min de ma.
Ez di ser pirê re derbas
bûm. Di nav gund de
nesekinî.
Di pêşiyê de dimeşiya.
Gund di bin berfê de
mabû. Ez di kêlekê de
rûniştim.

Hinek daçekên din

D kê ib di kî.:"," 1 "".{', "
açe en şı an me: we l... , mina ... , no a... , Jena ....

Ev daçek bi riya şibandinê têkiliyê di navbera du tiştan de pêk tîne. Mînak:

Ev zarok wekî mirovekî mezin xeber
dide. Ava Çilçaviyê mîna qeşayê sar bû.
E;:, nola te tevnagerim.
Ew fena guran êrîşî mirov dike.
Daçekên sedemîn: "ji bo", ')'i her"

Mînak:

Ji her baranê min nekarî biçim kar.
Jinek ji bo serdana lawê xwe çû bajêr.
Em vê çalakiyê ji ho mirovahiyê dikin.

Daçekên agahdariyê: "der barê ... de". "der heqê ... de", "li ser"

Mînak:

Tu der barê vê mijarê de çi difikirî?
Agirî der heqêjiyana Cegerxwin de agahiyên berfireh dan.
Li ser vê mijarê bîr lêbaweriya min zelal e.
Daçekên hevrûkirin: "bi qasî", "li gorî", "bi tenê" ...

Ev daçek bi riya qiyas û hevrûkirinê têkiliyê di navbera du tiştan de datînin.

Mînak:

Ev zarok bi qasî Şakiro xweş stranan
dihêje. Kes bi qasî wî ne jÎr lêjêhati bû.
Li gorî baweriya min ev kar şaş e.
Ev gotin ne li gorî devê te .vê.
VÎ karî bi tenê tu dikarî bibî sêrî.

Taybetiyên daçekan

Her wekî me di destpêkê de jî got, di kurmancî de daçekên bingehîn daçekên mîna: *"li", "bi", "ji", "di", "bê", '~jf"* ne, yên din jî bi alîkariya wan pêk hatine. Ji wan hinek daçek bi serê xwe, hinek hem bi serê xwe hem digel paşdaçekên xwe û hinek jî bi tenê digel paşdaçekên xwe têne bikaranîn.

Bo nimûne *"li"* her tim bi serê xwe tê bikaranîn, lê *"ji"* û *"bi"* hem bi tena serê xwe hem jî digel paşdaçekên mîna *"ve", "re", "de"* tên bikaranîn û *"di"* çend rewşên awarte ne tê de, her tim bi paşdaçekên mîna *"de"* û *"re"* tê bikaranîn.

Mînak:

Evîn bi balafirê diçe mala apê xwe.
Serdar li wir namîne, dê here
malê. Sînemxan ji bajêr tê.
Bozo kevirek di diz wer kir.
Heke tu bi min re werî, ez ê kêfxweş
bibim. Bi min ev gotina te ne rast e.

Rista daçekên **bingehîn**

/bt/: Bi gelek peywiran radibe û divê em wan yek bi yek destnîşan bikin. Ev daçek beranberî *"ile"ya* tirkî û *"with", "by"a* îngilîzî ye. Daçeka *"bi"* dema ku bi tena serê xwe be bi van peywiran radibe:

1- Tê ber navgîna ku kar pê tê kirin û wê sergihayî dike. Karek bi çi tê kirin wê nîşan dide. Ango ew cihê *"ile"* ya tirkî û *"by"* a îngilîzî digire.

Mînak:

Ez bi erebeyê çûm
bajêr. Min bi koling erd
kola.
Wî bi bivir darên hişk birin.
Min bi keviran xaniyek ji xwe re çêkir:
Balinde bi baskan difirin.

2- Alî û berek nîşanî mirov dide. Tê ber hinek hokerên cih û tevgera ber bi wî alî ve nîşan dide.

Mînak:
Ez bi ser avê ketim.
Hozan bi bin avê ket û hewjê derket.
Ew bi paş ket.
Xebat bi pêş dikeve.
Em bi dûv hinekan ketine.

3- Daççka"bi" dikeve navbera du hejmaran û wateya dabeşbûna kom bi kom dide wan.

Mînak:

Zarok du hi du dimeşin.
Kew refbi ref diçin.
Mirov kom bi kom li sûk« digerin.

Daçeka *"bi"* digel hin paşdaçekan jî tê û bi gelek karan radibe. fbi

... ref: Ev daçek pêrebûnê nîşan didc. Ev beranberî *"be-raber"a* tirkî û *"together"a* îngilîzî ye.

Mînak:

Ew bi min re xeber nade.
Hûn bi hev re herin bajêr.
Em hi wan re karekî bikin.

fbi ... ve/: Tevgereke ber bi aliyekî ve nîşan dide.

Mînak:

Mem bi wir ve hilkişiya.
Tu bi ku ve diçî?
Bi wir ve hat ûji ber çavan winda bû.

Her wiha *"bi ... ve"* digel lêkera *"kirin"* lêkera biwêjî *"pê ve kirin"* û ligel hokera *"ser'* dîsa lêkera biwêjî *"bi ser ve bûn"* pêk tîne

Mînak:

Kincên xwe bi hi/ço ve kirin.
Min wêneyek bi dîwêr ve kir. Ez bi ser ve nebûm.
Tasek av bi ser xwe ve kir û vexwar.

fbi ..... del: Tevgera ber bi cihekî nîşan dide. Ji aliyê wateyê ve nêzî *"bi .....ve"* ye, lê cudatiyek di navbera her duyan de heye. Di *"bi ... de"* de tevger ber bi cihekî diyar c. Lê di daçeka *"bi ... ve"* de tevger ber bi aliyekî ve ye, cih ne diyar e.

Mînak:

Xanî bi ser de ket.
Ew hat, lê tu bi ser de neçûyî. Xwarinê bi ser de nekî.
Bi aliyê me de hat.

/ji/: Ev daçek wateya jêbûnê dide gotinê. Di tirkî de jê re *"ismin -den hali'* tê gotin û di îngilîzî de li şûna wê daçeka *'from"* tê bikaranîn.

Mînak:

Hogir ji gund derket.
Av ji kaniyê tê. Xwinji birina wÎ diçe. Pez ji çêrê tê.

jji ... ref: Karê ji bo yekî/ê tê kirin û gotinê arasteyî yekî dike.

Mînak:

Zozanê ji Zinêr re tu tişt negot. Ji min re tiştekî bîne.

Jj wî re xwarinê amade
bike. Ji me re çîroka xwe
vebêje.

Jji ... ve/: Tevger ji cihekî derdikeve û heta cihekî din diçe. Bi tirkî *"<den beri", "<den itibaren"* tê gotin, di îngilîzî de beranberî wê *"since"* tê bikaranîn.

Mînak:

Xani ji binî ve hilweşiya, êdî bi kêrî tiştekî nayê.
Ji seri ve dest bi çîrokê bike.
Ev kar ji aliyê wi ve hate kirin.
Ji niha ve te ,Dve amade kiriye.
Ji duh ve te guhji me birin.

IIi!: Ev daçek tu paşdaçekan nagire û cih fl warekî nîşan dide. Cihekî ku *"li"* nîşan dide, cihekî gelemperî ye, sînorên wir ne diyarkirî ne. Di tirkî de jê re *"ismin -de hali"* tê gotin û di îngilîzî de beranberî wê daçeka *"at"* tê.

Mînak:

Apê min li bajêr dijî.
Zarok li dibistanê ne.
Karker li kargehê
namînin. Li gundan jiyan
xweş e.
Li daristanan her cure gil û giha peyda dibin.

Idi/: Ev daçek ji bilî çend biwêjan bi tena serê xwe nayê bikaranîn. Di wan biwêjan de jî bi îhtimaleke mezin paşdaçeka *"de"* bi domana demê re ji navê rabûye.

Mînak:

Ew belaya xwe di min dide.
Tiştekî pîs di pantorê min
geriyaye. Di zinêr wer bû.
Min kevirek di wê firand.

Idi ... del: Nava cihekî ku sînorên wî diyarkirî ne nîşan dide. Peywira nêzî peywira *"in* na îngilîzî ye. Bi tirkî jê re *"ismin -de hali"* tê gotin. Divê bê gotin ku *"ismin -de hati"* peywira *"li* "ya kurmancî jî digire nava xwe.

Mînak:

Kesên weki wî *di cihê xwe de nasekinin.*
Di nav mafê de rûnişt.
Di gund deji min jêhatîtir kes nîn e.
Di te de hal nemaye.
Di bajêr de gelek mal hene ...

Idi ... *re/:*

Tevgera li ser şopeke destnîşankirî û dorgirtî nîşan dide. Di tirkî de ji bo wê bêje û dacekek nîn c. Lê di îngilîzî de daçeka *"through"* peywira wê pêk tîne. Lê *"through "* bi tenê tevgera di nav re nîşan dide. Daçeka me Idi ... *rel* cihê *"around", "abo ve* " û *"under* "a îngilîzî jî digire.

Mînak:

Av di hin qeşayê re diherike.
Di nav malan re bihurî.
Di daristanê re derbas hû.
Av di ser re çû.
Ew di dêrî re derket.

Daçek û tewang

Taybetiyeke daçekan ev e ku peyvên piştî xwe ditewînin. Peyva guherbar di kîjan demê de li pey daçekekê bê, ditewe. Bo nimûne, gava em bibêjin: *"Zozanê Zîn dît"* di vê hevokê de *"Zozan"* kirde, *"Zîn"* bireser e û ji ber ku bûyer di dema borî de qewimiye, kirde (Zozan) tewiyaye, bireser (Zîn) wekî xwe maye. Lê dema ku em daçekekê bînin ber bireserê, dê wê jî bi xwe re bitewine. Ji bo zelalkirina mijarê mirov dikare hevoka *"Zozanê li Zînê nihêrî"* bide; di vê hevokê de jî *"Zozan"* kirde û *"Zîn"* bireser e, lê ji ber egera ku me li jor da xuyakirin, *"Zîn"* jî tewiyaye bûye *"Zînê".*

Mînak

Hevala min ji wî re got.
Gundiyan li Bozên da.
Kes li Robêr (Robarî) nanihêre.
Di dibistanê de mamoste tune.
Li malê xwarin nema.
Ji Bêrîvanê re tiştekî nabêje.
Bizinê tîne da ku li bajêr bifiroşe.
Ez bi Zelalê re axivim.

GJHANEK

Her wekî ji navê wê jî diyar e, gihanek bi serê xwe ne xwediyê tu wateyê ne, lê bêjeyan, komek û hevokan bi hev ve girê didin, an jî peyvekê, kornekekê bi hevokekê ve girê didin. Bo nimûne, dema em dibêjin; *"Hogir û Evîn xwişk û birayê hevin.", "û"* li vê derê gihanek c û her du navan digihîne hev. Dîsa gava ku em bibêjin; *"Piling çû malê. Ê Zarîfe li ba! xaltîka xwe ma."* îcar peyva *"lê"* dibe gihanek û her du hevokan (Piling çû malê - Zarîfe li bal xaltîka xwe ma) digihîne hev, wan bi hev ve dibestîne.

Dema ku em baş bala xwe bidinê em ê bibînin ku di warê wateyî de di navbera gihaneka *"û"* û gihaneka *"lê"* de cudatiyek heye. Gihaneka *"û"* ji aliyê wateyî ve tu bandorê li hevokê nake, lê belê gîhaneka *"lê"* balê dikêşe ser nakokiyekê. Bî piranî gihan ek bi tenê peyv û hevokan bi hev ve girê nadin, pê re ji aliyê wateyî ve jî wan tekûztir dikin. Çend heb gihanekên sereke yên di kurmancî de ev in: *bes, çawa ... wisa.jî, her çend. .. ew çend, çi qas , .. ew qas, lewre. dibe ku, heke na, nexwe, dema ku, heta ku, hew, mixabin, di ser de jî, ji ber ku, lê, lê belê, û, qet nebe, yan ... yan jî, ango, çi. .. çi, hem ... hem jî û hwd.*

Mînak

Tu kengê têyi tu bi kêfa xwe yî, bes tu were.
Tu çi bixwazî, ez ê bidim te, hew zêde galegalê
bike. Tu here. dibe ku ew jî li pey te were.
Her çend zêde bin, dê ew çend kar bikin.
Divê tu zû vegerî, heke na ez ê giliyê te
bikim. Şêr şêr e çi} in çi jî mêr e.

Dema ku *tu çûyî, ji min re nameyan*
bişîne. Ew çû malê, ***lê belê*** *kes bi xwe re*
nebir. Piştî ku hat, ***nema*** *çû.*
Min tu dîtî, ***lê mixabin*** *te ez nedîtim.*
Wî li min xist ***di ser de ji*** *giliya min li bal bavê min kir.*
Dayika min ***ji ber ku*** *karê wê hebû, nehat.*
Wan agahî nedan me, ***lewre jî*** *em ketin kemîna*
neyaran. Tu nehatî ***lewma*** *ez F neçûm.*
Te mala me xera kir, ***qet nebe*** *dev ji me berde.*
Tu ji vir diçî, ***nexwe*** *tu yê heri dibistaneke din.*
An *Zerîn* ***an jî*** *Ferzende divê bên alîkariya*
min. Dimilkî ***ango*** *zazakî zaraveyekî kurdî ye.*
Carinan *ew tê bal me,* ***carinan jî*** *em diçin serdana*
wan. Tu ***hem*** *tişteki nadî mirov* ***hem*** *ji fortan dikî.*
Tu ***çawa*** *hati,* ***wisa*** *jî biçe.*
Her çend *te goljf, min ji te bawer nekir.*
Xalê min çû bajêr, ***her wiha*** *birayê min jî pê re çû.*
Çima ku *min alikariya wî kir ji min xeyidî.*
Çer ku *hat, pirsa te kir.*
Hate malê, ***da ku*** *karê xwe bike.*
Heta ku *tu neyêyî, ez dev ji te*
naqerim. ***Geh*** *ew tê* ***geh*** *ez diçim.*
Ne ew dixwaze ***ne jî*** *ez diçim.*
Her wekî *min got, Îsal çandinî ne baş*
bû. ***Ku*** *zû were, dê bigihêje min.*
Xwest were, ***lê belê*** *karê wî zehf*
bû. ***Hey*** *tu hatiye, Îşev li vir be.*
Çend caran got ez ê werim, ***dîsa jî*** *nehat.*

BANEŞAN

Mirov hestên xwe yên germ û gur bi alîkariya baneşanan dide der. Ew hest dibe ku gir û kîn an jî kêfxweşiyeke jidil be. Hin baneşan di binyata xwe de baneşan in mîna: *axl, waxl, heyf, 10/, hey lol, lê.', erikl, ey!., oxl, oxweşl, hey wax.', de.' û hwd.*

Mînak

Ax dilo, wiha meke!
Wax kurê min wax!
Hey lo hevalo!
Oxweşl Dijminên me rasti belayê hatine.
Hey waxl Felekê te çima li me wiha kir?!
Wî! Kurê min tu çima wiha dikî?'
De! Em vegerin gundê xwe.
Ha ho! De werin li vê ecêba giran binêrin.
Of! Tu zanî ez çi qas tengav bûme?!
Hoştl Segê heram, biqeşite here ji vir!
Ço, ço! Kera reş em li pey heval û hogiran man.

Hindek peyvên ferman, hişyarî û hestên tund dema ku bi dengekî bilind û bi awayekî tund hate gotin, dibin bancşan.

Kuro rabe! Xêr e te xwe li erdê dirêj kiriye.'
Bira wiha nabe! Divê em rabin ser xwe û tê bikoşin.
Bavo zû were.'
Geli hevalan, guh bidin min!
Xwedêyo, mala te ava be!
Dayê. tu meke melezîne!

Her wiha hinek peyvên ji dengên siruştî û teqlîdî jî wekî baneşan têne pejirandin.

Mînak: vizzl, gurm!, teeeq!, virrrl, gurrr!, ringI, çirîngl, tirîngl, pissl, zing! ...

Rewşa banglêkirinê

Çawa ku me berê jî diyar kiribû, di kurdî de ligel rewşa xwerû û tewandî ya navdêran, rewşa banglêkirinê ya navdêran jî heye. Di rewşa banglêkirinê de navdêrên ku qertafên banglêkirinê digirin dibin baneşan. Qertafên ku ew digirin li gorî zayend û mêjerê ji hev vediqetin. Navdêrên nêr qertafa *"-o"* digirin, navdêrên mê *"_ê"* û navdêrên pirjimar jî *"<ino"* digirin.

Dema ku em dibêjin; *"Hevalê.'* ", em qala hevaleke keç, dema dibêjin, *"Hevalo!"* em çêlî hevalekî xort **li** dema cm dibêjin, *"Hevalino!'* jî em çêlî çend hevalan dikin. Bi şêweyekî din afirandina baneşanên pirjimar bi alîkariya peyva *"gelî"* û bi qerta fa tewangê ya pirjimariyê *"-an"ê* çêdibe. Wekî mînak: *"Gelî hevalan!"*

Mînak

Birako te çi zû xwe da
dest/ Bavo wisa nabe!
Keko rabe.' Mala te hilweşiya.
Lo dengbêjo, dengê xwe bilind bike.'
Keçê.' Te xêr e, tu çiji me dixwazî"!
Hevalê, bêyî le xebat nameşe.'
Birano! Dev ji xebatê bermedin!
Zarokino! Hûn li hêviya me ne.
Gundino, guh medin cehş û nokeran!
Gelî hevalan! Zû em ji vir dûr bikevin! Gelî karkeran! Roja giran û girÎng hatiye. Gelî aqilmendan! Aqilê xvve bidin serê xI·ve.

JIMARNAV

Jimamav her wekî ji navê wan jî diyar e, qesta navê hejmaran dike.

Jimamav çar cure ne:

1- Navên hejmarên hingehin

2- Navên hejmarên dabeşkirinê 3- Navên hejmarên rêzkirinê

4- Navên hejmarên hokerîn (hejmarên ritmik)

Navên hejmarên bingehîn: *yek, du. sê, çar, pênc. şeş, heft, heşt, neh, deh, yazdeh, dozdeh, sêzdeh, çardeh. pazdeh, şazdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh, hist, sih, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê, nod, sed, du sed, sê sed, çar sed, pênc sed, şeş sed, heft sed, heşt sed, neh sed, hezar, du hezar, sê hezm; milyonek. du milyon, deh milyon. milyar. ..*

Mînak:

Sih û yek *heval rabûn govendê. Me bist* ***û pênc*** *xanî ava kirin.*

Di sala ***hezar û neh sed û çil û pêncan*** *de hate cihanê.*

Wi di mehekê de ***milyonek û neh sed hezar*** *fira qazanc kirin.*

Hejmarên *dabeşkirinê: niv, çaryek, didu û niv, yek û niv, ji sisiyan*

Diya min ***nîv*** *nan dixwaze.*

Ez bi ***yek û nîvê*** *têr naxwim.*

Mînak:

yek, ji çaran sê ji pêncan du, ji dehan şeş, ji sedî pazdeh. ji sedî Ust. ji hezari pênc.ji deh milyonî yek.ji milyarekê milyonek. ..

Çaryek nan xwar.
Ji dehan yekê gundiyan vegeriyan.
Ji sedî çil qediya ma ji sedî şêşt.
Ji hezarî yek vi karî nake.

Navên hejmarên rêzkirinê: Di kurmancî de hejmarên rêzkirinê bi du awayan çêdibe; bi alîkariya tewangê û bi qertafên *"<em", "<emin".*

1- Bi tewangê: yekê, diduyan, sisiyan, çaran, pêncan, şeşan, heftan, heştan, nehan, dehan, yazdeh an, dozdehan, sêzdehan, çardehem, pazdehan, şazdehan, hevdehan, hejdehan, nozdehan, bîstî, sihî, çilî, penceyi, şêstî, heftêyî, heştêyî, nodî, sedî, hezarî ...

Mînak:
Kesê çaran nasê min bû.
Di rêza pêncan de ez hebûm.
Ew li ber deriyê dehan rawestiya û li dêrî da.
Di hejmara çilî de xwe ji bîr kir.

2- **Bi** qertafê "-em" û "emîn: Ev qertaf ji kurmanciya başûr derbasî: kurmanciya bakur bûne, *yekemin, duyemin, sêyemîn, çaremîn, pêncemîn, şeşemîn, heftemîn, heştemîn, nehemîn, dehemin, yazdehem în. dozdehemîn, sêzdehemîn, çardehemîn, pazdehemîn, şazdehemîn, hevdehemîn, hejdehem în, nozdehemîn, bîstemîn ...*

Di bazdanê de kesa yekemîn ew bû.
Di rêza duyemîn de kesên nexweş dabûn sekinandin. Di pêşbaziyê de bû sêyemîn, lê tu xelat wernegirt.
Di dorê de li pêş wî bîst sê kes hebûn, ew yê bîst û çaremîn bû.

HEJMARÊN HOKERÎN

Ev cure hejmar hokeran pêk tînin, awayê pêkanîna karekî nîşan didin. Di zimanên din de ji wan re hejmarên rîtmîk tê gotin. Ew bi alîkariya daçeka "bi" û qertafa "o" pê re jî bi dubarekirina hejmarekê tên bidestxistin. Her wekî: *yek bi yek, du bi du, yeko yeko, deh hi deh, pênc hi penc, sed bi sed, şeşo şeşo, histo bîsto ...*

Her wiha bi awayê *"yeke yek", "dehe deh","Msfe bîst", "sede sed" ...* jî tê gotin.

Mînak:

Kesên ku çûbûn bajêr yeko yeko vegeriyan.
Me gûz deh hi deh li hev parve kirin.
Ew çar bi çar, em şeş bi şeş digeriyan.
Mamoste şagirt pênce pêncji hev veqedandin.

Tewanga jimarnavan

Tewanga jimarnavan her çi qas li gorî devokan biguhere jî di zimanê niviskî de bi vî rengî ye; hejmara yek mê ye û lewre jî tewanga wê bi *"_ê"* pêk tê. Lê dema ku ew cînavka nebinavkirî be nêtar e û zayenda ku dinimîne digire.

Mînak:

Di rêza yekê de ez hebûm. (jimarnava rêzkirinê)
Yekiji min re got, .. Vê yekê bi min meke (CÎnavka nebinavkirî)

Hejmarên din ji diduyan heta 19'an bi qertafa tewangê ya pirjimariyê *"-an"* tên tewandin.

Mînak:

Dehan ev kar kiribe ji sêyan qebûl nekir.
Di wê rêzê de mala çaran a me ye.
Di dorê de ez yê bîstî bûm.
Hejmarên din bi "-Î"yê ditewin.

Mînak:

Çilî kir, sihî xwm:
Ji sedî bîstan bide min.
Ji hezarî dehan bîne.
Şêstî pejirand, çilî nepejirand.
Ji sedî heftêyî ev armanc daye ber xwe.
*Pênc sed kesi pişteva*niya *min kir.*

Di hejmarên pirxaneyî de tewanga hejmara dawîn diyarker e.

Mînak:

Di sala hezar neh sed û bîst û pêncan de.

Du sedî ev doz meşand, lê du hezar û du sed û bist û pêncanjî lê temaşe kil:

Hejmarên mîna milyon û milyar ku ji zimanên biyanî ketine zimanê kurdî, Ji gorî hejmara berî xwe têne tewandin.

Mînak:

*Milyonekê bide min, ez ê **dil** milyonan li te vegerînim. Bi **bîst** milyarî bikire û **sed** milyarî bifiroşe.*
Her wiha hejmarên şikestî ango dabeşkirinê jî li gorî hejmara berî xwe ditewin.

Mînak:

Ew sê kîlo tî nîvan bikire.
Nîvekî bide min. ez du nîvan bidim te.
Kîlo tî nîvekî bide min.

Her wekî ji hinek mînakên li jor jî diyar dibe, jimarnav dema ku dibin hevalnav, tewanga wan derbasî navdêra piştî wan dibe.

Mînak:

Mirovek nikare sê karan bi hev re bike.
***Sed** mirovî heman çîrok ji min re gotiye.*

Tewanga hejmarên şikestî li gorî hejmara berî wê pêk tê.

Mînak:
Nîvekî bide min.
Du çaryekan jê bistîne.

Heke ev hejmar rengdêrên jimarîn bin li gorî navdêra berî xwe ditewin. Ji aliyê tewangê ve ev cure jimarnav bandorê li navdêrê nakin.

Mînak:

Niv sêvê bide min.
Goşt xist nava çaryek nanî.

Her wekî me di destpêka mijarê de jî da zanîn, di hin hevokan de tewanga jimarnavan cuda ye. Bo nimûne di devoka Culemêrgê de hemû hejmar bi *"-ê"* têne tewandin. Wekî: *yekê, duyê, sêyê, çarê, pêncê, şeşê, heftê, heştê ...*

Raveka jimarnavan

Raveka jimarnavan li gorî rola ku ew jimamav pêk tînin diguhere. Bo nimûne, heke ew jimamav cinavkên jimarîn bin, raveka wan jî wekî ya navdêra ku cihê wê girtiye pêk tê.

Mînak: *yeke çeleng, yeki haş, duyên qeşmer, pêncên hêja, çi/ên pêwîst, dehên mayî, heftên te ...*

Di diyarkirina mêjûyê de raveka hejmaran her tim nêr tê, ango dibe "_ê". Her çi qas hejmara "yek" wekî hejmareke mê were pejirandin jî ew jî veqetandeka "_ê" digire. Lewre jî divê mirov vê yekê wekî tiştekî awarte yan jî xeletiyeke bicihbûyi bipejirîne.

Mînak:

Dehê meha adarê hewa pir germ
bû. Pêncê gulana par ez li Berlînê
bûm.
Yekê pûşpera sê salan berî niha bavê min ji girtîgehê
derketibû. Dozdehê vê mehê ez ê werim Amedê.

LÊKER

Lêker ew cureyê bêjeyê ye ku bi awayekî rêzimanî hêmana sereke ya pêveberê ye û bizavekê yan rewşekê nîşan dide. Di gelek zimanan de bi mebesta pêkanîna ahenga bi kirdeyê re li gorî dem, rawe, avanî ci rewşê tê kişandin.

Di ferhengan de *"lêker"* bi awayê ku me li jor da, hatiye

ravekirin.

Di kurdî de navlêka *"lêker"* bi xwe girîngiya wê li ber çavan radixe. Di nav cureyên bêjeyan de ya heri giring ci berfireh *"lêker"* e. Celadet Bedirxan dema ku ev nav li vê têgihê kiriye, giringiya wê li ber çavan girtiye. Lewre peyva *"lêker",* j i *"lêkirin'tê* tê. Lêkirin, her wekî xuya ye wateya *"avakirin"ê* dide. Her çi qas gelek wateyên wê yên din jî hebin, li vê derê di wateya *"avakirin"ê* de ye. Çawa ku *"dîwar lêkirin"* tê gotin. Hevok li ser lêkerê tê avakirin, bêyî wê hevok ava nabe. Heke mirov bi awayekî din bibêje, tu hevok bêyî *"lêker'ê* naçe serî. Hevokeke bêlêker, hevokeke nîvçe ye. Bo nimûne, dema ku mirov bibêje: *"Amed duh ji pirtûkxaneyê pirtûkek kirî"* mirov hêmanên vê hevokê yek bi yek jê derîne, heke lêker bi tena serê xwe jî bimîne, hevok dîsa dimîne, lê heke lêker jê were derxistin, hevok nîvçe dimîne.

Mînak:

Amed duh ji pirtûkxaneyê pirtûkek kirî.
Amed duh pirtûkek kirî.
Amed pirtûkek kirî.
Amed kirî.
Kiri.

Di hevoka dawî de lêker (kirîn) bi serê xwe ma, lê disa ji hevok ji hevoktiyê neket. Lewre dema ku mirov dibêje *"kiri'* di nava wê de kirde û bireserekc veşarî heye. Mirov dizane ku *"yekî tiştek kiriye".* Ev yekjî têrî sazkirina hevokekê dike. Lê dema ku di heman hevokê de lêker ango peyva *"kirî"* bê xistin, li holê hevok namîne. Kî dikare çi **ji** van peyvên ku li pey hev rêz bûne fêm bike: *"Amed duh ji pirtûkxaneyê pirtûkek ... "*

Taybetiyên sereke yên lêkeran

Dema ku mirov bi awayekî gelemperî bala xwe dide lêkeran hinek taybetiyên wê balê dikêşin. Wekî nimûne *"teker"* dema ku nehatibin kişandin, wekî navê lêkeran ango wekî *"rader"* derdikevin pêşberî mirov. Lêker di nav hevokê de bi riya kêşanê rist û peywira xwe bi cih tînin. Di dema kêsanê de reng û dirûvê lêkerê diguhere. Di dema kêsanê de rayekên lêkerê derdikevin holê û lêker hinek qertafên dem, kes û raweyan werdigirin. Berî ku em bala xwe bidin peyv saziya lêkeran, em ê hinek qala van taybetiyên bingehîn bikin.

Rader

Di kurdî de lêker di dirûvê raderîn de wekî navdêr derdikevin pêşberî mirov. Lêkera raderîn lêkera ku nehatiye kişandin e. Lêker bi dirûvê raderin navdêr in. Ew jî wekî navdêran ditewin û veqetandekan digirin.

Mînak:

kirin, gotin, hatin, xwestin, birin, şûştin, kişandin, avêtin ....

Lêkerên raderîn ango navên lêkeran ji aliyê zayendê ve mê ne.

Her wekî tê zanîn di kurdî de zayenda bêjeyan di dema ravek û tewangê de diyar dibe. Dema ku em bi lêkereke raderin ravekê pêk bînin an jî wê bitewînin, em ê bibînin ku raderên kurdî giş mê ne.

Mînak:

Ez bi dftina te kêfxweş bûm.
Ev gotina wê *li xweşa min*
neçû. Ew dîtineke şaş e.

Her wiha di dema tewangê de jî zayenda wê diyar dibe.

Mînak:
Ez bi vê gotinê xemgîn bûm.
Bi xwestinê mirov hi ser nakeve.

Gerguhêzî û negerguhêzî

Her wekî berê jî em li serê rawestiyabûn, di lêkeran de gerguhêzî û negerguhêzî li gorî *"bireser"ê* diyar dibe. Heke lêkerek bi *"bireser"* be, ew lêker gerguhêz e, lê heke *"bireser"a* wê nîn be ne gerguhêz e. Di kurmancî de gerguhêzî gelekî girîng e, lewre zaravayê kurmancî nîv-ergatîv e, ji ber vê yekê jî lêkerên gerguhêz û negerguhêz ji hev cuda têne kişandin. Lêkerên gerguhêz di demên bê û niha de li gorî kirdeyê, di demên borî de li gorî bireserê têne kişandin. Jj ber vê yekê di lêkerên gerguhêz de di demên bê û niha de kirde xwerû, bireser tewandî ye, di demên borî de kirde tewandî bireser xwerû ye. Ji ber heman sedemê di kurmancî de peyv ditewin û du kom cînavk (xweru û tewandî) hene. Di kurmancî de kirde û bireser bi riya tewangê ji hev têne veqetandin. Lewre jî di kurmancî de gerguhêzî û negerguhêziya lêkeran pir girîng e.

Nexwe em ₔçawa fêm bikin ku kîjan lêker gerguhêz c, kîjan ne gerguhêz e? Em di hevokê de li rewşa lêkerê binêrin. Di hevokê de dema ku mirov ji lêkerekê pirsa *"çi 0i bo tiştan)", "kî/kê 0i bo kesan)"* bike, heke bersiv ji kirdeyê cudatir be, ew lêker gerguhêz e, heke bersiv dîsa li kirdeyê vegere, ew lêker ne gerguhêz e.

Mînak:

Xwarin
Me şîv xwar.

Pirs:
Kê çi xwar!

Bersiv:
Me şîv xwar.

Ji vê yekê jî diyar dibe ku lêkera xwarin gerguhêz e. Em mînakeke din bidin.

Hatin

Bêrîvanji dibistanê hat.
KÎ ji dibistanê hat?
Bêrîvan hat.
Çi hat?
Bersiv dîsa *"Bêrîvan"* e.

Lewre jî ew lêker negerguhêz e. Li gorî heman rêbazê em dikarin çend mînakên din jî bidin.

Mînak:

Hozên stranek got. Kê çi got? Hozên stranek got.
Gundî zevîfirot. Kê çi firot? Gundî zevî firot.
Me *êzing sotin. Kê çi sot? Me êzing sotin.*
Me çar kes bijartin. Kê kî bijart? Me çar kes bijartin.

Ez ê hevalekî xwe bibînim. KÎ dê kê bibîne?Ez ê hevalekî xwe bibînim.

Ev lêker giş gerguhêz in, lê dema ku em dibêjin;

Çûk firiya. Çijiriya? Çûfiriya.
Lehî hat. Çi hat? Lehî hal.
Zarok ji darê ket. KÎ ket? Zarok ket.
Dilan çû bajêr. Kî çû bajêr? Dîlan çû bajêr.
Kulîlk vebûn. Çi vebûn? Kulîlk vebûn.

Mirov dikare gerguhêziya lêkerên xwerû bi vî awayî destnîşan bike. Ji lêkerên hevedudanî yên ku bi lêkera *"kirin"* pêk hatine, gerguhêz in, ên ku bi lêkera *"bûn"ê* pêk hatine, negerguhêz in. Ji bilî van her du lêkeran, hinek lêkerên mîna *"ketin", "man"* û *"şikestin"ê* ku hene ku lêkerên negerguhêz çêdikin, hinek lêkerên mîna *"dan", "xistin", "anîn", "birin"* û *"girtin"*ê hene ku lêkerên gerguhêz çêdikin.
Mînak:

Ez ji bo kar amade bûm. Ki ji bo kar amade bû? Ez amade bûm. Wê lawik amade kir. Kê ki amade kir? Wê lawik amade kil:
Ezfêrî xwendinê bûm. Kifêr bû? Ezfêr bûm.
Min Gulan/erf xwendinê kir. Kê kî fêr kir? Min Gulan fêr kir.

Di lêkerên pêkhatî de paşgira "-fn" lêkerên negerguhêz, paşgira *"<andin"* jî lêkerên gerguhêz pêk tîne. Her wiha paşgirên *"<ijîn", "-isln"* lêkerên negerguhêz, paşgirên *"<ijandin"* û *"<isandin"* jî lêkerên gerguhêz pêk tînin.

Lêkerên mîna *"firîn, şewitîn, êşîn, pelixîn, qelişîn, tengijîn û tepisîn ...* " negerguhêz in.

Lêkerên mîna, *"firandin, şewitandin, êşandin, pelixandin, qelişandin. tengijandin, repisandin..* " jî gerguhêz in.

Divê em bi bîr bixin ku hinek lêkerên awarte yên mîna *"birîn", "kirin", "nivisîn"* her çi qas bi *"-În"ê* diqedin jî lêkerên gerguhêz in. Her wiha kesên ku ji zikmakî kurdî nizanin divê ji bo gerguhêzî/ negcrguhêziya lêkerên xweru li ferhengan binêrin. Ji bilî wê hinek lêkerên mîna *"lîstin'îê* hene ku di warê gerguhêziyê de nîqaş li ser heye.

Gerguhêziya lêkerên hevedudanî û biwêjî li gorî lêkera bingehîn diyar dibe. Bo nimûne, lêkera *"lihevkirin"* ji ber lêkera *"kirin"ê* gerguhêz e, *"lihevhatin"* ji ber lêkera *"hatin"ê* negerguhêz e. Di van lêkeran de biresera yekser nîn e, biresera neyekser ango têrker heye, lê dîsa jî ji ber lêkera bingehîn lêkerên wekî gerguhêz têne dîtin.

Kêşana lêkeran

Lêkerên kurdî guherbar in, li gorî kes, dem, rawe û avaniyê tên kişandin. Di zimanzaniyê de ji vê taybetiya lêkeran re tewang jî tê gotin. Di kurdî de lêker li gorî kes, dem, rawe û avaniyê hinek qertafan digirin an jî di wan de hinek guhartin pêk tên. Dem û rawe li ser *"rayekên lêkerê"* ava dibin. Di kurdî de du rayek hene; *"rayeka dema borî"* û *"rayeka dema niha".*

Rayeka dema borî

Rayeka dema borî ya lêkeran, dema ku ji lêkeran qertafên raderîn *"-in"* û *"-n"* tên avêtin, tê bidestxistin. Rayeka dema borî ya lêkeran dema boriya têdeyî nîşan dide. Rayeka dema borî ya lêkerekê kesê sêyemîn ₑ yekjimar nîşan dide. Bo nimûne, *"kirin"* awayê raderî yê lêkerê ye, di vê lêkerê de *"-in"* qertafa raderî ye. Gava ku ev qertaf

bê avêtin rayeka lêkerê *"kir"* dimîne. Ev rayek jî her wekî diyar e, dema borî ya têde yî pêk tîne. Ji ber vê yekê, **ji** vê rayckê re rayeka dema borî tê gotin.

Rayeka dema horî ya lêkerên xwerû

Rayeka dema	***Rader***
alast	*alastin*
angaşt	*angaştin*
anÎ	*anîn*
aşkaft	*aşka/tin*
avê!	*avêtin*
awart	*awartin*
axaft	*axaftin*
bihîst	*bihîstin*
bijart	*bijartin*
hiraşt	*biraştin*
bir	*birin*
bişkaft	*bişkaftin*
buhart	*buhartin*
hû	*bûn*
cût	*cûtin*
çû	*çûn*
feşart	*[eşartin*
firot	*firotin*
gest	*gestin*
gihaşt	*gihaştin*
girt	*girtin*
got	*gotin*
guhart	*guhartin*
guhast	*guhastin*
guvaşt	*guvaştin*
hat	*hatin*
hejmar!	*hejmartin*
heraft	*heraftin*
herist	*heristin*
hinart	*hinartin*
derist	*deristin*

hingaft	*hingaftin*
hişt	*hiştin*
jen!	*jentin*
kêla	*kê/an*
ke liş f	*keliştin*
kenîşt	*kenîştin*
keraft	*kera/Un*
kesaxt	*kesaxtin*
kêşa	*kêşan*
ket	*ketin*
kevaşt	*kevaştin*
kir	*kirin*
koşt	*kaş tin*
kola	*ko/an*
kuşt	*kuştin*
kuta	*kutan*
list	*lîstin*
malaşt	*malaştin*
mêt	*mêtin*
mir	*mirin*
nihan	*nihartin*
nivist	*nivîstin*
nixamt	*nixamtin*
pişaft	*pişaftin*
qelaşt	*qelaştin*
parast	*parastin*
pelaxt	*pelaxtin*
pêça	*pêçan*
perast	*perastin*
perist	*peristin*
perişt	*peristin*
qevast	*qevastin*
rêt	*rêtin*
sot	*sotin*
spart	*spartin*
stra	*stran*
xist	*xistin*
xwar	*xwarin*
xwest	*xwestin*

Rayeka dema borî ya lêkerên pêkhatî

Ji lêkerên ku bi *"-in"* û *"-an"ê* diqedin de, bi tenê *"-n"* tê avêtin û li holê rayeka dema borî dimîne.

Rayeka dema	***Lêker***
mijf	*mijîn*
kişî (ya)	*kişîn*
dirî (ya)	*dirfn*
firî (va)	*firîn*
keliji	*kelijin*
tepisî	*tepisîn*
revî (Ya)	*revîn*
(ewî (ya)	*tewîn*
êşî (ya)	***êş În***
kêşa	***kêşan***
westa	*westan*
hêra	*hêran*
feqî (ya)	*teqîn*

Di lêkerên ku bi *"<andin"* hatine pêkanîn de jî bi tenê *"<in"* tê avêtin.

Mînak:

Lêker	***Rayeka dema***
kişandin	***borî*** *kişand*
êşandin	*êşand*
şewitandin	*şewitand*
gerandin	*gerand*
kelandin	*keland*
xurandin	*xurand*
dirandin	*dirand*
nivîsandin	*nivîsand*
qelişandin	*qelişand*
pelişandin	*pelişand*
ceribandin	*ceriband*
qurifandin	*qurifand*

Rayeka dema **niha**

Ji bilî vê rayeka dema borî, rayck dema niha jî heye. Ew li gorî her lêkerê diguhere. Ew jî di dema niha de bi dest dikeve. Piştî ku lêkerek li gorî dema niha hate kişandin û qertafên dem û kesan hatin je avêtin, tiştê ku li holê dimîne rayeka dema niha ye.

Wekî mînak em dîsa bala xwe bidine lêkera *"kirin "ê.* Lêkera *"kirin"* di dema niha de ji bo kesê yekemîn dibe *"dikim* ". Li vir *"di-"* daçeka dema niha *ye,"-im"* jî cînavka kesandinê ya kesê yekemîn e. Dema ku ev qertaf bêne avêtin li holê tîpa"k" dimîne. Nexwe rayek dema niha ya lêkera *"kirin "ê* bi tenê tîpek ango *"k"* ye. Di mijara peyvsaziyê de em bi berfirehî li ser vê mijarê rawestiyan lê dîsa jî wekî lîste em hinek lêkeran rêz bikin.

	Lêkerên xwerû	
Rayeka dema niha		*Rader*
	di-alês-e	*alastin*
	di-angêş-e	*angaştin*
(tîne)	*di-hîn-e*	*anin*
	di-aşkêv-e	*aşkaftin*
	di-avêj-e	*avêtin*
	di-awêr-e	*awartin*
	di-axêv-e	*axaftin*
	di-bihîz-e	*bihîstin*
	di-bijêr-e	*bijartin*
	di-birêj-e	*biraştin*
	di-b-e	*birin*
	di-bişkêv-e	*bişkaftin*
	di-bihêr-e	*bihar/in*
	di-b-e	*bûn*
	di-cû	*cûtin*
	di-ç-e	*çûn*
	di-bîn-e	*dîtin*
	di-feşêr- e	*feşartin*
	di-firoş-e	*firoştin*
	di-gez-e	*ges/in*
	di-gihêj-e	*gihaştin*
di- deriz - e		*deristin*

di-gir-e	*girtin*
di-bêj-e	*gotin*
di-guhêr-e	*guhartin*
di-guhêz-e	*guh as tin*
di-guvêş-e	*guvaştin*
di-hê (tê)	*hatin*
di-hejmêr-e	*hejmartin*
di-herêv-e	*heraftin*
di-heriz-e	*heristin*
di-hinêr-e	*hinartin*
di-hingêv-e	*hingaftin*
di-hêl-e	*hiştin*
di-jen-e	*jentin*
di-keliş-e	*kel iş tin*
di-kenîj-e	*kenîştin*
di-kerêv-e	*keraftin*
di-kesêx-e	*kesaxtin*
di-kêş-e	*kêşan*
di-kev-e	*kef tin*
di-kevêj-e	*ke vaş tin*
di-k-e	*kirin*
di-koj-e	*koştin*
di-kol-e	*ko/an*
di-kuj-e	*kuştin*
di-lîz-e	*lîstin*
di-malêş-e	*malaştin*
di-mêj-e	*mêtin*
di-mir-e	*mirin*
di-nihêr-e	*nihartin*
di-nivîs-e	*nivîstin*
di-nixêm-e	*nixamtin*
di-pişêv-e	*pişaftin*
di-qelêş-e	*qelaştin*
di-parêz-e	*parastin*
di-petêx-e	*pelaxtin*
di-periz-e	*peristin*
di-periş-e	*periştin*
di-qevêz-e	*qevastin*

rêtin	*di-rêj-e*
sotin	*di-soj-e*
spartin	*di-spêr-e*
xistin	*di-x-e di-*
xwarin	*xw-e di-*
xwesti n	*xwaz-e*

Lêkerên pêkhatî

Di lêkerên ku bi paşgira *"-în"* pêk hatine de rayeka dema niha morfema (navdêr, hevalnav, rayeka lêkera xwerû) ku lêkerê pêk tîne bi xwe yc. Her wekî *"rev-În" "di-rev-im".* Gava ku mirov ji van lêkeran *"-în"ê* bavêje, li holê rayeka dema niha dimîne. Em di vî warî de çend mînakan bidin.

Rayeka dema	*Rader*
di-ger-e	*gerîn*
di-meş-e	*meşîn*
di-êş-e	*êş În*
di-ken-e	*kenîn*
di-nivîs-e	*nivîsin*
di-rij-e	*rij În*
di-mij-e	*mijîn*
di-elim-e	*elimin*
di-xeyid-e	*xeyidîn*
di-ke/-e	*kelîn*
di-şewit-e	*şewitîn*
di-çir-e	*çirfn*
di-zûr-e	*zûrîn*
di-fir-e	*firîn*
di-dir-e	*dirin*
di-bar-e	*barin*
di-reş-e	*reş în*

Di lêkerên gerguhêz de ku bi paşgira *"-andin"ê* hatine pêkanîn rewşeke cuda derdikeve pêşberî mirov. Rayeka dema niha ya van lêkeran awayê negerguhêz ₑ van lêkeran e. Em îcar jî lêkera *"revandin"ê* wekî mînak bidin, *'di-revîn-e',* Her wekî xuya ye lêkera *"revîn"* îcar bû ye rayck a dema niha ye lêkera *"revandin"ê.*

Rader	***Rayek dema niha***
gerandin	*di-gerîn-e*
meşandin	*di-meşîn-*
êşandin	*e di-êşîn-*
kenandin	*e*
nivisandin	*di-kenîn-e*
rijandin	*di-nivîsîn-e*
mijandin	*di-rijîn-e di-*
elimandin	*mijîn-e di-*
xeyidandin	*elimîn-e di-*
kelandin	*xeyidîn-e*
şewitandin	*di-ketîn-e*
çirandin	*dl-şewitîn-e*
zûrandin	*di-çirîn-e di-*
firandin	*zûrîn-e di-*
dirandin	*firîn-e di-*
barandin	*dirîn-e di-*
	barîn-e

Lêkerên ku bi *"-an"ê* diqedin bi gelemperî li ser rayeka dema niha ya lêkereke xweru ava bûne. Lewre jî forma rayeka dema niha ya lêkera xwerû hatiye parastin. Her wekî *"hêrtin"* û *"hêran",* hinek ji wan lêkeran jî forma wan a xwerû hatiye jibîrkirin. Ji van lêkeran jî dema ku mirov *"-an"ê* bavêje, li holê rayeka dema niha dimîne.

Mînak:

Ral/er	
kêlan	*di-kêl-e*
kutan	*di-kut-e*
pêçan	*di-pêç-e*
westa	*di-west-*
n	*e di-kêş-*
kêşan	*e*

Rayekên ku dibin morfemên bêjesaz

Rayeka dema niha ya hin lêkeran wekî wekî morfemên bêjesaz bi kêr tên. Hin caran ew morfem wekî paşgir têne bikaranîn û bi alîkariya wan hinek bêjeyên nû têne darişţin.

Mînak:

I-alês/:ftraqalês, rûnalês ... I-avêj/:
tîravêj, peravêj, dûravêj. ..
I-kêş/: pêşkêş, şûrkêş, esrarkêş, serkêş, renckêş …
I-kuj/: agirkuj, êşkuj, mirovkuj, birakuj, xwekuj .
I-ger/: tevger, têger; şevger; bager. ..
I-koj/: hestîkoj, darkoj. ..
I-kut/: mîrkut, dankut. serkut..
I-xur/: kurtêlxur, bertîlxur, nanxur. ..
I-bêj/: çîrokbêj. stranbêj, goranîbêj, qewlbê ...
I-pêj/: *nanpêj, aşpêj. ..*
I-bihêr/: *zûbihêr; şevbihêrk, bihêrbar ..*
/-bijêr/: *hûrbijêr. hilbijêr, berbijêr .. I-rêj/:*
xwînrêj, avrêj, rondikrêj. .. I-gir/: avgir,
alîgir, destgir. kefgir. ..
I-guhêz/: gerguhêz, ma!guhêz, wêneguhêz, dîmenguhêz
... /-hingêv/: *derhingêv, şûnhingêv. desthingêv. ...*
I-jen/: bilûrjen, neyjen, pembûjen ....
I-nivÎs/: *çîroknivîs, helbestnivîs, dîroknivîs, bûyernivîs ...*
I-kêl/: dewkêl, têkilî ...
I-pêç/: dorpêç, derpêç ...
/-koU: *erdko/, dirankolk. ..*
I-bir/: cawbir, bivir (bibir), tevir (tebir), darbir; çu/bir, rêbir I-firoş/:
nanfiroş, agahîfiroş, darfiroş, rojname firoş, tilyakfiroş, xwefiroş, we latfiroş , çekfiroş ...

Hin earan jî berî hin paşgiran tên 0 bêjeyên nû pêk tînin.

Mînak: bêje, kujer, bêjing, ko ling, pêjen firoşkar; gerok, pêçek.:

Her wiha bi alîkariya paşgira *"-k"* ji van rayên bêjeyan navdêr têne çêkirin.

Mînak: dirankolk, serşok, destşok, rojnivîsk. ..

Mijareke ku divê em li ser rawestin jî di hin lêkeran de pevguherîna dengan e. Hin lêkerên xweru di dema kêşanê de ditewin ango di wan de dengek li dengekî dadigere. Di lêkerên kurmancî de hem dengdêr hem jî dengdar di dema kêşanê de diguherin. Ji dengdêran dengê *"a"* li dengê *"ê"* dadigere. Ji dengdêran jî dengên nefizekî *"ş, s, f, p"* li dengên fizekî (sewtanî) *"i.* z, *v, b"* dadigerin.

"ş" dibe **"j".** Di hin lêkeran de

Mînak:

dikuje	*kuştin*
dibirêje	*biraştin*
dikoje	*koştin*
digihêje	*gihaştin*

"f" dibe "v". Di hin lêkeran de

Mînak:

dipişêve	*pişaftin*
dikerêve	*kera/tin*
dipiş kêve	*pişkaftin*

"s" dibe "z". Di hin lêkeran de

Mînak:

diguhêze	*guhastin*
dilîze	*lîstin*
dibihize	*bihîstin*
dixwaze	*xwestin*
diparêze	*parastin*
digeze	*gestin*

"p" dibe "b". Di hin lêkeran de

Mînak:

diqulêbe	*Qulaptin*

Her wekî ji mînakan jî diyar dibe, dengê *"a"* li "ê"yê dadigere.

Mînak:

guhastin	*diguhêz*
parastin	*e*
axaftin	*diparêze*
guvaştin	*diaxêve*
	diguvêşe

Di hin lêkeran de hinek deng ketine, lê di dema niha de ew dengji nû ve derdikevin holê.

Mînak:

dikeve ke(f)tin
davêje avêtş) tin
difiroşefiro (ş) tin
didoşe dotş} tin
dirêje rê(ş) tin

Di hin lêkeran de jî rayeka dema borî ya kevnare wekî paşgir tê bikaranîn, wekî ji kerdinê *"<ker",* ji berdinê *"-ber".*

Mînak:

/-ker/: *zîvker; karker, zêrker: ..*
/-ber/: *rêveber. rêber, rêncher.*

Di devoka Serhedê de forma nûjen a rayek dema borî wekî paşgir tê bikaranîn.

Mînak:

/kir/: *ma/kir, zarkir; karkir. ..*

Her wekî j i mînakan jî diyar e, rayeka dema niha û ya dema borî ya hin lêkeran gelekî dûrî hev in. Ev lêkerên nerêzikî ne. Lêkerên mîna *"hiştin* ", *"pehtin* ", *"gotin* ", *"dîtin 'lê* lêkerên bi vî rengî ne.

rayek dema niha	rayek dema borî	Lêker
bêj	*got*	gotin
pêj	*peht*	pehtin
bîn	*dît*	dîtin
hêl	*hişt*	*hiştin*

Ji aliyê peyvsaziyê ve lêker

Piştî van agahiyên destpêkê êdî em dikarin derbasî taybetmendiyên lêkerê bibin. Pêşî divê mirov ji hêla kêsim û teşeyê ve lêkeran hilde dest. Her wekî peyvên din, lêker jî di nav xwe de parve dibin ser du cureyên; *"xwerû" û "nexwerû* ". Her wiha lêkerên *"nexwerû"* jî di nav xwe dibin du bir; *"hevedudanî" û "pêkhatî".*

Lêkerên xwerû

Ev cure lêker, her wekî ku ji navê wanjî diyar e, di binyata xwe de lêker in ûji hêmanekê tenê pêk hatine. Gava ku lêker li gor] dem û kesan neyên kişandin, qertafên raderan (masder) digirin. Lêker bi gelemperî ji lêkerên xwerû pêk tên. Hejmara lêkerên xwerû kêm e, lê ev cure lêker bingeha piraniya lêkerên kurmancî pêk tînin. Her wihaji rayeka dema niha ya van lêkeran morfemên serbixwe bi dest dikevin, ew morfem carinan dibin paşgirên ku kirdenavan saz dikin û hin caran jî bingeha peyvên nû pêk tînin. Ji bilî vê yekê ji wan lêkeran hinek navdêr bi dest dikevin.

Gelek ji van lêkeran hatine jibîrkirin, hinekan ji wan karîgeriya xwe ji dest daye. Îro em li şûna wan hinek lêkerên pêkhatî, hevedudanî yanjî lêkerên biyanî bi kar tînin. Heke ev lêker ji nû ve karîger bibin dê hêza derbirînê ya zimanê kurdî zêdetir bibe. Em dixwazin li vê derê bîr û têbîniyên xwe der barê wan de bibêjin.

ajotin *(ajo)*

Lêkereke karîger a xwerû ye. Ev lêkera gerguhêz îro jî tê bikaranîn. Her wiha rayeka dema niha ya vê lêkerê *"ajo"* wekî morfemekê tê bikaranîn û bi alîkariya wê gelek peyv bi dest dikevin. Bo nimûne, *"ajo, pêvajo, dû vajo, ajokar, ajodar ... "*

ajûtin (ajû)

Ev lêker niha zêde nayê bikaranîn, li şûna wê lêkera hevedudanî *"qirkirin"* û lêkera pêkhatî *"qîrandin"* tên bikaranin. Wekî lêkereke negerguhêz jî *"qîrîn"* tê bikaranîn.

alastin *(alês)*

Ev lêkereke gerguhêz e. Rayeka dema niha ya vê lekerê wekî paşgir tê bikaranin. Ji bo kesên ku tiştekî dialêsin mirov dikare bi kar bîne. Her wekî *"destalês, kasa/ês, solalês",* ller wiha ev lêker pêşgira *"da-"* werdigire û jê lêkera *"daalastin"* derdikeve holê.

arastin *(arêz): xemilandin, rayekandin*

Ev jî lêkereke gerguhêz e, lê hatiye jibîrkirin. Li şûna wê lêkera pêkhatî *"xemilandin"* tê bikaranîn. Mirov dikare rayeka dema niha ya vê lekêrê *"arêz"ê* jî wekî paşgir bi kar bîne.

Mînak: xanî arêz, bûkarêz ...

aşartin (aşêr): îtirafkirin

Lêkera *"aşartin"* lêkereke gerguhêz e. Ev lêker bi tenê di peyva *"veşartin"* de maye. Lêkera *"aşartin"* bi alîkariya pêşgira lêkersaz *"ve-"* wateya xwe guhartiye û wateyeke dijber wergirtiye. Lê belê lêkera *"aşartin"* di zimanê nivîskî de zêde nayê bikaranîn.

aşkartin (aşkêr): 1. derbirîn, beyankirin 2. *aşkerakirin* 3. *teyîdkirin* 4. *peyitandin*

Ev lêkera xwerû lêkereke gerguhêz e. Lêkera *"aşkartin"* di zimanê îroyîn de hatiye jibîrkirin, li şûna wê peyva *"aşkera"* ku **ji** wê lêkerê bi dest ketiye bi alîkariya lêkera "kirin" bûye *"aşkerakirin"* ango bûye lêkereke hevedudanî.

aşka/tin (aşkêv)

Ev lêker jî gerguhêz e û bi lêkera *"aşkartin"* re hemwate ye. Ew jî zêde nayê bikaranîn. Ev lêker bi rengê *"şika/fin"* jî derdikeve pêşberî mirov. Dibe ku têkiliya wê bi lêkera *"pişkaftin"ê* re jî hebe. Reng e ku ew *"bi-şkaftin"* be. Heke ev lêker di zimên de çalak û karîger bibe dê di warê wateyê de valahiyekê dagire.

avêtin / avêştin (avêj)

Lêkera *"avêtin"* lêkereke karîger c. Ew jî lêkereke gerguhêz c û rayeka dema niha ya vê lêkerê *"avêj"* wekî paşgir tê bikaranîn. Nimûne: *tîravêj, rimavêj . ...*

awartin (awêr): cudakirin, vederkirin

Ev lêker tenê di peyva *"awarte"* de wekî rengdêr derdikeve pêşber) mirov. Lê di hin berhemên berê de wekî lêker jî derdikeve pêşberî mirov. Îro li şûna wê hinek lêkerên ji zimanê biyanî û lêkera hevedudanî *"cudakirin"* tên bikaranîn. Heke ev lêker karîger bibe, dikare valahiyeke berbiçav dagire, her wiha mirov dikare rayeka dema niha ya vê lekêrê *"awêr"* jî wekî paşgir bi kar bîne.

axaftin (axêv)

Ev lêker negerguhêz e. Li hin herêman tê bikaranîn, rayeka dema niha ya vê lêkerê *"axêv"* jî wekî paşgir tê bikaranîn. Bo nîmûne, *"kurmancîaxêv" "tirkîaxêv"* û hwd.

baristin (bariz): ji ber germbûnê fireh bûn

Ev lêker zêde nayê bikaranîn, lê heke karîger bibe di warê zanistî de dikare valahiyekê dagire.

heraftin (berêv): f. sivikkirin 2. *gotûbêjkirin, hevditinkirin*

Ev lêker di du ferhengên cuda de bi du wateyên cuda derket pêşberî me. Lê Îro di her du wateyan de jî zêde nayê bikaranîn. Bi taybetî di wateya duyemîn de bikaranîna wê dê valahiyeke berbiçav dagire. Ji ber ku di kurmanciya nivîskî de li şûna vê lêkerê hinek lêkerên biwêjî tên bikaranîn.

beristin (beriz): hurmetkirin

Ev lêker îro zêde nayê bikaranîn, lê dibe ku bi peyva *"rêz"* re têkildar be. Her wiha wisa xuya dike ku têkiliya wê bi lêkera *"peristin"* re jî heye. Em dizanin ku dengê *"p"* û *"b"* di gelek peyvan de cihê xwe didin hev. Her wekî *"bişaftin"* û *"pişaftin",*

bêjtin (bêj): bêjandin, bêjingkirin.

Ev lêkereke gerguhêz e, di zimanê gelêrî de tê bikaranîn, lê di jiyana bajaran de zêde nayê bikaranîn. Peyva *"bêjing (bêj+ing)"* li ser bingeha rayeka dema niha ya vê lêkerê hatiye darîştin.

bihartin (bihêl)

Ev jî lêkereke gerguhêz e. Bihartin Îro jî lêkereke karîger e. Her wiha lêkerên borîn û borandin, li ser bingeha vê lêkerê hatine darîştin. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"bihêr"* wekî morfemeke serbixwe, hin caran jî wekî paşgir tê bikaranîn. Peyvên mîna; *"bihêrk", "şevbihêrk", "dembihêrk", "serblhêrk", "binbihêrk"* ji vê raye kê bi dest dikevin.

bihîstin (bihîz)

Ev jî yek ji lêkerên xwerû yên karîger c. Bihîstin lêkereke gerguhê? c **li** li gorî rêzikê tê kişandin. Rayeka dema niha ya lêkerê wekî morfemeke serbixwe û wekî paşgir jî tê bikaranîn. Ji rayeka dema niha *"bihîz"ê* mirov dikare peyvên mîna *"bihîzer", "dûrbihîz"* bi dest bixe. Lêkera bihîstin bi tenê pêşgira *"ra-"* digire û jê peyva *"rabihîstin (hîskirin, hestpêkirin)"* tê bidestxistin.

bijartin (bijêr)

Lêkera *"bijartin"* jî lêkereke karîger a kurdî ye. Ew jî lêkereke

gerguhêz e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"bijêr"* jî morfemeke serbixwe ye. Ji wê peyvên mîna *"hûrbijêr", "berbljêr", "hilbijêr"* hwd. bi dest dikevin. Her wiha ji lêkera *"bijartin",* lêkerên *"hi/bijartin", "vebijartin"* hatine dariştin. Ji wan jî peyvên mina *"hilbijêr", "vebijêr", "vebijêrk"* bi dest dikevin.

biraştin *(birêj)*

Lêkera biraştin lêkereke xwerû ya karîger e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê jî wekî paşgir tê bikaranîn. Her wekî *goştbirêj ....*

birûstin (birûs): biriqîn

Ev lêker di zimanê rojane de tê bikaranîn, lê zêde ne karîger e. Peyva *"birûsk (birûs+k)* " bingeha xwe ji rayeka dema niha ya vê lêkerê digire. Ev lêkereke negerguhêz e. Her wiha forma lêkera pêkhatî ya *"birûsîn"* ji heman bingehê tê.

birin *(b)*

Lêkera *"birin"* lêkereke gerguhêz e. Dema ku mirov bala xwe dide rayeka dema niha ya vê lêkerê mirov dibîne ku ew lêker jî bi domana demê re kun bûye. Her wiha dirûvê vê lêkerê yê di Laravayên din ên kurdî de jî vê rastiyê dipeyitîne. Di kurmanciya jêrin de *"birdin'* di kirmanckî de *"berdene't ti:* bikaranîn. Di hin devokên kurmancî de jî di raweya fermanî de li şûna *"bibe" "here"* tê gotin. Her wiha di peyva pêkhatî *"rêber"* de jî rayeka dema niha wekî *"ber"* derdikeve pêşberî mirov. Ew jî nîşan dide ku rayeka dema niha ya vê lêkerê, berê *"ber"* bûye, lê niha kurt bûye û wekî *"b"* maye.

bişaftin / pişaftin *(bişêv/ pişêv): helandin*

Lêkereke gerguhêz e, bi wateya di tiştê şilemenî (avî) de helandina tiştê hişk e û di zimanê gelêrî de ***"pişaftin"*** ji bo pel û titûna hişk tê bikaranîn. Van demên dawîn beranberî peyva *"asîmilasyorî'ê* tê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lekcrê ***"pişêv"*** jî wekî morfemeke bêjesaz bi kêr tê. Ifer wekî ***"xwepişêv", "çandpişêv"*** ...

bizaftin {hizêv): tevgerîn

Lêkera *"bizaftin"* di kurmanciya Bakur de zêde nayê bikaranîn, lê di kurmanciya jêrîn de wekî *"bizawtin"* tê bikaranîn. Di kurmancî

de lêkera pêkhatî *"tevgerîn"* cihê wê girtiye. *"Bizaftin"* lêkereke negerguhêz e. Aliyê balkêş ê vê lêkerê ev e kuji wê navdêra *"bizav"* bi dest dikeve. Her wiha mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkerê *"bizêv"* jî wekî morfemeke serbixwe bi kar bîne. Wekî mînak mirov dikare peyvên mîna"/ezbizêv", *"bizêvok'* darêje.

bizûtin (bizû): 1. *bizaftin* 2. *lihevgerîn, tevgerîn (mecazî)* Lêkera *"bizûtin"* lêkereke negerguhêz e. Der barê bikaranîna wê de agahiyên berfireh bi dest neketin.

bûn (b)

Lêkera *"bûn"* lêkereke negerguhêz e. Di kurdî de xwediyê du wateyan e, ev lêker beranberî *"bûden"* û ***"şoden"a*** farisî, *"to be"* û *"to become"* a îngilîzî tê bikaranîn. Wisa xuya dike ku ev lêker bi domana demê re gelekî guheriye, lewre jî rayeka dema niha ya vê lêkerê daketiye yek dengî ango bi tenê *"b"* maye. Dema ku mirov bala xwe dide forma vê lêkerê ya *"bûden"* ê û dirûvê di hin devokên kurmancî de mirov dikare bibêje dibe ku forma kevnare ya vê lêkerê *"bûndin"* be.

cûtin (cû)

Lêkera *"cûtin"* gerguhêz e, di kurmancî de tê bikaranîn. Li ser bingeha peyva rayeka dema niha ya vê lêkerê bêjeya *"cûm"* bi dest dikeve. Bo nimûne ***"cûmek benişt"*** tê gotin. Bi vê peyvê re paşgireke bêjesaz *"-m"* diyar dibe. Ev paşgir, di zimanê nivîskî de zêde nayê zanîn, ji rayeka dema niha ya lêkeran navdêran çêdike.

çêştin *(ç~JJ: fehmkirin*

Ev lêkereke gerguhêz e, di kurmanciya Bakur de zêde nayê bikaranîn, lê di kurmanciya jêrîn de tê bikaranîn. Di kurmanciya Bakur de li şûna wê peyva erebî *"fehm"* rayeka dema niha ya vê lêkerê *"çêj"* tê bikaranîn. Her wiha di kurmanciya jêrîn de li şûna *"xwaringeh'tê* jî ***"çêştxane"*** tê bikaranîn

çûn (ç)

Ev lêkera negerguhêz di kurdî de lêkereke bingehîn e. Ev jî wekî lêkera *"jJ1În"ê* gelekî guheriye û rayeka dema niha ya vê lêkerê wekî dengê *"ç"* maye. Ev lêker di nava gel de wekî *"çûndin"* jî tê bikaranîn, dibe ku forma kevnare *"çûndin"* be.

dan *(d)*

Lêkera *"dan"* lêkereke gerguhêz c û ev jî wekî lêkerên *"bûn"* û *"çûn"* lêkereke bingehîn c. Ev jî wekî lêkerên navborî gelek guheriye û rayeka dema niha ya vê lêkerê wekî dengê ***"d"*** maye. Di zimanê farisî de beranberî vê lêkerê *"daden"* tê bikaranîn, ne dûr c dirûvê kevnare yê lêkera *"dan"* jî *"dan tin"* be. Ji lêkera *"dan"* bi alîkariya qertafên lêkersaz lêkerên pêkhatî yên mîna *"vedan", "berdan", "werdan", "hi/dan", "dadan", "radan", ...* tên darişţin.

dawîtin (dawî): bêjtin

Ev lêkereke gerguhêz e, lê zêde nayê bikaranîn, ji wê zêdetir hemwateya wê *"bêjtin"* tê bikaranîn.

deristin (deriz)

Ev lêkereke gerguhêze, ev forma xweru zêde nayê zanîn, li şûna wê forma pêkhatî *"derizîn"* forma gerguhêz *"derizandin"* tên bikaranîn.

dirûtin *(dirû)*

Ev lêker jî gerguhêz e, di kurmancî de bi berfirehî tê bikaranîn. Du wateyên vê lêkerê hene: 1. *dirûtina cil û bergan* 2. *dirûtina giha.* Her wiha rayeka dema niha ya lêkerê *"didi"* wekî paşgira bêjesaz tê bikaranîn. Bo nimûne, *"cildirû", "soldirû".*

dîtin (hîn)

Ev lêkereke nerêzikî ye. Rayeka dema niha ya lêkerê ji dirûvê raderîn û rayeka dema borî cudatir e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"bîn"* morfemeke karîger e. Ji wê gelek peyv têne darişţin, her wekî ***"bînahî", "çakbîn", "dûrbîn", "bîner", "pêşbînî"*** hwd ... Li ser bingeha rayeka dema borî ya vê lêkerê jî hinek peyvên mîna, *"dîtbarî", "dimen"* hatine darişţin, lê ev rayek ji vê hêlê ve zêde ne karîger e.

dotin *(doş)*

Lêkereke gerguhêz e. Di dema niha de dengê ***"ş"*** derdikeve holê. Ji ber vê yekê dibe ku awayê kevn ₑ lêkerê *"dostin"* be. Di zimanê farisî de ji bo vî karî lêkera ***"doşîden"*** tê bikaranîn. Li gorî rêzika guherîna dengan a kêşana lêkeran diviya dengê ***"ş"*** bibûya ***"j",*** lê tiştekî wiha pêk nayê. Mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkerê jî wekî morfemcke bêjesaz bi kar bîne. Bo nimûne, ji bo kesên ku çêlekan didoşe ***"çêlekdoş"*** tê gotin.

dûtin (dû)

Lêkera *"dûrin"* di zimanê gundiyan de pir dihat bikaranîn, lê îro li şûna wê lêkera hevedudanî *"siwaxkirin"* jî tê bikaranîn. Di hin devokan de ev lêker kurt bûye û wekî *"dûn"* tê bikaranîn. Mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkera gerguhêz *"dû"* wekî paşgir bi kar bîne.

efsartin (evsêr): efsirîn

Ev lêkereke negerguhêz e, lêkereke kevnare ye, lê îro kêm tê bikaranîn, li şûna wê forma pêkhatî *"efsirîn"* tê bikaranîn.

engaştin (engêj): xeyalkirin

Ev lêker gerguhêz e û di kurmanciya jorîn zêde nayê zanîn. Li şûna wê peyva erebî *"xeyal"* tê bikaranîn. Di kurdî de peyveke hemwateya vê *"nîgaş"* heye, her wiha bi forma *"nîgaşkirin"* wekî lêkera hevedudanî jî tê bikaranîn, dibe ku binyata wan yek be. Bikaranîna vê lêkerê dê di kurmancî de dikare valahiyeke berbiçav dagire.

firotin (firoş)

Di vê lêkerê de jî di dema niha de dengê *"ş"* derdikeve holê, lewre dirûvê wê yê kevnare wekî *"flroştin"* tê zanîn. Lê di farisî de beranberî wê bêjeya *"firûxten"* tê bikaranîn, ev yek der barê forma *"firoştinê* de şik û gumanê bi mirov re çêdike. Rayeka dema niha ya vê lêkerê wekî morfemckê tê bikaranîn û gelek bêjeyên nû jê têne darişţin. *Mînak: kincfiroş.firoşkar; agahifiroş, xwefiroş, welatfiroş ...*

gestin (gez)

Lêkera *"gestin"* lêkereke gerguhêz e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê ne wekî paşgireke ku kirde navan çêdike, lê belê wekî navdêr tê bikaranîn. Her wekî *"Gezek nan bi dest min nakeve", "Min gezek li sêvê xist."* Li ser bingeha rayeka dema niha lêkera hevedudanî *"gezkirin"* hatiye çêkirin.

gihaştin (gihêj)

Lêkera *"gihaştin"* lêkereke negerguhêz e, niha di zimanê nivîskî de tê bikaranîn, lê ne pir zêde. Li şûna wê forma gerguhêz *"gihêjandin, gihandin"* li ser bingeha rayeka dema niha ya vê lêkerê

hatiye çêkirin û forma *"gihan"* her wekî hemwateya ***"gihaştin'tê.*** li ser heman bingehê hatiye dariştin. Li ser bingeha lêkera *"gihandin"* jî bi alîkariya pêşgira *"ra-"* lêkera *"ragihandin"* hatin dariştin.

girtin *(gir)*

Lêkera *"girtin"* lêkereke xwerû ya resen e. Ev jî lêkereke gerguhêz e. Di dirûvê vê lêkerê de zêde guhartin pêk nehatiye. Ji ber vê yekê mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkerê li gorî rêzikê bi hêsanî bi dest bixe. Dema ku mirov qertafa raderê ji lêkerê diavêje, rayeka dema borî *"girt"* ڇ dema ku mirov "t"yê jî diavêje îcar rayeka dema niha *"gir"* bi dest dikeve. Rayeka dema niha ya lêkerê gelekî karîger c. Wekî paşgir tê dawiya gelek bêjeyan ڇ kirdenavan çêdike, her wekî *"kefgir, çepgir, alîgir .. "* Ji lêkera *"girtin"ê* bi alîkariya qertafên lêkersaz gelek bêjeyên nû tên dariştin.

Mînak: *vegirtin, dagirtin, hilgirtin, wergirtin, ragirtin* ... Aliyekî din ە vê lêkerê jî ev e ku bi domana demê re qada wateyî ya vê lêkerê berfireh bûye, vê lêkerê cihê gelek lêkerên mîna *"radan, qefaltin û hingaftin"* ê jî dagir kiriye.

gotin *(bêj)*

Lêkera *"gotin"* lêkereke gerguhêz, lê ew lêkereke nerêziki ye. Forma raderî û rayeka dema niha ji hev cuda nc. Dema ku mirov bala xwe dide forma vê lêkerê ya kirmanckî *"vaten"* mirov dibîne ku di raweya fermanî de dibe *"vaje",* Ev yek di warê dirûvê kevnare yê lêkera *"gotin"* de ramaneke cuda bi mirov re çêdike. Wisa xuya dike ku lêkera *"gotin"* têkildarî lêkera farisî *"goften"* e. Di farisî de rayeka dema niha ya lêkerê *"go"* ye. Li gorî rêzikê diviya rayeka dema niha ya lêkera *"gotin"* jî *"go"* bûya. Lê ne wisa ye, nexwe rayeka dema niha ya lêkera kurdî *"bê)"* têkildarî *"va)"* a kirmanckî ye. Dibe ku di kurmancî de lêkereke cuda ya bi rengê *"bêjtin"* an jî ***"baş/in"*** hebe. Lêkera *"gotin"* bi xwe bi tenê pêşgira *"ve-"* digire û jê lêkera *"vegotin"* derdikeve holê. Lê belê rayeka dema niha ya vê lêkerê *"bê)"* wekî morfernekê bingeha gelek peyvan pêk tîne.

Mînak: *de ngbêj, çîrokbêj, bêje, bêjer. ..*

guhartin (guhêt)

Lêkera guhartin lêkereke gerguhêz e û lêkereke rêziki ye. Lê belê ji ber ku forma wê ya negerguhêz nîn e, li ser rayeka dema niha *"guhêr"ê* lêkera "guherîn" hatiye darişţin û li ser heman bingehê lêkera pêkhatî *"guherandin"* hatiye afirandin. Îro lêkera *"guherandin"* ji lêkera resen *"guhartin"i:* zêdetir tê bikaranin. Ji lêkera *"guhartin"ê* bi alîkariya pêşgira *"ve-"* lêkera *"veguhertin"* hatiye darişţin, her wiha ji bo forma negerguhêz jî *"veguherîn"* hatiye çêkirin. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"guh êr"* îro wekî morfemekê nayê bikaranîn, lê mirov dikare wê ji bo kirdenavên têkildarî *"guhartin"ê* bi kar bîne.

Mînak: dirûvguhêr. helwestguhêr. dengguhêr. rengguhêr.:

guhastin (guhêz)

Lêkera *"guhastin"* jî lêkereke xwerû û resen a kurdî ye. Ew jî lêkereke gerguhêz e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"guhêz"* wekî morfemeke karîger tê bikaranîn. Her wekî di peyvên *"barguhêz, dîmenguhêz, guhêzer. .. "* de tê dîtin. Ji bilî vê yekê, bi alîkariya pêşgiran lêkerên *"raguhastin"* û *"veguhastin"* jî hatine darişţin.

guvaşţin (guvêş)

Ev lêkereke gerguhêz e. Di vê lêkerê de tişţê ku balê dikêşe neguherîna dengê "Ş"yê ye. Li gorî rêzika guherîna dengan a kêşana lêkeran diviya dengê *"ş"* dageriya "j"yê, lê tişţekî wisa pêk nehatiye. Ji bilî wê jî ji ber ku forma wê ya negerguhêz nin e, ew bi alîkariya paşgira *"În"* wekî *"guvişîn"* hatiye çêkirin û li ser wê bingehê jî lêkera hemwate ya pêkhatî *"guvişandin"* hatiye darişţin. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"guvêş"* her çi qas wekî morfemeke bêjesaz nehatiye bikaranîn jî, mirov dikare pê kirdenavên têkildarî guvaştinê pêk bîne. Her wekî *"tirîguvêş", "fêkîguvêş ... "*

hatin (hê)

Lêkera hatin lêkereke negerguhêz e. Lêkereke rêziki ye, zêde tişţekî ku mirov li serê bibêje nîn e.

hejmartin (hejmêr)

Ev lêker wekî *"hemcartin"; "jimartin"* jî derdikeve pêşberî mirov. Lêkereke gurhêz e. Rayeka dema niha ya lêkerê wekî morfemeke bêjesaz tê bikaranîn. Her wekî *"demjimêr. xêvjimêr. .. "*

hêrtin (hêr): hêran

Lêkera *"hêrtin"* lêkereke gerguhêz e . .Ji forma wê ya xweru zêdetir formên *"hêran"* û *"hêrandin"* tên bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê wekî bêje û qertaf nayê bikaranîn, lê mirov dikare wisa jî bi kar bîne û pê hinek peyvên mîna *"genimhêr"* bi dest bixe.

hêvotin (hêvoj)

Lêkereke gerguhêz û resen a kurdî ye, lê kêm tê zanîn. Li şûna wê lêkera *"perwerdekirin"* tê bikaranîn. Di rayeka dema niha ya vê lekerê de jî dengê *"j"* derdikeve holê, lewre dibe ku lêker bi xwe *"hêvoştin"* be. Wekî Lêkereke resen di zimanê gelêrî de heye, di nav gel de *"Filan kes di mala xwe de hêvotî ye."* tê gotin. Mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkerê *"hêvoj"ê* jî wekî paşgireke bêjcsaz bi kar bîne, her wekî *"zarokhêvoj", "qenchêvoj."*

hinartin (hiner)

Ev lêker di kurdî de lêkereke karîger e. Her çi qas niha kurmancî lêkera pêkhatî *"şandin"* di gelek waran de şûna wê girtibe jî, lê dîsa ev lêker jî tê bikaranîn. Ji vê lêkerê morfema *"hinar"* bi dest ketiye û ji wê jî bêjeya *"hinarde"* hatiye dariştin. Her wiha rayeka dema niha ya vê lêkerê *"hinêr"* wekî paşgireke bêjesaz tê bikaranîn, her wekî *"peyamhinêr"*

hingaftin (hingêv): lêdan. li armancê dan

Ev lêker berê pir karîger bûye, lê niha zêde nayê bikaranîn. Lêkereke gerguhêz e, rayeka dema niha ya vê lêkerê wekî paşgira bêjesaz tê bikaranîn. Bo nimûne, *"şûrhingêv", "derhingêv."*

hiştin (hêj! hêl)

Lêkera *"hiştin"* lêkereke gerguhêz e. Ev lêker bi du dirûvan derdikeve pêşberî mirov; *"hiştin"* û *"hêlan";* her wiha forma *"heliştin"* jî di hin devokên kurmancî de hebûna xwe parastiye. Dibe ku forma kevnare *"he/hiştin"* be û li ser vê bingehê du lêkerên cuda derketibin holê. Tiştê balkêş di dema borî de bi giranî forma *"hiştin"* tê bikaranîn, lê di demên din de forma *"hêlan"* tê bikaranîn.

Mînak: Min pirtûk li cihê dibistanê hişt. Wê pirtûkê li wir bihêle. Lê belê di lêkera pêkhatî *"rahiştin'îê* de rayeka dema niha wekî *"ra+hêj"* derdikeve holê. Her wekî; *rahêje wê pirtûkê û ji min re bine.*

Di heman demê de ew lêker wekî *"rahêlan"* jî tê bikaranîn, wê demê rayeka dema niha ya lêkerê dibe *"rahêl"* û hevoka lijor jî dibe; *rahêle wê pirtûkê ûji min re bîne.*

hî: va tin (hîzvê): bi hûnandinê pînekirin

Ev lêker berê di karê malê û karê çilagiyê de dihat bikaranîn. Mirov dikare îro di karê tekstîlê de wê bi kar bîne. Lewre jî vejiyandina wê ji bo kurdî pir girîng e. Ev lêker lêkereke gerguhêz e.

jentin (jen): lêdan

Lêkera *"jentin'* jî lêkereke xwerû ya gerguhêz e. Wisa xuya dike ku berê di kurmancî de zêde hatiye bikaranîn, lê îro pir kêm tê bikaranîn. Niha li şûna wê lêkerên ku ji hev dibin *"lêdan"* û *"lêxistin"* têne bikaranîn. Di farisî de beranberî vê lêkerê *"zeden"* tê bikaranîn. Lê rayeka dema niha ya vê lêkerê *"zen"* e. Peyva "neyzcn" ji wir tê. Di kurdî de rayeka dema niha ya vê lêkerê peyvên mîna, *"kevanjen, libûjen, avjen"* hatine dariştin. Her wiha dîsa li ser heman bingehê lêkera dariştî *"jenandin"* pêk hatiye.

ke/tin (kev)

Lêkera *"kef tin"* îro bi gelemperî wekî *"ketin"* tê bikaranîn. Ew lêkereke negerguhêz e. Ji ber vê yekê jî rayeka dema niha ya vê lêkerê *"kev"* wekî morfemeke serbixwe nayê bikaranîn.

Ev lêker hinek pêşgirên mîna *"ra", "hir, "da" "ve"* û *"der"* digire û lêkerên mîna *"raketin", "hilke/in", "daketin", "veketin", "derketin"* têne bidestxistin. Her wiha lêkerên biwêjî *"biserketin"* û *"bibinketin"* ji vê lêkerê têne bidestxistin.

keiaştin / qelaştin (ke/êş / qelêş)

Ev lêkereke gerguhêz e,ji her du formên li jorê, forma *"qelaştin"* zêdetir tê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê bi serê xwe nayê bikaranîn, lê mirov dikare ji bo pêkanîna hinek kirdenavan bi kar bîne. Her weki *"darqelêş", "tarîqelêş"* û hwd.

kelistin / keliştin (ke!iz / kelij): raçavkirin, cavnêrîkirln, dîqkirin Ev her du lêker jî du lêkerên resen in û hatine jibîrkirin. Niha li şûna van her du lêkeran hinek lêkerên pêkhatî têne bikaranîn. Lê heke ev lêker ji nû ve di nava zimên de çalak û karîger bibin dê di warê wateyî de valahiyeke berbiçav dagirin.

keloştin (keloj): şikandin (hi diranan)

Ev lêker ji bo şikandina bi diranan a tiştên mîna gûzan tê bikaranîn. Wekî mînak *"Tovka dikelojî."*

kenîştin (kenîj): beşişîn, bişirîn

Ev lêker îro zêde nayê bikaranîn, li şûna wê lêkerên ***"beşişîn. bişirîn, besimîn"*** tên bikaranîn. Dema ku mirov bala xwe dide vê lêkera negerguhêz, mirov têki 1 iya wê ya bi lêkera *"kenîn'tê* re dibîne. Her wekî tê zanîn lêkera *"kenîn"* lêkereke pêkhatî ye, îro bêjeya *"ken"* wekî navdêr tê bikaranîn û li ser wê bingehê lêkera *"ken+în"* û *"ken+andin"* hatine darişştin. Lê dema ku mirov bala xwe dide lêkera farisî *"xenden"* û lêkera kirmanckî *"hiwa/ene"* ne dûr e ku dirûvê berê yê *"kenÎn"ê* jî *"kenîştin"* be.

keraftin (kerêv): ziqimîn, kerifîn

Ev lêkereke negerguhêz e. Niha zêdetir wekî nifirckê tê bikaranîn. Ji wê lêkerê navdêra *"kerafî* hatiye bidestxistin. Her wiha forma pêkhatî ya vê lêkerê jî *"kerifîn"* e. Wateya wê ya niha wateyeke mecazî ye. Dibe ku *"keraftin"* berê di şûna jehrîbûnê de hatibe bikaranîn.

kesaxtin *(kesêx): dapeştin*

Kesaxtin lêkereke gerguhêz e. Di jiyana çandiniyê de hê jî tê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"kes êx"* di zimanê gelêrî de wekî morfemekê nayê bikaranîn, lê mirov dikare ji bo pêkanîna kirdenavên têkildarî *"kesaxtinê (ho nimûne darkesêx)* ji wê bi dest bixe.

kirin *(k)*

Lêkera *"kirin"* lêkereke qedîm û resen a gerguhêz e. Ji ber kcvnarebûna xwe rayeka dema niha ya vê lêkerê pir kurt bûye, bi tenê dengê *"k"* maye. Lê belê dema ku mirov bala xwe dide dirûvê lêkera *"kirin"ê* ya di zaravayên din ên kurdî de, mirov guherîna pêkhatî baştir dibîne, Di kurmanciya jêrîn (soranî) de ev lêker dibe *"kirdin",* di kirmanckî de *"kerdene"* û di zimanê farisî de jî *"kerden"* e. Heke mirov li gorî rêzikê lê binêre divê di kurmanciya jêrîn de rayeka dema niha ya vê lêkerê *"kir"* û di kirmanckî de jî *"ker"* be. Lê di hemûyan de jî rayeka dema niha wekî *"k"* tê bikaranîn. Forma" *"biketin"* û *"dikerm"* di zimanê hin hereman de bi ber çavan diheve. Rayeka "ker" di hinek peyvên mîna *"karker; lavaker"* de wekî paşgir derdikeve pêşberî mirov.

koştin (koj) / kevaştin (kevêş)

Lêkera *"koştin'* jî lêkereke xwerû ya gerguhêz e. Di jiyana siruştî ya kurdî de lêkereke karîger bû, lê di jiyana bajarî de zêde nayê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"ko)"* jî wekî morfemekê tê bikaranîn, her wekî di peyva *"kojer", "hestîkoj", "eyarkoj"* de. Hemwateya vê lêkerê *"kevaştin"* heye, lê ew zêde nayê bikaranîn.

kuştin (kuj)

Lêkereke din a qedîm û karîger a xweru ye. Kuştin jî lêkereke gerguhêz e. Rayekên vê lêkerê bi awayekî rêzikî bi dest dikevin. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"kuj'* wekî morfemeke serbixwe tê bikaranîn. Her wekî, *agirkuj, bikuj, kujer, xwekuj ...* Bi alîkariya pêşgira *"ve"* ya lêkersaz lêkera *"vekuştin"* tê bidestxistin.

lîstin (lîz)

Lêkera *"lîstin"* j i aliyê gerguhêziyê ve lêkereke nakok e. Di hinek devokên kurmanCÎ de wekî gerguhêz, di hinekan de jî wekî negerguhêz tê bikaranîn. Bo nimûne di hinek devokên kurmancî de *"e: lîs tim"* , di hinekan de jî *"min lîst"* tê gotin. Lê di zimanê nivîskî de wekî gerguhêz tê bikaranîn. Lêkera *"lîstin"* bi alîkariya daçeka *"bi"* biresera nerasterast werdigire, her wekî *"bi tiştekî lîstin",*

MÎnak: Zelal bi radyoyê melîze!

Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"lîz"* morfemeke serbixwe ye.
Ew bi xwe wekî navdêr tê bikaranîn û bi alîkariya wê peyva *"lîzok", "goglîz"* hatine dariştin. Mirov dikare jibo pêkanîna kirdenavên têk-ildarî *"lislin"ê* jî bi kar bîne. Her wekî *"xweşlîz", "lîzer"* û hwd. Her wiha li ser bingeha lêkera *"lîstin"* lêkera *"velîstin"* hatiye dariştin. Rayeka dema borî ya vê lêkerê *"lîst"* jî wekî morfernekê tê bikaranîn. Peyva *"lîstik", "pêlîstok"* li ser vê bingehê pêk hatine.

malaştin (malêj)

Lêkera *"malaştin"* jî lêkereke xwerû ya resen e. Ligel forma *"malaştin'îê* forma "maliştin" jî tê bikaranîn. Her wiha Îro dirûvên wê yên pêkhatî yên mîna *"malan", "malîn"* têne bikaranîn. Bi alîkariya hinek pêşgirên lêkersaz lêkerên mîna *"ramaliştin", "vemalaştin", "damalaştin'* hatine bidestxistin. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"malê}"* wekî morfernekê nayê bikaranîn, lê mirov

dikare ji bo pêkanîna kirdenavên têkildarî *"malaştinê* bi kar bînc. Her wekî *"xweşmalêj", "qadmalêj", "kuçemalêj" ...*

man (mîn)

Lêkera *"man"* jî di kurmancî de lêkereke karîger c. Ev lêker negerguhêz e. Dirûvê îroyîn ê vê lêkerê wekî dirûvekî kurtbûyî xuya dike. Di rewşa îroyîn de rayeka dema niha bi guhartina dengdêra nîvekê "a"yê bi dest dikeve. Di zimanê nivîskî de rayeka dema niha wekî *"mîn"* tê pejirandin. Ew jî rayeka dema niha ya lêkerên ku bi paşgira *"<andin"* pêk hatine tîne bîra mirov. Heke wisa bûya, diviya wekî *"mandin"* bihata bikaranîn. Heke wisa be, ew lêkereke pêkhatî ye. Her wiha di zaravayê kirmanckî de beranberî vê lêkerê *"mendene"* û di zimane farisî de jî *"manden"* tê bikaranîn. Lê di devoka toriyan de rayeka dema niha wekî *"mên"* tê bikaranîn. Lewre jî ji bo zelalkirina dirûvê resen ₔ vê lêkerê, lêkolîneke berfireh pêwîst e.

mêştin (mêj) mêtin

Ev lêkereke negerguhêz e. Jiber ku lêkereke qedîm e, ew jî ₜûşî gelek guherînan bûye. Niha formên wê yên pekhatî *"mêjin / mijîn"* ◻ li ser wê bingehê forma gerguhêz *"mêjandin / mijandin"* hatine darîştin ◻ bi gelemperî ew têne bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"mêj"* jî bi domana demê re guheriye û bûye *"mij."* Rayeka dema niha *"mêj"* û dirûvê wê yê nû *"mij"* wekî morfem serbixwe têne bikaranîn û bi alîkariya wan gelek peyvên nû bi dest dikevin.

Mînak: mijok, xwînmij, mêjok ...

mezaxtin (mezêx): xerckirin

Lêkereke karîger a ku niha zêde nayê bikaranîn jî *"mezaxtin"* e. Ew lêkereke gerguhêz e. Heke ev lêker di jiyana rojane de karîger bibe, dê di warê wateyi de valahiyeke berbiçav dagire. Her wiha rayeka dema niha ya vê lêkerê *"mezêx"* jî wekî morfcmekê bi kar tê û li ser wê bingehê peyva *"mezêxer"* hatiye darîştin. Ji bilî wê jî mirov dikare gelek peyvên têkildarî *"mezaxtin'tê* darêjc.

Minak: pirmezêx, xwemezêx ...

mirin (mir)

Lêkera *"mirin"* lêkereke negerguhêz e. Ji ber ku forma gerguhêz a vê lêkerê *"kuştin"* heye, di lêkerê de guherîneke zêde pêk nehatiye.

Lê dîsa jî dema ku mirov bala xwe dide forma vê lêkerê ya di zaravayên din ên kurdî de mirov dibîne ku forma kurmancî kurt bûye. Di kurmanciya jêrîn de dirûvê vê lêkerê *"mirdin"* e, di kirmanckî de jî *"merdene"* ye. Ev jî nîşan dide ku dirûvê kevnare yê lêkera me *"mirtin"* e. Di vê lêkerê de aliyekî din î balkêş raye kên wê ne. Ji ber kurtbûnê her du rayekên lêkerê jî bûne *"mir".* Lê di rastiya xwe de rayeka dema borî divê *"mirt"* û rayeka dema niha jî *"mir"* be. Bi alîkariya rayekên vê lêkerê *"mir"ê* gelek peyv bi dest dikevin, her wekî; *mirî, mirdar, mêrmirî, jinmirî, gamirî ...* Li aliyê din lêkerên pêkhatî yên mîna *"vemirîn", "vemirandin"* ji vê raye kê bi dest ketine.

mîstin (mîz)

Ev lêker lêkereke xwerû ya kevnare ye, lê belê ji dirûvê xweru zêdetir forma hevedudanî *"mîzkirin"* tê bikaranîn. *"Mîstin"* lêkereke gcrguhêze, forma wê ya hevedudanî *"mîzkirin"* e. Di vê lêkerê de aliyê balkêş ev e ku rayeka dema niha ya lêkerê *"miz"* wekî navdêr tê bikaranîn, li ser bingeha vê raye kê gelek peyv hatine dariştin.

Mînak: mîzkêş, mîzdank, mizandin, mîzo

... mistin (mis) rîtin

Ev lêkereke gerguhêz c. lê zêde nayê bikaranîn. Lewre der barê wê de tiştekî ku mirov bibêje nîn e. Li şûna wê peyva *"rîtin'* tê bikaranîn.

naştin (nêj): çalkirin. definkirin

Lêkera *"nastin"* jî lêkereke gerguhêz e. Îro zêde nayê bikaranîn, li şûna wê lêkerên mîna *"definkirin", "binaxkirin"* tên bikaranîn. Lê jivan lêkeran yek j i peyveke erebî bi alîkariya lêkera *"kirin"* hatiye bidestxistin û ya din jî lêkereke biwêjî ye. Lewre bikaranîna lêkera *"nastin"* dê ji aliyê wateyî ve valahiyekê dagire. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"nêj"* wekî morfemekê nayê bikaranîn, lê heke mirov bixwaze dikare hinek peyvên mîna *"mirînê}", "nêjer"* darêje.

nehiftin (nehiv): veşartin

Ev lêker jî zêde nayê bikaranîn û lêkereke gerguhêz e. îro li şûna vê lêkerê, lêkera pêkhatî *"veşartin"* tê bikaranîn.

nimartin (nimêr): nimandin, xuyakirin

Lêkera *"nimartin"* jî lêkereke gerguhêz e, kêm tê zanîn. Li şûna wê lêkera pêkhatî *"nimandin"* zêdetir tê bikaranîn. Heke lêker karîger bibe, mirov dikare bi alîkariya rayeka dema niha ya lêkerê *'nimêr"i:* jî hinek peyvan pêk bîne.

Minak.xwcnimêr, rastinimêr.;

nimûtin (nimû): xuyabûn

Ev lêkereke negerguhêz e. Ligel ku pêdivî pê heye jî ev lêker pir kêm tê bikaranîn, li şûna wê lêkera hevedudanî *"xuyabûn"* tê bikaranîn. Balkêş e, forma gerguhêz a vê lêkerê *"nimartin"* jî zêde nayê zanîn, li şûna wê jî forma pêkhatî *"nimandin"* pir tê bikaranîn. Wisa xuya dike ku peyvên *"nimûne"* û *"nimûş"* têkildarî vê lêkerê ne. Di peyva *"nimûş'tê* de heke "ş" ne paşgir be, dibe ku rayeka dema niha ya lêkerê *"nimûş"* fl radera lêkerê bi xwe jî *"nimûştin"* be.

nîştin (nîş): qewirandin

Lêkera *"nîştin"* jî lêkerek e ku kêm tê zanîn. Ew lêkereke gerguhêz c, di dewsa wê de lêkerên pêkhatî *"qewirandin"* û *"qewirandin"* tên bikaranîn.

nîştin (niş)

Lêkera *"nişt in'* lêkereke xweru ye. Ev lêkera negerguhêz bingeha gelek lêkerên pêkhatî yên mîna *"venişt in, danişt in* ˛ *riinişt in'li:* pêk tîne. Her wiha forma gerguhêz a lêkera *"rûnişt in"* ango *"rûnişt andin"* jî li ser heman bingehê pêk hatiye.

nivistin (niv): razan. raketin

Lêkera *"nivis/in"* lêkereke xwerû ya kevnare ye. Ew lêkereke negerguhêz c. Di zimanê îroyîn de zêde nayê bikaranîn, li şûna wê lêkerên mîna *"razan, raketin, ramedîn"* tên bikaranîn. Li gorî rêzikê diviya rayeka dema niha ya vê lêkerê *"niviz"* bûya, lê ew kurt bûye, wekî *"niv"* maye. Li ser bingeha vê rayekê peyvên *"nivîn, "nivan""* pêk hatine.

nivîstin (nivîs): nivîsandin

Lêkera *"nivîstin"* lêkereke gerguhêz e. Forma wê ya xwerû zêde nayê bikaranîn, li şema wê formên pêkhatî *"nivîsîn"* û *"nivîsandin"* tên bikaranîn. Divê cm bibêjin ku rayeka dema niha ya vê lêkerê

"nivîs" wekî navdêr tê bikaranîn. Peyvên mîna *"nivîsar; ntvtser; nivîskar. destnivîs, dîroknivîs* ... " li ser vê bingehê hatine dariştin. Rayeka dema borî ya vê lêkerê *"nivist"* di peyva *"nivişt"* de derdikeve pêşberî mirov. Di kirmanckî de beranberî vê lêkerê *"nuştene"* tê bikanin, ew jî nîşan dide ku forma berê ya vê lêkerê dibe ku *"nivistin"* be.

nîgartin (nîgêr) : *wênekirin, nîgarkirin, neqişandin*

Lêkera *"nîgartin"* jî lêkereke xwerû ya gerguhêz e, lê zêde nayê bikaranîn. Li şûna wê forma hevedudanî *"nîgarkirin"* tê bikaranîn. Ji vê lêkerê navdêra *"nîgar"* bi dest dikeve, ji wê peyva *"nîgare"* hatiye dariştin. Mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkerê *"ni'gêr"ê* jî wekî paşgira kirdenavên têkildarî *"nîgartinê* bi kar bîne.

nixaftin (nixêv): parkirin, nixamtin. poştin

Ev jî lêkereke gerguhêz e, lê zêde nayê zanîn. Hemwateya wê *"nixamtin"* û forma wê ya pêkhatî *"niximandin"* zêdetir tên bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"nixêv"* di wateya devik ◦ devang de tê bikaranîn. Mirov dikare wê rayekê wekî morfemeke serbixwe jî bi kar bîne û pê hinek peyvan darêje.

***nixamtim** (nixêm)*

Lêkera *"nixamtin"* bi lêkera *nixaftin* û *poştin* re hemwate ye. Ew di zimanê rojane de ji wan peyvan zêdetir tê bikaranîn. Ligel wê peyvê forma wê ya hevedudanî *"niximandin"* jî tê bikaranîn.

***noştin** (noş): vexwarin*

Lêkera *"noştin'* lêkereke gerguhêz a xwerû ye, lê kêm tê bikaranîn, li şûna wê lêkera pêkhatî *"vexwarin"* tê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"noş"di* dema vexwarina alkolê de tê bikaranîn. Ev lêker di hinek berhemên klasîk ên kurdî de jî heye.

nûriştin (nûrij): avêtin, virvirandin

Ev lêker gerguhêz e ku îro zêde nayê bikaranîn, li şûna wê hinek lêkerên din ên pêkhatî tên bikaranîn. Heke ew j i nû ve karîger bibe dê di zimên de valahiyekê dagire.

palaftin (palêv): palandin, parzinandin, dawerivandin

Lêkera *"palaftin"* lêkereke xwerû ya kurdî ye. Di kurrnanciyajêrîn

de beranberî vê lêkerê *"palawtin"* tê bikaranîn. Her wiha rayeka dema niha ya vê lêkerê jî wekî paşgir tê bikaranîn, peyva *"çay palêw"* li ser vê bingehê hatiye dariştin. Mirov dikare di kurmancî de jî ji bo dariştina kirdenavên têkildarî *"palaftirî'i:* paşgira *"palêv"* bi kar bîne. Her wiha îro di kurmancî de ji bo fîltreyê *"palavk"* tê bikaranîn.

parastin *(parêz)*

Lêkera *"parastin"* lêkereke karîger a xwerû ye. Ev lêkera gerguhêz îro jî bi berfirehî tê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"parêz"* jî wekî morfcmeke serbixwe tê bikaranîn û bi alîkariya wê gelek peyvên mîna *"parêzer, parêzgeh, welatparêz ... "* hatine dariştin.

pehtin *(pêj)*

Lêkera *"pehtin"* lêkereke kevnare ya kurdî ye ku ev lêkera gerguhêz Îro jî di kurmancî de tê bikaranîn. Her wiha rayeka dema niha ya vê lêkerê *"pê]"* wekî morfemeke serbixwe tê bikaranîn. Peyvên mîna *"nanpêj. aşpêj. pêjer"* li ser bingeha vê rayekê hatine dariştin. Lêkerên pêkhatî *"pijîn"* û *"pijandin"* jî li ser bingeha lêkera *"pehtin"ê* hatine dariştin.

pe/aştin *(pelêş): hi/weşandin, rûxandin, kavi/kirin*

Lêkereke din a xwerû ya ku kêm tê zanîn ***"pelaştin"*** e. Ev lêkera gerguhêz jî bûye bingeha du lêkerên pêkhatî ***"pelişîn't«*** negerguhêz û ***"pelişandin"a*** gerguhêz. Ji vê lêkerê morfema ***"pe/aş"*** wekî navdêr tê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê ***"pe/êş"*** her çi qas îro wekî morfemekê nayê bikaranîn jî mirov dikare ji bo dariştina peyvên têkildarî ***"pelaştin'T:*** wê bi kar bîne.

pelaxtin (pe/êx)

Ev lêker hinekî dişibe lêkera ***"pelaştin"ê,*** di vê lêkerê de jî morfema *"pe/ax"* wekî navdêr tê bikaranîn, mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkerê *"pelêx"ê* jî wekî morfcmekê bi kar bîne û pê peyvên mîna *"serf pe/êx, pe/êxer ... "* bi dest bixe.

perçiftin (perçiv): werimîn

Ev lêkereke xwerû û negerguhêz e. *"Perçiftin"ku* lêkereke xwerû ye lê j i forma wê ya xwerû zêdetir forma pêkhatî *"perçivîn"* û forma wê ya gerguhêz *"perçivandin'* tên bikaranîn. Ji ber ku kêm tê bikaranîn, zêde tiştekî ku mirov li serê bibêje nîn e.

peristin (periz)

Ev lêker zêdetir bi rayeka xwe ya dema borî *"peres!"* wekî paşgirekê di zimên de maye, forma wê ya lê kerî *"peristin/ peres tin"* kêm tê bikaranîn. Lêkera *"peristin"* lêkereke gerguhêz e. Li ser bingeha rayeka dema niha *"peri="ê* forma negerguhêz *"perisîn"* û paşê jî hemwateya *"peristitî'ê "perisandin"* pêk hatiye.

periştin (pcrij): teftîşkirin

Lêkereke xwerû ya ku kêm tê zanîn e. Li şûna wê hinek lêkerên nexwerû tên bikaranîn. *"Peristin"* lêkereke gerguhêz e. Ji rayeka dema borî *"perişî'ê* peyva *"serperişt"* hatiye dariştin. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"perij"* wekî rnorfem nayê bikaranîn, lê heke ev lêker ji nû ve karîger bibe mirov dikare bi vê rayekê gelek peyvan darêje.

pesartin (pesêr): piştevanîkirin, paldan

Lêkera *"pesartin'* lêkereke gerguhêz e. Di kurmancî de peyva *"pesar* (pal, berwar)" heye, dibe ku têkiliya wê bi lêkera *"pesartin"ê* re hebe. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"pesêr"* wekî morfcmekê nayê bikaranîn, lê mirov dikare wê wekî morfernekê bi kar bîne û pê hinek peyvan darêje.

pestin (pes): guvaştin

Ev lêker gerguhêz e, lê wekî lêker pir kêm tê bikaranîn. Rayeka dema borî ya vê lêkerê *"pest"* wekî navdêr tê bikaranîn, her wekî *"pest ₒ pêkutî", "pestlêkirin",* ji wê jî lêkera pêkhatî *"pestandin"* hatiye dariştin.

peyiftin (peyv): axaftin, qisekirin, şitexilîn

Ev lêkera xwerû lêkereke negerguhêz e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"peyv"* wekî navdêr tê bikaranîn. Li ser bingeha vê rayekê lêkerên *"peyivîn"* û forma gerguhêz a lêkerê *"peyivandin"* hatine bidestx istin.

piraştin (pirêj): dariştin

Ev lêker jî kêm tê zanîn, lêkereke gerguhêz e. Karîgerbûna vê lêkerê di zimanê kurdî de dê di warê wateyî de valahiyekê dagire. Her wiha mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkerê *"pir~j"ê* jî wekî morfemekê bi kar bîne.

***ponişt**in (ponij): ponijîn, kûrfikirîn*

Lêkera *"ponişt**in"*** jî lêkereke kevnare ya kurdî ye. Ev lêkera negerguhêz, bi formên xwe yên pêkhatî *"ponijîn"* û *"ponijandin"* zêdetir bi ber çavan dikeve.

poştin (poş): nixamtin

Ev lêkera negerguhêz Îro di kurmancî de zêde nayê bikaranîn, lê rayeka dema niha ya vê lêkerê wekî paşgir di kurdî de tê bikaranîn, her wekî peyvên *"reşp oş* " , *"se/paş", "rûpoş" "poşak" ...* tê dîtin.

qefaltin (qefêl): girtin, zeftkirin

Lêkera navborî gerguhêz e. Der barê wê zêde tiştekî ku were gotin nîn e, rayeka dema niha ya lêkerê *"qefêl"* wekî morfemeke serbixwe nayê bikaranîn, lê mirov dikare di dariştina kirdenavên mîna *"dizqefêl, rastîqefêl ... "* de bi kar bine. Divê em bi bîr bixin ku lêkera *"girtin"* bi domana demê re cihê vê lêkerê jî vegirtiye, lewre jî ev lêker kêm tê bikaranîn Forma vê lêkerê ya bi rengê *"qufaltin"* jî heye.

qelaptin (qelêb) I qulaptin (qulêb): wergerandin

Lêkera *"qelaptin"* û hemwateya wê *"qulaptin"* her du jî lêkerên gerguhêz in. Ev her du lêker di zimanê gelêrî de hê jî zindî û karîger in, lê belê di zimanê nivîskî de zêde nayên bikaranîn. Rayekên dema niha ya van lêkeran *"qulêb"* û *"qelêb"* wekî morfcmekê nayên bikaranîn, lê dirûvê wan ₔ teşeguheri *"qelib"* tl *"qulib"* bûne bingeha lêkerên pêkhatî *"qulibîn"* û *"qulibandin", "qelibîn"* û *"qelibandin".* Heke mirov bixwaze mirov dikare *"qelêb"* û *"qulêb"* jî wekî paşgir bi kar bîne, her wekî *"darqelêb", "zimanqulêb" ...*

***qelastin** (qe/êz): çizirîn*

Ev lêkera xwerû jî kêm tê bikaranîn, lê heke di zimên de karîger bibe, dê hêza xwebêja zimên zêde bike. Bi taybetî di lîteratûra leşkerî de pêdivî bi vê lêkerê heye. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"qelêz"* niha wekî morfemeke serbixwe nayê bikaranîn, lê mirov dikare di pêkanîna hinek kirdenavan de bi kar bîne.

***qerastin** (qerêz): 1. kîsihîn* 2. *hewldana rakirina tiştekî 3. vehiştin, derengxistin*

Ev lêkera ku xwediyê sê wateyên euda ye, îro di zimanê rojane de zêde nayê bikaranîn, lê di nav gel de heye. Ji bo naskirina vê lêkerê pêdivî bi xebatên qadî heye.

qeşartln (qeşêr): qeşkirin, qaşkirin, qeşûrkirin

Ev jî lêkereke kevnare û resen a kurdî ye. Lêkera *"qeşartin"* lêkereke gerguhêz e, ligel vê lêkera xwerû, lêkera pêkhatî *"qeşkirin"* û lêkera mecazî *"spîkirin'* jî tên bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"qeşêr"* wekî morfemekê nayê bikaranîn, lê mirov dikare ji bo pêkanîna kirdenavên têkildarî qçşartinê yên mîna *"darqeşêr; sêvqeşêr"* bi kar bîne. Forma negerguhêz ya lêkera *"qeşartin" "qeşiftin (qeşiv)* " *e.*

qevastin (qevêz)

Lêkera *"qevastin"* lêkereke karîger a xwerû ye. Ev lêkereke gerguhêz e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"qevêz"* wekî morfemeke serbixwe nayê bikaranîn, lê forma wê teşeguhcri *"qeviz"* bûye bingeha lêkerên pêkhatî *"qevizîn"* û *"qevizandin",* Mirov dikare rayeka dema niha wekî paşgira hinek kirdcnavan bi kar bîne. Her wiha ji vê lêkerê navdêra *"qevaz"* jî bi dest ketiye û li ser bingeha wê jî lêkera *"qevazdan"* hatiye dariştin.

qewartin (qewêr): 1. *nava tiştekî bi tiştekî serîtûj kolan* 2. *qewitandin*

Ev lêkera xwerû gerguhêz e, lê zêde nayê bikaranîn, li şûna forma xwerû forma pêkhatî *"qewirandin"* zêdetir tê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"qewêr"* wekî paşgir tê bikaranîn, her wekî *"balafirqewêr", "darqewêr" ...*

quncartin (quncêr): quncirandin

Ev lêker di jiyana gelêrî de pir dihat bikaranîn, lê îro zêde nayê bikaranîn. Li şûna wê forma pêkhatî *"quncirandin"* zêdetir tê bikaranîn. Lewre jî tiştekî ku zêde li serê were gotin nîn e.

quraftin (qurêf) 1. *berhevkirin* 2. *bi badanê şikandin*

Lêkera *"quraftin"* lêkereke gerguhêz e. Her çi qas lêkereke kevnare be jî ji ber ku têkildarî jiyana siruştî ye, îro zêde nayê bikaranîn. Rayeka dema niha ya lêkerê *"qurêf"* wekî morfemekê nayê bikaranîn, lê mirov dikare ji bo pêkanîna kirdenavên mîna *"gulqurêf, darqurêf"* bi kar bîne. Heke di zimên de karîger bibe, di warê wateyî dê valahiyekê berbiçav dagire.

rihoştin (rihoj): revaştin, ka/an

Lêkera *"rihoştin"* lêkereke xwerû ya gerguhêz e. Ev lêker jî di jiyana kurdewarî ya siruştî de digel hemwateyên xwe *"revaştin"* an jî *"rewatin"* ₔ zêde dihat bikaranîn, lê niha kêm tê zanîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"rihoj"* ji bo pêkanîna kirdenavan bi kêr tê.

rêstin (rês)

Ev jî lêkereke resen a xwerû ye. Lêkereke gerguhêz e. Ji vê lêkerê lêkera pêkhatî *"vêrêstin"* hatiye bidestxistin. Rayeka dema niha ya lêkerê *"rês"* wekî navdêr tê bikaranîn. Her wiha li ser wê bingehê peyvên mîna, *"verês, rêsî, hevrêsîn"* hatine dariştin. Ev lêker bi dirûva *"ristin"* jî derdikeve pêşberî mirov, ji wê jî peyva *"ristik"* hatiye dariştin.

rehistin (rehiz): şînbûn, şaxvedan

Ev lêker di klasîkên kurdî de, nemaze jî di berhemên Ehmedê Xanî de balê dikêşe. Bo nimûne, di şahkara Ehmedê Xanî "Mem û Zîn"ê de *"rehistin"* wiha derbas dibe:

"Sorgulji we ra li ser rehistî
Sunbul bi xwe pêva daheristin

Îro li şûna wê lêkerên hevedudanî *"şînbûn, şax vedan"* tên bikaranîn. Heke ev lêker ji nû ve çalak bibe dê di warê wateyî de valahiyekê dagire.

rêtin (rêj)

Ev lêker lêkereke kevnare ya xwerû ye û gerguhêz c, ji ber ku kevnare ye, tûşî hinek guhartinan bûye, li ser bingeha wê hinek lêkerên pêkhatî yên mîna *"rijîn, rijandin, verê tin, darêtin* ... " bi dest ketine. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"rê)"* wekî morfemekê tê bikaranîn fl peyvên mîna *"verêj, rêje, xwînrêj. .. "* ji wê bi dest ketine.

revaştin (revêj) koştin

Ev lêker gerguhêz e, hemwateya wê *"koştin"* e. Ev lêker jî kêm tê zanîn, mirov dikare rayeka dema niha ya vê lêkerê *"ravê)"* jî wekî morfemeke serbixwe bi kar bîne fl pê peyvên mîna *"revêjok, hestîrevêj"* darêje.

rewastin (rewês): di ber re derbas hûn, di ser re

lêketin. M~~:~0~~~~~~wru~û.

Ev jî lêkereke gerguhêz a xweru ye. Lê ji forma xwerû zêdetir forma wê ya pêkhatî *"rewisandin"* tê bikaranîn. Her wiha forma wê ya negerguhêz *"rewisîn",* jî pêkhatî ye. Ji ber ku forma wê ya xwerû kêm tê bikaranîn, rayeka dema niha ya vê lêkerê *"rew~s"* wekî mortemeke serbixwe nayê bikaranîn. Lê mirov dikare ji bo dariştina peyvên têkildarî *"rewastin"ê* bi kar bîne.

***rêwiştin** (rêwij) meşîn, birêveçûn*

Lêkera ***"rêwiştin"*** lêkereke kevnare ye, lê îro hatiye jibîrkirin. Li şûna vê lêkera negerguhêz lêkera pêkhatî ***"meşîn"*** tê bikaranin. Li ser bingeha peyva ***"meş"*** a erebî lêkerên ***"meş"*** û ***"meşandin"*** hatine çêkirin.

***rûtin** (rût)*

Ev lêkera xwerû jî zêde nayê zanîn. Lêkera *"rûtin"* lêkereke negerguhêz e. Rayeka dema niha ya lêkerê *"rût"* wekî rengdêr tê bikaranîn. Her wiha lêkerên hevedudanî *"rûtbûn"* û *"rûtkirin"* jî têkildarî vê peyvê ne. Forma vê lêkerê ya gerguhêz *"rûtandin"* e, hemwateya wê jî *"rûçikandin"* e.

***satin** (sê): helizandin. kewitandin*

Lêkera *"salin"* lêkereke gerguhêz e, îro di zimanê rojane de zêde nayê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"sê"* mirov dikare wekî morfemckc bêjesaz bikar bîne.

***sotin** (soj) şewitandin*

Lêkera *"sotin"* lêkereke kevnare ya xweru ye. Ev lêker jî gerguhêz e. Forma wê ya negerguhêz nîn e. Wekî lêkereke gerguhêz lêkera ***"şewitîn"*** **li** wekî hemwateya wê lêkerê zêdetir jî lêkera ***"şewitandin"*** tê bikaranîn. Îro kêm be jî lêkera *"sotin"* tê bikaranîn, lê di berhemên wêjeya klasîk de zêdetir bi ber çavan dikeve. Her wiha rayeka dema niha ya vê lêkerê *"su)"* wekî morfemeke serbixwe tê bikaranîn. Li ser wê bingehê peyvên mîna *"sojet; dilsoj, sînesoj"* hatine dariştin.

spartin (spêr)

Ev lêkera kevnare îro jî tê bikaranîn. Li gorî pêdiviya dema nû wateya wê berfireh dibe. Ev lêker jî yeke gerguhêz e, rayeka dema niha ya vê lêkerê *"spêr"* jî wekî morfemekê tê bikaranîn. Peyva *"spêre"* ji wir hatiye bidestxistin. Her wiha ji rayeka dema borî ya wê lêkerê *"spart"* jî dibe bingeha pêkanîna hinek peyvên mîna *"sparde", "spartî"* … Ji vê lêkerê bi alîkariya pêşgira *"ra-"* lêkera *"raspartin"* hatiye bidestxistin.

su/tin (suv): qulkirin, kunkirin

Ev lêker zêdetir ji hêla soldirû koşkaran ve dihat bikaranîn. Lêkereke gerguhêz c. Di roja Îroyîn de zêde nayê bikaranîn, li şûna wê lêkerên hevedudanî *"qulkirin", "kunkirin"* tên bikaranîn.

sûtin (sû): tûjkirin

Lêkera *"sûtin"* lêkereke kevnare ye, bi taybetî **ji** bo tûjkirina tiştên bibir tê bikaranîn. Her wekî *"Pale kelendiyê disû.* ", *"Qesab kêrê disû"* Lêkereke gerguhêz c. Di jiyana gundewarî de zêdetir dihat bikaranîn, îro kêmtir tê bikaranîn.

şikestin (şikê)

Lêkera *"şikestin"* lêkereke xwerû ya kevnare ye. Ji ber vê yekê jî ew jî tûşî hinek guherînan bûye. Ji ber ku negerguhêz e, li ser bingeha rayeka dema niha forma gerguhêz, *"şikênandin"* û li ser heman bingehê îcar hemwateya *"şikestinê "şikîn"* û ji wê bingehê jî formeke din a gerguhêz *"şikandin"* pêk hatiye. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"şikê"* heke li gorî rêzikê pêk bihata diviya *"şikêz"* bûya, lê niha ev form li tu deveran bi ber çavan nakeve. Hebûna dengê *"ê"* di rayckê de nîşan dide ku forma berê *"şikastin"* e, lê niha di tu devokên kurmancî de mirov rastî forma *"şikastin"ê* jî nayê.

şûştin (şo)

Ev lêker lêkereke kevnare û karîger e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"şa"* wekî morfemeke serbixwe derdikeve pêşberî mirov. Bi alîkariya vê morfernê hinek kirdenavên mîna *"berşo, mirîşo, cilşo, firaqşo"* û hin navdêrên mîna *"serşok, destşok, xweşok"* hatine bidestxistin. Pêwîst e cm bibêjin ku rayeka dema niha ya vê lêkerê li gorî rêzikê diviya *"şûş"* an jî *"Şl!/"* bûya, lê "ş"ya dawiyê ketiye û wekî *"şo"* maye.

xepartin (xepêr): vekolan, tevrikkirin

Lêkera *"xepartin"* lêkereke gerguhêz e. Li ser bingeha vê lêkerê, lêkerên pêkhatî *"hi/xepartin"* ◻ *"vexepartin"* hatine dariştin. Her wekî, *"Min dil heye, hinekî vê mijarê vexepêrim."* Her wiha forma pêkhatî ya vê lêkerê *"xepirandin"* jî heye. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"xepêr"* her çi qas niha wekî morfemeke bêjesaz nayê bikara nîn jî cm dikarin bi vê mebestê bi kar bînin ◻ jê hinek peyvên mîna *"zevixepêr", "kûrxepêr"* bi dest bixin.

xewtin (xew)

Lêkera *"xewtin"* lêkereke negerguhêz e. Îro ev lêker zêde nayê bikaranîn, li şûna wê lêkerên *"razan, raketin"* tên bikaranîn. Lê dîsa jî li hin herêman hê jî tê bikaranîn. Aliyekî balkêş ê vê lêkerê ev e ku ji rayeka dema niha ya vê lêkerê navdêra *"xew"* bi dest dikeve. Lêkera ku ji aliyê wateyê ve nêzî *"xewtin"ê* ye, lêkera *"nivistin"* e.

xistin (x)

Lêkera *"xistin"* lêkereke gerguhêz e, îro jî lêkereke karîger e. Li hin herêman wekî *"êxistin"* jî tê bikaranîn. Rayeka dema niha ya vê lêkerê kurt bûye, bi tenê wekî "x" maye. Li gorî rêzikê diviya rayeka wê *"xiz"* an jî *"xis"* bûya, lê ne wisa ye. Hin earan rayeka dema niha wekî *"xîn"* her wekî *"di-xîn-im"* jî derdikeve pêşberî mirov, li gorî wê divê radera wê *"xiyandin"* be, lê formeke wisa jî nîn e. Ev jî rewşeke balkêş e. Ji vê lêkerê bi alîkariya hinek pêşgiran lêkerên *"raxistin, daxistin"* ◻ bi alîkariya cînavkên lihevxisti lêkerên *"lêxistin, vêxistin"* bi alîkariya hokera *"der"a* ku êdî rengê pêşgirekê wergirtiye lêkera *"derxistin"* bi dest dikeve. Her wiha hinek lêkerên biwêjî yên mîna *"biserxistin",* " *bibinxistin"* **li** *"biberxistin"* pêk tên.

xunaftin (xunêv): ferikandin, mehandin, gewirandin

Ev jî lêkereke resen a kurdî ye ku niha zêde nayê bikaranîn. Li şûna wê hinek lêkerên pêkhatî yên mîna *"ferikandin, mehandin, gewirandin"* têne bikaranîn. Lêkereke gerguhêz e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"xunêv"* wekî morfemeke serbixwe nayê bikaranîn.

xwarin (XH')

Ev lêker bi domana demê re guheriye, lewre jî rayeka dema niha ya lêkerê karîgeriya xwe ji dest daye. Li şûna wê rayeka dema borî

ya lêkerê *"xwar"* wekî paşgir tê bikaranîn. Her wekî *kedxwar, xwînxwar ...* Lê belê dema ku mirov bala xwe dide forma vê lêkerê ya di soranî û kirmanckî de ango *"xwardin"* û *"werdene",* mirov dibîne ku lêker di bingeha xwe de *"xwardin"* e. Wê gavê rayeka dema borî ya lêkerê dibe *"xward"* û rayeka dema niha jî dibe *"xwar".* Îro jî di hin devokên kurmancî de forma *"xwardin"* di hin biwêjan de tê bikaranîn. Paşgira *"xur"* ya di peyvên ***"goş txur"*** , *"giyaxur"* de ji lêkera *"xwarin"ê* tê.

xwendin (xwîn)

Her çi qas ev lêker rengê lêkereke xwerû bide jî dibe ku lêkereke pêkhatî be, lewre lêker li gorî rêz û rêzikên lêkerên ku bi *"-andin"ê* pêk hatine tê kişandin. Lêkera xwendin jî pêşgira *"ve-"* digire û lêkera *"vexwendin (dawetkirin)"* pêk tê. Peyvên mîna; *"quranxwîn" û "helbestxwîn"* jê çêbûne.

xwestin (xwaz)

Lêkereke gerguhêz e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê jî wekî paşgir tê bikaranîn. Nimûne: ***xêrxwaz, aştîxwaz, azadîxwaz ...*** Her wiha hin earan wekî morfemeke serbixwe hinek paşgir û pêşgiran digire û peyvên nû pêk tîne. Mînak: *daxwaz, xwazgin ...* Lêkera xwestin pêşgira *"ve-"* digire û jê lêkera *"vexwestin"* bi dest dikeve. Her wiha lêkera xwestin pêşgira *"ra-'* jî digire û peyva *"raxwestin"* tê dariştin.

zanistin (zan) zanîn

Ev forma lêkerê hatiye jibîrkirin. Bi tenê di peyva *"zanist"* de derdikeve pêşberî mirov. Forma *"zanîn"* ji rayeka dema niha ya lêkera *"zan"ê* hatiye bidestxistin. Di warê gerguhêziyê de lêkereke tevliheve. Lê bi gelemperî wekî gerguhêz tê qebûlkirin. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"zan"* wekî paşgir tê bikaranîn. Her wekî *"zimanzan* ", *"rêzan"* ...

zivartin (zivêr): zivirandin, vegerandin, qulaptin

Lêkera *"zivartin"* lêkereke gerguhêz e. Ji forma wê ya xweru zêdetir, forrna wê ya pêkhatî *"zivirandin"* tê bikaranîn. Fonna negerguhêz a vê lêkerê *"zivirîn"* e. Rayeka dema niha ya vê lêkerê *"zivêr"* wekî peyvekê tê bikaranîn û ji wê jî lêkerên hevedudanî *"zivêrbûn"* û *"zivêrkirin"* hatine bidestxistin.

zitln (zîr): ristin

Ev lêker kêm tê zanîn, lêkera hemwateya wê *"ristin"* zêdetir tê zanîn. Ev jî lêkereke gerguhêz e.

Lêkerên nexwerû

Lêkerên *"nexwerû",* ji lêkerên xwerû, navdêr û hevalnavan bi alîkariya qertaf, daçek û lêkerên din têne bidestxistin. Lêkerên *"nexwerû"* jî dibin du cure: *"hevedudanî"* û *"pêkhatî,'*

Lêkerên *"hevedudanî"* ji çend hêmanên serbixwe pêk hatine. Dema ku mirov wan hêmanan ji hev cuda bike, her yek ji wan xwediyê wateyeke serbixwe ye.

Mînak: *olandan, diyarkirin, danzanîn, başbûn, dela/bûn, bilindhûn, hêvîşikestin, bawerkirin, hûrkirin, xerakirin, parkirin, şopgerandin, topavêtin, sorkirin, nexweşketin, di/man, bidestketin, amadebûn, bergirtin, berxwarin, agirdadan, agirxweşkirin, aramgir/in, arizîkirin, avisman, ba/kêşan, bêhnvedan, biryardan, cihêrengîkirin, dabînkirin zÎ hwd.*

Piraniya wan lêkeran bi alîkariya lêkerên mîna *"kirin* ", *"bûn"* ji hinek navdêr û hevalnavan têne bidestxistin. Bi alîkariya lêkera *"kirin"* lêkerên hevedudanî yên gerguhêz û bi lêkera *"bûn"* jî lêkerên hevedudanî yên negerguhêz têne bidestxistin.] i bi lî wan jî lêkerên mîna *"anîn* ", *"birin* ", *"mayin* ", *"hiştin* ", *"girtin ". "şikestin* ". *"danîn"* û hwd. lêkerên hevedudanî têne bidestxistin. Dîsa tê dîtin ku hinek ji wan lêkeran wekî; *"hêvîşikestin* ", *"di/mayin* ". *"bîrbirin "* lêkerên biwêji ne.

Lêkerên pêkhatî û qertafên lêkersaz

Mijara heri berfireh mijara lêkerên pêkhatî ye. Lêker di kurmancî de bi alîkariya paşgir û pêşgiran têne pê. Qertaf çi pêşgir çi jî paşgir bi serê xwe, ne xwediyê tu wateyê ne, lê dema ku bi lêker, navdêr an jî hevalnavekê ve dibin, wateyeke nû didin wê. Divê em ji bîr nekin ku gelek bêjeyên watedar jî bi domana demê re bûne qertafên bêjesaz. Ilinek peyvan bi demê re wateya xwe winda kiriye ûji bêjeyên ferhengî (lexical words) dageriyane bêjeyên erki (functional

words), hinek jî ketine vê qonaxê lê hê wateya wan tê zanîn. Her wiha hinek morfernên din hene ku di bingeha xwe de daçek in, lê niha wekî qertafên bêjesaz tên bikaranîn.

Di kurmancî de hejmara lêkerên xwerû gelekî kêm e, bi giranî lêkerên pêkhatî, hevedudanî û hin earan lêkerên biwêjî tên bikaranîn. Ji ber ku rêz û rêzikên lêkerên pêkhatî diyarkirî û hêsantir in, meyla zimên ber bi wan ve ye. Ji ber vê sedemê gelek lêkerên xwerû dageriyane ser formeke pêkhatî.

Di vê yekê de mijara gerguhêzî û negerguhêziyê jî bandor li lêkeran kiriye. Di lêkerên xwerû de kêm caran formên gerguhêz û negerguhêz ligel hev peyda dibin. Pirî caran formek ji van di nav lêkerên xwerû de peyda nabe, lewre jî li ser bingeha rayeka dema niha forma din pêk tê. Piştre jî li ser bingeha forma pêkhatî, hemwateya lêkera xweru ya heyî jî tê dariştin.

Paşgirên lêkersaz

Di kurmancî de paşgirên ku bi alîkariya wan lêkerên pêkhatî *çêdi*-bin, ne gelek in, yên herî zêde tên bikaranîn paşgirên *"<în", "<andin"* in. Ev her du paşgir ji navdêr û rengdêran lêkeran çêdikin. Ji wan "*în"* lêkerên negerguhêz (têneper), *"<andin"* jî yên gerguhêz çêdike. Hinek lêkerên mîna *"kirîn, birîn* û *girîn"* hene ku ji aliyê teşeyê ve dişibin lêkerên negerguhêz ên pêkhatî, lê dema ku mirov bala xwe dide wan diyar dibe ku lêkerên gerguhêz in. Ev jî diyar dike ku forma kevnare ya van lêkeran euda ye. Her çi qas ji aliyê teşeyê ve bişibin lêkerên bi *"-În"ê* pêkhatî jî, ji aliyê wateyê ve ji wan cudatir in.

MÎnak: belişandin, belişîn, berisîn, berisandin, berizandin, bersivandin, bihurandin, bihurîn, kavilandin, kefandin, kelandin, kelişandin, ke/mijîn, kezixandin, kerixandin, kulandin, kulîn, kumişandin, jehrandin.jenandin, mijandin, malandin, malişandin, mehandin, mehilandin, mehitandin, nalîn, nalandin, napirandin, nasandin ...

gerguhêz	*negerguhêz*	*rayek*
revandin	*revîn*	*rev*
lîrandin	*firîn*	*fir*
bezandin	*bezîn*	*bez*

êş	*êşîn*	*êşandin*
kel	*kelîn*	*kelan din*
ceme d elm	*cemidîn elimîn*	*cemidandin elimandin*
heyv	*hewîn*	*hewandin*
kew	*kewin*	*kewandin*
xap	*xapîn*	*xapandin*
germ		*germandin*
ger	*gerîn*	*gerandin*
sor		*sorandin*
kesk		*keskandin*
xweş şop	*xweşin*	*xweşa n din sopandin*

Ji bilî van çend heb paşgirên dinjî hene, wekî *"<ijîn", "<ijandin", "-isÎn", "-isandin".*

Bo nimûne:

germijandin	*germijîn*	*germ*
kelijandin	*kelijîn*	*kel*
tam ijandin	*tamijîn*	*tam*
tepisandin	*tep is în*	*lep*
rep is andin	*repisîn*	*rep*

Divê bê gotin ku ev paşgir ne tenê ji navdêr, rengdêr û peyvên biyanî lêkeran çêdikin, her wekî me li jorê jî nîşan da gelek lêkerên me yên resen jî guherîne û ketine dirûvê van lêkerên pêkhatî. Ji ber ku hejmara lêkerên resen gelekî kêm in. Ew lêker bi alîkariya pêşgir û paşgiran zêde bûne.

		Mînak:
gerguhêz	*negerguhêz*	*lêkera xwerû*
angêşandin		*angaştin*
axivandin	*axivîn*	*axaftin*
bihfstandin		*bihîstin*
bişkuvandin	*bişkuvin*	*blşkaftin*
bihurandin	*bihurîn*	*bihartin*
gezandin	*gezin*	*geztin*

gihaştin	*gihîn*	*gihandin*
guhartin	*guherîn*	*guherandin*
hêrtin	*hêrîn*	*hêrandin*
heraftin	*herifîn*	*herifandin*
heristin	*herisîn*	*herisandin*
jentin	*jenîn*	*jenandin*
ketin		*ketandin*
lîstin		*lîstandin*
mêtin	*mijîn*	*mijandin*
mirin		*mirandin*
nihartin	*nihêrîn*	*nihêrandin*
nivistin	*nivîsîn*	*nivîsandin*
nixamtin	*nixumîn*	*nixumandin*
pişaftin	*pişêvîn*	*pişêvandin*
qelaştin	*qelişîn*	*qelişandin*
pelaxtin	*pelixîn*	*pelixandin*
peristin	*perisîn*	*perisandin*
rêtin	*rijîn*	*rijandin*
sotin	*sojin*	*sojandin*

Li ser sedema vê guherînê pêdivî bi ravekirinê heye. Her wekî me di destpêka mijarê de jî diyar kir, hinek **ji** van lêkerên xweru gerguhêz in, hinek jî negerguhêz in. Ji lêkerên negerguhêz bi alîkariya *"-andin"ê* lêkerên gerguhêz û ji lêkerên gerguhêz jî bi alîkariya "În"ê lêkerên negerguhêz hatine bidestxistin.

"Axaftin" lêkereke negerguhêz e û bi paşgira *"-andin"ê* jî forma dançêker *"axivan din* " pêk hatiye û piştre jî bi alîkariya paşgira "*-în"* hemwateya axaftinê *"axivîn"* pêk hatiye.

Dîsa ji lêkera gerguhêz *"bihîstin"ê,* forma dançêker *"bihîstandin"* hatiye bidestxistin.

Ji lêkera gerguhêz *"bişkaftin* forma negerguhêz *"b işku vîn* " bi *"-andin"ê* jî dîsa forma gerguhêz *"bişkuvandin"* tê pêkanîn.

Lêkera *"buhartin "* a gerguhêz forma negerguhêz *"bihurîn* ", ji wê jî dîsa bi paşgira *"<andin"* avaniya gerguhêz *"bihurandin"* hatiye bidestxistin.

Her wiha *"gestin"* lêkereke gerguhêz e, ji wê lêkera hemwate *"gezandin"* hatiye dariştin.

Lêkera gerguhêz *"guhartin"* bi *"-În"ê* bûye negerguhêz û dirûvê *"guherîn'* wergirtiye, li ser heman bingehê forma avaniya gerguhêz *"guherandin"* hatiye pêkanîn.

Ji lêkera gerguhêz *"heraftin"* avaniya negerguhêz *"herifîn"* **li** ji wê jî forma avahiya gerguhêz *"herifandin"* pêk hatiye.

Lêkera gerguhêz *"jentin "* bi paşgira *"-În"* bûye *'jenîn* ", piştre jî li ser heman bingehê îcar bi alîkariya paşgira *"<andin" "jenandin"* pêk hatiye. IIer sê lêker jî gerguhêz in ûji aliyê wateyê ve tu cudatî di navbera wan de nîn e.

Lêkera *"lîstin"* bi alîkariya paşgira *"<andin"* bûye *"lîstandin "* ketiye rewşa lêkereke dançêker.

Ji rayeka dema niha ya lêkera gerguhêz *"mêtin"ê* ku *"mêj"* e, bi alîkariya paşgira *"-În"* forma avaniya negerguhêz *"mijîn"* ûji heman bingehê îcar jî avaniya dançêker *"mijandin"* hatiye bidestxistin.

Ji rayeka dema niha ya lêkera *"nihartin "* a gerguhêz hemwateya wê *"nihêrîn"* û ji heman bingehê îcar forma avaniya dançêker *"ni-hêrandin"* hatiye çêkirin.

Lêkera *"nixamtin* ", bi alîkariya paşgira *"-În"* ketiye rewşa negerguhêz û bûye *"nixumîn "* û piştre jî bi *"-andin"ê* îcar hemwateya wê *"nixumandin"* hatiye pêkanîn.

Rayeka dema niha ya *"pişaftin* bi alîkariya paşgira *"-În"* bûye *"pişêvîn* ", bûye negerguhêz û li ser heman bingehê hemwateya lêk-era pişaftin *"pişêvandin "* hatiye pêkanîn.

Lêkera *"qelaştin"* a xwerû jî bi alîkariya *"-În"ê* bûye *"qelişîn"* û piştre jî hemwateya wê *"qelişandin"* pêk hatiye.

"Pelaxtin " jî bi alîkariya paşgira *"<în"* bûye negerguhêz û dirûvê *"pelixîn"* wergirtiye û bi alikariya *"<andin"* jî hemwateya pelaxtinê *"pelixandin"* hatiye dariştin.

Lêkera *"rêtin'* jî tûşî heman guherînê bûye, rayeka dema niha ya *"rêtint: "rêj"* bi alîkariya paşgira *"<în"* dirûvê lêkerên negerguhêz wergirtiye û bûye *"rijîn* ", her wiha li ser heman bingehê hemwateya lêkera" rêtin" ê . *'rijandin* " pêk hatiye.

Lêkerên bi paşgira "-an"

Paşgireke din ku lêkeran pêk tîne *"-an"* e. Lêkerên ku bi paşgira *"-an"ê* pêk hatine, rasterast li ser rayeka dema niha ya lêkerê pêk hatine. Di rayeka dema niha ya lêkera xwerû de zêde guhartin çênebûye. Her wekî *"kêşan (kêş)", "guran (gur)", "kêlan (kêl)", "kolan (kol)", "pîvan (pîv)", "westan (wesf)", "hêran (hêr)", "hinan (hin)" ...* ji van lêkeran hinekên awarte hene, herwekî *"man (mîn)", "pan (pê)", "zan (zê)".* Di van lêkeran de her çi qas forma wê ya raderî guherîbe jî rayeka dema niha di forma lêkera xwerû de maye. Di soranî de radera lêkera *"manî'ê "mandin",* di kirmanckî de *"mendene* " tê bikaranîn. Di kirmanckî de li şûna lêkera *"pan"ê "pawitene"* tê bikaranîn, lêkera *"zan"* jî di farisî de *"zaden"* e.

Mirov dikare bibêje ku forma raderî ya van lêkeran di kurmancî de jî nêzî van lêkeran bûye. Ji van lêkeran lêkera *"zan"* hêjayî nirxandineke berfirehtir e. Lêkera *"razan"* ji vê lêkerê hatiye bidestxistin. Her wiha rayeka dema niha ya vê lêkerê hinekî bi arîşe ye, di dema kêşanê de wekî "zê" xuya dike, lê di hinek peyvan de wekî *"za"* jî derdikeve pêşberî mirov. *"Zê"* û *"za"* wekî morfemekê tên bikaranîn û bi alîkariya wan peyvên mîna *"avzêm. zêde.biraza/birazê, xwarza* / *xwarzê"* hatine dariştin.

Ev lêkerên ku bi *"-an"ê* pêk hatine, carinan bi qertafa *"-in"* û "-*andin"ê* jî derdikevin pêşberî mirov.

Mînak:

pêçandin	*pêçîn*	*pêçan*
kêlandin	*kêlîn*	*kêlan*
kişandin	*kişîn*	*kêşan*
kolandin	*kolîn*	*kolan*
kutandin		*kutan*
westandin	*westîn*	*westan*

Pêşgirên

lêkersaz

Di kurmanci de lêker ne tenê bi alîkariya paşgiran, belkî ji wê zêdetir bi alîkariya pêşgiran tên dariştin. Hinek qertaf têne ber lêkeran û wateyeke nû li wan bar dikin, ango lêkereke nû pêk tînin. Bo

nimûne dema ku mirov dibêje, *"kirin",* tiştek tê bira mirov, lê dema *"rakirin"* hate gotin, tiştekî din tê bîra mirov. Li vir qertafa *"ra-"* pêş gir e. Pêşgirên *"lêkersaz "* ku bi berfirehî tên bikaranîn ev in: "wer-", *"da-", "ra-",* "ve-", ***uhil-".***

Mirov dikare ji wan pêşgiran çend mînakan bide.

"wer-": Ev pêşgir bi piranî wateya tevgera scrûbinobûnê dide lêkerê ...

gerîn	*wergerîn*
gerandin	*wergerandin*
girtin	*wergirtin*
kirin	*werkirin*
dan	*werdan*
pêçan	*wer pêçan*
jirandin	*werfirandin*
guhartin	*werguhartin*
guhastin	*werguhastin*
ketin	*werketin*
kutan	*werkutan*
pekandin	*werpekandi n*

"da-": Ev pêşgir bi piranî tevgera ber bi jêr ve ango sernivîş nîşan dide.

dan	*dadan*
ketin	*daketin*
gerîn	*dagerî n*
xistin	*daxistin*
girtin	*dagirtin*
weşandin	*da weşandin*
kişandin	*dakişandin*
belandin	*dabe/andin*
berandin	*daberandin*
beristin	*daberistin*
beşandin	*daheşandin*
binartin	*dabinartin*
çikandin	*daçikandin*
çilmisandin	*daçilmisandin*
hatin	*dahatin*

"ra-": Ev pêşgir bi piranî tevgerên ji jêr ber bi jor û ji jor ber bi jêr bi hev re nîşan dide.

rakirin	*kirin*
raborîn	*borîn*
rabûn	*bûn*
raxistin	*xistin*
rabuhartin	*buhartin*
rafizirîn	*fizirîn*
raçandin	*çandin*
rahatin	*halin*
rahiştin	*hiştin*
rakenandin	*kenandin*
raguhastin	*guhastin*
rakişandin	*kişandin*
rahejandin	*hejandin*
ragihandin	*gihandin*
raperin	*perîn*
radan	*dan*
ragirtin	*girtin*
rabezîn	*bezin*

"ve-": Ev pêşgir tevgera dubarebûnê û jêkvebûnê dide lêkerê.

vedan	*dan*
vebûn	*bûn*
vekirin	*kirin*
vegirtin	*girtin*
veniştin	*niştin*
vemirandin	*mirandin*
velîstin	*lîstin*
vehatin	*hatin*
vegotin	*gotin*
vekuştin	*kuştin*
veşûştin	*şûştin*
vexwarin	*xwarin*
veman	*man*

Mirov dikare Ji ser pêşgira "ve-"çend tiştan bibêje. Di devoka Behdînan de ev pêşgir bi dawiya lêkeran ve dibe, wekî *"xwarine ve* " (vexwarin). Di zaravayê soranî de jî ew pêşgir dibe *"-ewe"* û bi dawiya lêkeran ve dibe ango dibe paşgir wekî *"çûnewe"* (vegerin), *"kirdinewe"* (vekirin). Di zaravayê kirmanckî de weki kurmancî ye. II in caran tê pêşiya lêkerê wekî *"wekerdin* " (vêxistin), ***"weriştin"*** (rabûn). Di hin devokan de tê dawiyê û bi serê .xwe tê nivîsandin, wekî; *"Mi adir kerd we ".*

"hil-": Ev pêşgir bizaveke ber bi jor ve dide lêkerê.

hilkirin	*kirin*
hilbûn	*bûn*
hilanîn	*antn*
hilbijartin	*bijartin*
hilpekîn	*pekîn*
hilweşandin	*weşandin*
hilhatin	*hatin*
hilgirtin	*girtin*
hi/ketin	*ketin*
hildan	*dan*
hilborîn	*borin*
hilgerîn	*germ*
hi/avêtin	*avêtin*
hilsengandin	*sengandin*
h ilç În in	*çtntn*

Ji bilî van pêşgiran du pêşgirên din hene ku zêde nayên bikaranîn. Ew jî *"1'o-"* û *"çê-"* ne. Ew pêşgir bi tenê di çend mînakan de derdikevin pêşberî mirov.

Mînak:

kirin	*rokirin*
niştin	*rûniştin*
kirin	*çêkirin*
hûn	*çêhûn*

Lêkerên bidaçek

Di kurmancî de ji bilî lêkerên hevedudanî û pêkhatî hinek cureyên din jî hene. Cureyek ji van lêkerên bi daçek in. Ev cure lêker bi alikariya daçekan sergihayî dibin, bêyî daçek nayên kişandin. Bo nimûne, em bala xwe bidin lêkera *"nihartin"* ev lêker bi tena serê xwe nayê bikaranîn, divê tevî daçeka ***"li"*** were bikaranîn. Lewre jî forma rastîn a vê lêkerê *"lê nihartin"* e. Dema yek bibêje, *"Min tu nihanî"* kes tiştekî jê fêm nake, lewre di kurmancî de formeke wiha nîn e, divê li şûna wê mirov bibêje, *"Min li te nihart,"* Her wekî ji mînakê jî diyar c, ev lêker ji gelek aliyan ve ji lêkerên din eudatir e. Bo nimûne her çi qas lêker gerguhêz be jî, tê de biresera rasterast nîn e. Di dema borî de hem kirde hem jî bireser tewandî ne. Ji bilî wê lêker ne li gorî kirdeyê, ne jî li gorî bireserê hatiye kişandin. Ji aliyê ergatîviyê ve li holê rewşeke awarte xuya dike. Ji bo zelalkirina mijarê em dikarin mînakeke din bidin, ***"Me li nûçeyan temaşe kir."*** Her wekî diyar e, hem *"kirde"* hem jî *"bireser"* pirjimar in, lê belê lêker yekjimar e.

Divê em diyar bikin ku gelek ji van lêkeran, lêkerên biwêji ne, di hinekan de jî cînavkên 1ihevxistî *"lê, tê, pê, jê"* bûne parçeyekî peyvê, lewre jî di hin pirtûkên rêzimanî de ew wekî qertafên bêjesaz hatine destnîşankirin, di hinek bêjeyên mîna *"jêkirin"* û *"lêkirin"* û ***"têgihîştin"*** de peywira pêşgiran bi cih tînin, lê dîsa jî ew di bingeha xwe de cînavkên lihcvxisti ne.

Ji bo van lêkeran çend mînak: *têdan, bicihbûn / bicihkirin, pêde çûn.fêhezkirin.fêkirin/jêbûn. têhilatin, têwerbûn /kirin, têde kirin, têrekirin, têreçûn. têfirandin , têgerîn/ lêgerandin, têkoşîn, têkilandin, têwerdan, pêhesîn, pêkenîn, pêzanin, pêketin, pêvekirin, lê nihartin, lêxistin, lêkirin, lêdan, lêborîn, lêsiwarbûn, lêvenan.lêsiwarkirin, lê germ, lêkolîn, lêguncîn / guncandin. lêguhdarîkirin, lêanîn, lêhatin, bawerîpêanin, pêdaketin, pêbilîbûn, pêdeçûn, bidûrket in/ xistin, pê lîstin, têgerîn, têgihîştin ...*

Her wekî **ji** mînakan jî diyar e, gelek ji van lêkeran, lêkerên biwêji ne. Di hinekan de daçek hebûna xwe diparêzin, dema ku navdêr tê cihê cînavka "ê", daçek jî derdikeve holê. Her wekî mînak, *"jê hez kirin".* Dema ku em dibêjin, *"Ez ji kulîlkan hez dikim"* lêkera ***"ji"*** derdikeve holê.

Minak:

Em li filmekî xweşik temaşe
dikin. Wan li hev nedihart.
Wî lawikî bi xeletî li hevalê xwe xist.
Ew bi tiştekî nizane.
Ez bi te dizanim.
Dema ku we bi tiştekî girt, hûn
bernadin. Kê li te daye lawo ji min re
bibêje?

Lê di hinek mînakan de ev yek pêk nayê. Bo nimûne di lêkera *"jêkirin"* de cînavka lihevxistî *"jê"* wekî hemanekê cihê xwe girtiye û daçek û cînavkji hev cuda nabin. Em dikarin ji bo zelalkirina mijarê çend mînakên din jî bidin.

Mînak:

Te çima guliyê vê darê
jêkir? Min xaniyek lêkir.

Her wiha hin caran hokerên cih ên mîna *"ber"* û *"der"* roleke nêzî pêşgiran hilgirin ser xwe. Bi alîkariya wan jî hinek lêkerên pêkhatî tên dariştin. Her wiha hin navdêrên mîna *"dergûş", "derpê"* jî bi *"der'c* pêk hatine, lewre jî mirov dikare wan hokeran wekî pêşgir bibîne.

Mînak: berdan, beran in, derxistin, deranîn, derkirin, beravêtin

DI LÊKARAN DE RAWE

Rawe teşeya lêkeran nîşanî me didin. Zimanzan û rêzimanzan bi awayê cur bi cur nêzî mijara raweyan bûne, bi awayên cuda ew dabeş kirine. Bo nimûne hinekan neyînî, hinekan pirs wekî raweyekc bi serê xwe destnîşan kiriye. Her wiha der barê raweya fermanî de jî helwestên ji hev cuda derketine holê. Gelekan raweya fermanî di nav raweyên daxwazî de daye, hinekan jî ji her duyan cudatir, wekî tiştekî bi serê xwe nîşan daye. Her çi qas bi hinek taybetiyên xwe raweya fermanî ji raweyên daxwazî cudatir be jî, em wê jî di nav raweyên daxwazî de nîşan bidin. Lewre jî em dikarin bibêjin ku di kurmancî de *"raweyên pêş kerî* " û *"raweyên daxwazî* hene.

Raweyên pêşkerî dema karekî nîşan didin, em ji wan tê digihêjin ku tiştek dê pêk bê, pêk tê yan jî pêk hatiye. Li aliyê din raweyên daxwazî karekî aşopî yê ku tê nîgaşkirin dinimînin; hin caran jî daxwazekê nîşan didin.

Berî ku em der barê dem û raweyan de agahiyên kitekit bidin, em bi nêrîneke giştî li ser avaniya wan çend tiştan bibêjin. Hemû demên borî û hinek raweyên xwestekî li ser bingeha rayeka dema borî ava dibin. Dema niha, dema bê, raweya fermanî û hinek raweyên xwestekîjî li ser bingeha rayeka dema niha ava dibin. Li gorî pêkhatin û avaniyê. lêkerên kurdî bi çend dirûvan derdikevin pêşberî mirov.

Raweyên pêş kerî

Ev rawe di hevokê de deman nîşan didin. Divê em bidin zanîn ku di warê navlêkên deman de, nemaze jî di warê navlêkirina demên borî de di nav zimanzanên kurd de aloziyeke mezin heye. Her çi qas Celadet Bedirxan hîmê rêzimana kurmancî danibe jî, di warê lêkeran de xebateke bi kurdî nehiştiye. Ji lew re jî her lêkolînerê nûhatî li gorî xwe ev mijar hildaye dest û li gorî xwe navek li deman kiriye. IIeta ku ji destê me hat, me cih da navlêkên ku ji aliyê gelek kesan ve hatine bikaranîn. Her wiha me li vê derê cih neda hinek demên ku zêde nayên bikaranîn. Mirov dikare demên ku di kurmancî de bi berfirehî têne bikaranîn wiha rêz bike:

1) Dema niha
2) Dema bê
3) Çîrokiya dema bê
4) Dema bê ya nêzîk
5) Çîrokiya dema hê ya nêzîk
6) Demên borî
a) Dema boriya têdeyî (diyar)
b) Çîrokiya dema boriya têdeyi
c)Dema boriya dûdar (nediyar)
ç) *Çîrokiya dema boriya dû dar*
d) *Dema boriya berdest*

Dema Niha

Heke karek di dema têdeyi bê kirin, dema vî karî wekî dema niha tê binavkirin. Dema niha bi alîkariya qertafa *"di-"* û rayeka dema niha ya lêkerê pêk tê. Bo nimûne di mijara rayekan de hatibû gotin ku rayeka dema niha ya lêkera *"kirin"ê "k"* ye. Niha heke em li gorî vê rêgezê biçin ₒ em qertafa *"di-"* bidin ber rayeka dema niha *"k"* ₑ *"dik"* derdikeve holê, li gorî kesê ku wî karî dike heke em cînavkeke kesandinê jî bi dûv wê bixin, dê lêkereke dema niha derkeve holê. Iler wekî *"dikim, dikî, dike, dikin. ..* " Çend nimûne dê têgihîştina mijarê hêsantir bikin .

.Ji bo lêkerên gerguhêz

Kirin (xwerû)	*Vegirtin (pêkhatî)*
Ez dikim.	*Ez vedigirim.*
Tu dikî.	*Tu vedigirî.*
Ew dike.	*Ew vedigire.*
Em dikin.	*Em vedigirin.*
Hûn dikin.	*Hûn vedigirin.*
Ew dikin.	*Ew vedigirin.*

Ji bo lêkerên negerguhêz

Çûn (xwerû)	*Dahatin (pêkhatî)*
Ez diçim.	*Ez datêm (dadihêm).*
TIl diçi.	*Tu datêyî (dadihêyi).*
Ew diçe.	*Ew datê (dadihê). Em datên (dadihên). Hûn datên (dadihên). Ew datên (dadihên).*
Em diçin.	
Hûn diçin.	
Ew diçin.	

Di dema niha de neyînî

Neyiniya dema niha bi alîkariya qertafa neyiniyê ya dema niha *"na-"ê* pêk tê. Ev qertaf tê şûna qertafa dema niha *"di-"yê* û wateya neyiniyê dide lêkerê.

Ji bo lêkerên gerguhêz

Kirin (xwerû)	*vegirtin (pêkhatî)*
Ez nakim.	*Ez venagirim.*
ᴛIl nakî.	*Tu venagiri.*

Ew nake.	*Ew venagire.*
Em nakin.	*Em venagirin.*
Hûn nakin.	*Hûn venagirin.*
Ew nakin.	*Ew venagirin.*

Ji bo lêkerên negerguhêz

Çûn (xwerû)	*dahatin (pêkhatî)*
Ez naçim.	*Ez danayêm.*
Tu naçî.	*Tu danayêyî.*
Ew naçe.	*Ew danayê.*
Em naçin.	*Em danayên.*
Hûn naçin.	*H1În danayên.*
Ew naçin.	*Ew danayên.*

Her wekî ji mînakan jî diyar c, di lêkerên pêkhatî de qertafa dema niha *"di-"* fl qertafa neyiniyê *"na-"* dikevin navbera pêşgir fl lêkera bingehîn.

Mînak:

Ez vedixwim.	*avê*
Ew avê venaxwe	

Dema niha û dema fireh

Di zimanê nivîskî de dema niha û dema fireh bi heman rengî ne.

Her du dem bi alîkariya hokeran ji hev cuda dibin. Ji bo dema niha hokerên mîna *"niha, a niha, va ye* ", ji bo dema fireh hokerên mîna *"tim, her gav, her tim, carinan, hin carinan"* tên bikaranîn.

Mînak:

(Dema niha)
Vaye ez têm.
Ez niha kincan dişom.
Ew o niha pirtûkê dixwîne.

(Dema fireh)

Ez her roj serê sibê zû radibim.
Ew carinan tê mala me.
Hevind her tim heman stranê dibêje. Xezal gelek caran diçe Stenbolê.

Di devokên kurdi de dema **niha**

Li hin herêman, her wekî tirkî, dema niha û ya fireh ji hev cuda ne. Dema niha ya di zimanê nivîskî de li van herêman wekî *"dema fireh"* tê bikaranîn. Ango gava ku li wan deveran, *"ez diherim"* tê gotin, *"ez her tim diherim"* tê fêmkirin. Li wan herêman ji bo pêkanîna dema niha "e"yekê bi dûv forma *"demafireh"* dixin û dibêjin *"e: diherime* ". Ev deng wateya domdariyê dide lêkerê. Ji bo zelalbûna mijarê em dikarin lêkera *"xwendin"ê* li gorî vê demê bikişînin.

Ez dixwînime.
Tu dixwîniye .
Ew dixwîne (ye).
Em dixwînine .
Hûn dixwînine.
Ew dixwînine ..

Di kovara Enstîtuya Kurdî ya Parîsê Kurmancî hejmara 12'an de di nivîseke bi navê *"Kişandin û navlêkirina deman"* de **j** i bo vê demê *"dema niha ya domdar"* hatiye gotin. Her wekî di mînaka jorîn de .îÎ diyar c, ev dem di kişandina lêkerê ya li gorî kesê sêyemîn ê yekjimar de bi arîşe ye. Ji ber ku cînavka kesandinê ya kesê sêyemîn ₔ yekjimar jî "e"ye. Ji ber vê yekê jî ev dem di kişandina lêkeran ali gorî kesê sêyemîn ê yekjimar de pêk nayê. Lê ev tevlihevî di hinek demên din de jî derdikeve pêşberî mirov. Bo nimûne di dema boriya dûdar de tevlihevî di navbera kesê sêyemîn û duyemîn de pêk tê.

Di pirtûka Sadiq Bahadin Amêdî ya *"Rêzimana Kurdî"* de du demên niha hatine destnîşankirin. **Li** ser mijarê wiha hatiye gotin: "Di zarê kurmancî de demê niho ji layê sixê ve du cor in:

Dema **niha** ya berbiçav

Li pêşiyê cînavka kes koma yekem, dûre *"ê"* ya sixa dema niha berçav a bi serveçûyi, paşê nîşana demê niha *"di-",* paşê jî rayeka dema niha ya *"kirin"ê "le'* û nîşana kesandinê têt.

Mînak:
Ez ₔdikim, tu yê dikî, ew ₔdikit, em ê dikîn, hûn ê dikin, ew ₔdikin ...

Dema niha ya neberbiçav

Mînak:

Ez dikim, tu dikî, ew dikit, em dikîn, hûn dikin, ew dikin ...

Dema bê

Her wekî ji navê wê jî diyar e, ev rawe jibo karekî ku hîn pêk nehatiye, lê bikaranîn. Dema bê, bi alîkariya amraza dema bê *"dê"* û *"ê"yê* pêk tê. Qcrtafa *"bi-"* tê ber *"rayeka dema niha"* ya lêkerê. Bi vî awayî dirûvê dema bê ya lêkerê bi dest dikeve.

Mînak:

Xwarin (xwerû)	*Vexwarin (pêkhatî)*
Ez ê bixwim.	*Ez ê vexwim.*
Tu yê bixwî.	*Tu yê vexwî.*
Ew ê bixwe.	*Ew ê vexwe.*
Em ê bixwin.	*Em ê vexwin.*
Hûn ê bixwin.	*Ilûn ê*
Ew ê bixwin.	*vexwin. Ew ê*
Ketina pêşgira "bi-"yê	*vexwin.*

Her wekî ji mînakan diyar e qertafa raweya fermanî *"bi-"* di lêkerên pêkhatî de ji holê radibe.

Mînak:

Ez vexwim.
Ez daxim.
Ez dakevim.
Ez hilgirim. Ew ê wergerine.
Em hilweşînin.

Di dema bê de neyînî

Qertafa neyiniyê ya dema bê *"ne-"* ye. Ev qertaf cihê qertafa raweya fermanî "bi-"yê digire. Di lêkerên pêkhatî de dikeve navbera pêşgirê û lêkera resen.

Mînak:

Girtin (xwerû)	*Hilgirtin (pêkhatî)*
Ez ê negirim.	*Ez ê hilnegirim*
Tu yê negirî.	*Tu yê hilnegirt*
Ew negire.	*Ew hilnegire.*
Em negirin.	*Em hi/negirin.*
Ilûn negirin.	*Hûn hi/negirin.*
Ew negirin.	*Ew hi/negirin.*

Çirokiya dema bê

Di vê demê de lêker di forma lêkerên xwest ekî de ye, bes pişti kirdeyê amraza dema bê *"ê / dê"* heye. Dema ku pêkanîna karekî hatibe plankirin, lê ew pêk nehatibe û dem di ser re derbas bûbe, ev rawe tê bikaranîn.

Birin (gerguhêz)	*Ketin (negerguhêz)*
j\1i17 bibira.	*Ez biketama.*
Te Yl:' hibira.	*Tu yê biketayî.*
Wî/wê yê bibira. Me yê bibira. We yê bibira.	*Ew biketa.*
	Em ê biketana.
	Hûn biketana.
	Ew biketana.

Çîrokiya dema bê (bi daxwazî - dema borî)

Wan ê hibira.

Di vê rawcyê de lêkera di forma *"daxwazî-dema borî"* de amraza
dema bê *"êldê'* werdigire.

Mînak:

Ew ê hatibe
Wan gotibe
Hinekan dêji 'wan xwestibe

Dema bê ya nêzîk

Ev dem jî ",'ekî dema bê ye, lê di cihê daçeka *"dê"* de lêkera alîkar *"kirin"* heye. Cudatiya wê ji dema bê ew e ku lêkera alîkar *"kirin"* jî wekî lêkera bingehîn ligorî dem û kesan tê kişandin. Yanê her du lêker jî cinavkên kesandinê werdigirin.

Ez dikim nên bixwim.
Tu dikî derivê malê veke.
Ew dike nameyekê
binivîse. Em dikin daran
av bidin. Hûn dikin malekê
bikirin. Ev.' dikin pirtûkê
bixwînin.

Neyiniya dema bê ya nêzîk

Ncyîniya vê demê bi neyînîkirina lêkera bingehîn pêk tê. Lêkera bingehîn qertafa ncyiniyê "-ne"yê digire. Lêkera alîkar *"kirin"* her wekî xwe dimîne.

Mînak:

Çûn	*Girtin*
Ez dikim neçim. Tu dikî neçi.	*Ez dikim negirim.*
Ew' dike neçe.	*Tu dikî negirî.*
Em dikin neçin.	*Ew dike negire.*
Ilûn dikin neçin.	*Em dikin negirin.*
Ew dikin neçin.	*Ilûn dikin negirin.*
	Ew dikin negirin.

Çîrokiya dema bê (bi daxwazî dema boriya dûr)

Li vir bi tenê dirûvê lêkerê diguhêre, wekî din tu guhartin pêk nayê. Lêker di forma raweya daxwazî ya *"çîrokiva dema boriya têdeyî"* de ye, amraza dema bê *"ê"* tê ber lêkera kişandî.

Birin (gerguhêz)

erênî	*neyînî*
Min .b iribû va.	*Min ê nebiribûya.*
Te y(~ biribûya.	*Te yê nebiribûya.*
Wî/yvê ye biribûya.	*Wî :vê nebiribûya.*
A1e *vê biribûya.*	*Me yê*
We yê biribûya.	*neblribûya. We*
Wan ê biribûya.	*yê nebiribûva.*
	Wc1l1 .nebiribûya.

Ketin (negerguhêz)

erênî	*neyînî*
Ez ketibûma. *Tu yê ketibûyayi. Ew ketibûya. Em ketibûna. Hûn ê ketlbûna. Ew ketibûna.*	*Ez neketibû ma.* *Tu yê neketibûyayî. Ew ê neketibûya. Em neketibûna. Hûn neketibû na. Ew neketibûna.*

Çîrokiya dema bê ya nêzîk

Ev rawe jî dişibe çîrokiya dema bê, lê di eihê daçeka dema bê de lêkera alîkar *"kirin"* heye. Di vê raw eyê de ev lêkera alîkar *"kirin"* di dirûvê dema boriya berdest de ye tl qertafa raweya daxwazî *"-a"* yê jî werdigire dawiya xwe û dibe *"dikira".* ʝler wiha lêkera bingehîn jî di dirûvê dema borî ya raweya daxwazî de ye. Bo nimûne, hevoka *"Ez dikim biçim malê."* di dirûvê dema bê ya nêzîk de ye. Dema ku em wê bixin dirûvê *"çîrokiya dema bê ya nêzîk"* a hevokê dibe *"Ez dikira biçûma malê.* "Di vê raweyê de jî lêkerên gerguhêz û negerguguhez **ji** hev euda têne kişandin.

Mînak:

Negerguhêz	*Gerguhêz*
Ez dikira biketama. *Ew dikira bihata.* *Ew dikira ji kêfan bifiriya.*	*Min dikira kevir biavêta.* *Kemêl dikira nan bixwara.* *Wan dikira* ew *bidîta.*

Neyînî

Ncyîniya vê demê her wekî dema bê ya nêzîk dîsa bi alîkariya lêkera bingehîn pêk tê. Yanî lêkera bingehîn qertafa neyînî "ne-"yê werdigire.

Mînak:

Xwestin (xwerû)	*Vekirin (pêkhatî)*
Min dikira nexwesta. *Te dikira nexwes ta.* *WU}vê dikira nexwesta.*	*Min dikira venekira.* *Te dikira venekira.* *WÎ/wê dikira venekira.*

Me dikira nexwesta.	*Me dikira venekira.*
We dikira nexwesta.	*We dikira venekira.*
Wan dikira nexwesta.	*Wan dikira venekira.*

Demên borî

Ev rawe çêlî karekî ku berî niha hatiye kirin dike. Demên borî giş bi alîkariya rayeka dema borî ya lêkeran lt hinek qertafan derdikeve holê. Bi taybetî di navlêkirina demên borî de tevliheviyek heye. Li vir heta ji me hat, me hewl da xwe ku em navlekên ku pir têne zanîn, bi kar bînin. Her wiha me cih neda hinek demên ku zêde nayên bikaranîn.

Dema boriya têdeyî

I linck kes ji vê demê re *"dema boriya diyar"* jî dibêjin. Rêşidê Kurd jê re *"nêzbuhêr* ,. gotiye. Dema ku bûyerek di demeke diyar de pêk hatibe, ev dem tê bikaranîn. Di tirkî de jê re *"gorûlen geçmiş zaman",* di îngilîzî de *"simple past tense"* lt di farisî de jî *"maziyê mutleq"* dibêjin. Berê hatibû gotin ku dema paşgirên raderîn ji lêkerên resen bêne avêtin, li holê rayeka dema borî dimîne.

Rayeka dema borî bi xwe dema boriya têde yî nîşan dide. Wekî nimûne, dema ku ji lêkera *"çûn* "ê paşgira raderî *"-n"* bê avêtin, li holê *"çû"* dimîne. Ew jî dema boriya têdeyi li gorî kesê yekjimar ê sêyemîn nîşan dide. Dema bûyerek di demeke diyar de pêk hatibe, dema boriya têdeyi tê bikaranîn. Ji ber vê yekê di nûçeyan de dema boriya têdeyî tê bikaranîn.

Ji ber ku di demên borî de lêkerên gerguhêz cinavkên kesandinê yên bircserê digirin ango li gorî birescrê (obje) têne kişandin, di demên borî de rewşa lêkerên gerguhêz û negerguhêz jihev cuda ye. Lewre jî divê mirov mînakên wan ji hev cuda bide.

Mînak:
Ji ho lêkerên negerguhêz

Ketin (xwerû)	*Daketin (pêkhatî)*
Ez ketim.	*Ez daketim.*
Tu ketî.	*Tu daketî.*

Ew kel.	*Ew daket.*
Em ketin.	*Em daketin.*
Hûn ketin.	*Hûn daketin.*
Ew ketin.	*Ew daketin.*

***Ji bo lêkerên** gerguhêz*

Di van lêkeran de kirde navdêr û cînavkên tewandî ne, lêker li gor! bireserê têne kişandin.

DÎtin (xwerû)	***Vexwarin** (pêkhutî)*
Min tu dîti.	*Min îskanek çay vexwar.*
Te ez dîtim. WF ew dît.	*Te îskanek çay veXW(l!~ WÎ/wê dıı Îskan ç'a)' vexwarin. Me tasek av vexwar.*
Me hûn dîtin.	*We çay l'exww:*
Hi(J em dîtin.	*Wan şîr vexww~*
Wan ew dît.	

Neyiniya **dema boriya têdeyî**

Di dema boriya têdeyi de her wekî demên borî yên din lêker qertafa neyîniyê *"ne-"yê* digirin.

Mînak:

Şûştin (xwerû)

Min kinc neşûştin.
Te kinc neşûştin.
Wi/wê kinc neşûştin.
Me kinc neşûştin.
We kinc neşûştin.
Wan kinc neşûştin.

*Dîtin **(xwerû)***	***Vegotin** (pêkhatî}*
Min Iu nedîtî.	*Min vcnegot,*
Te ez nedîtim.	*Te venegot.*
Wîhrc cm nedîtin.	*Wî/wê venegot.*
Me ew nedil.	*Me venegot.*
We em nedîtin.	*We venegot.*
Wan ez nedîtim.	*Wan venegot.*

Di kesandina kesê sêyem ê yekjimar de taybetiyek balê dikêşe. Gelek caran cînavka kesandinê *"-el"* di vê demê de jî derdikeve pêş-berî mirov. Her wekî çawa *"Ew haf bajêr"* lê gotin, *"Ew hate bajêr"* jî tê gotin.

MÎnak:

Zozan hate
male. Evîn kete
xwarê.
Min destê .nve xiste nava avê.
Ew gihîşte gund.
Dema boriya dûdar

Ev dem bi alîkariya qertafa *"-el"* û rayeka dema borî pêk tê; di lêkerên ku bi dengdêrê diqedin de ev qertaf dibe *"-iye".* Ji bo vê demê jî cm lêkera *"ketin* "ê hildin dest. Gava qertafa *"<iye"* bi dûv rayek dema borî *"ket* "ê bê xistin. dirûvê dema boriya dûdar a lêkera ketin: *"ketiye"* bi dest dikeve.

Ji aliyê wateyê ve ev dem qala bûyerekê dike ku berî niha di demeke nediyar de pêk hatiye. Her wiha dema ku bandora bûyera ku di dema borî de pêk hatiye li ser dema niha hebe, an jî encama wê bûyerê li ber çavan be, ev dem tê bikaranîn. Bo nimûne dema ku em werin malê ci bibînin ku derî vekirî ye, em bibêjin, *"Derî vekirî maye"* Lê heke em piştî ji malê derketin, were bîra me ku derî vekirî maye. em bibêjin, *"Derî vekirî ma."*

MÎnak:

Ji bo lêkerên gerguhêz

Wê kinc şûştine îî *raxistine.*
Te heval dîtiye, lê jê re negotiye. Wi/wê
mirov girtine, piş/rejî berdane. Va ye
min nan kiriye.
We hemûfêkîfirotine, tiştek li holê nemaye.
Wan xanî rûxandiye, li şûna Ivê avahiyeke nû lêkiriye.
Wan dar bir/ne, cihê wan kiriye zevî.

Ji bu lêkerên negerguhêz

Binêre. ez hilkişiyame ser darê, hejîran berhev dikim.

Xweziya min hi te, tu gihaştiye armanca xwe,
Ew bi lez meşiyaye, lewma zû hatiye.
Bihara Îsal hat, lewma kulîlk zû vebûne.
Mirovek ketiye erdê, divê em wîji erdê rakin.

Neyiniya dema boriya dûdar

Awayê neyîniya vê demê jî wekî ya dema boriya têdeyî ye.

Minak:

Hatin (xwerû)	*Vegerandin (pêkhatî)*
E:: nehatime.	*Min ew venegerandiye.*
Tu nehatiye.	*Te ew venegerandine.*
Ew nehatiye.	*Wê tu venegerandiye.*
Em nehatine.	*Me ew venegerandiye.*
Hûn nehatine.	*We em venegerandine.*
Ew nehatine.	*Wan ez venegerandime.*

Hin caran jî dema ku karek bêhemdî hatibe kirin, an jî mirov ji hinekên din hîn bûbe, ev dem tê bikaranîn. Nemaze di nûçeyan de dema ji bo bûyerên ku mirov ji devê yekî din veguhêze ev dem tê bikaranîn.

Bo nimûne:

Li gorî agahiyên ku bi dest ketine, li Pirtûkxaneya Neteweyî ya Îranê destnivîseke kurdî derketiye holê.

Di vê hevokê de dema boriya dûdar di her du komekan de ji xwediyê wateyên euda ye. Di komeka yekem de agahî me ber hev kirine, lewre em niha li ser encamên wê dipeyivin. Di komeka duyemîn de em qala bûyereke ku me nedîtiye, agahiyên wê ji hinekan standine, dipeyivin.

Di dema boriya dûdar de aloziyek

Wekî têbîniyeke divê em balê bikêşin ser mijarekê. Her wekî ji mînaka *"ketin"ê* jî tê fêmkirin, di hin lêkeran ên ku bi dengdêran diqedin ên mîna *"ketin, hatin, şûştin, avêtin nê* de jî qertafa dema boriya dûdar wekî *"-iye"yê* dimîne. Ew jî girêdayî formeke dema

boriya têdeyî ye. Her wekî tê zanîn ligel forma *"hal, ket, avê!* ji bo kesê sêyemîn *"hate, avête, kete"* jî tê gotin. Ziman ji bo ku xwe ji tevlihevî û aloziyê rizgar bike, di lêkerên bi vî rengî de qertafa dema boriya dûdar wekî *"-iye"* dihêle.

Dema boriya têdeyî	*Dema boriya dûdar*
Ew hat/e mafê.	*Ew hatiye malê.*
Ew kelle xwarê.	*Ew ketiye xwarê.*
Ew avêtle erdê.	*Ew avêtiye erdê.*
Ew xist/e hundir.	*Ew xistiye hundir.*

Her wiha di vê demê de di kişandina kesê duyemîn ê yekjimar de jî alozî û dijwariyek heye. Li gorî rêzikê rayeka boriya têdeyî ya lêkerê, piştre qertafa kesandinê *"<î"*, piştre jî qertafa boriya dûdar "e" tê. Dengê alîkar *"y"* dikeve navbera du dengdêran û "f"ya berî *"y"ê* jî nerm dibe, dibe *"i",* Li gorî vê rêzikê divê dirûvê lêkera kişandî wiha be:

Rader	*Forma dema boriya dûdar*
dîtin	*Zozanê tu dîtiyiye.*
avêtin	*xwediyê kar tu jê avêtiyiye.*
xwarin	*Ma guran tu xwariyiye?*

Lê belê di zimên de formeke wisa nîn e, li şûna wê lêker bi dirûvê *"kiriye", "ketiye", "avêtiye", "dîtiye"* derdikeve pêşberî mirov. Bi vê yekê re jî kesê duyem yekjimar û kesê sêyem yekjimar dibin yek.

Mînak:

kesê duyem	*kesê sêyem*
Tu hatiye.	*Ew hatiye.*
Tu ketiye.	*Ew ketiye.*
Zozanê tu dîtiye.	*Zozanê ew dîtiye.*
Hevalan tu neditiye. Kesî tu negirtiye.	*Hevalan ew dîtiye. Kesî ew negirtiye.*

NIŞe: Di hin devokan deforma êtu hativî" tê bikaranîn.

Çîrokiya dema boriya têdeyî

Ev dem, demeke hevedudanî ye. Wekî *"dema borî ya çîrokî"* jî tê binavkirin. Digel rayeka dema borî, bi alîkariya lêkera *"bûn"ê* pêk tê.

Wekî mînak em rayeka lêkera *"ketin"ê "ke/"ê* bigirin, dîsa rayeka dema borî ya lêkera *"bûnê; "bû"yê* bînin dawiya wan dê dirûvê dema boriya çîrokî ya lêkera *"kelin"ê "ketibû"* derkeve holê. Her wekî berê jî hatibû gotin, li vê derê *"i'* wekî dengê alîkar dikeve navbera du dengdaran. Li gorî kesê ku di bin bandora wî karî de dimîne ango *"bireserê* mirov dikare cînavka kesandinê bîne dawiya wê.

MÎnak:

Ji bo lêkerên gerguhêz

Min nan xwaribû.
Te kevir avêtibû binê bîrê.
Wê ez biribûm zozanan.
Me kulîlk danîbûn ser gorê.
We dar birîbûn.
Wan erd kolabû .

.Ji bo lêkerên negerguhêz

Ew heta sûkê meşiyabû.
Ez hatibûm mala \;r'e.
Hûn çûbûn bajêr.
Balafir pir bilindflriyabû.
Pelgên daran weşiyabûn.

Neyîniya çîrokiya dema boriya têdeyî

Kirin (xwerû)	*Vekirin (pêkhutî)*
Min nekiribû. Te	*Min venekiribû.*
nekiribû. Wî/wê	*Te venekiribû.*
nekiribû. Me	*Wi/wê venekiribû.*
nekiribû. We	*Me venekiribû. We*
nekiribû. Wan	*venekiribû. Wan*
nekiribû.	*venekiribû.*

Awayê neyîniyê ya vê demê jî wekî demên din e, lêker qertafa neyîniyê *"ne-"yê* werdigire.

Piştî van agahiyên der barê pêkhatina vê demê de îcar em dikarin der barê wate û cihê vê demê de çend tiştan bibêjin. Ev dem ji bo bûyereke ku beri bûyereke din a dema borî pêk hatiye, tê bikaranîn.

Bo nimûne,

Dema kil ew hat me taştê xwaribû. Li vê derê du bûyer qewimîne: *"yek hatiye",* ben ku ew were, "wan" *taştê xwariye.* Ji bo zelalkirinê em dikarin çend mînakên din jî bidin.

Mînak.

Roja ku min dest hi kar kil; ew ji kar derketibû.
Duh ez çûm fîlmê ku me here li serê xeber dabû.
Pirtûka ku min ji le standibû, hinekan ji min dizî.

Hin kes vê demê weki tirkî dinirxînin û ji ber vê yekê wekî çîrokiya dema boriya dûdar bi nav dikin, lê ev yek şaş c.ji ber ku ev dem li ser bingeha dema boriya têdeyi ava dibe. Heçî dema tirkî ye, li ser bingeha dema boriya dûdar ava dibe, ev dem di îngilîzî de wekî *"pas! perfect tense"* tê binavkirin. Ew jî tê wateya *"boriya borî".*

Çirokiya dema boriya dûdar

Dema ku qertafa *"e"* tê dawiya *"çîrokiya dema boriya têdayî"* ev dem bi dest dikeve. Bo nimûne, çîrokiya dema boriya têdeyî ji bo lêkera *"xwarin" "xwaribû"* ye. *"Çîrokiya dema boriya dûdar"* a vê lckerê dibe *"xwaribûye* ". Ev dem pir zêde nayê bikaranîn. Dema mirov qewimîna tiştekî ji hinekan bibihîze yan jî mirov bêhemdî tiştek kiribe, tê bikaranîn.

Mînak:

Ji bo lêkerên gerguhêz

Min ev pirtûk xwendibûye, lê nehatiye bîra wî.
Heval ez dîtibûme.]i min re negotiye.
Wi diyariyek anîbûye, lê nedaye min.
Me hûn êşandibûne, we qet dengê xwe
nekiriye. Wan har kişandibûye, haya meji
nebûye.

Ji bo lêkerên negerguhêz

Tuj; welêt hatibûye.
Em ber bi wan beziyabûne.
Ew j; her dijmin reviyabûye.
Gund şewitîbûne.
Serheng zû çûbûye.

Neyîniya çirokiya dema boriya dûdar

Neyîniya vê demê jî wekî demên din ên borî ye. Di neyîniya vê demê de jî lêker qerta fa neyîniyê *"ne-"* werdigire.

Mînak:

Min pirtûkek nexwendibûye. Hevêl ez nedîtibûme.
We werîs bernedabûve.
Me hûn neêşandibûne.
Wan har nekişandibûye.
Tu ji welêt nehatibûye.
Em her bi wan nebeziyabûne.
Wîji her dijmin xwe ranegirtibûye.
Gund neşewitîbûne.
Serheng zû neçûbûye.

Dema boriya berdest

Ev dem bi alîkariya qertafa dema niha *"di-"* û rayeka dema borî pêk tê. Dema ku mirov qertafa dema niha bide ber rayeka dema borî ya lêkerekê dê dirûvê wê yê *"dema boriya berdest"* derkeve holê. Hindek wê wekî *"çîrokiya dema niha"* jî bi nav dikin. Bo nimûne, dema ku cm qertafa dema niha *"di-"yê* bidin ber rayeka dema borî ya lêkera *"çûn nê,* dê dirûvê dema boriya berdest a vê lêkerê *"diçû"* derkeve holê. Dema ku bûyerek di dema borî de bi domdarî hatibe kirin, ev dem tê bikaranîn. Di îngilîzî de ji vê demê re *"post continous tense"* tê gotin. Ev jî tê wateya *"dema boriya domdar".*

Mînak:

Ji bo lêkerên gerguhêz

ElÎ mala xwe dişûşt.
Remezan rojiya Remezanê digirt. Dînekî kevirek diavêt hinê birekê. Wanji erebeyê gelek tişt datanîn. ZÎnê hevala xwe nedidît.
Zozanê gul diçinîn.
Remo nisk li zeviyê diçandin?

Ji bo lêkerên negerguhêz
Ewji cihê xwe nediliviya.
Hûn ji gund diçûn bajêr.
Hinek mirov ber bi me ve dihatin.
Ew li ber qeraxê çêm radiwestiyan.
Kes bi wan ewle nedibû.
Daran pelgên xwe diweşandin.

Di dawiya vê mijarê de divê em li ser taybetiyeke lêkerên ku ji pêşgiran pêk hatine, rawestin. Her wekî berê jî hate diyarkirin di vê demê de qertafa neyîniyê *"ne-"* piştî pêşgirê û berî qertafa dema niha"di-"yê tê bikaranîn. Em dikarin çend mînakan li ser vê yekê jî bidin.

Min av venedixwar.
WÎ ez ranedikirim.
Ew hilnedikişiyan.
Em
ranediwestiyan.
Min kakilê mijarê venedigot.
Awarteyên neyîniyê

Dirûvê qertafên neyîniyê her wekî me berê jî dabû xuyakirin, li gorî deman diguhere. Lê hin lêkerên awarte hene ku qertafên wan ên neyîniyê li gorî demê naguherin. Mirov dikare,ji bo wan lêkerên awarte ku hejmara wan gelekî kêm e, lêkerên mîna *"karin/kanîn* ", *"zanîn", "şiyan* û *"wêrîn* Hê bide.

Qertafa neyîniyê ya lêkerên *"karîn"* fl *"zanîn'ê "ni-"* ye.

Ez nikarim werim.
Min nikaribû bibêjim.
Em nizanin kar bikin.
Hûn nizanibin bixwînin.

Di dema boriya têdeyî û dûdar de qertafa neyînî ya van lêkeran *"ne-"* ye.

Min nekarî çareser bikim.
Min nezanî ku eV!' wisa ye.
WÎ nekariye xwe bigihîne
te. Wan riya mala we
nezaniye ..

Qertafa neyîniyê ya lêkerên *"werin"* û ***"şiyan"*** jî her tim *"ne-"* ye.

Mînak:

Ez neşêm bibêjim.
Neşiya were.
Wî newêribû bigire.
Ew newêre here.
Ew ê newêre
higire.

Raweyên **daxwazî**

Di raweyên daxwazî de karekî ku tê nîgaşkirin heye. Raweyên daxwazî qala karekî pêknehatî yan jî pêkanîna wê tê xwestin dike. Hin caran ji bo pêkanîna wê hê derfet hene, hin caran jî dem di ser re derbas bûye, lewre jî pêkanîna wî karî êdî ne pêkan e.

Di van raweyan de hin caran jibo pêkhatina wî karî hinek merc pêwîst in. Raweyên daxwazî li ser du hêmanan ava dibin, aliyekî wan form û dirûvên lêkerê ne, ew bingeha raw eyê pêk tînin, hêmana duyemîn jî amrazên raweyi ne, ew amraz wate û peywira raweyê zelaltir dikin

Di raweyên **daxwazî de dirûvên lêkeran**

Di raweyên daxwazî de lêker bi van dirûvan derdikevin pêşberî mirov:

Dema niha

Di vê raw eyê de daxwaz û pêşniyaz heye. Bûyer hê pêk nehatiye, derfeta pêkanînê heye.

Mînak:

Ez karê xwe hikim.
Tıı karê xwe bikî.
Ew karê xwe bike.
Em karê nve bikin.
Hûn karê xwe bikin.
Ew karê xwe bikin.

Dema borî

Ev rawe qala tiştekî pêkhatî dike, tê de merc, daxwaz û dibetî heye. Di vê raweyê de rayeka dema niha ya lêkera *"bûn"ê "b"* tê dawiya rayeka dema borî ya lêkerê.

Mînak:

Gerguhêz	*Negerguhêz*
Min çîrok gotibe.	*Ez ji darê ketibim.*
Te çirok gotibe.	*Tuji darê ketibî.*
WÎ / wê çîrok gotibe.	*Ewji dibistanê hatibe.*
Me çîrok gotibe.	*Emji dibistanê hatibin.*
We çirok gotibe.	*Hûn ji dibistanê hatibin.*
Wan çirok gotibe.	*Ewji dibistanê hatibin.*

Neyînî

Di neyiniya vê raweyê de jiqertafa *"ne"* tê ber lêkera kişandî.

MÜ1Qk:

Heke wî nedîtibe. kê dîtiye?

Dibe ku .van rasti ji fe re negotibe.

Pêknehatî

Di vê raweyê de daxwaza tiştekî pêknehatî heye, êdî derfeta pêkhatinê nîn e. Di vê demê de dirûvê lêkerê bi temamî diguhere. Li ber lêkerê dîsa qertafa raweya fermanî heye, lê îcar rayeka dema borî ya lêkerê û li dûv wê jî qertafa raweya daxwazî *"-a"* tê bikaranîn. Bo nimûne, bila lêkera me *"xwendin"* be, rayeka dema borî ya vê lêkerê *"xwend"* c, dema ku qertafa raweya fermanî *"bi-"* were pêşiya wê, ew dibe *"bixwend"* û piştî ku qertafa daxwaziyê *"-a"* hate dûv wê, ew dibe *"bixwenda* ".

Minak:

Gerguhêz	*Negerguhêz*
Min el1· bidîta.	*Ezji bajêr bihatama.*
Te ew bidîta.	*Tl/ji bajêr bihatayi.*
Wî/wê ew bidîta.	*Ewji bajêr bihata.*

Me ew bidîta.	*Emji bajêr bihatana.*
We ew bidîta.	*Hûn ji bajêr bihatana.*
Wan ew bidîta.	*Ew ji bajêr bihatana.*

Neyîniya daxwaziya pêknehatî

Ncyîniya vê raweyê jî bi alîkariya qcrtafa neyînî *"ne-"yê* pêk tê.

Mînak:

Xwestin (xwerû)	*Vexwarin [pêkhatî}*
Al/in nexwes ta.	*Min venexwara.*
Te nexwes ta.	*Te venexwara.*
Wî/wê nexwes ta. Me nexwes fa. We nexwes ta. Wan nexwesta.	*WÎ /wê venexwara. .Me venexwara. We venexwara. Wan venexwara.*

Dema boriya dûr

Di vê raweyê de jî tiştekî pêknehatî heye. Ev rawe li ser bingeha *"çîrok iya dema boriya têdeyt'pêk* tê. Qertafa daxwaziyê *"<a"* tê dawiya lêkera di dirûvê çîrokiya dema boriya têdeyî de. Dema ku qertafaxwestekî *"-a"* bê dawiya wan, *"daxwazî- dema boriya dûr"* pêk tê. Heke lêkera me *"xwarin"* be, dirûvê çîrokiya dema boriya têdeyi ya vê lêkerê *"xwaribû"* ye. Ger em qertafa daxwaziyê *"-a"* bi dûv vê formê bixin, ew dibe *"xwaribûya".*

Mînak:

Gerguhêz	*Negerguhêz*
Min sêv xwaribûya.	*Ez ji gund hatibûma.*
Te sêv xwaribûya.	*Tuji gund hatibûya yÎ.*
WÎ / wê sêv xwaribûya.	*Ew ji gund hatibûya.*
Me sêv xwaribûya.	*Em ji gund hatibûna.*
We sêv xwaribûya.	*Hûn ji gund hatibûna.*
Wan sêv xwaribûya.	*Ewji gund hatibûna.*

Neyînî

Neyîniya vê demê ji dîsa bi qertafa *"ne-"yê* pêk tê.

Mînak:

Kirin (xwerû) Min nekiribûya. Te nekiribûya. Wî/wê nekiribûya. Me nekiribûya. We nekiribûya. Wan nekiribûya.

Vegotin (pêkhatî) Min venegotibûya. Te venegotibûya. Wî/wê venegotibûya. Me venegotibûya. We venegotibûya. Wan venegotibûya.

Raweya fermanî

Ev rawe bi alîkariya rayeka dema niha ya lêkerê û qertafa raweya fermanî *"bi"yc* dertê holê. Ji ber ku ferman li kesên duyemîn ên yekjimar û pirjimar tê kirin, cînavkên kesandinê yên ku tên dawiya vê raweyê jî *"_e"* û *"-in"* in. Bo nimûne em lêkera *"çûn "ê* hildin dest. Her wekî berê jî hatibû gotin, rayek dema niha ya lêkera *"çûn"ê* "ç" ye. Dema ku em qertafa fermanê *"bi-"yê* bînin pêşiya vê rayê *"hiç"* derdikeve holê, piştî cînavkên kesandinê yên fermanê "-e" û "-in"bên dawiya vê peyvê, dirûvê raweya fermanî ya lêkera çûn; *"biçe/biçin"* derdikeve holê.

Minak:

Ji bo kesê yekjimar

bike, bide, bistîne, bixwe, bigire, bigere, bibîne, bikire, biçe, bişo, bibe ...

Ji bo kesên pirjimar

bikin, bidin, bistînin, bixwin, bigirin, bigerin, bibînin, bikirin, bişon ...

Di nava hevokê de em çend mînakan bidin:

Tu nên hixwe.
Hûn kêvir bavêjin.
Hevalê, min bibîne. Zû firaqan bîne. Kuro dêrî veke.

Raweya fermanî di lêkerên ku bi pêşgiran pêk hatine de qcrtafa raweya fermanî "bi-"yê wernagire. Bo nimûne, lêkera *"vekirin "ê*

nabe *"vebike* ", dibe *"veke* ". Jibo heman tiştî em dikarin çend mînakên din jî bidin:

Hilgire, çêke, rake, wergerîne. dagerîne, derxin, hilkişe, dakeve, rakevin ...

Mînak:

Yekjimar	***Pirjimar***
Dêrî veke.'	*Dêrî vekin.'*
Pirtûkê rake!	*Pirtûkê rakin!*
Xwarinê çêke.'	*Xwarinê çêkin.'*
Ji malê derkeve.'	*Ji malê derkevin!*

Neyîniya raweya fermanî

Li ser qertafa neyîniyê ya raweya fermanî dubendî heye. Birek zimanzanên kurdî didin zanîn ku qertafa neyîniyê ya vê raweyê jî *"ne*" ye. Ji ber ku di nav wan kesan de danerên alfabe û rêzimanê kurdî Celadet Bedirxan jî heye, di zimanê nivîskî de bi giranî wisa ji cihê xwe girtiye.

Lê li gelek deverên Kurdistanê di nav gel de qertafa neyîniyê ya vê raweyê wekî *"me-"* tê bikaranîn. Ji ber vê yekê hinek zimanzan li dijî boçûna serdest derdikevin û di nivîsên xwe de wekî qertafa neyiniyê "me-"yê bi kar tînin. Li gorî dîtina min jî qertafa neyînî ya raweya fermanî *"me-"* ye. Ji ber ku di nava gel de bi berfirehî *"me*" tê bikaranîn, di klasîkên kurdî de jî wekî *"me-"* derbas dibe. Bo nimûne, Melayê Cizîrî di helbesteke xwe de wiha gotiye: *Goş bi amê mede, terka mudamê meke.'*

Her wiha di zaravayên din ên kurdî (kirmanckî û kunnaneiya jêrîn) de jî qertafa neyîniyê ya raweya fermanî *"me-"* ye, lewmajî heke wekî *"me-"* bê bikaranîn dê çêtir bibe.

Ileval zû meçe.
Keko tev medin.
Hêdî mexwin.
Heval wisa merêse.
Lo lawo fu meke, melezînel

Fêkiyên ku min anîne
mexwin. Derî ji kesî re
vemeke!

Di dawiya vê mijarê de divê em balê bikêşin ser çend lêkerên ku raweya wan a fermanî naşibe lêkerên din. Lêkerên bi vî rengî sê heb in: *"Hatin* ", *"çûn"* û *"birin ".* Raweya fermanî ya van lêkeran bi du awayan pêk tê. Awayê yekemîn weki ya lêkerên din e. Lê awayê duyemîn **ji** lêkerên din cuda ye. Raweya fermanî ya van lêkeran bi vî rengî ye: *Were* / *hê, here* / *biçe, bere* / *bibe*

Mînak:
Tu van pirtûkan bere
pirtûkxaneyê. Lawo zûji vir here.
Sibe were mala me.

Ev her sê dirûvên cuda yên lêkeran bi hin taybetiyên xwe ji hev cuda dibin. Bo nimûne dema ku mirov bala xwe bide *"were ",* mirov dibîne ku awayê neyînî yê *"were"yê* nîn e. Lê ew lêker bi vî awayî di dema bê de jî tê bikaranîn.

Her wekî dê were mala me.

Li aliyê din neyîniya lêkera *"here "yê* heye.

Mînak:
Tu mere mala me.

Divê bê gotin ku ew forma awarte di dema niha de wekî *"diherim /narim"* tê bikaranîn. Her wekî ji mînakan diyar dibe, ew lêker di forma neyinî de kurt dibe. Li gorî rêzikên zimanî dirûvên mantiqî *"mehere* ", *"nahere"* ne, lê di zîmanê îroyîn de kes bi kar nayne, li şûna wan"mere","nare" tên bikaranîn.

Heçî forma *"bere"* ye, awayê wê yê neyînî nîn e, lê di dema bê de tê bikaranîn ..

Ez ˛berim.
Tu yê berî.
Ew ˛here.
Em ˛berin.
Hûn ˛berin.
Ew ê berin.

Amrazên raweyên daxwazî

Raweyên daxwazî li ser bingeha form û dirûvên ku me li jorê pêşkêşkirin ava dibin. Ji bo zelalkirina cureyên raweyê hinek amrazên demî û raweyi yên mîna *"xwezî", "ku/heke", "divê", "bila"* tênepêşiya lêkerê. Bi alîkariya van amrazan raweyên mîna" *xwestek?', "hekanî (mercî)', "divêt!', "bilanî* pêk tên.

Raweya xwestekî

Di vê raweyê de lêkerên di formên raweya daxwazî de amraza raweyi *"xwezî"yê* digirin. Ev rawe xwesteka ji bo tiştekî vedibêje.

Daxwazî - dema niha

Di vê dema raweya xwestekî de lêker di dirûvê daxwazî - dema niha de ye. Her wekî li jor jî hate gotin, ji bo veqetandina vê raweyê ji raweya fermanî, mirov dikare peyva *"xwed'* bi kar bîne. Her wiha di raweya fermanî de ferman li kesên duyemîn ên yekjimar û pirjimar tê kirin, lê di raweya xwestekî de, jibo hemû kesan lêker tê kişandin.

Mînak:

Negerguhêz	*Gerguhêz*
Xwezî ez biçim.	*Xwezî ez bigerînim.*
Xwezî tu biçî.	*Xwezî tu bigerînî.*
Xwezî ew biçe.	*Xwezî ew bigerîne.*
XweZÎ em biçin.	*Xwezî em bigerînin.*
XweZÎ hûn biçin. Xwezî ew biçin.	*Xwezî hûn bigerînin. XweZÎ ew bigerînin.*

Daxwazî- dema borî

Di vê dema raweya xwestekî de lêker di dirûvê *"daxwazî - dema bad'* de ye. Ev rawe li ser kesên sêyemîn, kêm caran jî li ser kesên duyemîn pêk tê, lewre tê de şik û guman heye.

Negerguhêz	*Gerguhêz*
Xwezî ew hatibe.	*Xwezi wî nekiribe.*
Xwezî ew neketibin.	*Xwezî wan negotibe.*

Daxwazî - pêknehatî

Di vê demê de gerguhêzî û negerguhêziya lêkeran girîng e, lewre di lêkerên gerguhêz de cînavkên j i koma duyemîn, di yên negerguhêz de jî cînavkênji koma yekemîn tên bikaranîn. Dîsa em dikarin peyva *"xwezî", "xwezilka", "xweziya"* bidin ber hevokê. Di vê raweyê de daxwazeke ku pêk nehatiye û dema wê derbas bûye, tê vegotin.

Mînak:

Gerguhêz

Xweziya min pirtûk bikiriya.
Xweziya te nan bixwara.
Xweziya wÎ ez bidîtama.
Xweziya me tu vexwendayî.
Xweziya we birayê min
bianiya. Xweziya wan kulilk
biçandana.

Ji bo lêkerên negerguhêz
XwezIya ez biçûma mala
wan. Xwe.:iya tu ji gund
bihatayî. Xweziya ew ji erdê
rabûya.
Xweziya em bi lez bibezîna (beziyana).
Xweziya hûn birevîna (bireviyana).
Xweziya ew bilind bifirîna (bifiriyana).

Her wekî ji mînakên *"bihatama* ". *"biçandana"* diyar dibe di hinek lêkeran de qertafa daxwaziyê *"a* "yê dengê berî xwe şibandiye xwe. Di rastiya xwe de diviya ev lêker wekî *"bihatima"* û *"biçandina"* bihatana kişandin. Lê di van lêkeran de *"şibandina berepaşkî"* pêk hatiye.

Daxwazî - dema boriya dûr

Amraza raweya xwestekî *"xwezî /xweziya"* tê ber forma daxwazî ya çîrokiya dema boriya têdeyî. Bi vî awayî dema boriya dûr a raweya xwestekî pêk tê.

Mînak:

Ji bo lêkerên gerguhêz
Xweziya min kevir avêtibû
ya. Xweziya te ez dîtibûma.

Xweziya wêji min re gotibûya.
Xweziya me para xwe ji wan standibûya.
Xweziya weji me xwestibûya.
Xweziya wan em dîtibûna.

Ji bo lêkerên negerguhêz

Xwez(va ez çûbûma malê.
Xweziya tu ketibûyayî erdê.
Xweziya ew hatibûya gund.
Xweziya mala zaliman şewltîbûya.
Xwezzya çavên dijmin rijiyabûna.
Xweziya hûn ji cihê xwe liviyabûna.
Xweziya ew hinekî westiyabûna.

Raweya hilanî

Her wekî tê zanîn ferman li kesên duyemîn tê kirin. Îcar fermana ku li kesên sêyem tê kirin jî bi alîkariya raweya bilanî pêk tê. Bêjer vê fermanê rasterast li bihizer nake, bi riya wî radigihîne kesên sêyem (yekjimar/pirjimar) da ku wê fermanê bi cih bîne.

Mînak:

(yekjimar) bila bike, bila biçe, bila bine, bila bixwe ....
(pirjimar) bila bikin, bila biçin, bila bînin, bila bixwin ...

Divê em bidin zanîn ku raweya bilanî jî li ber bingeha forma daxwazî ya lêkerê pêk tê. Di bilaniyê de fermanaji bo kesê sêyemîn, dcstûrdayîna karekî li daxwaz heye. Her wiha bi bilaniyê hevokên hevedudanî jî pêk tên. Ji bo zelalkirina mijarê mirov dikare çend mînakan li ser vê raw eyê jî bide.

Mînak:

Ji wi re bibêje, bila zû were vê derê.
Ji wan re bibêje, bila zû werin vê derê.

Di van hevokan de hem destûrdayin li gazîkirin heye, hem jî mirov dikare wateya fermana ji bo kesên sêyemîn lê bar bike.

Hin caran hêvî fl daxwazek bi bilaniyê tê diyarkirin.

Mînak:

Bila ezji destê wan rizgar bibim, ez tiştekî din naxwazim.
Bila tu bigihêjî vê derê, wekî din xema tiştekî nekêşe.

Her wekî tê dîtin li vir bi alîkariya *"bila"yê* hevokên hevedudanî pêk hatine, *"bila"yê* jî rista gihanekê girtiye ser xwe.

Dema borî

Amraza raweya bilanî *"bila"* tê ber forma dema borî ya daxwaziyê, Ev rawe zêde nayê bikaranîn.

MÎnak:

Bila wî kiribe, xem nake.
Bila ew hatibin, ez tiştekî din naxwazim.
Bila hinekan anîbe, kê anîbe, ne girîng e.

Pêknehatî

Amraza raweya bilanî *"bila"* tê ber forma dema borî pêknehatî ya daxwaziyê. Di vê raw eyê de hêvî fl daxwazeke pêknehatî tê derbirîn.

Hatin	*Kirin (gerguhêz)*
(negerguhêz) Bila ez bihatama. Bila tu bihataya. Bila ew bihata.	*Bila min ew bidîta, bes bû.*
Bila em bihatana.	*Bila pirtûk bixwenda..*
Bila hûn bihatana.	*Bila rastî bigota, le yê bidîta.*
	Bila me zû karê xwe bikira.
	Bila derî vekira, hindurû hûnik dibû.
Bila ew bihatana.	*Bila wan karê xwe neaniya malê.*

Têbînî: Her wekî ji mînakan jÎ xuya dike, ji bo kesên yekem û duyem, raweya bilani zêde nayê bikaranîn.

Dema boriya **dûr**

Li vê derê jî amraza raweya hilanî *"bila"* tê ber forma raweya daxwazî ya dema boriya dûr. Ev form di zimên de zêde nayê bikaranîn. Ji aliyê wateyê ve jî ji forma li jor zêde ne cuda ye.

Bila ez çûbûma, min ê ev kêşe çareser kiribûya.
Bila wan xwaribûya, min ê tiştek negota.

Raweya mercî (hekanî)

Ev rawe ji bo xwe hin mercan divê û yan jî hin mercan datîne ber hinekên din. Her wiha bi riya hekaniyê hevokên hevedudanî pêk tên. Di van hevokan de *"heke"* rista gihanekê jî pêk tîne. Hekani hem bi raweyên pêşkerî hem jî raweyên daxwazî pêk tê.

Hekanî bi rawcyên pêşkerî

Di vî cureyê hekaniyê de amraza mercî *"heke"* tê ber lêkerên di forma raweyên pêşketî de, bi vî awayî wateya mercî di wê demê de pêk tê.

Dema niha

Mînak:

Heke tu min dibînî, xwe nişanî min bide?
***Heke** ew pêz diçêrîne, bila yekî din here bajêr.*
***Heke** ew dixwazin, hila bên.*
***Heke** ew::.û tên, bila werin.*

Dema bê

Gava ku peyva *"heke "yê* bê serê hevoka dema bê, ew dibe hevoka mercê ya dema bê û hevok dirûvê dema bê ya raweya mercê digire. Bo zelalbûna mijarê çend mînak:

***Heke** ez ◦biçim, hewce bi te nîn*
*e. **Heke** tu yê werî, lez bike.*
***Heke** ew ◦here, çima xênî çêdike?*
***Heke** em ◦bistînin. ew dibe ku?*
***Heke** hûn ê bimeşin, zû rabin.*
***Heke** ew ◦bixwin, hila ew neyên.*

Dema boriya têde yî

Raweya hekanî ya vê demê dîsa bi peyva *"heke* "yê ji dirûvê rastîn ê wê demê vediqete. Ji bo ronîkirina mijarê çend mînak bes in:

***Heke** min got, tu jî bibêje.*

Heke tu hatî, xeberê bide min.
Heke wi nan xwm; bilafiraqan bişo.
Heke me ew dîtin, em êji wan re bibêjin.

Dema boriya dûdar

Dirûvê vê demê di raweya mercî de jî naguhere, bes *"heke"* tê ber û bi vî awayî ev rawe pêk tê.

Heke te gotiye. Iê xwedî derkeve.
Heke wî li te xistiye, pê re melîze.
Heke Iu çûye Amedê. ji me re bibêje.
Heke ew hatine, bila werin.
Heke çûkfiriyane, dafikê daneyne.
Heke hûn reviyane, hûn tirsonek
in.

Dema boriya berdest

Di vê demê de jî ji bilî peyva *"heke"yê* tu guhartin di dirûvê hevokê de çênabe. Her çi qas ev dem zêde nayê bikaranîn jî, dîsa jî mirov dikare çend mînakan jî jibo vê demê bide:

Heke I,ve didît, we gazî wan bikira.
Heke le hêjîr dixwestin, te bixwara.
Heke wî ez didîtim, çima nedigot.

Hekaniya daxwazî

Ev rawc li ser bingeha raweyên daxwazî ava dibin, amraza mercî *"ku* / *heke"* tê ber wan fonnên lêkeran ku raweyên hekaniya daxwazî ango merc û dax wazî pêk tê.

Dema niha

Di raweyê de amraza mercî *"ku* / *heke"* tê ber forma dema niha ya raweya daxwazî. Bi vî awayî dema niha ya raweya merc û daxwazî pêk tê. Ev rawe di hevokên hevedudanî de tê bikaranîn.

MÎnak:

Heke ez biçim, ez wi' bibînim.

Heke tu niha biçî, tu yê serê sibê bigihêjî wê derê.
Heke ew *zû biçe, ew berf me bigihêje wÎJ~*
Heke em dereng biçin, em ê wî *nebînin.*
Heke hûn îro biçin, hûn sibê li wir bin.
Heke ew biçin, ew ê zû bigihêjin wê derê.

Daxwazî - dema borî

Raweya daxwazî dema borî bi alîkariya du lêkeran pêk tê, lewma mirov dikare jê re daxwazî- hevedudanî jî bibêje. Di vê raweyê de digel lêkera bingehîn, rista lêkera *"bûn"ê* jî heye. Rayek dema borî ya lêkera bingehîn û rayeka dema niha ya lêkera *"bûn* tê bikaranîn. Bo nimûne lêkera *"birin"* di vê raweyê de dibe *"biribe* ".

Mînak:

Firotin (gerguhêz)

Erênî	*Neyînî*
Heke minfirotibe.	*Heke min nefirotibe.*
Heke tefirotibe.	*Heke te ne.firotibe.*
Heke wî/wêfirotibe.	*Heke* wf *Iwê nefirotibe.*
Heke me firotibe.	*Heke me nefirotibe.*
Heke wefirotibe.	*Heke we nefirotibe.*
Heke wanfirotibe.	*Heke wan nefirotibe.*

Hatin (negerguhêz)

Erênî	*Neyînî*
Heke ez hatibim.	*Heke e: nehatibim.*
Heke tu hatibî.	*Heke tu nehatibî.*
Heke ew hatibe.	*I!eke ew nehatibe.*
Heke em hatibin.	*Heke em nehatibin.*
Heke hûn hatibin.	*Heke hûn nehatibin.*
Heke ew hatibin.	*Heke ew nehatibin.*

Mînak:

Heke e: hatibim, kê dîtiye.
Heke Ie dîtibe, bibêje.
Heke wê standibe, bila bine.

Heke me gotibe, sûcê me ye. Heke we firotibe, kê kiriye?
Heke wan şûştibe, çima qirêjî ye!
Pêknehatî

Di vî awayê hekaniyê de lêker mîna lêkera xwestekî ye, bi tenê di destpêkê de *"heke"* heye, her wiha bi vî awayî dîsa hevokên hevedudanipêk~n.

Mînak:

Heke ew ê bihata, te çima negot?
Heke tu yê biçûyayî, le çima ezjî bi xwe re nebirim?
Heke wî yê bida, çima serhişkî kir?
Heke wê yê bianiya çima bi derengiyê xist?
Heke me yê biçanda, çima te pêşî negot?
Heke we yê bikola, ka tevir!
Heke wan bim 'êla, we nekiriya.

Dema boriya dûr

Her wiha çîrokiya dema boriya têdeyî ya hekaniya merc û daxwaziyê jî dîsa wekî daxwazî - dema boriya dûr c, bi tenê di destpêka hevokê de amraza mercî *"ku* / *heke"* heye.

Heke e: çûbûma, min ê bidîta.
Heke tu çûbûtyîtya, te yê bigota.
Heke ew çûbûya, wê yê bixwesta. Heke em biçûna, me yê bigirta. Heke hûn biçûna, \\C *yê bidîtana.*
Heke CHI *biçûna,* civ *bigihiştana ser xwarinê.*
Raweya Divêtî

Di pêkhatina vê raweyê de tiştê herî girîng lêkera alîkar *"viyan"* c, ev lêker di pêkhatina vê raweyê de roleke sereke dilîze. Lêkera *"viyan"* li gorî dema ku nîşan dide dirûvê xwe diguhêre.

Dema **niha**

Di vê demê de lêkera *"viyan"* dirûvê dema niha digire lt dibe *"divê* ". Lêkera bingehîn di dirûvê raweya fermanî de ye.

Mînak:

Divê e= hiç im.
Divê tu hevalê min
bibînî. Divê ew bên.
Divê em tiştê ku dixwin, pêşî bişon.
Divê hûn hejîran bixwin.
Divê zarok biçin dibistanê.

Dema borî

Di vê demê de lêkera bingehîn di forma raweya daxwazî - dema borî de ye amraza raweyî *"divê"* wateya divêtiyê dide hevokê.

Mînak:

Divê ez hatibim.
Divê te hevalê min dîtibe.
Divê we serê nve şûştibe.
Divê we hejîran xwaribin.
Divê zarok çûbin dibistanê.

Pêknehatî

Di dema borî ya pêknehatî de dirûvê lêkera *"viyan "ê* jî li gorî demê diguhere. Bi awayekî teorîk kişandina lêkera *"viyan"* li gorî hemû demên borî pêkan e, ji bo vê mebestê bi tenê dema boriya berdest tê bikaranîn. Di vê demê de jî lêkera *"viyan"* dirûvê dema boriya berdest *"diviya"* û lêkera bingehîn jî forma raweya bi I anî digire.

Mînak:

Diviya min hevalekî xwe bidîta
Diviya we ez bidî/ama.
Diviya me nan bixwara.
Diviya wan dar av bidana.

Raweya daxwazî - dema boriya dûr

Ev dem her çi qas di vê raweyê de pir zêde neyê bikaranîn jî carinan tê bikaranîn, ji aliyê wateyê ve nêzî dema li jor, lê cudatiyeke biçûk di navbera her duyan de heye.

Mînak:

Diviya çûbûma Amedê, min ew anîbûya. ***Diviya*** *min ew dîtibûya.*
Diviya me nan xwaribûya.
Diviya wan dar çandibûna.

Ev raweya nû ketiye zimanê nivîskî fl tê de bi cih bûye. Lêkera *"viyan"* bi xwe her wekî me berê jî dabû xuyakirin hemwateya lêkera *"xwestin'tê* yc. Lê li vir rista *"pêwistî"* II *"hewcetî'tyê* pêk tîne. Her wiha bêjeya *"pêwist"* a ku ji kurmanciya jêrîn ketiye zaravayê kurmanciya jorîn fl bêjeyên *"hewce"* fl *"pêdivî"* jî bi heman mebestê têne bikaranîn.

Hewce *ye ez herim.*
Pêwîst *e tu ras tiyê ji min re bibêjî.* ***Pêwîst*** *e tu zû herî.*
Pêdivî *bi çûna te heye.*

Raweya dibetî

Bi hinek amrazên mîna *"dibe ku", "belkî"; "mimkûn e"* jî tên ber formên daxwazî yên lêkeran û demên raweya dibetiyê pêk tînin.

Dema niha

Dibe ku *ew bê.*
Dibe ku *em biçin.*
Belkî *ew rastiyê bibêjin.*

Dema borî

Belkî *wan gotibe.*
Dibe kil *wan alîkarî xwestibe.*
Belkî *hê kes? nedîtibe.*
Mimkûn *e ku hê zarok ji dibistanê venegeriyabin.*

Raweyên bi lêkerên alîkar

Hinek rawe hene ku di kurdî de hê nehatine binavkirin. Ev rawe bi lêkerên alîkar pêk tên. Di van raweyan de hem lêkera alîkar ango lêkera raweyi hem jî lêkera bingehîn tên kişandin. Lêkerên ku raweyên bi vî rengî pêk tînin ev in: *"xwestin", "karin", "zanin"* fl *"wêrîn".*

Xwestin:

Bi alîkariya vê rawcyê daxwaza pêkanîna karekî tê vegotin. Pêkanîna vê raweyê dişibe dema bê ya nêzîk, ji al iyê wateyê ve cudatiya wê ji dema bê ya nêzîk ev e ku di vê rawcyê de bi tenê daxwaz heye, ji bo pêkanîna daxwazê demeke teqez nîn e.

Dema niha

Di vê demê de lêkera *"xwestin"* di forma dema niha de ye, lêkera bingehîn di forma dema niha ya daxwazî de ye. Her du lêker jî piştî rayeka dema niha qertafên kesandinê werdigirin.

MÎnak:

Ez dixwazim hevalê HVe h lbîn
im. Ew dixwaze were mala me.
Tu dixwazî vê havînê biçî ku derê?

Demên borî

Di demên borî de bi tenê forma lêkera *"xwestin"* diguhere, her wekî;

Min xwest te bibînim.
Min dixwest te bibînim.
WÎ xwestiye min bibîne.

Di dema borî de hin caran lêkera bingehîn forma dema borî ya raweya daxwazî jî werdigire.

Bo nimûne:

MÎn dixwest ew bidîta.
Wê dixwestji keça xwe re çirokek b igo ta.

Şiyan/karîn:

Ev her du lêkerên hemwate (sînonîrn) jî hêz û quweta mirova ji bo karekî dinimînin. Mirov dikare têrêkirina hêza xwe bi riya van lêkeran diyar bike. Di hin zimanan de wekî *"raweya têrêkirinê"* tê binavkirin.

Dema niha

Dema niha ya vê rawcyê jî dişibe ya lêkera *"xwestin"ê.*

Mînak:

Ez dişêm ji te zûtir bimeşim.
Tu neşêyiji min re tiştekî bibêjî.
*Tu **dikarî** Îro karê xwe biqedîni.*

Demên borî

Di dema borî de jî ev lêker wekî lêkera *"xwestin"ê* ye.

*Wi **karî** bersiva xI·ve bide.*
*Me **karibû** ew kar bibira serf*
We yê karibûya a dilê xwe bigota.

Zanîn:

Di vê lêkerê de jî rewşeke cuda nîn e. Ev lêker hem di dema niha de hem jî di demên borî de dişibe lêkerên din.

Dema

niha

Mînak:

Demên borî

*Ez **dizanim** herim mala I-*
*ve. Hûn **dizanin** herin*
*bajêr Hûn **dizanin** vî karî*
bikin.
*Min **zanîbû** bi tena serê .xvve biçim bajêr.*
*Wan **zanibû** hi alîkariya stêrkan riya xwe bibînin.*
*Te **zanibû** navê wê kulî/kê bigota.*

Wêrîn: Lêkera *"wêrin"* ji yên din ne cudatir e.

Dema niha

Mînak:

*Ez **newêrim** ji wi re tiştekî bibêjim.*
*Faşîst **newêrin** bela xwe di belavkaran bidin.*
Bi tenê Serdar diwêre şaşiyên wî jê re bibêje.

Demên borî

Kesî newerî nêzîkî wî bibe.
Bi tenê dayika wi diwerî wîji xewê hişyar bike.
Hevalên wî nediwêrî li bal wî *qala jiyana gund bikira.*

Raweya çêbiwar

Ev rawe bi rayeka dema borî û qertafa "-f'yê pêk tê. Bi vê raweyê mirov karekî pêkhatî dide zanîn. Raweya çêbiwar li gorî dem û kesan nayê kişandin, ji rawcyckê zêdetir rengê hevalnavan dide. Di îngilîzî de ji vê formê re *"pas! participle"* tê gotin. Rayeka dema borî ya lêkerên ku bi paşgira "-f'yê pêk hatine bi xwe di dirûvê "raweya çêbiwar" de ne.

Lêkera ku di dirûvê raweya çêbiwar de ye, ji ber ku çawaniya tiştekî û kesekî nîşan dide, di nava hevokê de dibe hevalnav. Bo nimûne, rayeka dema borî ya lêkera *"ketirî'ê "kel-"* dema qertafa *1-ilyê* digire raweya çêbiwar a vê lêkerê *"ketî"* derdikeve holê.

Em ji lêkerên xwerû hinek mînakan bidin.

Mînak:

raweya	*rayek dema borî*	*lêker*
alasti	*alast*	*alastin*
angaştî	*angaşt*	*angaştin*
aşkaftî	*aşkaft*	*aşkaftin*
avêtî	*avêt*	*avêtin*
awartî	*awar!*	*awartin*
axaftî	*axaft*	*axaftin*
bihîstî	*bihîst*	*bihîstin*
bijartî	*bijart*	*bijartin*
biraştî	*biraşt*	*biraştin*
birî	*hir*	*hirÎn*
bişkaftî	*bişkaft*	*bişkaftin*
bihartî	*bihart*	*bihar/in*
bûyî	*bû*	*bûn*
cûtî	*cût*	*cûtin*
çûyî	*çû*	*çûn*

veşartî	*veşart*	*veşartin*
firotî	*firot*	*firotin*
gestî	*gest*	*gestin*
gihaştî	*gihaşt*	*gihaştin*
girtî	*girt*	*girtin*
gotî	*got*	*gotin*
guhartî	*guhart*	*guhartin*
guhastî	*guhast*	*guhastin*
guvaştî	*guvaşt*	*guvaştin*
hatî	*hat*	*hatin*
hejmartî	*hejmart*	*hejmartin*
heraftî	*heraft*	*heraftin*
heristî	*heris!*	*heristin*
hinartî	*hinart*	*hinartin*
hingafti	*hinga.ft*	*hingaftin*
hiştî	*hişt*	*hiştin*
jentî	*jent*	*jentin*
kê/ayî	*kêla*	*kêlan*
keliştî	*kelişt*	*keliştin*
keniştî	*kenîşt*	*kenîştin*
kera/tî	*keraft*	*keraftin*
kesaxti	*kesaxt*	*kesaxtin*
kêşayî	*kêşa*	*kêşan*
ketî	*kel*	*ketin*
kevaştî	*kevaşt*	*kevaştin*
kirî	*kir*	*kirin*
koştî	*koşt*	*koştin*
kolayî	*kola*	*kolan*
kuştî	*kuşt*	*kuştin*
kutayî	*kuta*	*kutan*
lÎstÎ	*lîst*	*lîstin*
ma/aştî	*malaşt*	*malaştin*
mêtî	*mêt*	*mêtin*
mirî	*mir*	*mirin*
nihartî	*nihart*	*nihartin*
nivîstî	*nivist*	*nivistin*
nixamtî	*nixamt*	*nixamtin*

pişaftî	*pişaft*	*pişaftin*
pişkaftî	*pişkaft*	*pişkaftin*
qe/aştî	*qelaşt*	*qelaştin*
parastî	*parast*	*parastin*
pelaxtî	*pelaxt*	*pelaxtin*
pêçayî	*pêça*	*pêçan*
perastî	*perast*	*perastin*
peristî	*perist*	*peristin*
qevastî	*qevast*	*qevastin*
rêlî	*rêt*	*rêtin*
sotî	*sot*	*sotin*
spartî	*spart*	*spartin*
strayî	*stra*	*stran*
westayî	*westa*	*westan*
xistî	*xist*	*xist in*
xwarî	*xwar*	*xwarin*
xwestî	*xwest*	*xwestin*

ller wekî me di destpêkê de diyar kir. rayeka dema borî ya lêkerên ku bi *"-i'I1"ê* diqedin bi xwe di forma raweya çêbiwar de

ne,

Mînak:

raweya çêbiwar	*rayek dema borî*	*lêker*
mijî (yayî)	*mijî*	*mijîn*
birî (yayi)	*hiri'*	*birÎn*
kiri (yayi)	*kirr*	*kirÎn*
kişi (yayi)	*kişî*	*kişîn*
dirî (iyayî)	*dirî*	*dirin*
firityayî)	*firi*	*[irîn*
kelijî	*kelijî*	*kelijÎn*
tepisî	*tepisî*	*Iep is În*
revîtyayî)	*revî (va)*	*rcvtn*
tewî (yavi)	*tewitya)*	*tewîn*

eş/il *êşîtya)* *êşiyayî*

Her wekî me berê jî gotibû raweya çêbiwar dema ku tê ber navdêran çawaniya wan nîşan didin û dibin hevalnav,

Mînak:

hevalê dilşikestî
xaniyê hi/weşandî
dara şînbûyî
zaroka aşkirî
destê êşiyayî
çavên nedîtî pirtûka
wergerandî mirovê
keti

Lêkerên alîkar

Ev cure lêker digel erka xwe ya bingehîn bi erkine din jî radibin. Di kurmancî de hin lêkerên alîkar ev in: *bûn, kirin, dan, hatin, karîn/şiyan, viyan/xwestin, zanîn li wêrîn, ketin, xistin, girtin, xwarin ...*

Bûn: Lêkera *"hûn* di kurmancî de digel erka xwe ya bingehîn di pêkanîna hinek karên din de jî xwedî risteke girîng e. Bo nimûne, di pêkanîna lêkerên hevedudanî yên negerguhêz de ew xwedî roleke taybet e. Her wiha di pêkanîna hinek dem û raweyan de jî kar digire ser xwe. Mirov dikare ristên lêkera *"bûn* Hê yên alîkar bi çend mînakan rêz bike.

Di pêkanîna lêkerên hevedudanî yên negerguhêz de dibe alîkar. ***Mînak:***

Ç'av li serî sor ***bûn.***
Zarokên me zû mezin
bûn.
Dilê hevalan bi 1'ê peyamê geş
bû. *Ez hi dîtina we Ji/xweş* ***bûm.***
Dagirker bi karê xwc yên kirêt rûreş ***bûn.***
Divê em gelek! bêhnfireh ***bin.***

Ev lêker di pêkanîna lêkera pişaftî *"he-"* de jî xwedî erk e. Ew morfema *"he"* di bingeha xwe de têkildarî *"estene"* ya kirmanckî ye. Ji bo vê yekê jî mirov dikare çend mînakan bide.

Ez heme.
Min nanek heye.
Xweziya hevalên min hebûna.

Ez dê hebû
ma. Ez
hebim.

Lêkera *"bûn nê* di pêkanîna dema hevedudanî *"çîrokiya dema boriya têdeyî û dûdar"* de dibe alîkar.

Çîrokiya dema boriya têdeyî

Mînak:
Ez çûbûm.
Min dîtibû.
Wêfirotibû.
We nan
kiribû.
Çîrokiya dema boriya dûdar

ez hatibûme.
Ew reviyabûye.
Em ketibûne.
Zînê nehatibûye.

Dîsa di pêkanîna raweya daxwazî dema borî de xwedî erk e.

Heke ez çûbim.
Bila ew çûbûya.
Xwezî ew hatibûya.
Wan dê gotibe.
Ez ê çûbim.
Ew hatibûya ...

Kirin: Lêkera *"kirin"ê* jî digel rola xwe ya bingehîn di pêkhatina hinek tiştên din de jî dibe alîkar. Mirov dikare wan erkan her yekê bi çend mînakan rave bike.

Dema bê ya nêzîk û çîrok iya wê demê bi alîkariya vê lêkerê çêdibe.

Ez dikim herim ba wi.
Tu dikî bi kil de herî?
Zîn dike hinek fêkiyanji mamosteya xlve re bibe.
Em dikinji vir herin.

Çîrokiya dema bê ya nêzîk

Min dikira xurîniya xwe bişikanda.
Wî dikira vegeriya.
Me dikiraji we bistanda.

Di pêkanîna lêkerên hevedudanî yên gerguhêz de' jî ev lêker derdikeve pêşberî mirov.

Min ala rengîn berz kir.
Wi li me zordarî kir.
Teji wan pirs kir.
Me sohbet xweş kir.
We govend geş kir.
Te ez dilxweş kirim.

Hatin

lêkera hatin bi taybetî di pêkanîna *"avaniya tebatî"* de xwedî erkekê ye. *"Lêkerên lebatî* bi alîkariya vê lêkerê dibin *"tebatî".*

Bo nimûne:

Ji min re hate gotin.
.Ji wî tê pirsîn.
Dêji wan were xwestin.
Li 'wî hatibû xistin.
Bi navekî din dihat nasin.

Viyan/xwestin: Lêkera viyan digel peywira xwe ya bingehîn ji bo pêkanîna raweya divêtiyê pêwîst e.

Divê ez werim.
Diviya tu biçûyayî.

lêkera *"xwestinrê* jî dibe alîkar da ku daxwaza ji bo pêkanîna karekî were zimên.

Ez dixwazim tu heri.
Min xwest ji fe re tiştekî bibêjim.
Wan xwestibû karkeran ji kar bavêjin.

Şiyan/karîn: Ev her du lêkerên hemwate (sînonirn) jî hêz û quweta mirov aji bo karekî dinimînin. Mirov dikare têrêkirina hêza xwe bi riya van lêkeran diyar bike. Lêkera *"karîn"* di hin devokên kurmancî de wekî *"kanin"ê:* jî tê bikaranîn.

Mînak:

Ez dişêm wî *hevalî bi xwe re bibim.*
Tu dikarîji min re wê çîrokê vebêjî.
WF şiyabû hevaltiya min bike.
Me dikaribû bersiva xwe bida.
We yê karibûya vî karî pêk bînin?

Zanîn: Lêkera *"zanin"ê* di pêkanîna hevokên hevedudanî de dibe alîkar, jiber vê yekê jî lêkereke alîkar e. Ew jî mîna *"şiyan", "karîn", "xwestin", "wêrfn"ê* digel lêkera bingehîn li gorî kes fl demê tê kişandin.

Mînak:

Ez dizanim herim mala we,
Hûn dizanin herin bajêr:
Ilûn dizanin vi' karî bikin.

Wêrîn: Lêkera *"wêrînt:* jî lêkereke alîkar e. Bi vê lêkerê jî her wekî lêkerên mîna *"karîn", "zanîn", "xwestin"* hevokên hevedudanî pêk tên. Di van hevokan de hem lêkera *"wêrîn"* hem jî lêkera bingehîn li gorî kes ₒ cih têne kişandin û kesandin.

Mîntik:

E: newêrim bi şev herim li goristanê razêm.
Qet kes diwêre bela xwe di wî bide"!
Bi tenê Serdar diwêre vi karî bike

DI LÊ KARAN **DE** AVANÎ

Avanî ev tişt e ku avasaziya lêkeran nîşan dide. Ji avaniyê tê zanîn ka kar rasterast bi destê yekî pêk tê, yan jî bi awayekî nerastcrê pêk tê, tê de bireser heye yan tune ye, kirde kar bi xwe dike yan bi yeki/e din dide kirin. Di tirkî de jê re *"çatî* , di îngilîzî de jê re *"voice"* tê gotin, di erebî de jî beranberî wê peyvê *"bîna"* tê gotin. Di zaravayê kurmancî de ji aliyê avaniyê ve lêker dibin sê bir: *"gerguhêz I negerguhêz", "lebatî / tebatî"* lî *"dan çêker".* Ji ber ku me mijara gerguhêzî û negerguhêziyê berê hildabû dest. cm ₑ li vê derê bi tenê li ser mijarên mayî rawestin.

Lebati û tebatî

Dema ku yek rasterast karekî bike, avaniya wî karî lebatî ye. Yanê yek bibêje *"Min nan xwar".* Lêkera di forma avaniya *"xwarin"* lebatî de ye. Tê de kirde diyar e. Dema ku mirov pirsa *"kê"* aresteyî wê lêkerê bike, dê bersiva *"min"* wekî kirde xwe bide dest. Lê dema ku mirov bibêje *"Nan hale xwarin"* di vir de" *kirde"* ne diyar e. Di vê hevokê de karê ku tê kirin ango *"bireser"* li pêş e. Tiştê ku *"tê xwarin",* zêdetir derdikeve pêş, lê kesê ku wî karî dike diyar nabe, heke diyar bibe jî ne bi awayekî rasterê, lê bi awayekî nerasterê diyar dibe. Avaniya "tebatî" bi alîkariya lêkera *"hatin "ê* tên bidestxistin. Mirov lêkera *"hatin "ê* li gorî dem **li** kesan dikişîne û lêkera bingehîn jî di forma raderê de dide, avaniya tebatî derdikeve holê.

Mînak:

Lebatî: Min (kirde) kevir avêt.
Tebatî: Kevir (bireser) hate avêtin (ji hêla min ve).
Lebatî: 'Lozan (kirde) tûyan dadiweşîne.
Tebatî: T1î (bireser) têne weşandin (bi destê Zozanê).
Lebati: Biro (kirde) av vexwarzve.
Tebatî: Av (bireso) hatiye vexwarin (ji hêla Biro ve).
Lebatî: Cerdevanan (kirde) dar birîne.
Tebatî: Dar (bireser) hatine birîn (bi destê cerdevanan).

Di lêkerên lebatî de tiştekî ku mirov zêde li serê raweste nîn e. Lê di lêkerên tebatî de çend xalên giring hene. Avaniya tebatîji lêkerên gerguhêz çêdibe. Jiber ku lêkerên bêyî bireser nikarin bibin tebatî. lewre di vê avaniyê de rista bireseran li pêş e. Tiştê ku tê serê yekî yan tiştekî. derdikeve pêş. Dema ku mirov dibêje *"Dar hate avdan"* tiştê ku tê sere darê girîng e û dar jî bireser e. Lewre mirov nikare bibêje, *"Çûk hatefirîn"* divê mirov pêşî lêkerê bike gerguhêz, piştre bike tebatî. Awayê gerguhêz ê *"firintê, "firandin"* e. Nexwe divê mirov bibêje, *"Çûk hatefirandin."*

Mînak:

Xanî hate hilweşandin.
Gund hatiye avakirin.
Xwarin tê sarkirin. Mal hatibû avakirin.

*Kar dê **bihata** birêvebirin.*
*Ditin **dihatin** gotin.*

Her wiha di avaniya tebatî de neyînî ji lêkera *"hatin'T:* diyar dibe, ango lêkera *"hatin"* qcrtafên neyiniyê *"ne-"* ℂ.*"na-"* werdigire.

Mînak:

Goşt hat xwarin.
Goşt nehat xwarin.
Goşt tê xwarin.
Goşt nayê xwarin.
Goşt dê bê xwarin.
Goşt dê neyê
xwarin. Goşt dihat
xwarin
Goşt nedihat xwarin.
Goşt bihata xwarin.
Goşt nehata xwarin.
Goşt dê hatibe xwarin.
Goşt dê nahatibe
xwarin.

Her wekî me di destpêkê de diyar kir, di kurmancî de tebatiya lêkerên negerguhêz çênabe. Di kurmancî de bi tenê tebatiya lêkerên gerguhêz çêdibe. Di vî warî de kurdî ji zimanên din ên mîna tirkî cuda dibe. Bo nimûne di tirkî de lêkerên negerguhêz jî dibin tebatî.

Her wekî *"gidildi, gelindi, uçuldu, duruldu, dokûldû ...* " tê gotin. Lê di kurdî de *"hate çûn* ", *"hate hatin* ". *"hate firin* ", *"hate rawestîn* ", *"hate weş În* " ... nayê gotin. Mirov nikare van lêkeran bike tebatî. Mixabinji ber wergera tirkî mirov gelek caran di çapemeniya kurdî de rastî gotinên mîna *"hate rawestîn", "hate hînbûn"* tê. Heke mirov pir xwe mecbûrî wergerandina peyva tirkî bibîne, mirov dikare bibêje, *"çûyin pêk hat* ". *"firîn pêk hat* ", *"rawestan pêk hat ".* lê li gorî bawerya min wergereke wiha ne pêwîst e.

Jixwe lêkerên mîna *"weşîn, şikestin, westan, hejîn, acizbûn, amadebûn, belavbûn, berisîn, hest În, heti/În, bişkuvîn, rijin, kennitîn, ferisîn, filitin ....* , xwediyê wateyeke tebatî ne.

Lewre jî mirov dikare li şûna *"diikûldû "* bibêje *"weşiya* ", an jî *"rijiya* " ... L€ hemû lêker heman wateyê nadin. Bi taybetî kesên ku ji tirkî wergerê dikin di vî warî de dikevin tengasiyê. Lê divê em bizanin ku her ziman xwediyê hinek taybetî ℂ1xisletan e.

Avaniya dançêker

Dema ku mirov karekî bi yekî din bide kirin, divê mirov *"avaniya dançêker"* bi kar bîne. Avaniya dançêker bi alîkariya lêkera *"dan"ê* pêk tê. Dema ku yek bibêje, *"E: kincan dişom"* ew vî karî bi xwe dike, lê dema ku kesekî din li şûna wî kincan bişo, wê demê dê bibêje, *"Ez kincan didim şûştin,"* Ji bo pêkanîna avaniya dançêker, cm lêkera *"dan"ê* li gorî dem û kesan dikişînin û tînin ber lêkera bingehîn û lêkera bingehîn wekî rader bi lêv dikin.

MÎnak:

Bozo xanî da avakirin.
Eyşo kincên xwe dan şûştin.
Remezan miha xwe dide
serjêkirin.
Dagirker li ser çemên me bendavan didin avakirin.

Di van hevokan de mirov dikare kesê ku kar dike bi alîkariya daçeka *"bi"* nîşan bide.

Minak:

Mamoste karê xwe bi şagirtan dide kirin.
Kincên xwe bi hevalên xwe dan şûştin.
Ezîz xwarina xwe bi xelkê dide çêkirin.
Wan doza xwe bi neyaran jî da
pejirandin.

Forma neyînî ya avaniya dançêker jî wekî avaniya tebatî pêk tê, di vê avaniyê de jî qertafên neyînî berî lêkera *"dan"ê* tên.

MÎnak:

Ew wan bide girtin.
El'.' *ê 'wan nede*
girtin. Ew wan dide
girtin. Ew wan nade
girtin. WÎ el'\;' da
girtin.
WÎ ew neda girtin.
Wf *ew bidana girtin.*
WÎ ey\' nedana
girtin.

Her wekî ji mînakan diyar e. avaniya dançêker jî bi alîkariya lêkerên gerguhêz pêk tê. Ji ber ku divê di bûyerê de *"bikir"* û karê

ku tê kirinji hev euda bin û *"bikir"* wî karî bi hinekên din dide kirin. Lewre jî ne gengaz e ku mirov bibêje *"Hevalê min qesrek da çêbûn";* divê mirov bibêje, *"Hevalê min qesrek da çêkirin."*

Di zimanê gelêrî de avaniya dançêker bi awayekî dinjî tê çêkirin, ew jî dîsa bi alîkariya lêkera *"dan"ê* pêk tê, li vir daçeka *"bi"* jî pêwîst e.

Mînak:

Wi ez hi girtin dam.
Wan ew bi kuştin
da.
Ew kincên xwe bi şûştin
dide. Awayê neyînî jî bi wiha
ye:
wî ez hi gir/in nedam.
Wan em hi kuştin
nedan.
Ew kincên xwe hi şûştin nade.

Li aliyê din hin lêkerên gerguhêz bi paşgira *"-andin"ê* dibin dançêker, Bo nimûne lêkera *"bihîstin"* lêkereke gerguhêz e û bi alîkariya paşgira *"-andin"ê* dibe *"bihîstandin "* ⍰ ji aliyê wateyê ve dibe dan çêker. Iler wiha lêkerên mîna *"axivandin* ", *"lîstandin* ", *"mijandin nê* bi heman awayî bûne dançêker. Jixwe di zimanê farisî de jî paşgira *"andin"* lêkerên negerguhêz dike gerguhêz, lêkerên gerguhêz jî dike dançêker, Lê di kurdî de hemû lêkerên gerguhêz nake dançêker. Dîsajî hinek lêkerên gerguhêz bi alîkariya *"andirî'ê* dibin dancêker.

Li şûna *"Min ew da axaftin.* ", *"Min ew axivand.* ", li şûna *"Min ew da lîstin.* ", *"Min ew lîstand.* ", li şûna *"Min tiştek da bihîstin.* ", *"Min tiştek bihfstand.* " ...

HEVOKSAZÎ

Em bi vê mijarê derbasî hevoksaziya kurdî dibin. Beşa zimanzaniyê ya ku awayê pêkhatina hevokan û rêzbûna bêjeyan vedikole û wan şîrove dike, sentaks ango hevoksazî ye. Di vî warê zimanzaniyê de zimanzan bala xwe didin ser rêz û rêzikên pêkhatina hevokan, li gorî wan rêz û rêzikan hevokan analîz dikin. Em ê jî di vê beşê de hevokan rave bikin, ji gelek aliyan ve bala xwe bidin an. Her wiha em ê hêman û cureyên hevokê şîrove bikin. Serê pêşîn divê em bala xwe bidinê ka hevok çi ye?

Hevok

Dema ku çend bêje li gorî rêz û rêzikekê li pey hev rêz bibin û wateyekê bidin,ji vê koma bêjeyan re *"hevok"* tê gotin. Dîtinek, ramanek û rûdanek an jî çend rûdan û raman bi hevokê tên nimandin. Hevokek bi tîpa girdek dest pê dike û li gorî wateya xwe bi xal, baneşan û xalecotê diqede. Hevokek dibe ku ji boçûnekê pêk bê, yan ji çend boçûnên serbixwe, yan ji **ji** boçûneke bingehîn û çend boçûnên alîkar pêk were.

Li gorî rêgezên zimanzaniyê ziman ew rêzîleya nîşaneyan e ku liser dengan ava bûye. Di vê rêzilcyê de deng di pêpelûka jêrtirîn.de hevok jî di pêpelûka jortirîn de cih digire. Hêmanên din ên zimên di nav hevokê de watedar dibin. Hêmanên din ên zimanî bi tena serê xwe nabin navgînên ragihandinê. Hevok ew yekeya zimanî ye ku rêzîleya dengî diyar dike, teşe û wateyê dide wê. Ji aliyê ragihandinê ve hevok pêpelûka herî jorîn a zimên e. Ji aliyê avanî fl pêkhatinê ve yekeya herî mezin a zimanî hevok e.

Jibo hevokeke herî kêm lêkerck pêwîst e. Lêkereke kêşbar têra sazkirina hevokekê dike. Dema ku lêkerek li gorî dem û kesan bê kişandin, hevokeke biçûk ava dibe. Ev qertafên kêsanê **ji** aliyê kirde û lêkerê ve hevokê sergihayî dikin. Bi alîkariya hevokeke wiha mirov dikare peyamekê ragihîne.

Mînak:

Hat.
Ketim.
Bibêje!

Der barê navlêkirina kurmancî de jî divê ez çend têbîniyan pêşkêş bikim. Peyva *"hevok"* ji hêla Celadet Bedirxan ve hatiye dariştin û cara pêşîn wî bi kar aniye. Lê wî ew peyv di şûna *"clause':«* îngilîzî de bi kar aniye. Ji bo *"cumle'tvt:* wî peyva *"komek"* bi kar aniye, lê kesên ku li dûv wî hatine, wan *"hevok"* bi wateya *"cwnle"yê* bi kar aniye û wisa bi cih bûye. Em jî jiber vê egerê peyva *"hevok'tê* ji bo cumleyê, peyva *"komek"ê* jî di şûna *"c1ause"a* îngilîzî de bi kar tînin. Her wiha divê em bidin zanîn ku S. B. Amêdî jî peyva *"hevek"* bi kar aniye. Di zaravayê soranî de *"riste"* tê bikaranîn. Li gorî baweriya min peyva herî xweşik û di cihê xwe de *"riste"* ye. Lewre peyv têne ristin û *"riste"* derdikeve holê. Lê ji ber ku di kurmancî de peyva *"hevok"* cihê xwe girtiye, em ê jî wê bi kar bînin.

Hêmanên hevokê

Di hevokê de du hêmanên bingehîn; *"kirde* .. , *"pêveber"* û du hêmanên alîkar; *"bireser"* û *"têrker"* çar birên hevokê hene. Divê em yeko yeko **li** ser van rawestin.

Kirde

Karck **j** i aliyê keseki/kesinan an jî tiştekî/tiştinan ve tê kirin, ew kes CI tişt kirde ne. Bo nimûne gava em dibêjin *"Seyran çê mafê* ol li vê derê kesa ku wî karî dike *"Seyran"* e. lewre jî di vê hevokê de *"Seyran"* kirde ye.

Mînak:

Zînê kevir avêt.
Zelalê rewşa xwe di her çavan re derhas kil:

Rohatî destên xwe paqij
kirin. Ceng nanê xwe dide
hevalan. Kêvir cam şikand.
Êgir mal şewitand.
Kerê giha xwar.
Marî bi Zero veda.

Di lêkerên negerguhêz de bûyera ku pêk tê dibe kirde. Dema ku mirov ji pêveberê pirsa *"çi/ki"* bike, bersiva wê kirdeyê dide. Her wekî *"Çi ve/nî'!" Derî vebû.*

Derî vebû.
Destê wî
şikest. Berf
bariya.
Kulîlk çi/misin.
Zarokji ser xênî
ket. Mala me hctiki.
Zozan ji bajêr haf.

Kêm caran be jî kirde, veşartî ye, bi alîkariya cinavkên kesan dinê xwe nîşan dide.

Hat îî çû riya xwe bi vir
nexist. Diçî ku?
Diçime mala apê xwe.

Ji ber ku di kurmancî de cînavkên kesandinê di her sê kesên pirjimar de jî *"in"* e, di pirjimariyê de mirov nikare bêyî cînavkên kesane (em, hûn ew) kesan jihev veqetîne, lewre jî kirdeya veşarî pêk nayê.

Kirde hin caran jî ne tenê ji bêjeyekê, ji ra vekên navdêrî, hevalnavî û hokeri pêk tên. Carinan jî bi alikariya cînavk û rengdêrên girê kî kurtehevokek dibe kirde.

Mînak:

Birayê min î xwende duhji dibistanê
haf. Keçikajîr a çavşîn bûye gula civatê.
Lawikê porxelek ji gundê me dê li Stenbolê
bixwîne. Birayê min ku li Almanyayê dijî, Îro tê
gund.
Birayê min ê ku par hatibû girtin, sibeji girtîgehê derdikeve.

Hevalekî ku min ji mêj ve nedîtibû, duh rastî min hat.
Qeşmerê kil me duh bi hev re xwarin dixwar, iro min nas nake.

Her wekî ji mînakan ji diyar c, di kurdî de kirde bi piranî di dest-pêka hevokê de cih digire.

Pêveber

Di hevokê de hêmana ku karekî, bûyerekê, rewşekê radigihîne pêveber e. Ji bo pêveberê pêwîstî bi lêkereke kişandî heye. Pêveber dibe ku ji lêkereke tenê pêk hatibe, her wekî;

Derî vebû.
Deste wê şikestiye.

Her wiha di hin hevokan de pêveber ji çend peyvan pêk tê.

Ev zarok pir xweşik û delal e.

Her wekî têgihên din ên rêzimanî di warê navê vê têgihê de jî tevliheviyek heye. Lê me bêjeya di *"Kovara Kurmancî"* ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê de gunean dît û em ê wê bi kar bînin. Di vê kovarê de her wekî Celadet Bedirxan, ji bo fiîlê *"lêker"* hatiye bikaranîn û ji bo *"yuklem* "a tirkî, *"predicate"a* îngilîzî *"pêveber"* hatiye bikaranîn. Ji bo zelalkirina mijarê em ê çend mînakan bidin:

Mînak:

Elî mirovek!' haş e. Zîlan gulan diçine.

Her wekîji hin mînakên li jor jî diyar e, hin earan bi tenê lêkerek dibe pêveber. Hin caran jî rengdêr. navdêrên ku bi alîkariya lêkerên *"bûn"* û *"kirin* ê pêk hatine dibin pêveber.

RZÎyê keçikê li ber tava havînê reş bûye.
Çima te rûyê xwe reş kir?

Hin earan ravekên navdêr, hevalnav û hokeran dibin pêveber, Carinan jî bi alîkariya cînavk li rengdêrên girêkî kurtehevokek dibe pêveber.

Welatê me bi Kulên rengîn dixemile.
Ew kurê meta min bû.
Derdê min barana gur a welatê we ye.

Li gorî lêkeran pêveber dibin du cure; pêveberên ku bûyer û kirinekê nîşan didin û pêveberên ku rewş ﬕ taybetiyekê nîşan didin. Pêveberên hevokê yên ku kar û bûyerekê nîşan didin, bi alîkariya lêkeran pêk tên.

Mînak:

Kurê min Azad diçe dibistana
seretayî. Di/avan dê biçe nav rêz.
Serbest dersa xwe dinivîse.
Bêrîvan çêleka zer didoşe.
Xunav dê kulîlkan biçine.
Gulzar çîrokên kurdi berhev
dike. Dara li mala me dinive.

Di hevokên navdêri de lêkera *"bûn "ê* digel cinavkên kesandinê têne bikaranîn lt pê rewşek tê nîşandan.

Mînak:

Mamê te mamoste
ye. Xwişka wî
bêrîvan e.
Hevalê min şagirtekî jîr û jêhatî ye.
Birayê te dostekî min î hêja bû.
Serdar li malê ye.

Her wekî ji mînakan jî diyar e, pêveber pirî caran lêker e, lê ew kêm caran jî dibe navdêr, hevalnav, cînavk, baneşan û daçek, gihanek û hoker.

Mînak:
Ez mamoste me. (navdêr)
Ew balindeyek bû. (navdêr)
Birayê min pir biçûk e. (hevalnav)
Xwişka wî çavşîn e. (hevalnav)
Hevalê kuji bajêr hat tu yî? (cînavk)
Belê. ez im. (cînavk)
Daçekeke bingehîn 'ji" ye. (daçek)
Daçekeke ku nevîniyê nîşan dide "na" ye. (daçek)
Gihanekeke kurmancîjî "lê" ye. (gihanck) *Qertafa*
kil wateya derewîn dide "zir-" e. (qertaf)

Digel vê yekê ravckên navdêr, hoker û hevalnavan jî dibin pêveber. *Mînak:*

A ku min duh dît, dotmama Zozanê ye. (rave ka navdêrê)
Duh bi şeva li mala me diya keçikê bû. (raveka navdêrê)
Li welatê me Gola Wanê gola herî mezin e. (raveka hcvalnavê)
Bazîd navçeyeke bi ser bajarê Agirî ve ye. (raveka hokerê)

Pêve berên veşarî

H in caran di nava axaftinê de ji bo kurtkirinê pêveber nayê gotin. Lê ew bi awayekî ji hêla bêjer û bihizer ve tê zanîn.

jl1Jnak:
Navê fe bi xêr? (Bi xêr he, navê te çi ye?)
Tu mamoste yî?
Belê. (Belê, e:; mamoste me.)
Tu kengê ji bajêr hatî?
Duh. (Ez duhji bajêr hatim.)
Te karê x~i'e qedand?
Erê. (*Erê, min qedand)*

Têrker

Têrker ji gelek aliyan ve karê ku tê kirin sergihayî (temam) dikin. Ev sergihayîkirin dibe ku **ji** aliyê demê, yan cih an jî rewşê ve be.

Her wekî ji ravekirinê jî diyar e, têrker di binyata xwe de hoker û daçek in, lewre tiştê ku lêkeran bi me didin nasîn hoker in û tiştê ku wateya hevokê diedilînin daçek in. Dê çend mînak têrî zelalkirina mijarê bikin.

Gundi li dora gund zivirîn.
Bajarî serê sibê zû diçin karê xwe.
Ez ber bi hevalekî xwe ve meşiyam.
Ez gelekî westiyam.
Kakilê gûzê hêdî hêdî pûç dihe.
Zahid yekser xwe gihand sel' gir.
Bi tenê ez ha/im.
Xwedêgiravî tu ji bo min çûyî.

Min mêvan birin jûra
mêvanan. Stranbêjê stranek ji
me re got.
Cejna karkeran di J 'ê meha gulanê de tê
pîrozkirin. Duh ez çûm mala apê xwe.
Min ji pirtûkfiroş pirtûkeke nû kirî.
Koçer havînan diçin zozanan.
Ez bi balafirê çûm Amedê.
Xelfetî di bin avê de ma.
Lawik gelekî ji kar zivêr bûye.
Min bi tembûrê ji wî re stranek
got. Tu çawa diçl bajêr?
Tu kengê vedigerî malê?
Nexwe tu naçî malê.
Belê. em zû vegerin.
Mixabin, ez. nikarim werim.
Xwedêgiravî ew jî bi min re
dihat. Heke hal, bila were.

Bireser

Li ser vê bira hevokê em berê jî rawestiyabûn, di hevokên gerguhêz de ew derdikeve pêşberî mirov. Di hevokên ji lêkerên gerguhêz pêkhatî de kes û tiştê ku rasterê di bin bandora tiştê ku tê kirin de dimîne *"bireser"* e. Ji ber vê yekê jê re *"têrkera rasterast"* jî tê gotin. Wekî mînak, di hevoka *"Serwerî pez çêrand"* de peyva *"pez"* bireser e. Lewre tiştê ku di bin bandora wî karê *"çêrandin"ê* de dimîne *"pez"* e.

Di mijara tewangê de em hinekî li ser vê mijarê rawestiyabûn. Nihajî em dikarin bi çend mînakan mijarê ji nû ve bi bîr bixin.

Hozan stranekê
dibêje. Gurgîn kincan
didirû. Bivir dar birî.
Min nanek da
yeki. Şêroyî zevî
av da. Te ez
bextyar kirim.
Min tuji mêj ve nedîtibûyî.

Min duh zarokê biçûk pir zû ji xew rakir.
Wî zeviya xwe ajot.
Min duh serê sibê hevalek hinarte
Amedê. Darvên êzing anîn.
Şagirtan dersên xwe xwendin.
Bêrîvanê çêleka xwe ya zer dot.

Cureyên hevokan

Dema ku cm qala cureyên hevokan dikin, divê em ji sê aliyan ve bala xwe bidin hevokan: ji aliyê wateyê ve.ji aliyê rewşa pêveberê ve lt ji aliyê avasazî lt pêkhatinê ve. Dema ku mirov ji van aliyan ve bala xwe bide hevokan gelek cureyên hevokan derdikevin pêşberî mirov.

Ji aliyê wateyê ve hevok

Hevok li gorî wateya wê ango peyama ku ji derdikeve tên dabeşkirin. IJer wekî hevokên *"ragihandin?', "fermanî", "navberî", "erênî / neyînî", "pirsyar?', "baneşanî", "divêtî", "bilanî", "karinî" ...* Gelek ji van eureyan me berê di beşa morfolojiyê de hildane dest, li ser wan nirxandin kirine. Li vê derê cm ê hinekên ku me zêde der barê wan de tiştek negotiye, çend tiştan bibêjin.

Hevokên ragihandinî

Hevokên ku der barê rewş **II** tevgerckê de agahî lt ramanekê bi riya ragihandinê didin, hevokên ragihandinî ne. Hevokên ragihandinî bi alîkariya raweyên pêşkeri têne sazkirin.

MÎnak:

Hevalê min duh ji Amedê vegeriya.
Berî sê rojan li vê taxê agir hi sê malan ket.
Ez sibê gazî hevalên xwe yên dibistanê bikim.

Hevokên fermanî

Di van hevokan de fermanek heye, ji yekî yan jî ji hinekan pêkanîna karekî tê xwestin.

Mînak:

Mêvan hatin, derî veke.
Tiştên min ji te re gotin. ji kesî re mehê
je. Zarokên me jf bi xwe re bînin.
Karê xwe zû biqedîne.
Berî tu şîvê bixwî destê xwe
bişo. Dersa xwe biqedînin û
razên.

Hevokên navberî

Ji bo di nava hevokekê de mirov mijarê hê baştir rave bike, peyama xwe hê zelaltir ragihîne muxatabê xwe, mirov hinek hevokên biçûk dixe navberê, jivan hevokan re hevokên navberî tê gotin. Ev hevok dema ku ji nava hevoka mezin bêne derxistin wateya hevokê xera nabe.

Mînak:

Xwedê hez ke, ez ê Îsal herim ber Behra
Wanê. Dûrî haziran, hevalekî min duh qeza
kiriye.
Ehmedê Xanî, Xwedê wî bi bihuşta xwe ya berîn şad bike, bingeha hişmendiya neteweyî danî.

Hevokên erênî

Hevokên erênî diyar dikin ku karê ku lêker radigihîne hatiye kirin, tê kirin an ji dê were kirin. Ev cure hevok bi alîkariya forma erênî ya lêkeran saz dibin.

Mînak:

Şaredariyê li vê derê avahiyeke xweşik çêkir:
Hevalên min dê alîkariya me bikin.
Ez ê roja yekşemê serê sibê zû
rabim.

Carinan bi alîkariya hin gihanekên mîna *"ne ku* ", *"nema* ", *"hew"* neyînî pêk tê.

Mînak:

Ne ku min negot, le guh neda
min. Ne ku tune ye, heye lê ez
nadim te. Ew çû malê û nema hat.
Êdî hew deng ji wan tê, çi bi wan hatiye?

Hevokên neyîniyê

Mijara hevokên neyînî me tevî lêkeran rave kiribû. Her wekî me li wir jî diyar kiribû neyinîbûna lêkeran bi qertafên neyînî, neyînîbûna rengdêr û navdêran jî bi daçekên neyîniyê pêk tê. Ev cure hevok nişan didin ku karê ku lêker radigihîne, nehatiye kirin, nayê kirin an jî dê neyê kirin.

Bo nimûne dema ku em dibêjin *"Min heval dîtin"* em hevokeke erênî saz dikin, lê dema ku cm bibêjin, *"Min heval nedîtin"* wê gavê em hevokeke neyînî saz dikin. Her wiha em dikarin bi alîkariya hin daçek û gihanekan jî hevokeke neyînî bikin erênî yan jî ya erênî bikin neyînî.

Mînak:

Ew hevalekî ne baş
e. Koçer ne şagirt e.
Zîlan keçeke ne jîr e.

Bi alîkariya gîhaneka *"ne ... ne"* em hevoka erênî dikin neyînî.

Ne min ew dîtin, ne jî wan ez dit im.
Ne te xwest, ne jî min da te.

Hevokên pirsyariyê

Ji aliyê wateyê ve cureyekî hevokê jî hevoka pirsê ye. Ev cure hevok bi riya pirsê dixwaze agahiyan wergire, şik û gumananji holê rake. Di van hevokan de her tim pirsek heye, lewre jî divê li hember yekî ku bersivê bide jî hebe. Di kurmancî de hevokên pirsê, dema ku cînavk, hevalnav û hokerên pirsê tune bin, bi alîkariya kirpandinê têne sazkirin. Dema ku hevok bi awayekî gumanbar bê bilêvkirin, hevoka pirsê derdikeve holê. Kirpandina bi guman li ser kîjan peyvê be, tiştê ku tê pirsîn ewe. Ji bo xurtkirina gurnanbariyê daçekên wekî *". gelo, ma, qey"* jî tenê bikaranîn.

ilfînak:

Bi hoker, rengdêr û cînavkan:

Ki ji darê
daket? Çi hate
serê te!

Kurik bi ku de çû?
Bozo li ku ma?
Kîjan hevalî rê nîşanî te
da? Çima fe ji min re
nego!'! Çend zarokan li te
xist? Kîjan şagirti ji te
stand?

Bi kirpandin û daçekan:

Dar hatin kişandin:
Elijî hat?
Zozanê heval birin?
Ma Hecîji malê derket?
Gelo mizgefta gund temam hû:
Ma tu duh nehatibûyî vir?

Her wiha pirsyariya hevokên neyînî jî bi pêşgirên neyîniyê çêdibe.

Mînak:

Dar nehatin kişandin?
Wan firavîn nedabû
çêkirin? We karê xwe
neqedand?
Tu naçî bajêr?

Ji bilî van cureyên hevokan, hevokên xwestekî û hevokên baneşanî jî hene, lê ji ber ku em di mijara raweyan û baneşanê de li ser wan rawestiyabûn, em e dubare li ser ranewestin.

Dîsajî em çend mînakan der barê wan de bidin.

Hevokên xwesteki

Xweziya hevala min bihata.
Xwezila tu neçûyayî wê derê.
Xwaziya ciwanî bi dest mirov biketa.

Hevokên baneşanî

Çi zarokekî xweşik ef
Ew gund çi qas dûr bûye!
Çi *dengekî xweş li ser ef*

Li gorî rewşa pêve berê hevok

Li gorî pêve beran hevok dibin du bir: Hevokên navdêrî û hevokên lêkerî, I ler çi qas di vî warî de zimanzanên kurd ne lihevkirî bin jî li gorî baweriya min di kurdî de ji aliyê rewşa pêvcberê ve du cure hevok hene; *"hevokên navdêrî", "hevokên lêkerî",*

Hevokên navdêrî

Hevokên ku bi alikariya lêkera *"bûn"* û cînavkên kesandinê têne sazkirin û rewşekê nîşan didin *"hevokên navdêrî* ne. Her wekî tê zanîn di kurdî de lêkera *"bûn"* xwediyê du wateyan c; ji wan yek rewşê nîşan dide, ya din qewimîn û guherînekê nîşan dide, hevokên navdêrî bi alîkariya wê *"bûn"a* ku rewşê nişan dide têne sazkirin.

Mînak:

Ez mamoste me.
Ew' hevalekî pirjîr ûjêhatî ye.
Em hevalên hev bûn.

Hevokên Iêkerî

Hevokên ji bilî lêkera *"hûn"* a ku rewşê nîşan dide, çêdibin hevokên lêkcri ne. Di van hevokan de heke lêker gerguhêz be, bi kêmanî sê hêman; *"kirde+bireser+pêveber",* heke lêker negerguhêz be bi kêmanî du hêman; *"kirde+pêveber"* peyda dibin.

Mînak:

Kurik duhji darê ketiye. destê xwe
şikandiye. Ew berî dil salan bû mamoste.
Mamoste duh nex'weş ketiye, lewmajî nehat dibistan .

. Ji aliyê avasaziyê ve hevok

Hevok **j** i aliyê ava saziyê ve jihev cuda dibin, hinek j i wan hevokên xwerû ne, hest û ramaneke tenê vedibêjin. Hinek hevok hene, digel hêmaneke bingehîn, çend hêmanên alîkar di nava xwe de dihewinin. Hinek hevok jî wekî çend hêmanên serbixwe li pey hev rêz dibin.

Dema ku em bibêjin; *"Bozan çû bajêr",* li vir rûdane ke serbixwe heye. Gava em bibêjin: *"Bozan çû bajêr, hevalê xwe dît, wan li xwaringehê firavîn xwar"li* vê derê sê tiştên serbixwe hene. Lê dema ku yek bibêje, *"Ez van daran hûr bikim da ku bînim bavêjim argûni da ku em .\we pê germ bikin.* /1 li vir sê boçûnên têkildarî hev hene.

Hevokên xwerû

Hevokên ku hest û ramaneke tenê rave dikin û bi lêkereke tenê ya kişandî têne sazkirin hevokên sakar (sade) ango *"hevokên xwerû"* ne.

Mînak:

Jiyan xweş e.
Vî karî ez bextewar kirim.
Hewa tarî bûbû.
Min bi destê hevalê xwe girt.
Azad ji dibistanê vedigere.
Mamoste pirsên ezmûnê amade kirine.
Şivên pez aniye cihê mexelê.
Dê îî bavê Zerlnê çûne ser avê.

Hevokên hevedudanî

Dema ku mirov nikare hest û ramanên xwe bi hevokeke tenê der-bibe, mirov dixwaze hest û ramanên xwe bi çend hevokan vebêje. Ev hevok dibe ku hevokên serbixwe bin û bi gihanekan li pey hev rêz bûbin an jî dibe ku çend komek bin û pêk ve girêdayî bin, wan bi vî rengî hevokeke mezin pêk anîbe.

Hevokên hevedudanî yên serbixwe

Her wekî me li jor diyar kir carinan hevokeke tenê têrê nake ku mirov hest û ramanên xwe der bibe, ji bo vê yekê çend hevokan li pey hev rêz dike, wan hevokan bi hinek gihanekan bi hev ve girê dide. Di van hevokan de her hevok serbixwe ye, bi alîkariya bêhnok û gihaneka *"û"* bi ev ve têne girêdan, bi vî awayî hevoka hevedudanî dibe xwediyê hevgirtineke watcyî. Ji ber ku di beşa gihanekan de

me gihanekên ku hevokên hevedudanî pêk tînin jî pêşkêş kiribûn, em ê li vir zêde li ser tiştekî nebêjin, lê dîsa em çend mînakan ji wan bidin.

Mînak:

Ez nikarim li vir bijîm, ev der pir sar e.
Bazên serê xwe dişûşt, Zînê firavîn amade dikir û dayika
wan Meyro Jî li benda hevserê xwe Tacdînî bû.
Zozanê name dixwend û keça wê li televîzyonê temaşe dikir
lî Serheng li odeya din li tembûrê dida.
Dizan ji dizan dizî, erd û ezman tev lerizî.

Hevokên **hevedudanî** yên pevgirêdayî

Hin hevok hene ku çend hevokan di nava xwe de dihewînin. Di hevokên wiha de hêmanekê bingehîn û yeke alîkar heye. Hêmana alîkar her çi qas bi xwe hevokek be jî ji aliyê wateyê ve bi tena serê xwe kêm dimîne. Ji ber ku ew **ji** aliyê wateyî ve girêdayî hêmana bingehîn e. Di kurdî de navê van hêmanên hevoka hevedudanî ya pevgirêdayî *"komek"* e. Ji van hêmana bingehîn ***"şahkomek",*** hêmana alîkar jî *"komeka alikar"* e.

Ev eure hevok ji aliyê wateyê ve bi alîkariya hinek gihanekan bi hev ve hatine girêdan. Hinek gihanekên ku ji bo pêkanîna van hevokan têne bikaranîn ev in: *"lê", "lê belê" "hem ... hem (ji)", "ne .... ne (ji)", "(ylan ... (y)an (jî)", "belkî* ", *"dibe ku,* " *her wekî", "ku".* Ji bilî van, gihanekên sedemî yên mîna *"ji bo ku", ':ji ber ku", "çima ku", "da ku";* gihanekên demî yên mîna *"dema ku", "gava ku", "piştr ku", "beri ku", "çer ku";* amrazên raweyî yên mîna *"divê", "hila", "heke"* ji bo pêkanîna van hevokan têne bikaranîn.

Jl1inak:

Ji ber ku tu nehatî. bavê min destûra çûna minjî neda.

Di vê hevokê de ramana bingehîn beşa duyemîn e, ango *"bavê min destûra çûna min neda"* ye, ramana duyemîn *"tu nehatî"* alîkar e, her du komek bi alîkariya gihaneka sedemîn *"ji ber ku"* bi hev ve hatine girêdan.

Heke te alîkariya min bikira, ez ew qas dereng nedimam.

Di vê hevokê de ramana bingehîn *"Ez ew qas dereng nedimam "* e, *"Te alikariya min bikira"* ramana alîkar e û bi gihaneka mercî *"heke"yê* bi hev ve hatine girêdan.

Min bala xwe dayê ku tu qet baş naxebitî.

Di vê mînakê de *"Min bala xwe dayê"* ramana bingehîn, *"Tu qe! baş naxebitî"* jî ramana alîkar e. Di hevoka jorîn de gihaneka *"ku"yê* ev têkilî daniye. Ji bo zelalkirina mijarê cm dişên çend mînakên din jî bidin:

Çendî min zor dayê Jî. ji cihê xwe neliviya.

Ez bi dûv ketim da kujê re mijarê rave bikim, lê wê qet guh neda min.

Heke tu min bikujî Jî tu nikarî gotinekêji devê min bigirî.

Di mînakên li jorê de gihanekên mîna *"da ku", "heke'I, "çendî .... ji'* wê têkiliyê pêk tînin.

Hin hevok hene ku gelek komekan digirin nava xwe. Hin caran *"kirde", "bireser", "têrker"* û *"pêveber"ên* wanji komekan pêk tên.

Mînak:

Hevalê min î kil duh li vir bû.]! bo ku debara ."-.ve bike, sibê diçe Almanyayê.

Di vê hevokê de şahkomek *"Hevalê min diçe Almanyayê"* ye. Ji bi lî vê şahkomekê, du kornekên alîkar hene. Komeka *"duh li vir bû"* kirdeyê ji aliyê cih û demê ve temam dike. Lewre jî parçeyekî kirdcyê ye. Heçî komeka *'ji bo ku debara xwe bike"* lêkerê ji aliyê sedemê ve temam dike, lewre jî parçeyekî pêveberê ye.

Komek **di** hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî de

Ev hevok bi alîkariya hin parçeyên hevokî tên sazkirin. Her wekî me li jor diyar kir, ji van parçeyên hevokî re di kurdî de *"komek"* tê gotin. Komek ew koma bêjeyan e ku tê de lêkerek heye, di nava hevokeke mezin de cih digire ₒ wateya wê sergihayî dike. Di her hevoka hevedudanî ya pevgirêdayi de divê bi kêmanî du komek

hebin; yek jivan şah parçe ango *"şahkomek"* e ku peyama bingehîn a hevokê radigihîne, ya din jî *"komeka alîkar"* e ku wateya hevokê tekûztir dike. Kakilê van hevokan di şah komekê de ye. Di kurdî de hevokên bi vî rengî bi alîkariya "ku"ya gihanek **II** cînavkên girêki *"ê ku", "a ku", "ên kil"* pêk tên.

Şahkomck

Her wekî me li jor jî diyar kir, *"şahkomek"* peyama bingehîn a hevokan radigihîne. Ew pirî caran rengê hevokeke serbixwe dide. Komekên din girêdayî vê komekê ne ûji wê re dibin alîkar. Di hevokekê de bi tenê yek *"şahkomek"* peyda dibe.

Min nedizanî ku ıı bi dergistî yî.
Karê ku min gOl bikin.
Ew xortê ku me duhî dit xwarzayê te ye.

Komeka alîkar

Ev komek parçeyekî hevokê ye û şahkomekê **ji** aliyekî ve sergihayî û tekûztir dike yan jî bi sînor dike. Komeka alîkar bi tena serê xwe nayê bikaranîn. Ew girêdayî şahkornckê ye.

Mînak:

E:: ditirsim ku venegere.
Ew mastê kil duh min kirî tirş bû.
Ez ê xebata xwe her bikim, heta bigihêjim armanca xwe.

Cureyên komekên alîkar

Komeka alîkar a **ku** hevalnav e:

Ev komek bi mebesta temamkirin û zelalkirina taybetiyên hêmaneke navdêr! ya hevoka hevedudanî têne bikaranîn. Ew bi riya cinavkên girêki *"ê kill a kul ên ku"* bi şah komekê ve têne girêdan.

Mînak:

Mirovê ku min Ii sûkê dîtibû, iro hat vê derê.
Yekemin ferhenga helbestî ya ku der barê zarokan de hatiye nivîsandin, Nûbara Biçûkan e.

Komeka alîkar a ku gihaneka demê ye:

Di hinek hevokan de komek dema lêkera şahkomekê nîşan dide. Ew bi alîkariya gihanekên *"roja kll","dema ku", "gava ku", "çer ku" "berî ku", "piştî ku",* ... pêk tên.

Mînak:

Dema ku min ew dît, hê nûji kar vegeriyabû. Gava ku derî vebû, ew keçika xweşik kete hundir. Roja kil te dest bi kar kir, wî de)! ji kar herda. Çer ku ez dîtim, Rûnê wê zer hû.
Piştî kil ezjî xew rabûm, min taştê xHW:
Berî ku ew were, ez ji malê derkevim.

Komeka alîkar a ku hokera sedemîn e:

Ev komek di hevoka hevedudanî de sedema bûyer rûdanê nîşan didin. Di hevokan de dema ku komeka alîkar sedemê nîşan bide, şahkomek encamê diyar dike. Ev komek bi alîkariya gihanekên *"ji ber ku", "çima ku"* tên sazkirin.

Mînak:

Ji ber ku te alîkariya min nekir, ezji te xeyidîme.
Çima kil min guh neda vir lî derewên wî, wî li bal xelkê zema min kiriye.

Komeka alîkar s ku hokera mebestê ye:

Ev komek mebest armanca buyera di şahkomekê de nîşan dide. Di hevokên xwerû sakar de armanc bi alîkariya hokerên mebestê têne nîşandan, lê di hevokên hevedudanî de mebest bi alîkariya komeka alîkar a ku hokera mebestê ye, tê nîşandan. Gihaneka sereke ya ku vê komekê pêk tîne *"]! ho ku"* ye, lê carinan gihaneka *"da ku"* ji tê bikaranîn.

Mînak:

Ji bo ku em te ji zilma dagirkeran biparêzin, em têdikoşin. Ji bo kil te bibînim, ez ji wî welatê dûr hatime.
Ew hi dizîka hatibû da ku kes wî nebîne.

Komeka alîkar a bi peywira mercê

Bi van kornekan mercên pêkhatina bûyera di hevoka hevedudanî de têne nîşandan. Ev komek bi gîhaneka *"heke"* û *"ku" "ger"* pêk tên.

Mînak:

Heke tu hewl bidî, tu yê bigihêjî armanca xwe. Ku zû were, em ê bigihêjin destpêka film.

Heke tu dixwazî rastiyê bizanî, guh bide gotinên heval li hogiran.

Komeka alîkar a bi peywira dijberiyê

Ev komek ji aliyê wateyê ve dijberî bûyera di şahkornekê de ne. Bi vî awayî nakokiyê nîşan didin. Ev komek jî bi alîkariya *"her çend', "her çi qas"* , *"tevî ku, "raxmî ku" ...* pêk tên .

Mînak:

Her çi qas karê min hebe jî, ez hefa ber malê bi we re werim. Her çend mirovekî xwende be jî. zêde ne zana ye. Ligel ku ew gelekî xebitî jî, bi ser neket.

Komeka alîkar a ku hokera rêje û hejmarê ye

Ev komek di hevoka hevedudanî de rêje, mêjer ci hejmara bûyer ci tevgerê diyar dike. Ev cure komekjî bi alîkariya gihanekên *"heta ku", "bi qasî ku" ...* pêk tên.

Mînak:

Bi qasî ku min karî, min mijar jê re rave kir. Heta ku ji destê min were, ez alîkariva te hikim. Heta kil dikarî w[kevirî dûr biavêje.

RAVEK

Ji bo ravekirina tiştekî pêwîstî bi ravekê (izafc) heye. Di kurmancî de her wekî berê jî em li ser rawestiyan, ravek bi alîkariya veqetandekan pêk tê. Ev veqetandek tiştekî bi taybetiyeke wî **ji** tiştên din vediqetînin. Di ravekê de tiştek *"raveker"* (tam layan! rnodificr)

e. tiştek jî *"raveber"* (tamlananl modified) e. Veqetandek jî dikeve navbera her duyan û wan digihîne hev. Bo nimûne dema ku mirov bibêje, *"bavê Zozanê"* li vê derê pênaseya *"bav": "Zozan"* e. Mirov bi alîkariya *"Zozan"ê "bav"ê* wê nas dike. Veqctandeka *"ê"* jî wan her du serenavan digihîne hev. Ravek bi alîkariya navdêr, hevalnav û cînavkan çêdibe. Her wiha hin hoker û hevokên hokerî jî di ravekê de dibin raveker. Di ravekê de raveber veqetandekê werdigire, raveker jî heke bêjeyeke guherbar be ditew-e.

Mînak:

deri vê
malê apê
ıvî
Ravêkên **navdêran**

Di raveka navdêran de hem rave ber, hem jî raveker navdêr in. Raveker di rewşa tewandî de ye. Bo nimûne di raveka *"riya bajêr"* de navdêra *"bajar"* navdêra *"rê"* rave dike û hatiye tewandin.

Jl1Înak:

xalê Zînê
dara gûzê
mala mêran
destê hevêl
(hevalî) birina dilî
xwarina
zivistanê
gewriya mirovan

Di van minakên jorîn de navdêrên *"raveket",* bi piranî tiştekî bi-navkirî ye. Dibe ku *"ravcker"* tiştekî nebinavkirî be jî.

Mînak:

dara gundiyekî
destên hevalinan
lingê hevalekî
çavên xezalekê
deriyê malekê

Her wiha dibe ku *"raveber"* ncbinavkirî be.

Mînak:

dareke gundiyan
pellne darê
gulîne bêxçe
destekî zarokan
gulî yeke darê
şaxekî çêm

Heta dibe ku her du jî nebinavkiri bin.

Mînak:

darine gundiyekî
gûzeke zarokekî
şagirtine xwendegehekê
birayekî hevalekê
newaline bajarekî
pênûsine mamosteyekê

Raveka hevalnavan

Di raveka hevalnavan de raveker hevalnav û raveber navdêr e. Ji ber ku hevalnavên çawan iyê natewin, di van ravekan de ravek erên ku hevalkarên çawaniyê ne nctewiyaye.

Minak:

porê reş
çavên şîn
pelên hişk
mala şewitî
gundê xopan
çavine zer
dilekî şikestî
mal ine wêran
gundekî xweşik
guhine hel
mala vî hevalî
zeviya vî cot
yarî

xwendina wî bilbilî
hatina çar hevalan
axaftina çend
karkeran xebata du
destebirakan kena
hinekan
roniya kîjan malê?

Raveka cînavkan

Di vê mijarê de tiştek bi alîkariya cînavkan tê ravekirin. Di van ravekan de cînavkên tewandî dibin raveker.

Mînak:

mala min
gundê wan
hevalê te
xwişka me
hevrêya
wî
destê vî
guhên kê?
birayê kîjanê?
dostê hinekan
berxwedana
çaran kurên yekî

Dibe ku raveber nebinavkirî be.

Mînak:
hevalekî min
xwişkeke te
hevaline me
birayine wî
gundiyekî
me

Her wekî tê dîtin hemû cînavk ji koma tewandî ne.

Raveka hokeran

Her wekî me pêşî jî got, hin hokerên eihî ⊔ bcrekê jî dibin raveker. Hokerên cih dema ku dibin raveker, daçek jî dikeve navbera raveker û raveberê.

Mînak:

mirovê li aliyê rastê
keçika lijor
hevalê ji Amedê
birayê min ₑ ku ji Farqînê hatiye
xwişka te ya ku çûbû Germenistanê
rezê li hemberî gund
mala li qûntara çiyê
gula li baxçeyê me

Di dawiya ve mijarê de tiştekî din î ku divêt em li serê rawestin heye. Dema ku hokerên mîna *"paş* ", ,. *pêş* ", *"piş!", "ber* ", *"dûr* ₚ. ., *nêzîk"* bi navdêran 0 cînavkan ve têne girêdan qertafek derdikeve holê. Ew jî qertafa ·'-t""yê ye. Ew qertaf wan hokeran bi cînavk fl navdêran ve girê dide, ango risteke nêzî rista veqetandekê pêk tîne. Dema ku mirov bala xwe didê, mirov dibîne ku berê li şûna wê qertafê daçekên *"li"* ⍞ *"F'yê* hebûne. Nihajî hin caran dîsa *"li"* cihê "-t""yê digire.

Mînak:

forma bi daçek	*bi qertafa /-Îl*
nêzîk li min	*nêzîkî min*
dûrji mala xwe	*dûrî mala xvve*
pişt li wan	*pişt/wan*
tev li te	*tevî te*

Ravekên zincîrîn

Dema raveka tiştekî bi alîkariya çend tiştan bibe, ravekariya zincîri derdikeve holê. Tiştên ku tiştekî din rave dikin, bi alîkariya gihaneka "û"yê digihêjin hev.

Mînak:

hevala çavşîn ₒ porzer
dayika dilşewitî û keserkûr

Yan jî dibe ku bi alîkariya veqetandekekê pêk were.

Mînak:

hevalê bejinzirav ◦ çavşîn
destbirakê lezgîn ◦ bejinkurt ◦ bi kulû keser
keça porzer a destbiçek a li serê lat ◦ zinaran
dayika biçefi ya li pêş
fermandarê çavsor ◦ xwînxwar ◦ zordest
deriyê malê yê mezin ê neqişandî

Divê em bi bîr bixin ku hevalnav bi xwe veqetandekan nagirin, ew veqetandekên navdêr û cînavkan dubare dikin. Ango dema ku em dibêjin, *"Birayê de/al ◦ payebilind"* veqetandeka pişti hevalnava delal *"ê"* ji peyva "bira"yî tê. Li vir du taybetiyên navdêrê bi hev re hatine gotin. Wate, li şûna ku em bibêjin, *"birayê dela/", "birayê payebilind'* me her du bi hev ve girê dane. Her wekî ji mînakê jî diyar e, *"ê"* nîşan dide ku ew navdêr nêr e. Lê em dizanin ku zayenda *hevalnavên resen* nîn e.

Dema ku navdêr bibe ravekera ravekereke din wê demê qertafa veqetandekê diguhêre.

Mînak:

birayê xwişka hevsera
min kilîla deriyê mala apê
min
pelên dara li ber deriyê xalê Hesenî
xebata gundiyên me yên jîrek

Di van ravekan de ji bo ku mirov navdêra destpêkê destnîşan bike, divê mirov veqetandekê ji ravekera wê cuda binivîse. Heke wisa nebe dê wateyeke din derkeve holê.

Mînak:
Kurê apê minê /i bajêr hat.- Kurê apê min ◦ li bajêr hat.

(Di hevoka pêşîn de kesê li bajêr ap e, di ya duyemîn de kurê apê li bajêr e.)

Partiya Azadiya Ge/- Partiya Azadiyê ya Gel

(Di van ravekan de jî, di ravcka yekemîn azadî pênaseya gel c. di raveka duyemîn de *"azadî"* pênaseya partiyê ye.)

Hevalê birayê minê hejinbilindji bajêr hat.- Hevalê birayê min bejn bilind ji bajêr hat.

(Di hevoka yekemîn de kesê bejinbilind bira wî ye, di hevoka duyemîn de kesê bejinbilind hevalê birayê wî ye.)

Di hevokê de cih û peywira ravekê

Hêmanên hevokê carinan ji peyveke tenê pêk tê. Carinan çend peyvên di forma ravekê de hêmaneke hevokê pêk tînin. Ew ravek carinan dibe kirde, carinan dibe bireser, carinan jî dibe têrker. Kêm caran jî dibe pêveber, Ev ravek dibe ku ravekeke navdêrî, ravckcke cînavkî yan jî ravekeke hokerî be.

Ravek weki kirde

Di hîn hevokan de ravek peywira kirdeyê bi cih tîne.

Mînak:

Bavê min derî li min vekir:
Hevalekî qenc alikariya min kil:
Pismamê bavê min mirovekî bîrbir e.

Ravek wekî bireser

Di hin hevokan de ravek dibe bireser.

Mînak:
I Iogir hevalê bavê xwe dît.
Gundiyan qesreke mezin a xweşik li gund ava kir
Hevalê min deriyê mala xwe dadaye.

Ravek weki têrker

Derwêş li her deriyê mala xwe rûniştibû.
Zarok ji mala apê xwe nehatin.
Şivan keriyê pêz li dora gundê delala her dilê xwe çêrand.

Ravek wekî pêve ber

Lozan hevaleke delal e.
Keledoş xwarineke xweş a kurdî
ye. Hogir mirovekî xewar e.

Di hevokên hevedudanî de ahenga deman

Di hevokên hevedudanî de mijareke girîng a ku divê cm lê hûr bibin jî mijara ahenga deman e. Her wekî tê zanîn hevokên hevedudanîji çend hevokan pêk tên û di navbera her du hevokan de ji aliyê demê ve ahengek heye. Hin dem li pey hev tên, hinek li pey hev nayên. Di her du hevokan de carinan dem wekî hev in, earinan ji hev cuda ne. Lewre jî cm ê hewl bidin ku di vê beşê de hinek rêz û rêzikên di vî warî de destnîşan bikin. Pêşî em bala xwe bidinê ka *ev.'* hevokên hevedudanî çend cure ne. Piştre jî em ê bi mînakan ahenga di deman a di navbera hevok **Ii** kornekan de diyar bikin.

Hevokên hevedudanî yên serbixwe

Di van hevokan de, di deman de zêde guhartin pêk nayê. Dema hevoka yekem çi be, ya hevoka duyemîn jî ewe.

MÎnak:

Em ê her roj serê sibê zû ji xew **rabin** û em ê **biçin** dibistanê.

(dema bê) *(dema bê,*
Em her roj serê sibê zıı ji xew **radibin**û em **dicin** dibistanê.

(dema niha) *(dema niha;*
Em her roj serê sibê zû ji xew **rabûn** û em **cûn** dibistanê.

{dema boriva tedevi) *(denu: boriva têdevl)*
Em her roj serê sibê zû ji xew **rabûne** û em **çûne** dibistanê.

{dema borivu dûdar) *(dema boriya dûdar)*
Em her roj serê sibê lû ji xew **radibûn**û em **diçûn** dibistanê.

tdema bortva berdes 1) *(dema bonva berdest)*
Em her roj serê sibê *LÛ* ji xew **rabûbûnli çûbûn** dibistanê.

tçîrok iya dema boriya têdevi)
(çîrokiya dema boriva têdevî)
Em her roj serê sibê zû ji xew **rabûbûne** û **çûbûne** dibistanê.

(çirokiv« dema boriva dûdar) *(çirokiva dema boriya dûdar)*

Hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî

Ev cure hevok j i çend hêmanên pevgirêdayî pêk tên. Ew hêman bi alîkariya hinek amrazên gihanekî digihê] in hev.

Hevokên hevedudanî yên bi gihanekên *"ku"* û *"ka"yê*

Yek ji van amrazan gihaneka *"ku"* ye. Ligel hevokên lêkerên mîna ***"zanîn", "lê nihêrtin", "hal dan", "lê temaşe kirin"ê*** li cihê gîhaneka *"ku"yê* cînavka pirsyarî *"ka"* wekî gihanck tê bikaranîn.

Mînak:

Ez dizanim ku *tu vê çi bibêjî.*

tdema niha) *(dema li;')*

Ez dizanim ku *(u çi dibêiF.*

(dema niha) *(dema niha)*

Ez dizanim ku *le* çi *gor.*

(dema ruha) *tdcmaa boriva tedeyi)*

Ez dizanim ku *le çi gotiye.*

(dema niha; *(dema borivu dûdar)*

Dema ku hevoka bingehîn dema niha be, hevoka alîkar ligorî wateyê bi van demên ku me li jorê diyar kirin re tê bikaranin, bi demên mayî (çîrokiya dema boriya têdeyî, çîrok iya dema boriya dûdar, çîrokiya dema bê e dema boriya berdest) re nayê bikaranîn.

Min dizanî ku *fu vê çi bibêjî.*

ld<'lll(1 1)01'î) *(dema hê)*

Min dizanî ku *tu ci dibêjî.*

(dema bori) *(dema niha)*

Min dizanî ku *fe ci gal.*

(dema bO/'îl *(dema boriya têdeyî)*

Min dizanî ku *te* çi *'!Jolive.*

(dema bori) *(dema boriya dûdar)*

Min dizanî ku *fe çi '!Jolihû.*

(dema borî} *(çirokiva dema boriva tedevit*

Min dizanî ku *tevê ci higo/a.*

Lderna 110/';1 *(çirokiyaa dema bê)*

Dema ku hevoka bingehîn di dema borî de be, hevoka alîkar bi van demên ku me li jorê diyar kirin re tê bikaranîn. Her wekî xuya ye dema ku hevoka bingehîn di dema borî de be, hevoka duyemîn li gorî wateyê dikeve forma hemû deman. Heke gihanek wekî ***"ku"*** bimîne, gava ku lêkera bingehîn biguhere jî, têkiliya deman naguhere.

Mînak:

Min fem kir ku *ew ê çi bike.*

(dema boriva têdevi) *tdemu bê)*

Ez ditirsim ku *ew karê ;n've ni'vce hihêle.*

(dema niha) *(daxwaz: . dema*

Ez ditirsîm ku *ew karê xwe nîvçe hihêle.*

(del/la boriva tedevi) *(daxwazi - dema niha)*

Ez bawer dikim ku *ew ê karê xwe nîvçe hihêLin.*

(dema niha) *(dema*

Min bawer dikir ku *ew ê karê xwe nÎvçe bihêlin.*

{dema boriya berdest} *(dema hêl*

Wî bawer kiribû ku *ez ê karê xwe nîvçe bihêlim.*

boriya çiroki) *(dema bê)*

Gava ku gihanck bibe *"ka"* fl îcar di warê ahenga deman de rewşeke wiha derdikeve holê:

Em bala xwe bidinê ka *ew ê çi bike,*

(R. daxwaz! - dema niha) *(dema hê)*

Em bala xwe bid inê ka *ew çi dike.*

(R. dal wazi - dema niha) *tdema niha)*

Em bala xwe bidinê ka wî *çi kiriye.*

(R. daxwazi - dema niluu *(dema boriva dûdar)*

Bi hevoka bingehîn em *"hala xwe bidinê ka"* re ev demên ku me li jorê rêz kirine tên bikaranîn. Demên mayî (dema boriya têdeyî, dema boriya berdest. çîrokiya dema boriya têdeyî, çîrokiya dema boriya dûdar) nayên bikaranîn. Dema ku hevoka bingehîn dikeve forma daxwazî, hevoka alîkarî jî dibe çîrokiya dema bê.

Her wekî;

Me bala xwe bidayê ka *wî vê* ci *bikara.*

(R. daxwoz! - dema niha) *(dema hû)*

Ev rêzika me diyar kir ji bo mînakên din ên li xwarê jî derbas dibe.

Em ê fêm bikin ka ew ê bi ku de biçe.

tdcma hê) *(dema hû)*

Em binêrin ka *ew ê <"mva bixebite.*

tdaxwazi - dema

(dema hê)

Em binêrin ka *çi dike.*

tdaxwazî dema niha) tdema

Her weki ji mînakan jî diyar dibe, dema hevokên bingehin diguhere, lê dema hevoka alîkar bi du awayan derdikeve pêşberî mirov; di forma daxwazî-dema niha de yan jî di forma dema bê de. Di mînakên *"em binêrin". "em hala bidinê"* de hevoka alîkar dikeve forma dema niha jî. Di her du hevokên dawin de hevoka bingehîn di dema borî de ye, ji aliyê wateyî ve mirov tê digihêje ku bikir karê xwe nîvçe nehiştiye, ango ev bawerî pûç derxistiye.

Hevokên hevedudanî yên **bi** lêkerên alîkar

Hinek hevok bi lêkerên alîkar pêk tên. Ev lêkerên alîkar ên ku di hevokên hevedudanî de derdikevin pêşber! me sê heb in; *"xwestin", "karîn" ◻ "kirin".* Ji van, lêkera *"kirin"* dema bê ya nêzîk ◻ çîrokiya "vê pêk tîne. Lêkera *"karîn /şiyan"* raweya *"karÎn"ê* pêk tîne. Lêkera *"xfi'estin"ê* jî peywireke nêzî ya lêkerên din bi cih tîne ku mirov dikare wekî raweya xwestekî bi nav bike. Di van hevokan de komeka duyemîn bi gelemperî di forma dema niha ya raweya daxwaziyê de ye. Bi tenê dema ku lêkera *"xwestin"* li gorî raweya daxwazî-pêknehatî hatibe kişandin, lêkera komeka duyemîn dibe raweya daxwazî-dema borî.

Mînak:

Xwestin

Ew ê bixwaze biçe dibistanê. Ew dixwaze biçe dibistanê.

Wê xwest biçe dibistanê.
Wê xwestiye biçe dibistanê.
Min dixwest biçim dibistanê.
WÎ xwestibû biçe dibistanê.
WÎ yê bixwesta biçûya dibistanê. WÎ yê bixwesta biçe dibistanê.

Karîn

Ew ê bikare malê ava bike.
Ew dikare malê ava bike.
Wê karibû malê ava bike.
Me yê karîbûya mal ava bikira.

Kirin

F::: dikimji malê derkevim.
Min dikiraji malê derketama.

Di van hevokan de dema hevoka bingehîn diguhere. Iê dema hevoka alîkar di forma raweya daxwazî-dema niha de ye. Dema ku hevoka bingehîn dikeve forma raweya daxwazî-pêknehatî. hevoka alîkar jî dibe raweya daxwazî-pêknehatî.

Hevokên hevedudanî yên bi cînavkên girêkî

Hin hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî bi alîkariya cînavkên girêkî *"ê ku", "a ku", "ên ku"* pêk tên. Di van hevokan de jî demên her du komekan hev û din digirin. Hin earan di hevoka duyemîn de ji bo vegotina bûyereke pêknehatî, dema bê tê bikaranîn.

Lawikê *ku niha derhas dibe.* biraziyê min e.

(dema 111ha) *ulema niha)*

Lawikê *ku niha derhas bû.* biraziyê min bû. (' *biraziyê min e"* jî tê gotin.) *(dema hu* rim *têdeyi)* *tdema boriya têdcvi)*

Lawikê *ku niha derbas dibe.* diçe mala me.

tdema niha) *tdema niha)*

Lawikê *ku niha derbas dibe.* dê biçe mala me.

tdema niha) *tdema bê)*

Barana ku dê Isal bibare, dê hi kêrî me were.

(dema bê)

(dema bê)

Barana *kıl İsal dibare,* bi kêrî me tê.

tdema nihat *t dema nihat*

Barana *ku İsal dibare.* dê bi kêrî me were.

(derna niha) *idema bê)*

Barana *ku İsal bari,* bi kêrî me hat.

(D.B têdeyî) *({).R_I~deyil*

Karê *ku min heta niha kiriye,* beredayî çûye.

ro. B. dûda«) *(DB dûdar)*

Karê*kıl wî heta hingê kiribÜ,* beredayî cûbû.

(D.8 çirakı) *r0.n. çirokî)*

Barana *ku ji hingê bi şlîn de bibariya dê* bi kêrî me nehata.

(daxwazî - pêknehatî) *(daxwazî - pêknehatî)*

Di van hevokan de jî di navbera beşên hevokê de ji aliyê demê ve ahengek heye. Bi piranî di beşa pêşîn de çi dem hatibe bikaranîn, di beşa dawin de jî heman dem hatiye bikaranîn; ligel dema niha dîsa dema niha, ligel demên borî (tedeyî, dûdar, çiroki) dîsa demên borî hatine bikaranîn. Lê belê carinan ligel dema niha dema bê hatiye bikaranîn. Her wiha ligel raweya daxwazî- pêknehatî jî dîsa daxwazî-pêknehatî hatiye bikaranîn.

Hevokên demê

Di van hevokan de komeka alîkar dem **li** heyamê, têkiliya demî ya her du bûyeran nîşan dide.

Ji bo diyarkirina dem **li** rêza bûyerê gihanekên mîna *"dema ku", "gava ku", "piştî kil", "berî ku" ...* têne bikaranîn.

Dema kıl ew were ez ê jê re bibêjim.

tdaxwazi- dema niha} *(dema bê)*

Gava ku ew hat, ez *ê jê re bibêjim.*

it: fl têdevi) *(dema he)*

Dema ku ew hat. min jê re got.

ID.8 harim têdevi) *(dema bortya trdeyî)*

Gava ku ew bihata. min ê jê re bifota.

tdaxwazî - pêknehati) tçirokiva dema be)

Di van hevokan de ahenga deman li gorî rêza pêkhatina bûyeran e. Kîjan bûyer pêşî, kîjan piştre diqewime, dema beşên hevokê jî li gorî wê diguhere. Lewre ji carinan hevoka pêşîn raweya daxwazî-dema niha ye, beşa duyem a hevokê di forma dema bê de ye. Dî van mînakan de her du hevokên pêşîn ji aliyê wateyê ve nêzî hev in û li şûna hev têne bikananîn.

Di hevokên din de, di her du beşên hevokê de heman dem hatine bikaranîn. Di hevoka dawîn de qala tiştekî pêknehatî tê kirin. *"Gava ku bihata. min jê re bigota."* Ji vê hevokê ev wate derdikeve. *"Ew nehat. min jê re negot."* Di hevokên li jor de mînakek heye ku xweseriya kurdî nîşan dide, di mînaka duyemîn de her çi qas hevoka bingehîn *"ez jê re bibêjim"* dema bê be jî, hevoka alîkar *"gava ku hat"* di di forma dema boriya têdeyî de ye.

Di hin hevokan de her du bûyer li pey hev tên, yek pêşî diqewime ya din jî piştî wê tê. Ev cure hevok hin earan bi *"dema ku", "gava ku"* pêk tên.

MÎnak:

Dema ku ew were. ez ê ji malê derkevim.

(daxwazî Cl. niha) *(dema hê)*

Dema ku el<i' haf. bÎl'avê wî ji malê derket.

(JHI tedevi) *(dema harim têdevi)*

Dema ku e\v hllt. biral'f.~ wî ji malê derdiket.

fD.B têdevi) *tclema boriva berdest}*

Dema kıl el-\! *hat. biravr:.;* wî *ji malê derketibû.*

(D.B. têdeyî) *(cîrokiya dema boriya tedevî)*

Di van mînakan de, di hevoka yekemîn de mereek heye, derketinaji malê girêdayî hatina wî ye. Di hevokên din de ji aliyê demê ve têkiliyek di navbera her du beşên hevokê de heye. Di hevoka

"hat-derket" de her du bûyer ligel hev pêk tên. Di hevokên *"hat-derdiket"* de dema ku bûyera pêşîn pêk hat, a duyemîn hê dom dikir, di hevoka *"hat- derketibû"* de bûyera derketinê berî bûyera *"hafin"*ê pêk hatiye.

Hevokên bi vî rengî bi piranî bi alîkariya gihanekên *"berî ku", "piştî ku"* pêk tên. Bi gîhaneka *"berî ku"* em hevokên ku bûyera komeka duyemîn pêşî, bûyera komeka yekemîn paşê pêk tê, nîşan didin.

Berî ku ew were rnalê. ez ji malê herim.

(daxwazî - del/la niha) *(daxwazi - dema IIi",,)*

Berf ku ew were malê. ez ê ji *malê herim.*

(daxwaz! - dema niha) *(dema he)*

Berî ku eH! were malê. ez ji malê diherim.

(daxwaz! - dema niha) *(dema niha)*

Berî ku evv were malê. ez ii malê cûm.

tdaxwazî-dcma niha) (dema boriya tedeyî)

Berî ku ew were malê. ez ji malê çûme.

(daxwaz- dema niha) (dema boriya dûdar)

Berî ku ew bihata malê. ez ê ji malê biçûma.

(daxwazi-pêknehatî} *(çîrok iya dema be)*

Di van hevokan de beşa pêşîn a hevokê bi gelemperî di forma raweya daxwaziyê - dema niha de ye. Dema ku ew dibe raweya daxwazî -pêknehati, hevoka duyemîn dibe çîrokiya dema bê. Di kurmancî de cm nikarin bibêjin, *"Berî ku hat.* ez *ji vir herim. "* Formeke wiha di kurmancî de nîn e. Hin hevokjî bi gihaneka *"piştî ku"* pêk tên. Di van hevokan de pêşî bûyera komeka yekem, piştre bûyera komeka duyem pêk tê.

Piştî kil hiravê min were. ez jê re bibêjim.

(dw:II'aZî - dema niha) (daxwazî - dema niha) Piştî ku hirayê min hat. ez,iê re bibêjim. (dema boriya têdevi) (daxwazî- dema niha)

Pişti ku birayê min hat. ez ê jê re bibêjim.

(dema hor iya têdeyi) *(dema hê)*

Pişti ku birayê min hat. ez jê re dibêjim.

(dema boriya têdeyi) *(dema niha)*

Pişti ku hirayê min hat. min jê re got.

m.B. têdevi) *(D.B. têdeyi)*

Pişti ku hirayê wî hatiye. wî jê re gotiye.

(D.B. dûdar) *(D. B dûdar)*

Pişti ku birayê wî hatibû. wî jê re f(otibû.

(D.B. çiroki) *(D. B çîroki)*

Pişti ku bira)/ê wî dihat. wî jê re lligot.

(D.B. berdest) *(!J.B berdest)*

Pişti ku birayê min bihata. min ê jê re bigota

(daxwazî - pêknehatî) *(çîrokiya dema bê)*

I ler wekî **ji** mînakan jî diyar dibe, di hevokên wiha de heke bûyera duyemîn pêk hatibe ango di dema borî de be, lêkera berî wê jî di heman demê de ye. Lê heke bûyera duyemîn hê pêk nehatibe, dema lêkera pêşî li gorî mebesta bikir diguhere.

Hin caran hevokên alîkar ast û radeyê nîşan didin, ew jî bi alîkariya *"heta ku", "ta ku"* pêk tê.

Ileta ku birayê min neyê. ez ê ji vir neçim.

(daxwazi- dema niha) *(dema hê)*

Heta ku tu werî vir. ez ê jî ji Mêrdînê vef:erim.

(daxwazî- dema niha) *(dema bê)*

Heta ku ew ji gund hê. kes ji yir naçe.

tdaxwazi- dema nihar *(dema ıı iha)*

I Ieta ku tu ji 'i,;und hatÎ, tistek li vîr nema.

(dema boriya têdevi) *(Dema boriya têdevî)*

Heta ku ew ji gund hatiye, tistek li vir nemaye.

(elema boriva dûdar) *(Dema borivu dûclar}*

Hela ku ew ji gllnd hatihû. tistek li vir nemabû.

(deli/il harim çiroki) *(Deli/li boriya çimkî)*

Heta ku tll ji fJlmd biha/avî. tistek dê li vir nemava.

(davwazî-peknehati) *(çirokiva d('1/111 hê)*

Heta ku berpirsek ber5;iva pirsa min bide. ez ê li vi!' rûnim.

(daxwazi- dema lli/IG) *(dema hê')*

Heta ku berpirsekî bersiva pirsa min bida. ez ê li vi!' rÛnistama.

(daxwazi-pêknehatî} *{Ç'îrokl)'a dema hêj*

Di van hevokan de pştî dema niha ya raweya daxwazî dema bê yan jî dema niha tê. Heke lêkera pêşî di forma daxwazî - pêknehatî de be, lêkera pştî wê jî dikeve forma çîrokiya dema bê. Dema ku buyera duyemîn di dema borî de be, dema beri wê jî di forma heman demê de ye. Heke lêkera duyemîn di forma dema niha de be ji, lêkera pêşîn dîsa nakeve forma dema niha, li şûna wê raweya daxwazî - dema niha tê bikaranîn. Wate, em nikarin bibêj in, *"Heta tuji gund têyî, kes li vir namîne."* Li şuna wê divê em bibêjin, *"Heta ku tuji gund hêyî, kes li vir namîne."*

Hevokên diyarkirina armancê

Ji bo diyarkirina sedem *il* armancê gihanekên mîna *"j! ho ku", "ji ber ku", "çima ku", "bi sedema ku" ...* tên bikaranîn. Di wan de jî ahenga deman bi vî rengî ye.

Ji bo ku ew hiçe Amedê, ('H' ê li halafirê shi'ar bibe.

(llo-,\1'(/:::;î- dema niha) *(Dema hê)*

Ji bo ku ni' bice Amedê, li halafirê siwar dibe.

(daxwazi- c!t>l/111 niha) *(Dema niha)*

Ji bo ku ew biçe Amedê. li balafirê siwar bû.

(Dema boriva têdevî)

(daxwazî- dema niha)

Ji bo ku eY\! biçe Amedê. li balafirê si~i'ar bûve.

tdaxwazi- dema niha) *(Dema boriva dûdar)*

Ji bo ku ew biçe Amedê. li balafirê siwar bûbû.

(daxwazî - dema niha) (Çîrokiya dema boriya têdeyi)

Ji bo ku ew biçÛya Amedê. dê li ba/afirê siwar bibûya.

(daxwazî- dema niha) (Çîrok iya dema boriya têdeyî)

Ji bo ku ew biçûya Amedê. li balafirê siwar dibû.

(daxwazî- pêknehati) (dema boriya berdest)

Ji bo ku ew biçLÎva Amedê. li balafirê siwar bûbû.

(daxwazî- pêknehatî) (Çîrokiya dema boriya têdeyî}

Di van hevokan de hevoka pêşîn her tim di forma raweya daxwazî- dema niha de ye, dema hevoka duyemîn li gorî dem cı mebesta *"bikir"* diguhere. Heke lêkera yekemîn bikeve forma raweya daxwazî- pêknehatî, lêkera duyemîn dikeve forma çîrok iya dema bê, dema boriya berdest cı çîrokiya dema boriya têdeyî. Di hin hevokên scdemin de jî ji armancê wêdetir, hincet tê nîşandan. Ev cure hevok bi alîkariya *"ji ber ku"* tên sazkirin.

Mînak:

Jj bel' ku ez ê biçim Amedê. ez ê iro biçim balaOn;ehê.

(dema bê) (dema bê)

.Ji ber ku e:: ê biçim Amedê. e:: diçim halafirgehê.

(dema bê) (dema niha)

Ji ber ku ez diçim Amedê. e::. ê biçim ba/afirgehê.

(dema nthu) (dema bê)

Ji her ku ez diçim Amedê. ez diçim balafirgehê.

tdcma niha) tdema niha)

Ji her ku ez diçÛm Amedê. ez diçÛm balafirgehê.

(dema boriva hen/esl) (dema boriva berdest)

Ji her ku e:: diçÛm Amedê. e:: ê hiçûma balaf;r~ehê.

(dema b"";1"<1 berdest) (çirokiva dema hê)

Ji ber ku e:: ê hicÛma Amedê. ez ê biçÛma balafirgehê.

(çirokiya dema bê) (çirokiya dema bê)

Ji ber ku ez ê biçûma Amedê. ez diçûm balafirgehê.

(çlrokiva "mIG bê) *(dema boriya berdest)*

Ji ber ku ez diçûm Amedê. ez ê biçûma balafirgehê.

(dema boriva berdest) *(Çîrokiva dema 1,,;1*

Di van hevokan de jî di navbera demên her du beşên hevokê de ahengck heye. Bi gelemperî her du demên beşên hevokê yek in. Lê hin demên ji hev cuda li pey hev tên. Her wekî; dema niha ci dema bê ligel hev têne bikaranîn. Her wiha demên borî û çîrokiya dema bê jî ligel hev tên bikaranîn.

E::. ê Îro herim nexweşxanevê. da ku hevalê x}ve bibînim.

(dema 6,}1 *(daxwazi - dema niha)*

Ez Iro diçim nexweşxaneyê. da ku hevalê xwe bibînim.

(dema niha) *(daxwazî - dema niha)*

Ez Îro çÛm nexweşxaneyê. da ku hevalê .nve bibÎnim.

ı daswazi - dema niha)

(dema boriya têdeyî)

Ez Iro çUbUm nexweşxaneyê. da ku hevalê xwe bibînim.

(Ç lrokiya dema boriya têdeyi) *(daxwazî - dema niha)*

E::. ê Îro biçÛma nexwesxaneyê. da ku hevalê xwe bihÎnim.

(daxwaz] - deli/al/iha)

(çirokiya dema bê)

Di van hevokan de dema hevoka pêşî diguhere, lê dema hevoka duyemîn her tîm di forma raweya daxwaziyê- dema niha de ye.

Hevokên diyarkirina mercê

Her wekî tê zanîn raweya mercî bi alîkariya amrazên mercî *"heke"* ci *"ku"yê* lê sazkirin.

Heke ez biçim Amedê. ez ê wî bibim.

(mercî - dema niha) *(dema be)*

Di vê hevokê de karekî ku dê pêk were heye. Ango di vê hevokê de hckanî raweya pêşkerî ye.

Heke wî ez dWbim. ew ê bibêje.

(daxwazî -dema borî) *tdema hê)*

Heke ew çûbe, divê dîtibe.

(daxwazî - dema ban] (Daxwazî- dema borî)

Heke e\V ketibe xewê, dibe ku wÎ deri girtibe

(daxwaz! -dema borî) *(daxwazî - dema borit*

Ku em biçûna Amedê, me yê şahiya Newrozê bidÎta

(daxwazî-pêknehatî) *(çirokiya dema bê)*

Di vê hevokê de lêker daxwaziya dema borî ye. Di vê hevokê de qala karekî ku pêk nehatiye û dem di ser re derbas bûye, tê kirin.

Ku ew çûbûm Amedê, dê hevalê xwe dîtibÛya.

(daxwazî- dema hor iya dûr) *(çirokivu dema bê Il)*

Di kurdî de hevoka veguhastî

Di hevokên hevedudanî de mijareke din jî mijara *"hevokên veguhastî"* ye. Ev eure hevok zêdetir di nûçeyan de tên bikaranîn. Ev hevok bi alîkariya lêkera *"gotin"ê* tên sazkirin. Lêkera *"gotin"ê* bi gelemperî di forma demên borî: de ye, lê hin caran di forma dema niha de jî derdikeve pêşberî mirov. Hevokên veguhastî du cure ne; *"hevoka veguhastî ya yekser"* û *"hevoka veguhastî ya neyekser".* Hevoka veguhastî ya yekser di nava dunikan de tê nîşandan. Ew bûyer ji devê bêjerê/a xwediyê gotinê tê dayîn.

Mînak: *Zozanê got: "Ez ê herim mala apê xwe."* Hevoka veguhastî ya neyekser ji devê bêjerê/a veguhêzer tê nivîsandin. Ev cure hevok bi *"ku"yê* ji hevoka din vediqete. Her wiha di hevoka duyemîn de kes jî diguhere. Bo nimûne, *Zozanê got, "Ez ê herim mala xwe." "Zozanê got ku ew ê here mala xwe."* Ji bo zelalkirina mijarê dê çend mînak bes bin.

Heke lêkera *"gotin"ê* di forma dema bê û dema borî de be, hevok wiha saz dibin:

Hevind dibêje, "Ez ê birayê xwe bibînim. "

(dema niha) *(dema hê)*

Hevind dibêje ku ew ê birayê xwe bibîne.

(dema niha) *(dema hêj*

Hevind dibêje. *"Ez birayê xwe dibînim. "*

(dema niha) *[dema niha}*

Hevind dibêje ku ew birayê xwe dibîne.

(dema niha} *(dema "iha)*

Hevind dibêje. "Min birayê xwe dît. "

(dema niha) *(dema boriya têdeyî)*

Hevind dibêjekil wi biravê xwe dilive.

(dema niha} *(dema boriva dûdar}*

Hevind dibêjekil wî hirayê xwe didît.

(dema niha) *iiletnu harim berdest)*

llevind dihêle ku wî bimvê xwe bidÎta. dê jê re bi~ota.

(dema niha) *(cim 11'(1:;; I'U,I/el/luil* *(çîrokiva dema bê,*

llevind dibêje ku wî bimrê xwe dirihûya. dê jê re gotihûm.

(dema niha) *(daxwazi- del/la boriva dûr)* *tçîrokiva dema 1,,;)*

Her wekî ji mînakan jî diyar c di dema borî de, hevoka veguhastî ya neyekser ji aliyê demê ve ji hevoka veguhastî ya yekser cuda dibe . .li ber ku veguhêzer bi xwe nedîtiye, nikare dema boriya têdeyî bi kar bîne, li şûna wê dema boriya dûdar bi kar tine.

Heke lêkera *"go/in"* di forma demên borî de be:

Di zimanê nûçegihaniyê de bi piranî forma *"got", "got ku"* tê bikaranîn. Dema ku bûyer berî bûyereke din pêk hatibe, îcar ji bo vegotina bûyera kevntir çirokiya dema boriya têdcyi *"goti/JI?', "gotibû ku"* tên bikaranîn. Heke bêjer bi xwe nebûbe şahidê bûyerê, wê demê dema boriya dûdar, *"goliye"* ◻ *"gotiye ku"* bi kar tîne.

Lêkera *"gotin"* di forma dema boriya têdeyi de:

Hevind; ji Zozanê re eOl,"Ez ê birayê xwe bibînim. ,.

(dema boriya têdeyîj (dema bê)

1Je\'indi ji Lo::anê re f:0tku ew ê bimrê xwe bibine.

(dema bortva IJd"l'i) *tdema bê)*

HevindÎ ji Zozanê re got. "Ez himvê xwe dihÎnim. "

I dema boriya têdcyi) (dema niha)

HevindI ji Zozanê re got ku ew birayê xwe dibîne.

(dema boriva têdeyi) *(dema niha)*

JlevindI ji Zozanê re got, "Min biravê xwe dît. "

(dema boriya têdeyi) (dema boriya têdcyi)

Hevindî ji Zozanê re got ku wi birayê xwedîtive.

(dema boriya têdeyi) *identa boriya dildar)*

I1evindî ji Zozanê re got. "Min ew bidIta ez ê kêfxwes bÛbûma. "

(dema boriya têdeyî) (daxwazi - pêknehatî]

Hevindf ji Zozanê re gO! ku wî ew bidita ew ê kêfxweş hûbûva.

(dema boriva têdevi) t daxwuzi - pêknehatî)

HevindI ji Zozanê re got. "Min ê birarê TIre bidrta. "

(dema boriya têdeyi) (çirokiya dema bê)

f levindI ji Zozanê re got ku wî yê biravê xwe bidîta.

(dema boriya têdevi) (çîrok iya dema bê)

Di van mînakan de jî guhartin bi tenê di dema boriya têdeyî û çirokiya dema boriya têdcyi de pêk tê. Her wekî mînakên din di vir de jî dema boriya têdeyi ya hevoka yekser di hevoka veguhastî de dibe dema boriya dûdar. Her wiha çîrokiya dema boriya têdeyî ya hevoka yekser jî di hevoka veguhastî de dibe çîrokiya dema boriya dûdar.

Lêkera *"gotin"* di forma dema boriya dûdar de

Bêjerê/a vê bûyerê, bûyer ji hinekên din bihîstiye ango hinekan jê re gotiye. Di van mînakan de jî bi tenê dema boriya têdeyi ya di hevoka yekser de, di hevoka veguhastî de dibe dema boriya dûdar. Her wiha çîrokiya dema boriya têdeyî, di hevoka veguhastî de dibe çîrokiya dema boriya dûdar.

IIogirÎ ji Zozanê re gotiye. "Em ê li ber sÎnemayê hev bibînin. "

(dema bori ya dûdar I (dema bê)

[{agirt ji Zozanê re gotiye ku ew ê li her sînemayê hev bibînin.

(dema boriya dûdar) (dema bê)

Hogirî ji Zozanê re f:0tiye. "Em li ber sînemayê hev bibÎnin. "

(dema borî ya dûdar) (raweya daxwazî - dema niha)

Hogirî ji Zozanê re gotiye ku ew li ber sInemayê hev bibfnin.

(dema boriya dûdar) (dax", 371 - dema niha)

Ho~irf ji Zozanê re gotiye, "Me li ber sînemayê hev dff. "

(dema boriya dûdar) (dema boriya têdeyi)

Hogirf ji Zozanê re gotiye ku wan li ber sînemayê hev drtiye.

(dema boriya dûdar) (dema boriya dûdar)

Hogirf ji Zozanê re f:otiye, "Me li ber sînemayê hev dîtiye. "

(dema boriya dildar) (dema boriya dûdar)

HOf:irî ji Zozanê re gotiye ku wan li ber sînemavê hev dîtive.

(dema boriya dûdar) (dema bori ya dûdar)

Her wekî ji mînakê diyar dibe, di vir de dema her du forman dibe yek.

Hogirî ji Zozanê re gotiye, .. Me li ber sfnemayê hev dîtibû. "

(dema boriya dûdar) (çirokiya dema boriya têdeyî)

Hogirî ji Zozanê re gotiye ku wan li ber sînemayê hev dîtibûve.

(dema boriya dûdar) (çirokiya dema boriya dûdar)

HOf:iri ji Zozanê re gotiye, "Me li ber srnemayê hev bidî/a. "

(dema boriya dûdar) (daxwazî- pêknehatî)

Hogirî ji Zozanê re gotiye ku wan li ber srnemayê hev bidîta.

(dema boriya dûdar) (dax wazî - pêknehatî)

HOf:irî ji Zozanê re gotiye, "Me li ber sînemayê hev dftibUya. "

(dema boriya dûdar) (daxwazî - dema boriya dûr)

Hogirî ji Zozanê re gotiye ku wan li ber sînemayê hev dîtibûya.

(dema boriya dûdar) (daxwazî- dema boriya dûr)

Dema ku lêkera *"gotin"* dibe çîrokiya demên borî *"gotibû"*

Tu guherîn di komeka duyemîn de çênabe, em dikarin mînakên berê ji bo wê jî bi kar bînin. Di mînaka pêşîn de hevoka duyemîn, di forma raweya daxwaziyê dema niha de ye û hevoka mezin ji aliyê wateyî ve nîvçe dimîne, lewre hevokeke sêyemîn di forma dema bê de li pey wê tê.

Hogirî gotibû, "Ez herim ba hevalan, ez ˛kêfxweş bibim. "
Hogirî gotibû ku ew here ba hevalan, ew ˛kêfxweş bibe.

Hogirî gotibû, "Ez herim ba hevalan. "
Hogirî gotibû ku ew here ba hevalan.
Hogirî gotibû, "Ez diherim ba hevalan. "
Hogirî gotibû ku ew dihere ba hevalan.
Hogirî gotibû, "Ez çûm ba hevalan. "
Hogirî gotibû ku ew çûye ba hevalan.
Hogirî gotibû, "Ez çûbûm ba hevalan. "
Hogirî gotibû ku ew çûbûye ba hevalan.
Hogirî gotibû, "Ez biçûma ba hevalan. "
Hogirî gotibû ku ew biçûya ba hevalan.
Hogirî gotibû, "Ez çûbûma ba hevalan. "
Hogirî gotibû ku ew çûbûya cem hevalan.

Lêkera *"gotin"* di forma çîrokiya dema boriya dûdar de

Ev form pir kêm tê bikaranîn, dema ku bûyerek di demeke pir kevn de hatibe gotin, me ji hinekan bihîstibe, *"gotibûye"* tê bikaranîn. Her wekî ji mînakan jî diyar e, em dikarin beşa duyemîn a hevokê bi hemû deman bikişînin.

Xezalê gotibûye, "Ez werim mala we dê baş bibe.
" Xezalê gotibûye ku ew were mala me dê baş
bibe. Xezalê gotibûye, "Ez werim mala we. "
Xezalê gotibûye ku ew were mala me.
Xezalê gotibûye, "Ez têm mala we. "
Xezalê gotibûye ku ew tê mala me.
Xezalê gotibûye, "Ez hatim mala we. "
Xezalê gotibûye ku ew hatiye mala me.
Xezalê gotibûye, "Ez hatime mala we. "
Xezalê gotibûye, ew hatiye mala me.
Xezalê gotibûye, "E::. hatibûm mala we.
Xezalê gotibûye ku ew hatihûye mala me.
Xezalê gotibûye, "Ez dihatim mala we, "
Xezalê gotibûye ku ew dihate mala me.
Xezalê gotibûye, "Ez bihatama mala we, min tu biditayî. "
Xezalê gotibûye ku ew bihata mala me, wê yê ez bidîtama.
Xezalê gotibûye, "Ez hatibûma mala we, min tu dîtibûya. "
Xezalê gotibûye ku ew hatibûya mala me, wê yê ez dîtibûma.

Rêzbûna bêjeyan

Em heta niha li ser cureyên bêjeyan rawestiyan, lê gelo di kurdî de bêje çawa rê? dibin? Li ser vê yekê heta niha xebateke berfireh nehatiye kirin. Di hevokên kurmancî de bi giranî *"kirde"* di destpêkê de, *"lêket"* li dawiyê cih digire. Heke bireser hebe, ew dikeve navberê. Lewre jî di kurdî de rêzbûna bêjeyan bi gelemperî bi *vî* rengî *"KB!,"* ye. Lê di hin hevokan de *"lêker"* piştî *"kirde"yê* tê. Hevokên ku bi lêkerên negerguhêz pêk tên û hokerên wan daçekan nagirin hevokên bi vî rengî ne.

Mînak:

E:: diçim dibistanê.
Em hatin mala bavê xwe.
Hevalê min kete bin barekî giran.
Hûn derketin derveyi malê. Lawik
hilkişiya ser banî.
Ew dakete jêr.
Em rûniştin xwarê.

Lê dema ku daçek bikeve ber hokera cihî, lêker diçe dawiya hevokê.

MÎnak:

Ezji mala bavê xwe têm.
Ew dê li malê binive. Hûnji
dibistanê derketin. Em li
xwarê rûniştin. Sorgul ji
ser banî daket.
Evîn di nav daristanê re derbas dibe.
Ew bi lez û bezji malê derket.
Ilogir ber hi dibistanê ve diçe.

Di hevokên bi lêkerên gerguhêz de lêker li dawiya hevokê cih digire. Rêzbûna bêjeyan di hevoka xweru (sade) de bi awayê *"kirde, bireser û lêker"* rêz dibe.

Ez xwarinê dixwim.
Ez te dibin im.
Hawar pirtûkê dixwîne.
Serdêr ko mp . terek
kirî.

Wi derman xww~
Zozanê name
nivîsand. Xunavê deri
vekir:
Serwer li dersa xwe
dixebitî. SÎnemê çîrokek
digot.

Di kurmancî de birên hevokê li gorî rêzanekê rêz dibin, ew rêz jî rêza pêkanîna kar û pêkhatina bûyerê ye. Bûyer kengê, li ku bi kê û bi çi dest pê dike, heta ku diçe û bandorê li çi dike; di encamê de digihêje ku, çi encamê bi xwc re tîne ... Bêjeyên hevokê jî li gorî vê rêzanê rêz dibin. Her wekî me di beşa watenasiyê de destnîşan kiribû, di hevokê de hêmanên cuda hene.

Di hevokê de beşên mîna *"bikir", "pêkir", "navgîn"* û *"armanc"* hene. Li goti vê yekê, dema ku em dibêjin, *"Zarokan kevir avêt"* lêker di vê hevokê de tevgerekê nîşan dide. Dema ku mirov ji aliyê karîgeriya wateyî ve li vê hevokê binêre, dibîne ku *"zarok"* li vir *"bikir"* in, *"kevir"* di vê hevokê de *"pêkir"* e. Dema ku em bibêjin, *"Zarok kevir bi destê çepê avêt"* li vê derê *"destê çepê"* navgîn e. Dema ku di lêkerê de bizaveke çalak nîn be, wê demê *"jiyer"* cihê *"bikir"* digire. Di hevoka *"Xecê deng bihîst"* de *"Xec"* tu tiştî nake, bi tenê tiştekî dijî, lewre jî *"jiyei"* e. Dema ku hêmaneke hevokê cih nîşan bide, peywira cih pêk tîne, di hevoka" *Pirtûk li ser maseyê ye"* de *"mase"* cih c. Heke bûyer ji cihekî ber bi cihekî din ve be, cihê destpêkê *"jêderk"* cihê dawiyê *"armanc"* e.

Her wiha di hevoka *"Hogir bi balafirêji Amedê çû Tehranê."* de *"Hogir"* bikir e, *"balafir"* navgîn e, *"Amed'* jêderk e û *"Tehran"* jî *"armanc"* e. Li gorî vê yekê dema ku mirov li hevoksaziya kurdî binêrc, di kurdî de hêmanên hevokê ji *'~jêderk"ê* ber bi ve *"armanc'lê* ve rêz dibe. Di hevokên kurdî de bêjerêzî ji jêderkê ber bi armancê ve ye.

Zozanê xwişka xwe hire dibistanê.
Mirnak.

Di vê hevokê de pêşî *"Zozan"* heye, piştre *"xwişk* "a wê tê, piştre karê ku tê kirin ango *"birin"* tê û di dawiyê de jî cihê ku lê kar bi dawî dibe *"dibistan"* tê. Pêşî *"bikir"* tê, piştre *"pêkir",* piştre *"kar"* piştre jî *"armanc"* tê. Heke em li gorî têgihên hevoksaziyê hevokê analîz bikin hevoksazî bi vî rengî ye:

kirde + bireser + pêveber + hokera cih
Meta min keça xwe şande nav baxçeyê fêkiyan.

Di van hevokên din de jî heman rêzbûna *kirde + bireser + pêveber + hokera cihi* heye.

Xwişka min kevirek avêt binê bîrê.
SorguLê guhê xwe da ser radyo
vê. Pismamê min mala xwe anî
Amedê.

Di hevokên li xwarê de îcar hokera cihî berî lêkerê hatiye. Bi baweriya me dîsa heman rêz û rêzik heye.

Ciwanên taxê li komeleyê kom bûbûn.

Pêşî *"kirde"* paşê *"cihê bûyerê"* û paşê *"lêker"* tê. Ji ber ku ji bo kombûnê cihek pêwîst e, lewre jî cih berî pêveberê hatiye. Hevokên li xwarê jî li gorî heman rêzika *"kirde + hokera cihf + pêveber"ê* pêk hatine.

Ez li malê rûdinim.
Ew ji malê
derneket.
Ez di ber mala we re derbas bûm.

Hokerên demê bi piranî piştî *"kirde"yê* tên, lê hin caran jî di serê hevokê de cih digirin.

Ez her roj zû ji xewê radibim.
Min duh ew pir zû ji xewê rakir Min
sê rojan ew pir zû ji xewê rakir. Duh
min ew pir zûji xewa kûr rakir. Sibê
ez dê wî dereng ji xewê rakim.

Rêzbûna hokerên cihî jî ji gelemperiyê ber bi taybetiyê ve yanê ji dema berfireh û gelemperî ber bi dema teng û spesîfîk ve ye. Divê bê gotin ku hokerên çawaniyê her tim nêzî lêkerê ne. Her wiha hokerên cihî ji yan li pêş anjî li dûv lêkerê tên. Cihê wan li gorî rêza pêkhatina kar diyar dibe.

Ez duh piştî nîvro ji xewa giran hişyar bûm.
Ez duh piştî nîvro ji nişka ve ketim xeweke giran.
Min duh serê sibê saet di çaran de hevalek hinarte
Amedê Duh serê sibê bi bangdana dikan re ez ji malê
derketim. E:: dê sibê piştî nîvro saet di J3:15 'an de
werim mala we.

Di hevokê de **kirpandin**

Her wekî diyar e di tu zimanan de hemû birên hevokê wekî hev nayên bilêvkirin, hinek peyv bi şid, hinek nerm têne bilêvkirin. Wekî hemû zimanan di kurdî de jî rêjeya tundiya peyvê di nava hevokê de gelekî giring e. Bo nimûne di kurdî de pirs bi alîkariya kirpandinê jî têne diyarkirin. Wekî din jî dema ku kîjan peyv bê kirpandin ew peyv girîngtir e.

Mînak:

Zozan duh beri bavê xweji malê derket.

Di vê hevokê de hemû peyv wekî hev nayên kirpandin, heke tiştê ji bo me girîng kîjan be kirpandin li ser wê ye.

Zozan duh heri bavê xwe ji malê derket.

Ev hevok dixwaze bide zanîn ew e ku *"Zozan"* duh berî bavê xwe ji malê derketiye, ne yekî yan jî yeka din e.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê derket.

Di vê hevokê de kirp li ser hokerê ango li ser demê ye. Ew dide zanîn ku *"duh"* Zozan berî bavê xwe ji malê derketiye, ne rojeke din.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê derket.

Li vir jî kirp li ser hokera demê *"berî bavê xwe"* ye, bi vê yekê mirov fêm dike ku Zozan *"berî bavê xwe",* ne berî yekî din derketiye.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê derket.

Di vê hevokê de kirp li ser hokera cihî ye, mirov dibîne ku ew *"ji malê"* derketiye, ne ji dibistanê yan jî ji cihekî din.

Zozan duh beri bavê xweji malê derket.

Di vê hevokê de îcar kirpandin li ser rêveber ango karê ku pêk hatiye.

Di her hevokê de li gorî mebesta bêjeri/ê kirpandin li ser hêmaneke hevokê ye. Bo nimûne di hevoka jorîn de heke Zozan yeke zexel be, wê rojê berî bavê xwe derketibe, dê kirpandin li ser dema derketina ji malê be. Ji wan hêmanên hevokê kîjan tiştekî ji adetê der be, dê kirpandin li ser wê hêmanê be.

Dahûrandina hevokê

Di encama mijara hevokê de me divê ku em hinek hevokan dahûrinin, ango ji hev derxin. Hevokekji kîjan hêmanan pêk hatibe, mirov pêşî wan hêmanên bingehîn ên hevokê yên mîna *"kirde", "pêveber"," têrker"* û *"bireser"ê* destnîşan dike, piştre kurtehevok û ravekên di hevokê de destnîşan dike. Di dawiyê de jî hemû bêjeyên di hevokê de li gorî cureyên wan ji hev têne cudakirin.

Mînak:

Zozan duh berî bavê xweji malê derket.

Kirdeya vê hevokê *"Zozan ",* pêvebera wê *"derket"* e. Jiber ku lêker negerguhêz e, bireser nîn e, têrker hene. Ew jî hokera demê *"duh* to. raveka hokerî *"heri bavê xwe"* hokera eih *'~ji malê"* ne. Cureyên bêjeyan: Zozan (navdêr), duh (hokera demê), ber (hokera demê), bav (navdêr), xwe (cînavk), ji (daçek) û mal (navdêr) c. Her wiha veqetandeka *"ê",* veqetandeka *"î"* ku cihê daçekê girtiye û raveka hokerî pêk aniye **li** qertafa tewangê *"ê"* jî hene.

Min li mala apê xwe taştê xWaJ:

Di vê hevokê de *"min"* (cînavk) kirde, ",nI/ar" (lêker) pêveber e. Têrkera vê hevokê *"li mala apê :nve* " ye. Di têrkerê de *"li mal"* hokera cihî ye, her wiha *"mala apê xwe"* raveka zincîrîn e. Di vê têrkerê de *"li"* daçek, *"mar'* navdêr, *"ap"* navdêr û *"xwe"* cînavk e, ew bî veqetandekên *"a"* û "ê"yê bi hev ve hatine girêdan.

Hevalê min . ku duh li vir bû, Îsal ji bo qazanceke baş diçe Almanyayê.

Di vê hevokê de kirde raveka zincîrîn *"hevalê min î ku duh li vir bû"* ye, di vê ravekê de *"hevalê min"* raveka cînavkî ye kurtehevoka *"duh li vir bû* " bi alîkariya cînavka girêkî *"ê ku"* bi hevokê ve bûye.

Pêvebera hevokê *"diçe"* ye. Ji ber ku lêker negerguhêz e, bireser nîn c, du têrkerên hevokê *"ji bo qazanceke haş"* û *"Almanya"* hene. Di vê hevokê de cureyên bêjeyê ev in: Heval (navdêr), min (cînavk), duh (hokera demê), li vir (hokera cih), Îsal (hokera demê),ji bo (hokera sedemî) qazanc (navdêr), baş (rengdêr), diçe (lêker) **li** Almanya (hokera cih û navdêr). Her wiha divê cm veqetandekên *"ê"* li "'f'yê, cînavka girêkî *"ê ku"yê,* daçeka *"li"yê,* lêkera *"blÎn"ê* jî ji bîr nekin.

RASTNIVÎS

Di zimanekî de rastnivîs hêmaneke bingehîn e CI piştî rêziman û ferhengê tê. Di zimanê kurdî de bi taybetî jî di zaravayê kurmancî de rêz û rêzikên rastnivîsê bi awayekî tekûz nehatine destnîşankirin CI li ser wê bingehê rê nîşana rastnivîsê nehatiye amadekirin. Ji ber vê egerê em pêwîst dibinîn ku beşeke li ser vê mijarê li pirtûka xwe zêde bikin. Bi vê yekê em dixwazin hinek rêz ci rêzikên rastnivîsa kurmancî destnîşan bikin.

Rastnivîs her wekî ji navê wê ji diyar c. awayê nivîsîna rast nîşan dide. Rastnivîs bingeha xwe ji çend tiştên sereke digire. Yekji wan hêmanên bingehîn rêziman e. Di rêzimanê de pergala denganî ban-doreke taybet li rêz û rêzikên rastnivîsê dike, ji ber ku guherîn û veguherînên di dengan de, têkiliya di navbera dengan de di teşegirtina peyvan de diyarker in. Her wiha pcyvsazî jî bandorê li ser rastnivîsê dike. Awayê pêkhatin ci dariştina peyvan bandorê li rêz ci rêzikên rastnivîsê dike. Zanîna binyad û awayê pêkhatina peyvan di warê neqandina dûrivê bêjeyekê de rê nîşanî mirov dide.

J lêrnaneke din a rastnivîsê alfabe ye. Alfabeya ku tê bikaranîn ji berê ve xwediyê hinek rêz û rêzikan e. Ew rêz û rêzik tevî alfabeyê derbasî nav qada rastnivîsa wî zimanî jî dibin. Hinek rêz û rêzik jî toreyî ne. Her ziman bi domana demê re hinek rêz û rêzikên nivîsandinê diafirîne. Ev.' rêz û rêzikên nivîsandinê yên toreyî jî di nava rêz û rêzikên rastnivîsa wî zimanî de cihê xwe digirin.

Di rastnivîsê de tiştekî din ku divê teqez li ber çavan bê girtin jî têkiliya zimanê axaftinê û zimanê nivîskî ye. Guherîna di zimanê axaftinê de bi lez û bez e. Liv li lebata di zimanê devkî de ji zimanê

nivîskî bêhtir e. Ji ber ku zimanê nivîskî ji remz û sembolan pêk tê, guherîn tê de bi hêsanî pêk nayên. Zimanekî ku derbasî ser kaxiz û kompûterê bûbe, êdî bi hêsanî nayê guhartin. Ji ber vê yekê jî zimanê nivîskî bi tu awayî bi lez û beza zimanê devkî re nagihêje. Lewre jî dema ku mirov bala xwe dide gelên ku ji zû de dest avêtine pênûsê, mirov dibîne ku cudatiyeke mezin di navbera zimanê nivîskî û yê devkî de pêk hatiye. Di vî warî de mînaka herî berbiçav rewşa îngilîzî ye. Nemaze li Amerîkayê êdî gelek kes dixwazin peyvan bi awayê ku bi lêv dikin binivisin.

Di wan zimanan de ku dereng derbasî ser kaxizê bûne de zimanê nivîskî û yê axaftinê nêzî hev in. Lê belê di vî warî de zimanê kurdî xwediyê aloziyên mezin e. Ji ber ku gelek zarava û devokên wî hene. Jibo her tiştekî çend bêjeyên hemwate hene. Her wiha jî gelek dirûvên heman bêjeyê hene. Ew jî aloziyeke mezin derdixe pêşberî mirov.

Piştî vê destpêkê em derbasî mijara xwe bibin. Rêz û rêzikên rastnivîsa kurmancî çi ne? Em dê li ser rêz û rêzikên zaravayên din tu nirxandinan nekin, ji ber ku her wekî ji navê pirtûkê jî diyar e, çarçoveya vê xebatê zaravayê kurmancî ye.

Fonetîka **kurdî** û rastnivîs

Her wekî me berî niha jî got, di rêzimanê de tiştê ku herî zêde bandorê li rastnivîsê dike, dcngsazî ye. Di dengsaziya kurdî de hin tiştên ku serê pêşîn divê bêne zanîn hene.

Di kurdiya kevn de peyvê bi dengdêrekê dest pê nekiriye. Hê jî peyvên ku bi dengdêrên kurt ***''i''*** û "u"yê dest pê dikin pir kêm in. Lê bi domana demê re dengê "h"yê ku di kurdî de cihê gelek dengên zimanên Îranî girtibû, ji holê rabûye. Bi vê yekê re jî gelek peyvên ku bi dengdêran dest pê dikin derketine holê.

MÎnak:

hanîn	*anîn*
havêşti	*avêtin*
n hêrîş	*êrîş*
herê	*erê*
heger	*eger*
harîkarî	*arîkarî*

Bandora vê yekê ya li ser rastnivîsê gelek e. Ji ber ku bi vê yekê re rêzaneke din a kurmancî pêpes bûye. Di kurmancî de du dengdêr nayêne ber hev. Lê piştî ku ev qas peyvên ku bi dengdêran dest pê dikin derketine holê, êdî ev rêgez guheriye.

Di hinek dem fl raweyên ku bi dengdêran dest pê dikin de, du dengdêr hatin ber hev.

Mînak:

Raweya fermanî	*Dema niha*
biaxive	*diax il 'e*
biavêje	*diavêj e*
biêşîne	*diêşîn e*

Ev forma kurt jî di hin devokan de guheriye ₒ formên mîna *"tavêje, têşe û taxive'* derketine holê.

Ziman ji bo kuji vê bargiraniyê rizgar bibe. xwe sivik dike û ew peyv kurt dibin. Kurtbûna hinekan cihê xwe girtiye, ya hinekan hîn tam nehatiye pejirandin.

biaxive dibe *baxive*
biavêje dibe *bavêje*
biêşîne dibe *bêşine*
biajo dibe *bajo*

Îro her du formên li jor jî têne bikaranîn, di zimanê nivîskî de forma pêşîn serwer e, di axaftinê de forma kurt tê bikaranîn ..

Neyîniya lêkera "axaftin'tê

Naaxive carinan dibe *"naxive* ", hinek wekî *"n 'axive* „jî dinivîsin. Ew rêbaza dabirê ango apostrofê jî pirsgirêkê tam çareser nake.

Li ser heman mijarê em dikarin hin mînakên din jî bidin.

naavêje, neavêje (navêje), naêşlne, neêşîne (nêşîne) ...

Qertafên "bi-" û "bê-"yê

Qertafên *"hi-lO* û *"hê-"yê* yên ku rengdêran pêk tînin jî dihêlin ku du dengdêr bêne ber hev .

. Mînak: biagir. bêagir. biaş lî bêaş, biav lî bêav bio! „bêol, Niman lî bêîman ...

Ev yek di warê rastnivîsa kurmancî de bi xwe re arîşeyên girîng tîne. Belkî formên mîna *"têşîne. taxi ve, tavêje"* hîn neketine zimanê nivîskî û zêde devokî ne, lê ne dûr e ku di rojên pêş de xwe li ser zimanê nivîskî ferz bikin. Jiber ku bêjeyên mîna *"tîne, tê"* ji niha ve di zimanê nivîskî de bi cih bûne. Di hinek peyvan de mirov nikare xwe ji nivîsandina du dengdêrên li nik hev bide aliyekî, lê heke awayê kurt bêjeyan hebe II di warê wateyê de tevliheviyê pêk nayne. divê mirov awayê kurt tercîh bike.

Guherîn û veguherîna dengan

Guherîn û veguherîna di dengan de dirûvê peyvan diguhêre, peyvek bi çend dirûvan derdikeve pêşberî mirov. Gelek kes dixwazin formên herêma xwe derbasî zimanê nivîskî bikin, ev jî bi xwe re hinek aloziyan tîne. rê li ber pêkhatina zimanekî yekgirtî digire.

Têkildarî vê yekê, ji ber ku guhêrîna di zimanê devkî de bi lez û bez e. di warê rastnivîsê de ji bo kurmancan sergêjiyeke mezin pêk hatiye. Xuya ye ku guherîn û veguherîna di zimanê devkî de li her cihî ne bi heman şêweyî ye. Lewre jî gelek devok derketine holê li vê yekê rewşa zimên kambaxtir kiriye.

Di zaravayê kurmancî de pcvguherina dengan pir zêde ye. Astengiya herî mezin a li ber rastnivîsa kurmancî jî ev yek e. Nemaze dengdêrên kurdî gelekî pev diguherin. Li vir ne pêkan û ne pêwîst c ku hemû pevguherînên dengan bidin. Lê dîsa jî divê em hinek mînakan bidin.

Guherîna dengan li gorî sedem û bingeha xwe ji hev cuda dibin. Hin caran ji du dengên ku cîderka wan yek e. yek tê daqurtandin. An jî dengekî din dişibîne xwe; her wekî çawa ku di hin devokan de *"se/jêkirin"* bûye *"şe/jêkirin ": "şikestin"* bûye *"şikestin* ". Pevguherîna hin dengan bingeha xwe ji demên kevn digire. Dema ku mirov bala xwe dide cudatiya di navbera kurdî II farisî de yan jî farisiya kevn û partî de mirov guhartina hin dengan dibîne.

Ev guherîn ji mêjûyê tê, dema ku zimanên Hind-Ewropayê ji hev cuda bûne, guherîna van dengan pêk hatiye. Hin deng kurdî ji zimanên din ên îranî cuda dikin. Zanîna vê yekê di pêkanîna rêz û

rêzikên rastnivîsê de karê me hêsantir dike. Her çi qas guherîna van dengan ne tekûz be jî, di tercîhkirina teşeyên peyvan de divê ew rêz li rêzik li ber çavan bêne girtin. Dema ku ev yek bê kirin dê hem yekgirtina kurmancl hêsantir bike hem jî kurmancî nêzî zaravayên din bike.

Hin guhartin jî bingeha xweji zaravayan digirin. Dema ku mirov du zaravayan hevrû dike, mirov vê yekê bi awayekî zelaltir dibîne.

Bo nimûne di fonetîka kurmancî û soranî de hêmaneke sereke ya cuda tiyê dengên "v" û *"w"yê* ye. Di soranî de dengê "v" nîn e. Lê di kurmancî heye.

Peyvên ku ji soranî derbasî kurmancî dibin, bi awayê resen têne wergirtin. Ew jî bandorê li rastnivîsê dike. Soran ji bajarê Erbîlê re *"Hewlêr"* dibêjin, kurmanc jî *"Hevlêr"* dibêjin. Lê ji ber ku ev nav di ser soranî re derbasî kurmancî bûye, em peyva *"Hewlêr* bi kar tînin.

Mînak;
şev lî şew
av ûaw

Her wiha di navbera kurmancî û kirmanckî de jî cudatiya hinek dengan heye.

MfV

Mînak;

kurmancî kirmanckî

nav	*nam*
çav	*çim*
niv	*nîm*
dûv	*dim*

Lê hinek peyvên awarte hene, bo nimûne bêjeya *"çem"* di her du zaravayan de heman wateyê dide.

Z/J

kurmancî kirmanckî

roj	*raz*
jî	*zı*

Divê em diyar bikin ku devokên kirmanckî bi xwe jî di vî walî de ji hev cuda dibin. Di hin zaravayan de li şûna bêjeya *"roz", "roj"* tê gotin. Her wiha peyva ku kurmanc jê re *"zêde"* dibêjin, di hin devokên kirmanckî de dibe, *"jêde",*

Li aliyê din di kurmancî bi xwe de jî guherîna van her du dengan heye. Nemaze li hin herêman ev her du deng di peyvan de berevajî piraniyê têne bikaranîn. Li derdora Şemzînanê li şûna "v"yê *"w"* tê bikaranîn. Bo nimûne li şûna *"veke", "weke"* tê gotin. Guhartina di van her du dengdêran de herî zêde di paşgira *"-van"ê* de xwe dide der. Hin kes vê paşgirê wekî *"<wan"* dinivîsîn û ew jî di warê rastnivîsê de tevliheviyeke mezin bi xwe re tîne. Ji ber ku dirûvê hemû peyvên ku bi paşgira *"-van"ê* hatine pêkanîn, diguhere. Nimûne:
Gavan, naxirvan, şivan, dergevan, go/ikvan, baxçevan, şoreşvan ...

Mînak:

xevn	*xewn*
nîvîs	*niwîs*
şev	*şew*
goven	*gowend*
d ava	*awa*
	(şêwe)

Di zimanê nivîskî de awayê reşkirî rast ên din çewt in.

B/P

Ev her du dcngjî di gelek peyvan de cihê xweji hev re dihêlin.

biçûk	*piçûk*
bişaftin	*pişaftin*

Di van mînakan de her du jî têne bikaranîn.

BN

Her çiqasî me diyar kiribe ku pevguherîna van her du dengan bingeha xwe ji pêşketinên mêjûyî digire jî, ev pevguherîn di nava zaravayê kurmancî de jî hîn hebûna xwe diparêze.

Bo nimûne:

bah	*bav*
neqeb	*neqe*
derba	*w*
s	*derva:*
	::

J/Z

Ev pevguherîn jî bingeha xwe **ji** pêşketineke dîrokî werdigire, lê di nav zaravayê kurmancî de bi peyvên mîna *"jîrek* Lî *Zîrek ". "jehr lî zehr* ", *'jeng lí zeng"* hebûna xwe diparêzin.

N/L
livîn nivîn
limêjnimêj
ling nig

Li gorî zimanê nivîskî ji van mînakan ên reşkirî rast in û yên mayî şaş in. Jixwe peyva ni vîn ji al iyê peyv saziyê ve jî rasttir c, lewre ew ji lêkera *"nivistinrê* tê. Pevya *"nimêj"* ji aliyê peyvsaziyê veji peyva *"limêj"* duristtir e. Di zimanê farisî de jî *"nemaz"* e.

RIL

Ev her du deng ji ber ku ciderka wan nêzî heve *LÛ* bi hev diguherin.

Mînak:

alîkar arîkar
zê/û zêrû
lawir ra wir

Mînakên reşkirî di zimanê nivîskî de zêdetir têne bikaranin. Peyva *"alîkar"* ji hêla peyv saziyê ve jî ji *"arîkar"* zêdetir di cihê xwe de ye. Lewre peyv ji hêmanên *"alî"* û *"kar"* pêk hatiye. Wisa xuya dike ku di peyva *"arîkar"* de lixweşibandina berepaşkî heye.

S/Z

Ev her du dengjî nêzî hev in, lewre jî bandorê li hev dikin. Di hin lêkeran de dengê "s"ya di raderê de, di rayeka dema niha de dibe "z".

Mînak:
parastin diparêtim
xwestin dixwazim
gestin digezim
bihîstin dibihizim

Ji bilî vê yekê jî di hin peyvan de mirov pevguherîna her du dengan dibîne.

Mînak:

derba	*derbaz*
s xinis	*xiniz*
nas	*naz*

Q/K

qurq	*kurk*
qetandi	*ke1andi*
n qutan	*n kutan*
qelaştin	*kelaştin*

Bêjeyên *"qelandin'* û *"kelandin"* her çi qas ji heman bingehê bên jî wateya wan ji hev cuda bûye, du peyvên cuda derketine holê. Ji bilî wan bêjeyan reşkirî rast in, ên mayî çewt in.

FN

Ev her du deng jî nêzî hev in, lewre jî bandorê li hev dikin, carinan cihê hev digirin.

Mînak:

tiving	*tifing*
hevde	*hefdeh*
devda	*defdan*
movik	*mofik*
mirov	*miraf*

Bêjeyên ku li gorî zimanê nivîskî rast in, ên reşkirî ne. Her wiha ':('ya di radera hinek lêkeran de di rayeka dema niha de dibe "v". Ev yek zêde bandorê li rastinivîsê nake, lê hin kes vê guherîna deng li ber çavan nagirin wê demê formeke çewt derdikeve holê.

Mînak:

keftin	*dikevim*
axa/tin	*diaxivim*
peyiftin	*dipeyivim*

Her wekî me li jorê da zanîn, hinek kes li şûna *"diaxlvim'tê "di-axifim"* dinivîsin, ev yek şaş e.

H/X

hîm	*xim*
hine	*xine*

Mixabin ji van mînakan her du jî têne bikaranîn, hinek ji wan kêm, hinek jî zêde.

S/Ş

Ev her du deng ji geleki bandorê li hev dikin.

Mînak:

Rast

şikestin	*şikesti*
pisîk	*n plşîk*
sûravk	*şoravk*

DIT

Cîderka van her du dengan jî yek e. lewre jî bandorê li hev dikin. Ji ber vê yekê dengê "d"ya qertafa dema niha *"di"yê* di gelek lêkeran de bi domana demê re cihê xwe ji *"t"yê* re hiştiye.

dihlnim bûye *tinim*
dihêm bûye *têm*

Dengê "d"ya daçeka *"di"yê* di cînavkên lihcvxistî de jî dibe *"t",*

lUînak

Di hev bûye *tev*
Di wî/wê de dibe *tê de*

Her wiha mirov dikare hinek mînakên din jî bide.

egîd	*egil*
xerad	*xeral*
Ferad	*Ferat*

Di zimanê nivîskî de her çi qas bêjeyên li jor bi her du awayan bên nivîsandin jî yên reşkirî zêdetir têne bikaranîn.

T/Ç	
çu	tu
çîk	tîk
çêjik	têjik

Mixabin di zimanê nivîskî de her du dirûv derdikevin pêşberî mirov, dibe ku bi domana demê re yek ji wan ji holê rabe yan ji di warê wate 0 qada bikaranînê de her du ji hev cuda bibin.

Hin guherîn hene ku ji ber zimanên din derbasî zimanê kurdî bûne. Zimanê kurdî hin peyvên ji zimanên din li xwe anîne, hinek jî wekî xwe hiştine. Heta li hin cihan hatine guhartin, li hin cihan jî wekî xwe mane. Ev yek di warê rastnivîsa wan de bûye sedema tevliheviyê.

Mînak:

selam lî *silav*
Kore ˛ *Qare*
Ankara lî *Enqere*

zin

Guherîna di van dengan de jiber du sedeman tê. Sedemek her wekî me berê jî gotibû, ev cudatî ji kûrahiya dîrokê tê. Di peyvên li xwarê de peyvên bi "z"yê kurdî yên bi "d'yê farisî ne.

Mînak:

zerya lî *derya*
zava lî *damad*

Sedem jî dengê *"dzat "* (~) a erebî ye. Peyvên ku ew deng di wan de heye, bi du rengan derbasî zimanê kurdî bûne. Hinekan ew dengê erebî wekî "::"yê qebûl kiriye, hinekan jî wekî "d'yê.

Mînak:

qazî	*qadî*
qe::a	*qeda*

O-Û-UM'

olçe',	*welçek*

wen/ekordek
wijdan ûjdan
welaq olaq
wisa ûsa/usa

Ji van mînak ên reşkirî di zimanê nivîskî de zêdetir bi cih bûne. Li ser pevguherina van her du dengan şîroveyeke rast û durist gelekî dijwar e. Lê ji mînakê jî xuya dibe ku kurdî di destpêka peyvê de dcngdêrê napej irîne, lewre jî nivdendêrekê ango "w"yê tîne şûna dengdêrê.

Pevguherîna dengdêran

Di kurmancî de pevguherîna dengdêran ji pevguhcrîna dengdaran zêdetir c îı ew jî bandoreke neyînî li ser rastnivîsa kunnanci dihêle, ji ber ku peyvek bi gelek dirûvên ji hev cuda derdikeve pêşberî mirov.

UII

Ev her du deng gelekî zû bi hev diguherin. Nemaze jî dengê *"u"yê* bi hêsanî dikare cihê xwe ji dengê "j"yê re bihêle. Heta mirov dikare bibêje ku gelek peyvên ku di wan de dengê "j"yê heye. berê dengê "u"yê tê de hebûye. Dema ku mirov bala xwe dide hinek peyvên de-vokî, mirov vê yekê dibîne. Di kurmancî de ji dengê *"u"yê* ber bi dengê *"j"yê* ve herikînek heye. Hejmara *"du"yê* di hin devokan wekî *"di"* tê bilêvkirin. Her wiha peyva *"pir"* jî di hin devokan de wekî *"pur"ê.* tê bilêvkirin. Cînavka kesê duyem ₑ yekjimar a xwerû *"tu"* û peyva di hemwateya hîç *"tu"* jî di hin devokan de wekî "ti"yê têne bilêvkirin.

EIÊ

Ev her du deng ji ber ku nêzî hev in. gelekî bi hev diguherin.

Minak:

Rast	*çewt*
rek	*yêk*
meji	*mêjÎ*
hejmar	*hêjmar*

Di vî warî te tiştekî din heye ku divê mirov teqez li serê tiştan bibêje. Ji ber ku *"ê"* di tirkî de nîn e, gelek peyvên kurdî yên ku di wan de dengê *"ê"yê* heye, wekî tirkî bi *"e"yê* têne bilêvkirin û nivîsandin. Ev cureyekî pişaftinê ye, divê mirov li hemberî vê yekê hişyar û serwext be.

çewt	*Rast*
tek oş	*têkoşîn*
berîva	*bêrîvan*
tirej	*tîrêj*
	E/l

Ev her du deng jî di gelek peyvan de bi hev guherîne.

	Minak:
merov	*mirov*
weha	*wiha*
wesa	*wisa*
wend	*winda*
tejî	*tiji*
çel	*çil*
xerab	*xirab*

Ji bilî bêjeya *"mirov"* di zimanê nivîskî de li ser van mînakan dubendî heye û hinek mînakên berevajî yên mîna *"hem"* jî hene.

Pirsgirêka "u" û "û"yê

Pirsgirêkeke din a rastnivîsê jî peyvên ku bi dengdêrên *"u"- "û"* têne nivîsandin derdixin pêşberî mirov. Celadet Bedirxan daye zanîn ku dengê *"u"yê* ji dengên "wi"yê pêk hatiye. Li herêmên ku dengê *"û"yê* wekî *"ii"yê* bi lêv dikin, li şûna wê dengên "wi"'yê bi kar tînin.

J leke em vê yekê di zimanê nivîskî de bipejirînin, divê cm digel pevdenga *"xw"yê* qala pevdengên *"k1l'",'bJl-V",* **"şw"yê** jî bikin. Lê belê di kurmancî de **ji** bilî *"xw"* tu pevdeng nehatine destnîşankirin, Ji ber vê yekê divê peyvên bi pevdenga *"xw"yê* bi pevdengê bêne nivîsandin.

Mînak:

çewt	*Rast*
xûn	*xwîn*
xZlşk	*xwişk*
xû	*xwi*
xu	*xwe*
xuh	*xweh*

Yên mayî jî bi "û"yê bêne nivîsandin.

çewt	Rast
gwîzgûz	
bwîk	*bûk*
kwîr	*kû*
şwîr	*şû*
şwîn	*şûn*

Her wiha **ji** ber heman sedemê hin kes bêjeyên ku tê de *"u"* hebe bi pevdengê dinivîsin. Bi baweriya me ew jî şaş e.

Mînak:

çewt	*Rast*
xwirt	*xur!*
xwiya	*xuya*
kwirt	*kurt*
qwi/	*qul*

Pevguherîna dengdêrên kurt û dirêj

Dengdêrên kurt ên mîna *"i", "u"* û "e"yê yên ku dengdara "h"yê li ber wan heye, dema ku *"h"* ji ber wan radibe cihê xwe ji dengdêrên dirêj ên mîna "1"", *"û", "O"* û "a"yê re dihêlin.

Mînak:

Awayê dirêj	*Awayê kurt*
cih	*cî*
mih	*mi*
rih	*rî*
sih	*si*

do	*duh*
tirî	*tirih*
Bota	*Buhtan*
tat	*teht*
sotin	*suhtin*
patin	*pehtin*

Di kurmancî de herikîneke bi vî awayî heye. Lê belê hin kes vê rêgeza denganî binpê dikin, ev jî bi xwe re şaşiyeke rastnivîsê tîne. Ew jî li ber dengdêrên dirêj dengdara *"h* "yê dinivîsin her weki:

çew	*Rast*
cih	*cih*
mîh	*mih*
rih	*rih*
sih	*sih*
doh	*duh*

Ev yek şaş c **li** kesên ku bi kurmancî dinivîsin divê xwe ji vê yekê bidin alî da ku rê li ber aloziyekê bê girtin.

Her wekî me li jorê jî da xuyakirin di kurmancî de pevguherîna dengan pir zêde ye, ev yek jî' di warê rastnivîsê de bi xwe re gelek gelş **li** gelemşeyan tîne. Lê cihê bextewariyê ye ku digel vê yekê jî di kurmancî de hcvgirtina zimanê nivîskî **ji** sedî 85-90 pêk hatiye. Kesên ku bi kurmancî dinivîsin piraniya van peyvan wekî hev dinivîsin.

Ligel vê yekê jî hîn gelek kêşe **li** arîşeyên rastnivîsi hene. Her weki me berê jî diyar kiribu, piraniya van cudatiyan ji ber nebûna pergaleke perwerdehiyê ya li ser xîmê zimanê nivîskî tê. Bi pêkhatina pergala perwerdehiya bi zimanê kurdî **li** pê re jî bi pêşketin ci belavbûna zimanê nivîskî dê rêz fl rêzikên rastnivîsê di nav civakê de belav bibin ci cihê xwe teHIL bikin. Ji ber xebatên weşan **li** çapemcniyê **li** bidestketina mafê perwerdehiya bi zimanê kurdî dê riya yckgirtinê vebe. Ji bo çareserkirina dubendî **li** pirbendiyên li ser rastnivîsê çend rêbaz hene. Rêbaza herî girîng danûstandina xurt a di navbera hemû kurdan de ye. Di warê yekgirtinê de pêdivî' bi akademiyeke ziman a neteweyî heye, Divê em jibîr nekin ku zimanê

nivîskî yê kurdî hê di qonaxa pêkhatinê de ye. Divê zimanê yekgirtî li gorî rêz û rêzikên zanistî pêk were. Bo nimûne her peyva ku kurd bi kar tînin û ne bi zimanekî din, bi zimanê kurdî ye, divê em wê peyvê bixin zimanê nivîskî.

Divê hemû peyvên hemwate ango sînonîrn bikevin bazara zimanê nivîskî, ew peyv dê bi domana demê re bêne bêjingkirin, hinekji wan dê binbêjing bibin, hinek jî dê bimînin. Şansê her peyvê heye ku li ser bêjingê bimîne, lewre jî divê em tu peyvê yekser binbêjing nekin. Gelek hêmanên ku bandorê li man ci nemana peyvekê dikin hene; firehî ci tengiya herêma ku lê tê bikaranîn, newaya peyvê, hêsanî ci dijwariya jiberkirinê, tengî û firehiya qada wateyê ya bêjeyê ci hwd.

Li gorî vê yekê dê hinek peyv bêne jibîrkirin ci hinek jî bimînin. Her wiha hinek peyvên hemwate dibe ku di warê wateyê de **ji** hev cuda bibin, an jî di qadên cuda de werin bikaranîn ci pêkan e ku hinek ji wan peyvan bibin têgihên warekî taybet. Bo nimûne di kurdî de ji bo peyva *"keskesor"* çend nav hene. her wek; *"bûka baranê", "heftreng", "tira dawid"* ci hwd. Dibe ku yekji wan di wêjeyê de, yek di hunerê de yekjî zanistên xwezayî de were bikaranîn.

Li aliyê dinji peyvên ku bingeha wan yek e ci dirûvê wan piçekî ji hev dûr ketiye, bivê nevê em e yekê bineqînin. Lê biryardayîna li ser vê yekê jî divê bi lihevkirineke giştî pêk were. Serê pêşîn divê etîmolojiya peyvê li ber çavan bê girtin, lê bê nihartin ka çi guhartin bi serê peyvê de hatine. Her wiha herikîn ber bi ku ve ye ci kîjan deng j i peyvê ketine,ji ber çi sedemê wisa bûye? Digel vê yekê forma ku herî zêde di nav gel de belav bûye kijan be divê ew pêşî bê neqandin, lê yên mayî jî bikevin bazara zimên. Em dikarin peyva *"kêrguh"* wekî mînak bidin. Ev peyv bi gelek awayên euda derdikeve pêşberî mirov, her wekî *"kêrguh", "kêrgoşk", "kêroşk", "kîroşk", "kivroşk".*

Dema ku mirov bala xwe dide peyvê, mirov bi hêsanî pê derdixe ku peyveke hevedudanî ye. Peyv ji du hêmanan pêk hatiye, yek *"guh"* an jî *"goş"* ku her du jî tên heman wateyê. 1 lêrnana din jî bi rengê *"kîr", "kêr", "ker"* derdikeve pêşberî mirov, mixabin her sê jî ji aliyê şiband inê ve wê wateyê didin. Nexwe divê bala xwe bidin zaravayên kurdî, di kirmanckî de *"wwêş"* an jî *"hargoş"* e. Di zimanê farisî de jî *"xergûş"* e. Nexwe mijar zelal dibe, hêmana ku em

lê digerin *"ker"* e û peyv bi xwe jî *"kerguh"* an jî *"ke/goş"* e, lê forma duyemîn paşgira *"k"* wergirtiye ₒ bûye *"kerkoşk"* mirov dikare van her du peyvan *"kerguh"* û *"kergoşk"* bi kar bîne.

Her wiha di zimanê nivîskî de, di klasîkên kurdî de ew peyv çawa hatiye bikaranîn. Yanê mirov divê bi lez û bez li gorî dilê xwe tevnegere, heke wisa bike dê alozî zêdetir bibin. Pewîst e em bi hest-yarî tevnegerin û devoka xwe bingeh negirin. Heke her kes devoka xwe bingeh bigire, bi rastî jî dê çend zimanên ji hev euda derkevin holê.

Nîvdengdêr û dengdêrên dirêj

"î"ya berî "y"ê

Hin rêz û rêzik hene ku ji taybetiyên wî zimanî bi xwe tên. Têkiliya "F"ya berî dengê "y"yê têkiliyeke bi vî rengî ye. Dengê "f'yê dema ku berî *"y"ê* tê, dinermije û ev taybetiyeke denganî ye. Ev rêzika denganî ji hêla teveka zimanzanên kurd ve tê pejirandin Ev rêzik bandora xwe li rastnivîsê jî dike. Celadet Bedirxan gotiye "î"ya berî *"y"yê* dinennije û dibe *"i",* bingeha xwe ji vir digire. Gelek zimanzanên kurd vê encama rêzikê napejîrin, lewre ew dibêjin, *"Peyv wêne ye. divê di peyvê de guhartin pêk neyê."*

Her wekî me li jorê got, nîqaş li ser rêzika denganî nîn c, li ser encama wê ye. Danerê rêzimana kurmancî Celadet Bedirxan xwestiye ku ev rêzik derbasî rastnivîsê bibe û bi wî awayî bê nivîsandin. Ev daxwaz heta radeyekê di nava zimanê nivîskî de jî bi cih bûye. Em jî heta ku lihevkirineke gişti pêk were, vê biryara Celadet Bedirxan dipejirînin û pêk tînin.

Celadet Bedirxan heman tiştî ji bo tîpa "ê"ya berî dengê "y"yê jî gotibû lê vê yekê zêde cihê xwe negirt. Li gorî baweriya min têkiliyeke wiha di navbera *"ê"* û ".y"yê de nîn e, hebe ji nagihêje wê astê ku bikeve nav zimanê nivîskî.

Celadet Bedirxan wekî nimûne, van peyvan dide:

	"Î"		•.•.
deri vê me	*den'*	*piyê* wî	*pê*
tiliyên min	*tîlî*	*diya fe*	*dê*
xaniyê te	*xanî*	*riya wan*	*rê*

Her wekî me pêşî got, di telafûza *"dêya me* ". *"rêya me* ", *"pêyê wan"* de jî dijwarî nîn e. Di hinek bêjeyan de guherîneke wiha dê aloziyê bi xwe re bîne.

Bo nimûne dema ku mirov dibêje;

Ev pisîk mê ye.
Ew mêrekî çê ye.

Dîsa di telafûzê de tu zehmetî nayê kişandin.

Dema ku mirov hevoka *"Hesen tê malê.* "wekî *"Hesen te malê. "* binivîse kes tiştekî jê rem nake.

Hejmara *"sê"* dema ku li gorî vê rêgezê bê guhartin, dê wateya xwe winda bike.

"Sêyan got" dibe *"Seyan got"* an jî *"Siyan got"*

Heke em bi awayê din bibêjin *"dara sêyemîn"* dê bibe, *"dara s evem în* " an jî *"dara siyemîn* " ...

''û''ya berî ''w''yê

Ev her du dengjî bandorê li hev dikin, ''w'' dengdêra dirêj ''û''yê kurt dike. Dengdêra kurt a nêzî vê dengdêrê *''u''* ye, lê Celadet Bedirxan gotiye, ''u''jî ben ''w''yê nayê û diguhere, dibe *''i''.* Li gorî baweriya min ev raman şaş e, ''u''ya ku berî ''w''yê tê û wekî xwe dimîne. Ji ber ku *''u''* dengdêreke kurt e, hê kurtir nabe.

Her wekî me di mijara pevguherîna dengan de jî nîşan da, dengdêra *''u''* bi xwe dengdêreke zêde lawaz e, bi hêsanî dadigere ser ''i''yê. Bi baweriya me heke dengê *''u''yê* bi awayekî siruştî nebûbe *''i''* divê berî ''w''yê dengdêra ''u''yê bê nivîsandin.

MÎnak:

ruwê min
duwemîn

,
xweSllwa min (xwesiwa min)

Dengderên dubare

Di kurmancî du tîpên dengdêr û dengdarên jihev li nik hev nayên nivîsandin. Wate. di kurmancî de tipa dubare (şedde) nîn c. Mijara dengdêran me euda nirxandiye, lewre jî em dê tenê li ser dengdaran

rawestin. Her wekî me di beşa dengzaniyê de jî diyar kiribû, ew mijareke aloz e; jê re rêz û rêzikên zelal nehatine danîn.

Celadet Bedirxan dabû zanîn ku divê du dengdarên ji hev û nêzî hev li dûv hev neyêne nivîsandin, di rastnivîsê de jî pêwîst e yek ji wan bê xistin. Xuya ye ku di kurmancî de bilêvkirina du dengdêrên ji hev û nêzî hev gelekî dijwar e; dema ku mirov bi lêv dike, yek ji wan dikeve. Li ser vê yekê jî tu gelemşe û dubendî nîn e. Lê dema ku mesela hat ser rastnivîsê, her wekî hin mijarên din, dubendî derdikeve holê.

Me jî di xebata xwe ya bi navê *"Waneyên Rêzimanê Kurmancî"* û çapa yekemîn a vê pirtûkê de gotibû ku divê du dengdarên ji hev û nêzî hev bi hev re neyêne nivîsandin, ji wan dengdaran yek bê xistin. Heke di bêjeyeke hevedudanî û pêkhatî de hatin ber hev û xistina dengekî wateya bêjeyê xera bike, divê tîrek bikeve navbera her du dengên ji hev. Lê vê rêzika *"tir"ê* zêde cihê xwe negirt. Jixwe min gotibû, ev *"tir"* kêşeyê ji binî ve çareser nake, lewre ez wê didim aliyekî.

Li aliyê din heke ji her du dengan yek jixweber ketibe, divê neyê nivîsandin. Heçî dengdarên nêzî hev in, her çi qas di telafûzê de yek ji wan dikeve jî bi baweriya me pêwîst nake ku di nivîsandinê de bê xistin. Dîsa, heke jixweber ketibe, divê wisa bê nivîsandin.

Di vî warî de dîtineke din heye ku dibêje, şedde di peyvên kurdî yên xwerû de nîn e, di peyvên biyanî û hevedudanî de heke du dengên ji hev hatin ber hev divê bên nivîsandin. Ev raman her ku diçe zêdetir cihê xwe digire.

Li vir tiştê ku divê em li serê biryarê bidin eve; gelo em ê peyvê wekî *"wêne"* bipejirînin û nehêlin ku tê de şikestin çêbe yanjî em ê *"hifêvkirin"ê* esas bigirin û nivîsandina xwe nêzî axaftinê bikin? Celadet Bedirxan, di gelek waran de bilêvkirin esas girtiye û rêzikên rastnivîsê li gorî wê diyar kirine.

Zimanê nivîskî îro ji vê xetê dûr dikeve, nêzî tercîha din dibe û peyvê wekî *"wêne"* dibîne û dixwaze ku wekî xwe were nivîsandin. Mirov dikare riyekê ji van bineqîne, lê pêwîst e em li ser riyekê bimeşin û riya neguhêrin. Her wekî gelek warên din ên rastnivîsê de di vî warî de jî pêdivî bi lihevkirineke giştî heye.

Bi tenê rewşeke awarte heye. Navdêrên bi zimanên ku bi tîpên latînî têne nivîsandin divê wekî xwe bimînin.

Mînak:

Du dengdarên ji hev

serokkomar

şerrawestandin
terk kirin
xurttir
kurttir
denggir
William

Du dengdarên nêzî hev

bilindtir
rindtir
rengker
cengker

Rastnivîsa veqatendeka ku cuda tê nivîsandin

Li ser rastnivîsa veqetandekên ku bi serê xwe tên nivîsîn, divê em têbiniyekê daynin. Di nava hevokê de heke peyva berî vcqetandekê dengdêr be, berî veqetandeka serbixwe "y" tê û ew dibin *"yê", "ya", "yên".* Her wiha gihaneka *"an"* jî dema ku peyva berî wê bi dcngdêrê biqede divê bibe *"yan".*

Mînak:

Hevala min a dibistanê hate mala
me. Birayê wî yê biçûk çû.
Dara gûzê ya li ber dêrî hate birîn.
Kalikê wan e 70 salî koça xwe ya dawîn
kir. An wî gotiye yanjî birayê wf

Kurtkirina bêjeyan

Di zimanê axaftinê de hin bêje têne kurtkirin, bêjeyên ku bi dengdêrên *"e"* û *"ê"yê* diqedin didema veqctandekê de, qertafa "1'yê digirin an jî ditewin, kurt dibin.

		Mînak:
Dirêj	*Kurt*	*Bêje*
maseyek	*masek*	*mase*
neteweyî	*netewî*	*ne/ewe*
li	*li Enqerê*	*Enqere*
perdeyek	*perdek*	*perde*
li Tirkiyeyê	*li Tirkiyê*	*Tirkiye*

Di zimanê axaftinê de ev tiştekî asayî ye û zêde pirsgirêkan dernaxe, lê di zimanê nivîskî de bi xwe re hinek arîşeyan tîne. Ji ber ku rayeka bêjeyê kurt dibe, kesên ku bingeha bêjeyê nizanin êdî wê bêjeyê bi awayê kurtkirî bi kar tînin.

Di vî warî de mînaka herî baş bêjeya *"netewe"* ye, niha gelek kes wê bêjeyê wekî *"netew"* dizanin. Ji bo parastina rayeka bêjeyê divê ev rêbaza kurtkirinê di zimanê nivîskî de bi eih nebe, di nivîsandinê de awayê dirêj bê tercîhkirin.

Lê rastiyeke din jî heye ku divê em li xwe mikur werin, heke em di mijara "['ya berî 'Y'ê de wêneyê peyvê diguhêrin, em dikarin di vir de jî wêneyê peyvê biguhêrin. Li vê derê tiştê balkêş eve, zimanzan pirî caran helwestên nakok werdigirin. Bo nimûne, kesên ku di vê mijarê de forma kurt dineqînin, di mijara *"1'yê* de dibêjin bila peyv wekî *"wene"* xera nebe. Lewre jî heke ez bibêjim, teqez divê forma dirêj were bikaranîn wê demê helwesta min jî dibe helwesteke nakok û nelihev. Ji bo her du mijaran jî biryareke gelemperî pêwîst e.

Taybetiyên rastnivîsa pêşgiran

Divê wekî nîşeyekê mirov li ser xaleke din jî raweste. Ev lêker gava ku qertafeke din bigirin, ev qertaf dikevin navbera lêkerên bingehîn û pêşgirê, Her çi qas di hin devokan de bi awayê din jî tê bilêvkirin, lê di zimanê nivîskî de mirov nikare bibêje, *"dirabim"* divê mirov bibêje *"radibim".* Li vir qertafa *"di"* dikeve navbera pêşgirê û lêkera resen. Qertafên din jî li gorî heman rêgezê têne bikaranîn. Bo nimûne qertafa neyînîyê *"ne"* jî dikeve navbera pêşgirê û lêkera bingehîn û raweya neyînî ya lêkera *"vebûn"* li gorî

dema niha dibe *"venabe".* Her wiha di van lêkeran de di raweya fermanî û rawcyên daxwazî de qerta fa *"bi"* ji holê radibe.

Mînak:

Ell derî venekir.
Zînê agir vedimirand.
Bila derî venebe.
Çalekê vede.
Ji min re çêke.
Roj hilnehat.
Derî veke.'
Heke dêrî veke, em herin hundirû.
Divê nivîsê wergerîne.

Alfabe û rastnivîs

Hêmaneke ku bandorê li rastnivîsê dike jî alfabeya ku tê bikaranîne. Kurdan heta hilweşîna rejîma Sovyetê sê alfabe (latînî. erebî û kirîlî) bi kar dianîn. Lê niha bi tenê du alfabeyan bi kar tînin. Hêjayî gotinê ye ku meyla kurdan bi piranî li ser alfabeya latînî ye. Ew yek jibo berbihevhatina zimanê kurdî gaveke girîng c. Ji ber ku dê bi vê yekê re gelek qeyd û bendên li ber yekgirtina kurdî û zaravayên wê ji holê rabin.

Niha em vegerin ser têkiliya rastnivîs fl alfabeyê. Her wekî me berê jî dabû zanîn her milet dema ku alfabeyekê qebûl dike, pê re hinek rêz û rêzikên rastnivîsê jî qebûl dike. Bo nimûne di alfabeya erebî de tîpên hûrdek û girdek nîn in, lewre jî rêz II rêzikeke têkildarî vê yekê li bal kurdên ku bi vê alfabeyê dinivîsin nîn e. Lê kurdên ku bi latînî dinivîsin mecbûr in ku vê rêz û rêzika alfabeya latînî li ber çavan bigirin.

Çi, kengê mezin tê nivîsandin?

Hinek rê? û rêzikên rastnivîsê bi alfabeya ku tê bikaranîn re derbasî zimanan dibin. Wekî mînak, berê di alfabeya erebî de xalbendî nîn bû, lewre jî di gelek zimanên ku tîpên erebî bi kar dianîn de xalbendî tune bû. Wekî nimûne, xalbendî bi *"Fermana Tanzîmatê"* re bi berhemên Şînasî kete zimanê tirkî.

Her wiha di erebî de tîpên hûrdek û tîpên girdek jî nîn in, lê di alfabeya latînî de tîpên hûrdek û tîpên girdekji hev euda ne. Lewre jî hinek rêz û rêzikên rastnivîsê bi tîpên latînî re derbasî kurmancî bûne.

Di kurmancî de kêm caran, bêje bi temamî bi tîpên girdek têne nivîsandin. Bo nimûne, di sernavan de hinek caran tîpên girdek têne tercîhkirin, her wiha dema ku yek dixwaze balê bikêşe ser tiştekî, wî tiştî bi tîpên mezin dinivîse.

Di zimanên ku alfabeya latînî bi kar tînin de tîpa pêşîn ango scretîpa hin bêjeyan mezin tê nivîsandin. Ev cure nivîsandin hin caran li gorî cureyê bêjeyê pêk tê, hin caran jî li gorî cihê bêjeyê yê di nava hevokê de pêk tê.

Lê divê bê gotin ku di vî warî de jî di kurmancî de tevliheviyek heye. Ji ber ku hemû gelên ku bi tîpên latînî dinivîsin, ne wekî hev dinivîsin. Di navbera îngilîzî û fransî de cudatiyeke berbiçav di vî warî de heye. Zimanê tirkî yê ku bi salan e bûye zimanê nivîskî jî hîn xwe ji aloziya di vî warî de rizgar nekiriye.

Seretîpa bêjeya yekem a hevokê, ango bêjeya ku piştî xal, pirsnişan û baneşanê tê bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak:

Diya min ji mala cîranan tê. Xo/tika min Jl pê re ye.

Gelo hûn ₔkengê herin serdana Zozanê? Dema ku hûn çûn gazi min jî bikin.

Errik, çi baqil e! HÎn rêjî nîşan dide.

Serenav her tim mezin têne nivîsandin.

Di warê dabeşkirina serenavan de ziman ji hev vediqetin.Her wekî me berê jî gotibû, mînaka berbiçav dubendiya di navbera îngilîzî û fransî de ye. Ev tiştên ku di Îngilîzî de wekî screnav têne pejirandin ◌ bi tîpên mezin dest pê dikin, di fransî de wekî hevcnav têne zanîn ◌ bi tîpên biçûk dest pê dikin:

a- Navên mehan û rojan di îngilîzî de bi tîpa girdek di fransî de bi tîpa hûrdek dest pê dikin.

Îngilîzî	Fransî	Kurdî
Monday, Tuesday. .. January, February. ...	*/undi, mardi. .. janvier. fevrier: ..*	*duşemî, sêşemî ... rêbendan, reşeme*

b- Di navên cihan de hevenavên raveka navdêr a yekî serenavekî pêk tînin, di îngilîzî de mezin, di fransî de biçûk têne nivîsandin.

Mînak:

Ingilîzî	Fransî	Kurdî
Moliere Street	*rue Moliere*	*Kuçeya Moliere*
Victor Hugo Ave.	*av. Victor Hugo*	*Ko/ana Victor 1 Iugo*
Pacific Ocean	*I'ocean Pacifique*	*Ze/yaya Pasîfik Behra Spî*
Mediterranean Sea	*la mer Mediterranêe*	
Mont Blanc	*le mo nt Blanc*	*Çiyayê Blanc*

c- Navê zimanan di îngilîzî de mezin di fransî de biçûk têne nivîsandin.

Mînak:

Kurdî	Fransî	Îngilîzî
fransî	*le français*	*French*
Îngilîzî	*I'anglais*	*English*
rûsî	*le russe*	*Russian*

d- Navê qewm û neteweyan di ingilizî de mezin di fransî de biçûk têne nivîsandin.

Îngilîzî	Fransî	Kurdî
I'm American.	*Je suis americain.*	*E: amerîkî me*
He bought ci Frenchflag.	*II a achete un drapeau français.*	*Wî aleke fransî kirr*

Hin navên miletan di fransî de jî bi tîpên mezin dest pê dikin.

Îngilîzî	Fransî	Kurdî
She married a Spaniard.	*Elle s'est mariee avec un Espagnol.*	*Bi îspaniyekî re zewicî,*
I saw an Australian.	*J'ai \/ıı zin A ustralien.*	*Min yekî awistralî dîL.*

Navê bîr û baweriyên olî, rengdêrên ku bi wan pêk hatine di ingilîzî de mezin, di fransî de biçûk têne nivîsandin.

Îngilîzî	**Fransî**	**Kurdî**
Christianity	*le christianisme*	*xiristivanî*
a Chris/im?	*chretien*	*xiristivan*
Christian	*un chretien*	*xiristiyanek*
Judaism	*le judaîsme*	*cihûtî*
Jewish	*juif*	*cihû*
a Jew	*unjuif*	*cihûyek*
Ilindttism	*le hindouisme*	*hîndûyîtî*
Hindu	*hindou*	*hindû*
Buddhism	*le bouddhisme*	*bûdîzm*
Buddhist	*bouddhiste*	*bûdîst*
Islam	*musulman*	*misilman*
a Muslim	*un musulman*	*misilmanek*

1 l inek bêjeyên awarte hene. Ev bêje cannan mezin têne nivîsandin.

Îngilîzî	**Fransî**	**Kurdî**
a Hindu	*un Hindou*	*hindû*
a Buddhist	*un Bouddhiste*	*bûdîst*
Islam	*l'Islam*	*îslam*

Dema ku mirov bala xwe bide Hawarê mirov dibîne ku danerê rêziman û rastnivîsa kurmancî Celadet Bedirxan, rastnivîsa fransî bingeh girtiye. Di kovara Hawarê de navên zimanan fl navê miletan biçûk hatine nivîsandin. Ji bo zelalkirina mijarê, em dikarin çend mînakan ji kovara Hawarê bidin.

Navê zimanan:

Di kurdmancî de yekjimarî û geljimariya navdêran bi çend awayên têvel xuya dibin.

Navê neteweyan:

Zerdeşt ji me ye, Îro JÎ li Kurdistanê hin kurd hene ko pê bawer in.

Di sala 1708ê de gava di navbera Ûrûs û ***tirkan*** *de şer çêbû,* ***yewnanan*** *hêvî dikirin ko Ûrûs dê bibe arîkarê wan.*

Raveka navdêran **ku** serenavekê pêk **tînin**

Di *navbera Melegê û Sometrê de avtengek heye. jê re avtenga Melegê dibêjin.*

Digel vê yekê jî di Hawarê de navên mehan bi gelemperî mezin hatine nivîsandin.

Mînak:

Li 19ê Tirmehê di navbera Fransê li Japonyayê de lihevhatinek hate Îmze kirin.

Lê roja iro her kurdek li welatekî di nav sînorên dewletekê de dijî, bivê nevê awayê rastnivîsa wan miletan bandorê li wan dike. Her wiha gelek kurd li Tirkiyeyê bi tirkî perwerde bûne û hînî rastnivîsa tirkî bûne, lewre jî li gorî rastnivîsa tirkî dinivîsin.

Rojnameya Welat piştî sala 1994'an biryar da ku li gorî rastnivîsa Hawarê (fransî) binivîse. Heta niha bi vî awayî dinivîse, lê gelek kesên din ên ku di rojnameyê de dinivîsin, wekî îngilîzî û tirkî dinivîsin. Li ser vê bingehê em ji navên miletan, navê zimanan, navê bîr û baweriyên siyasî û olî, navê meh û rojan biçûk dinivîsin. Heve-navên di ravekên navdêrên ku serenavekî pêk tînin de, heke nebûbin parçeyekî wî navî, biçûk têne nivîsandin, lê heke bûbin parçeyekî wî navî mezin tên nivîsandin.

3-Nasnavên mirovan dema ku bi navê wan re bûbin yek û tevî navê wan bên bikaranîn, bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak:

Hevserokê KeD ê Ahmet Turk, Serokwezîr Erdogan. Serokê Kurdistana Federal Mesûd Barzanî. Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr, Serokê Amerîkayê George W Bush. ..

Wekî din biçûk tê nivîsandin.

Mînak:

Erdogan serokwezîrê Tirkiyeyê

ye. Bush serokê Amerîkayê ye.

4- Serenavên cih, sazî, çem, çiya lt navên din ên cografî mezin têne nivîsandin.

Mînak:

Nav: Bozan, Hêvî, Şoreş, Egîd, Pelîn, Hevind, Robar ..

Navê cihan: Mezopotamya, Ferat, Dîcle, Amed, Riha, Semsûr. Sêrt, Mehabad, Stenbol, Kerkûk, Washington ...

Navê saziyan: Rêxistina Mafên Mirovan, Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, Partiya Aştî û Demokrasiyê, Saziya Zimanê Tirkî, Însiyatîfa Dayikên Aştiyê, Enstîtuya Kurdî ya Stenholê ...

5- Di navê ku **ji** ravekekê pêk tên de, heke hevenavek bûbe parçeyekî serenavê mezin tê nivîsandin.

Çiyayê Agirî, Çemê Dîcleyê, Pira Genderê, Pira Malabadê, Deriyê Çiyê, Qesra Qenca, Birca Belek. ..

Lê heke ne parçeyekî serenavî be biçûk tên

nivîsandin. *Mînak:*

Ez li ber deriyê Birca Belek rawestiyam. Ev çemê ku di Amedê re dibore, Dîcle ye.
Dara li ber mala apê Hesen çi qas bilind e?

6- Navê roj û serdemên taybet mezin tê

nivîsandin. *Mînak:*

Roja Evîndaran 14'ê reşemiyê ye.
Cejna Karkeran 1'ê meha gulanê ye.
Zozanê di Cejna Newrozê de ango di 21'ê adarê de dest bi xebatê kir.

Roja 21'ê Adarê li gelê me pîroz be.
14'ê Tîrmehê rojeke taybet e, nayê jibîrkirin.
Şerê Rizgariyê riya demokrasiyê vekir.

7- Berek dema ku bi wateyeke taybet bêne bikaranîn mezin têne nivîsandin.

Mînak:

Li Bakur têkoşînê geşedana çand i jî bi xwe re anî.
Hilbijartina li Başûr dê gelek encaman bi xwe re bîne.
Li başûrê Iraqê her roj nûçeyên şer û pevçûnan tên.
Tirkiye divê li gorîpîvanên rojavayî tev bigere.

8- Navê xizmantiyê dema ku bûbe nasnav û bi navî re bûbe yek, mezin tê nivîsandin.

Mînak:

Rewşenbîrê mezin Apo Osman Sebrî divê bi mîhrîcanan were bibîranîn.
Duh keça Dayê Fatê hate mala me.

9- Seretîpa bêjeya yekemîn a veguhastî ango hevoka di nava dunikan de.

Mînak: *Hawarî got: "Ez* wf *qeşmerî baş nas dikim."*

10- Di sernavên nivîsan de ji bilî daçekan hemû bêje bi tîpa mezin
dest pê dikin.

Li Almanyayê Xebata Zimanzaniyê
Tevgera Demokratîk a Demên
Dawîn Li Tirkiyeyê Rojnamegerî
Divê Kurdji bo Azadiya Xwe Çi Bikin?
Li ber Zilmê Serî Hildan

Lê mirov dikare bi tenê peyva destpêkê û serenavan mezin binivîse.

Li Tirkiyeyê pêşketina zimanê kurdi
Helwesta neteweyî

11- Bêjeya hevoka ku piştî eotexalê tê, bi tîpa mezin dest pê dike, lê heke piştî cotxalê mînak hatibin rêzkirin, mînaka pêşîn jî li hûrdckê dest pê dike.

Mînak:

Navdêr du cure ne: serenav û hevenav

Mirov dikare wan nexweşînan wiha rêz bike: serêş, zikêş (navêş), tagirtin. ..

Di vê mijarê de tiştek heye ku divê em teqez li serê çend tiştan bibêjin. Ji ber ku gelek kes bi vê yekê nizanin ci çewt dinivîsin. Tîpa *"i"yê* dema ku dibe girdek wekî îngilîzî dibe *"I"* ci bêyî xal tê nivîsandin.

Mînak:

iRAQ, SIVIK, BIÇÛK, TIFiK, KURIK, SORIK. KIN, KIR, KIRIN, KIRiN. ..

Çi, kengê pê ve û kengê cuda tê nivîsandin'?

Di kurmancî de daçek bi tena serê xwe têne nivîsandin. Her wiha daçekên hevedudanî jî ji hev cuda têne nivîsandin.

MÎnak:

Hogir duh li vir bû, Îro bi ku de çû?
Zozan dema ku ji dibistanê dihat, di nav gundekî re derbas bû.

Di nivîsandina daçekan de bi tenê awarteyek heye; di hin bêjeyan de daçekên hevedudanî yên ku ji pêşdaçek û paşdaçekan pêk tên, dema ku pêşdaçck bikeve, paşdaçek bi bêjeyê ve dizeliqe.

MÎnak: dûre, piştre, lewre, peyre ... (di dû re, di pişt re, ji lew re. di pey re)

Cînavkên kesandinê bi lêkeran ve têne nivîsandin, lê ji rengdêr, cînavk û navdêran cuda têne nivîsandin.

MInak:

Pêkve	*Cuda*
ez diçim	*ez baş im*
tu çoyî	*ew mamoste bû*
ew biçe	*Hesen tu yi?*

Lêkerên hevedudanî û biwêjî dema ku wekî lêker bêne kişandin, hêmanên lêkerê ji hev cuda têne nivîsandin. Lê dema ku wekî navdêr bin an jî di avaniya tebatî û dançêker de bin bi hev ve têne nivîsandin.

Cuda

Xelî! sibê dest bi xebatê dike.
Me Îro xwe ji bo xebatê amade nekiriye.
Tu yê kengê amade bibî.
Gûnê wê mîna mişmişan zer
bû. Te çima rûyê xwe reş kir?

Pêkve

Destpêkirina xebatê hêvî da me. Biryardan
hêsan e, lê destpêkirin dijwar e.

Bingeha xebatê bi destên me hate amadekirin. Min bingeha xebatê da destpêkirin.

Daçekên *"bi", "hê"* û *"ne"yê* dema ku rista pêşgiran bi cih tînin û rengdêr û navdêrên nû çêdikin, bi bêjeyê ve têne nivîsandin. Dema ku hokeran çêdikin, cuda têne nivîsandin.

Mînak:

Ez çayê hi şêkir vedixwim. Ez çaya bişekir vedixwim .
. çay bêyî şekir nayê vexwarin.
Ez çaya bêşekir nikarim vexwim. Ew hêyî te naçe bajêr.
Bêyî rûn xwarin nayê xwarin.
Xwarina bêrûn nayê xwarin.

Di bêjeyên mîna *"bikir", "nexweş", "neyar", "nemir", "bêbav", "bêmirûz",* •. *bêteşe"* de jixwe *"bi", "bê"* û *"ne"* pêşgi r in, lewre jî bi bêjeyê ve têne nivîsandin.

Wekî din jî, hin tişt hene ku divê cuda bêne nivîsandin. Gihanek, hcvalkar, hokerên hevedudanî **ji** hev cuda tenê nivîsandin.

Mînak: her wiha, her weki, her weki çawa, her wekî tê zanîn, her tişt, her kes, her dem, her tim, her roj, her gav, her yek, her sal, her du, her sê, her çar. ..

Tu carî, tu demê, tu rojan, tu kes, tu tişt, tu mirov ....

Ev tişt, ev kes, ew kes, ew qas, ev çend, çi qeder, çi qas, hin kes, gelek kes, yek kes, du kes ...

Hemû kes, hemû tişt .. _

Rastnivîsa hejmaran

Di kurmancî de mijareke din a ku dibe sedema aloziyan rastnivîsa hejmaran c. Ji ber ku me awayê nivîsandina hejmaran di mijara jimarnavan de nîşan daye, em dê dubare nekin. Lê awayê nivîsandina hejmarên hevedudanî, pirsgirêkeke mezin e. Hin kes dixwazin hemû hejmaran bi hev ve binivîsin, hinek jî euda dinivîsin. Pirî caran bi awayekî kember têne nivîsandin. Çi bi kê çawa xweş tê, wisa dinivîsin.

Li gorî baweriya me divê jê re hinek rêz û rêzik bêne danîn, lê ne rast e ku ez biryara vê yekê bi tena serê xwe bigirim. Lê dîsa jî ez dixwazim ramana xwe li ser vê yekê bibêjim. Jixwe hejmarên heta bîstî rengekî taybet girtiye, ji hev nayêne cudakirin. Hejmarên ku bi gihaneka "û"yê bi hev ve hatine girêdan divê ji hev cuda bêne nivîsandin. Her wiha hejmarên ku bê gihanekê gihîştibin hev, her çi qas hin caran bi hev ve kelijîbin jî, **ji** hev cuda têne nivîsandin.

Bo nimûne, *pênc sed* wekî *pênsed; şeş sed* wekî *şesed; heft sed* wekî *hef •• ed* têne bilêvkirin. Her çi qas ev kurtbûn hîn neketibe zimanê nivîskî jî dibe ku di demên pêş de bikeve zimanê nivîskî.

27 (hîS! û yek)
45 (çil û pênc)
55 (pêncî û pênc)
200 (du sed), 300 (sê sed), 400 (çar sed), 500 (pênc sed), 600 (şeş sed) ...
345 (sê sed û çil û pênc)
2567 (du hezar ıîpênc sed ıîşêst ıîheft)
2. 575. *680 (du milyon û pênc sed û heftê û pênc hezar û şeş sed ıî heştê)*

Li aliyê din di nivîsan de divê hejmar heta dehan bi tîpan û ji dehan bi şûn de bi reqeman bêne nivîsandin. Ev yek dê me ji gelek aloziyan rizgar bike.

Rastnivîsa navên biyanî

Di warê nivîsandina navên biyanî de du rêbaz hene. Li gorî rêbeza yekem ew nav çawa têne xwendin, wisa jî têne nivîsandin. Yanê heke em li gorî vê rêgezê biçin, divê em hemû navên biyanî li gorî bilêvkirina kurmancan binivîsin. Ev jî dibe sedem ku peyvên bi zimanê biyanî ji dirûvê xwe yê resen bi dûr bikevin.

Ji ber vê yekê, gelek kes jî li dijî vê rêbazê radibin. Li gorî rêgeza duyemîn, navên neteweyên ku tîpên latînî bi kar tînin, divê wekî rastnivîsa zimanê resen bêne nivîsandin, bi tenê heke tê de tîpên ku di zimanê kurdî de nîn in, hebin, ew nav bi tîpên nêzî wan têne guhartin. Bo nimûne di kurdî de dengên mîna *"û",* "6" û *"g"* yên tirkî nîn in, li şûna wan tîpên nêzî wan *"u", "o"* û""g"yê têne bikaranîn.

Ev yek ji bo xwendinê başţir e. Hin kes tîpa ku ji aliyê denganiyê ve nêzî wî dengî be dixin şûna tîpên biyanî. Lê li gorî baweriya me ev rêbaz ne di cih de ye. Ji ber ku peyvê ji dirûvê resen dûr dixe. Bo nimûne, dema ku mirov li şûna peyva *"dag"a* tirkî *"dag"* binivîse, kesên ku bi tirkî dizanin, dikarin bi awayê rast bixwînin, lê dema ku mirov wê peyvê wekî *"dax"* binivîse, kes tiştekî jê fêm nake. Divê em peyvê wekî *"wêne"* bibînin, xuyanga peyva resen zêde neguhere.

Navên biyanî yên ku bi tîpên ji bilî latînî, wekî erebî û kirîlî bi kar tînin, dê bi awayê ku têne bilêvkirin bêne xwendin. Yanê em a navên bi rûsî, çînî û japonî, navên yewnanî û slavî bi awayê ku têne xwendin binivîsin.

Mînak: *Xumeynî, Xameney, Xuroşov, Arîsto ...*

Di vî warî de arîşeya herî mezin ji ber bindestiya kurdan tê. Ew nav bi piranî di ser tirkî re derbasî nav kurmancan dibin. Lewre jî gelek kurmanc ji Xumeynî re Humeynî, ji Xuroşov re Kruşçev dibêjin. Her wiha kurdên Başûr û Rojhilat jî peyvên îngilîzî bi riya ereb û farisan dinasin, wekî ereb û farisan dinivîsin.

Kêşeyeke din jî jiber globalîzmê derdikeve. Niha zimanê îngilîzî di bazara cîhanê de serdest e. Gelek peyvên ji zimanên nenas di ser îngilîzî re derbasî zimanên mayî dibin. Ji ber vê yekê em gelek peyvên çînî ûjaponî bi riya îngilîzî dinasin û wekî îngilîzî dinivîsin. Ew jî bi xwe re hinek aloziyan tîne. Wekî mînak demekê li Tirkiyeyê di nav çepgiran de li ser paşnavê Mao şerekî giran hebû. Hinekan digot, *"Çetûng",* hinekan digot, *"Zedûng",* hinekan jî digot, *"Tsetûng",* hê jî baş nayê zanîn ka rastiya wê çi ye.

Heke navek di kurdî de bi cih bûbe û rengekî kurdewarî girtibe, ew bi wî awayî tê nivîsandin.

Mînak: Edene, Enqere, Qers, Tewrêz, Bexda, London, Berlîn, Evdila, Evdirehman, Silêman, Selim, Cebar; Ûsiv, Xelîl, Hesenpûr. ..

XALBENDÎ (Niqteşani)

Her wekî berê hatibû gotin. hevok rêzkirina peyvan a li gorî hinek rêz ċi rêzikan e. Ji bo ku peywir ₒv, .. ateya bêjeyê ċi hêmanên hevokê baştir werin nîşandan di zimanê nivîskî de xalbcndî heye. Xalbendî xwendin ₒ têgihîştinê hêsantir dike. Xalbendî ser ċi binê hevokê, cihê bêhnvedanê nîşan dide. Her wiha di dema xwendinê de em li gorî nîşaneyên xalbendiyê peyvê dikirpînin. bêhna xwe berdidin ₒ radiwestin. Ji şêwaza danîna van nişaneyan re xalbendî yan jî bi awayê ku Celadet Bedirxan dibêje, ***"niqteşanî"*** tê gotin.

Berî ku em li ser rist ₒ peywira wan rawestin, divê em nîşaneyên xalbendiyê rêz bikin:

(.) .\"(1!
(,) *bêhnok*
(?)
pirsnişan (:)
xalecot
(;)
xalebêhnok ()
kevanek
II *kevaneka*
çarçik (" ") *dunik*
(' ') *yeknik*
(!)
baneşan
(-)xêzek
(-) *bendik*
(...) *sêxal*
(') *dabir*
(") *dubare*

Xal

1- Ev nîşane bidawîbûna hevokê nîşan dide. Dema ku hevok diqede mirov xalekê datîne dawiya hevokê û bi vî rengî jî dide zanîn ku dawî li hevokê hatiye. Peyva pişti *"xal* bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak:

Agir geş dibe.
Hevalan qûş li gurgebozan qetand. Doza azadiyê doza mirovahiyê ye. Gel bi serokatiya xwe serbilind e. Dil bi dilan şad dibe.
Kevir û kuç li te bibarin.

2- Di kurtenivîsan de li ber kurteyê xal tê danîn. Berê li piştî her tîpa kurteyê xal dihate danîn, lê ev yek hêdî hêdî ji holê radibe.

Mînak:

Prof DI: Joyce Blau beşdarî Konferansa Zimanê Kurdîya Amedê hû. Prz. Dogan Erbaş beşdarî civînê bû.

Fêkiyên mîna hinar; sêv, hirmê, hejîr, gûz hwd. mirov ji nexweşiyan diparêzin.

3- Ji bo ku xaneyên hejmaran ji hev bêne veqetandin piştî sê xaneyan xal tê danîn.

Mînak:

3.000.000 (Sê milyon)

678. 786.234 (*Şeş sed heftê heşf milyon, heft sed tî heştê û şeş hezm; du sed sih û çar)*

4- Di nivîsandina mêjûyê de di navbera roj, meh û salê de xal tên danîn.

Mînak:

12.06.2004 (12 ~vê meha 6 *'an o sala 2004 'an) 05.1/.1995* (5 *meha* 11 *'an a sala* 1995 *'an)*

5- Di matematîkê de wekî nîşaneya earandinê tê bikaranîn.

Mînak:

4.4=20 (çal' caran pênc dike şazdeh)

Nîşe: Xal di tirkî de dema ku piştî hejmarekê tê danîn, rêza wê nîşan dide. Hin kes dixwazin vê yekê derbasî kurdî Jî bikin, lê di kurdî de tiştekî wiha nîn e. Li şûna wê "1 'emîn, 2 'yemin, 3 'yemîn ... " lê nivîsandin.

Bêhnok

Di nav hevokê de cihê ku mirov lê bêhna xwe vedide nîşan dide. Bi vî awayî xwendina hevokê hêsantir dibe, lê divê ev bikaranîn wateya hevokê neguherîne.

Her wiha ev nîşane dikeve nav du peyvên hempeywir ên ku dane pey hev ango 1 i şûna gihanckê jî tê bikaranîn.

Mînak:

Zozan, Zîn û Gurgîn çûn bajêr.
Li gund darên tû, behîv, xox û hinaran hebûn. Mirov bi ked, fikirîn û axaftinê ji ajalan vediqetin.

Di nav hevokên hevedudanî de komekan ji hevokên serbixwe cuda dike. Her wiha du hevokên serbixwe jî bi riya bêhnekê ji hev têne veqetandin.

Mînak:

Lawikê ku duh li ber dêrî bû, pismamê min e.
Heke dil bixwaze, jixwe ku dil nexwaze tiştek nabe, mirov dikare her tiştî bike.
Gulîzarê xwarin çêdikir; Osmên li radyoyê guhdarî dikir û diya wan Bêrîvanê Jî kinc pîne dikirin.
Ji bo ku mirov hêmaneke hevokê ji hêmanên din euda bike, mirov bêhnokê datîne.

Belê, êdî roja me hat.
Li qeraxa çêm, li ber qesrekê rawestiya.
Erê lawo, tu çima wisa dikî?
Kuro, zû here ji vir.'
Keçê porkurê, zû binivise!

4- Di hejmarên şikestî de xaneyên di bin sifirê re bi bêhnokê têne veqetandin.

MInak:

1,5 (vek û niv)
0.25 (carêk)
5,25 (pênc û carêk)
0,75 (ji çar poran sê par)

Divê neyê jibîrkirin ku di îngilîzî de xaneyên ji sifirê biçûktir ên hejmarên şikestî bi xalê ji hejmarên tam tên veqetandin. Tirk bi bêhnokê jê vediqetînin. Di tirkî de *"iiç virgiil iki "* tê gotin, di ingilîzî de *"three point t\.'m"* tê gotin. Li gorî vê rêgezê divê em jî di hejmarên şikestî de *"bêhnokê"* bi kar bînin ê bibêjin, sê bêhnok du. Di îngilîzî de bêhnekê datînin navbera sê xaneyên hejmarên pirxaneyî.

Mînak:

5.5 (pênc bêhnok pênc ango pênc ûnîv)
4.75 (çar bêhnok, heftê û pênc)
12.3 (dozdeh bêhnok sê)

Di nav hevokê de pişti yên erêkirin û redkirinê yên mîna *"baş e",* *"bila he", "na wele"* girêdayî hevokê tê bikaranîn.

Mînak:

Erê wele. em Jl hatin.
De baş e, hila wekî gotina te be.
Na wele, ez nikarim serê xwe li ber zilmê bitcwînim.
Pişti hevokên xitabetê tê bikaranîn.

Mînak:

Gelî hevalan. hala xwe bidin min!
Hevalê heja, e: dixwazim ji ""c re qala dîroka kurdan bikim.
Birayê delal, ıu çawan F

Di daxwaznameyan de pişti navê saziya ku mirov serî le dide, tê nivîsandin.

Mînak:

Ji Enstîtuya Kurdi ya Stenbolê re.
Ji Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê re,

Di nivîsandina çavkaniya gotarên lêkolînî de bêhnok dikeve navbera nav, paşnav, navê berhemê û hwd.

Mînak:

Farqîni, Zana, Ferhenga Mezin a Kurdî- Tirki, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenhol, 2005.

Pirsnişan

Ev nîşane, tê dawiya hevokên pirsê. Ji ber ku di kurdî de pirs bi riya kirpandinê jî pêk tê, gelek caran ev nîşane tenê pirsê nîşan dide. Bêyî wê mirov nikare rengê pirsê bide hevokan.

Mînak:

Robar bi kil de çLÎ?
Hûn çûn bajêr?
Kevir li te ket?
Birîna .vi xedar e?
Êzingên we hene?
Çavên le baş dibînin?
Ma êdî ne hes e? Kêji
fe re çi got ?

Hin caran dema ku di nav kevanekê de pirsnîşanek bê danîn, ew şik û gumana li ser agahiyekê nîşan dide.

Mînak:

Dibêjin Feqiyê Teyran bi zimanê teyran dizanî (?), *lê nakeve serê min. Lêwik got, ji bav o kalan ji min re maye* (?), *lê wan ji mêj ve nas*
dikim, tiştekî wan tune bû.

Dema ku agahiyek ne teqez be, mirov pirsnîşanê datîne berê.

Mînak:

Ehmedê Xani (1651-1707?) di Nûbara Biçûkan de gelek şiretan li zarokên kurd dike.

Di hevokên hevedudanî yên pirsê de pirsnişan li ber hevoka dawîn tê danîn.

Mînak:

Deng dengê jinan e, dengê mêran e?
Tiştê ku te dilteng dike çi ye, tenêtiya te ye yan xemsariya zarokên te ye?

Xalecot

Gava ku di nav hevokê de tiştek tê gotin, an jî xisletên tiştekî têne rêzkirin, an jî wateya wê tê vegotin, xalecot tê bikaranîn.

Mînak:

Hevalê wî lê nihart û wiha got: "Em ê tejî bibînin. "
Tiştê ku mirovê çêji yê xerab vediqetînin sê ne: dilpaki, wêrekî lî camêrî.
Rengdêr: *Ew tişt e ku rengê navdêrê nişan dide.*

Wî got: "Heke tu neçî. ezjî naçim. "

Piştî hevoka ku dê li pey wê tiştek were ravekirin, xalecot tê bikaranîn.

Mînak:

Ez xwe bi we bidim nasîn: Nave min Dewran e, ez nivîskarê vê pirtûkê me.
Di deqên wêjeyî de dema ku gotûbêj hebe, piştî navê kesê ku dipeyive tê danin.
Mînak:

Xecê: tıı kengê hatî?
Hozan: Ez duh bi şev hatim.
Xecê: Te çima gazî min nekit:
Hozan: Min nexwest we hişyar bikim.

Di demê de ji bo nîşandana demjimêr û xulekê tê bikaranîn.

Mînak:

2:10.5:55. 17:33 ...

Xalebêhnok

Ev nîşane dikeve navbera du hevokên bi hev ve girêdayî yên ku hev temam dikin.

Mînak:

"Herçî niqte ne cihê rawesê ne; yanî di wan de mirov qederekî dis-ekine. Herçî bêhnok û niqtebêhnok in cihê vêsihê ne; di wan de em piçekî disekinin, vêsiha bêhnokê ji hemiyan kurtir e. " Ге. *Bedirxan, Bingehên Gramêra Kurdmancî, Hawar, hejmar* 28, *ci/da duyem,* t: *716)*

Dilpakî di kar de diyar dibe; ne di gotin û galegalê de.

Kulîlk ne tenê bi rengê xwe xweş in; bi bêhna xwejî dilê mirov geş dikin.

Sêv, hirmî û mişmişfêki; flreng~ xiyar û Îsot sebze ne.

Mewlana bi farisi; Fizûlî bi osmanî; Meleya Cizîrî bi kurdî helbest nivîsandine.

Ga dimire çerm dimîne; mêr dimire nav dimîne.

Ji bo cudakirina komekên hevokên ku hêmanên wan bi bêhnokan **ji** hev hatine cudakirin, tê bikaranîn.

Mînak:

Ez pir hi coş ûperoş im: ez dixwazim biqîrim, bistrêm, bibezim ...
Em ji serê sibê de li vir in: ne kes tê, ne kes diçe.

Ji mînakên ku tên rêzkirin ên **ji** aliyê cure û wateyê ve ji hev cuda bi riya xalebêhnokê ji hev tên cudakirin.

Mînak:

Di kurdî de navên zarokên keç dikin Zozan, Sosin, Binefş: navên zarokên kur ***t!*** *dikin Şêrko, Piling, Hogir. Derwêş.*

Divê mirov welatan û paytextên wan ji hev cuda bike. Fransa, Îngillstan, Germenistan welat.Parîs, London û Berlîn paytextên wan in.

Kevanek

Agahiyên ku cihgirtina wan di nav hevokê de ji sedî sed ne pêwîst e, di nav kevanekê de tên dayîn. Bi derxistina van agahiyan tiştek ji hevokê kêm nabe. Dema ku mirov nexwaze hevokê zêde dirêj bike jî, mirov beşeke hevokê dikare bixe nav kevanekê û bi vî awayî jî hevokê siviktir û herikbartir bike. Di cihê kevanekê de hin caran du bendek jî tên bikaranîn. Bi taybetî di zimanên ewropî de ew du bendik ji kevanekê zêdetir tên bikaranîn. Her wiha di nav kevanekê de mirov dikare hemwateya peyveke ku zêde nayê zanîn jî bide.

Mînak:

Heval, duh serê sibê zû (bi berbangê re)ji malê derketin.

Geliyê Zê (ê ku iro bûye warê şer) dibe ku sibe bibe warê geşt û gerê.

Hevala Zozan (a ku sih salî li Stenbolê jiyaye) par li Duhokê bi cih bû.

Xwişka min Eyşan (bûka çil rojî) hatiye zê.

Derdê mezin (îxanet) nahêle ku yekîtî pêk were. Komek mirov (nêzî sih kesî) bi hev re çûne bajêr.

Di mehên payîzê (rezber, kewçêr û sermawez) de pelên daran diweşin.

Meha avrêlê (nîsan) meheke biharê ye.

Di rastnivîsa erebî de bêjeya ku mirov balê dikêşe ser dikeve nav kevanekê. Kurdên ku ji tîpên erebî derbasî tîpên latînî bûne, bi vî awayî dinivîsin, lê ev yek di latînî de nîn e.

Di deqên şanoyê de liv û tevgera lîstikvanan di nav kevanekê de tê diyarkirin.

Mînak:

Kalo (hêdîka nêzîkî ber mêwêfiroş bû û bi dengekî nizm) got: Ka xwarzê du kîlo sêv bide min.

Mêwefiroş (bi lez ji cihê xwe rabû) got: Tu bi xêr hatî xalo, tu sêvên zer dixwazî yan ên sor'!

Dema ku mirov agahiyekê ji berhemekê veguhêze, nivîskarê berhemê di nav kevanekê de tê dayîn.

Mînak:

Mey nenoşi Şêxê Sen 'anî
xe/et, Ew neçû nêv
Ermenistanê xelet Mistê Mûsa
wî tecellaya te dî Ê lif di kanî
xeta, kanî xelet

(Melayê CiZIrI)

Di veguhastinan de cihê ku nehatiye wergirtin di nava kevanekê de bi sê xalan tê nîşandan.

Mînak:

Ehmedê Xanî di berhema nve ya navdar Mem û Zînê de bi van gotinan qala Elî Herîrî, Melayê Cizîrî . Feqiyê Teyran dike:

(...)
Bînave riha Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî
Keyfek wê bida Feqiyê
Teyran Heta bi ehed bimayi
heyran (. .)

Kcvaneka çarçik

Heke mirov mecbûr bimîne gotineke di nav kevanekê de careke din bixe nav kevanekê, mirov kevaneka çarçik bi kar tîne.

Mînak:

Helbestvanê navdar . kurd Cegerxwîn [ê ji Hesarê (gundekî Kercewsêj] di Kovara Ilawarê de dest bi nivîsandina helbestan kiriye.

Dunik

Dema ku mirov gotinekê ji devê yekî din bigire an jî neqil bike, mirov wê gotinê di nav dunikê de nîşan dide. Her wiha diyalog jî heke bi bendikê neyê nîşandan, dikeve nav dunikê. Dîsa peyveke kuji bilî wateya xwe ya bingehîn wekî nav hatibe nîşandan, di nav dunikê de tê nivîsîn.

MÎnak:

Pêş (vên me gotiye: "Rih dihe bihost, dijmin nabe
dost." Elî got: "Ez dê sibê werim malê."
Kovara "Zend' li Swêdê derdikeve.
Her kes dizane ku "Dara azadiyê bi xwîna xwediyan tê avdan.
" Celadet Bedirxan gotiye: "Gramer tevahiya qeydeyên rastaxaftin
û rastnivîsandina zimên e. "
Yeknik

Dema ku mirov mecbûr bimîne hevoka di nava dunikê de dîsa bixe nav dunikê, wê demê *"yeknik"* tê bikaranîn.

MÎnak:

Mamosteji şagirtê xwe pirsî: "Pirtûka 'Salar û Mîdya' berhema kê ve?"

Xêzek

Gava ku gotûbêj di navbera çend kesan de çêdibe, heke gotina yekî di nava dunikê de neyê nîşandan, xêzekê datînin ber gotina wî.

M'înak:

Cegerxwin ji bavê xwe re got:
- Bavo tu yê kengê herî welêt? Bavê lê vegerand:
- Di nêzîktirîn demê de ez dê herim.
Du mirov ketin nav gotûbêjê, yekîgot: - Siyadiyê sibê li te bixe. Yê din got:
- Heke ez zû rabûm, bila li min bixe.

Bangnişan

Mirov bixwaze hesteke bilind (coş, xem, tirs û xof) nîşan bide, mirov bangnîşanekê dide ber. Her wekî diyar e, mirov bangnîşanê datîne ber hevoka baneşanê. Bêjeya pişti baneşanê bi girdek dest pê dike.

111înak:

Ax dilo.' Dilo yeman! Hey gidî.'
Ax. derdê me çi *qas giran e! Hawar, ey hawar!*
Hiş he kuro.' Bila kes nebihîze. Hevaline!
De zû were. em herin!
Tew, te jî xweş nivîsî.'
Erik.' Te çi dereweke mezin kil:
Wa.' Bi rastî wisan e'!!

Her wiha baneşan bi mebesteke cuda jî tê bikaranîn. Dema ku di nav kevanekê de li ber bêjeyekê bê danîn, tê wê wateyê ku nivîser bi dijwateya wî tiştî bawer e.

Minak:

Osman mirovekî pir baqil (!) *e.*
Elo yeki wêrek (1) e, lewre bi şev dernakeve derve.

Bendik

Ev nîşan dikeve navbera du bêjeyên ku di navbera wan de hogirî heye. Her wiha gava peyvek ji ber ku di rêzê de bi cih nabe, ji hev bê qutkirin, bendikê datînin dawiya rêzê. Wekî nîşeyekê divê em bi bîr bixin ku peyv kîte bi kîte tê parçekirin. Mirov nikare kiteyê parçe bike. Gava mirov hêmanên peyvekê nîşan dide, mirov bendikê dixe navbera du hêmanan. Gava ku qertaf tên nîşandan, heke ji kîjan aliyî ve bi peyvê ve bibe, mirov bendekê datîne wî aliyê qertafê.

Mînak:

Du-sê mirovan pirsa fe kir.
Mîrê Botan Bedir-Xan Beg li dijî neyaran serî hilda.
Qertafa "bi-" rengê fermanê dide hevokê.
Di zimanê me de hinek paşgir hene ku ji navdêr rengdêran lêkerê çêdikin, "<andin" yek ji wan e.
Mirov dikare peyva" hilweşandin wiha dahûrîne: "Hil-weş-andin ". lê belê vekîtandina wê bi awayê "hil-we-şan-din" pêk tê.

Sêxal

Dema ku mirov bixwaze bide zanîn ku hevok neqediyaye, wê demê mirov sêxalê datîne dawiya hevokê. Her wiha heke ji nava gotina yekî din tiştek hatibe derxistin, wê gavê jî mirov bi sê xalan di nav kevanekê de dide zanîn ku ew jêgirtin ne tam e.

Ez werim .
Ehmedê Xanî
dibêje:
"E meywe (. . .) *ne avdar e.*
Kurmancîye ev qeder li kar el'

Carinan li şûna peyveke ku mirov naxwaze bi kar bîne, sêxal tê danîn.

Minak:

Te dîsa çi g ... be/av kiriye?

Dabir

Di tirkî de jê re *"apostrof"* an jî ***"kesme işareti"*** tê gotin. Di kurmancî de di kurtenivîsa peyvan de qertafa tewangê bi riya dabirê tê veqetandin. Her wiha di reqeman de jî dîsa qertafa tewangê û veqetandek bi riya dabirê ji hev têne veqetandin.

Divê bê gotin ku li ser vê yekê lihevkirincke giştî nîn e. Hinek bendikê dixin navbera qertafa tewangê û kurtenivîsê, hinek jî wisa bawer dikin ku divê tu tişt di navbera qertafa tewangê û kurtenivîsê de nîn be. Lê bi hev re nivîsandina du tiştên nejihev ne rast e.

Yanê di kurtenivîsa navdêran de kurtenivîs, bi tîpên mezin têne nivîsandin, qertafa veqetandekê bi hûrdekê tê nivîsandin. Di tewanga hejmaran de jî reqem û tîp li ber hev nabin. Lê heke hejmar bi nivîsê bê nivîsandin, dabir ji holê radibe.

,Mînak:

KNK'ê daxuyaniyeke berfireh da raya giştÎ.
Di J'ê gulanê de karkerên kurd bi coşeke mezin rabûn ser piyan. Di roja 25'ê gulana J 999'an de bûyereke girîng pêk hat.
8'ê Adarê rojeke taybet eji bojinan.
2 J 'e meha 3 'yan cejn e.

Di kurmancî de qertafên ku rêza hejmaran nîşan didin jî bi dabirê ji reqemê têne veqetandin.

Mînak:
Di dorê de ez kesê 23 'yemin bûm.
24 'emîn salvegera roja azadiyê iro ye. Em deh xwişk bira ne, ez 9 'emîn im.

Ligel van tiştan dabir ji bo nîşandana dengê kurtbûyî jî tê bikaranîn. Dema ku di bêjeyekê de dengek ketibe yan jî bi taybetî hatibe xistin, li şûna wî dengî dabir tê bikaranîn.

Mînak:

Rêka Midyatê teng e
Paçê Remzo
heftreng e
Ramîsanek bide min
Êvar e, ***"min*** *dereng e. (Strana gelêrî)*
Gava ku ew n 'axive, mirov nizane ku Ialûte ye.

Her wiha di tîpên transkripsiyonê de dabir ji bo nîşandana *"eyn* "a erebî tê bikaranîn. Hinek kes vê yekê di zimanê nivîskî de jî bi kar tînin, lê bi baweriya me ev yek ne pêwîst e.

MÎnak:

'Erebî, 'Eyşo, Şi 'il; me 'ane, me 'alûmat. 'ilm ...

Dubare

Dema tiştek hatibe dubarekirin **ji** bo ku dîsa neyê nivîsandin, ev nîşane tê bikaranîn.

Mînak:

Demên kurdi: dema niha

" hê
n boriya têdeyî
" " dÎ/dar
¦ " berdest

Dabe
ş
Ev nîşane jiber ku tiştan jihev euda dike û wekî nîşaneya dabeşkirinê jî tê bikaranîn, wekî *"dabeş"* tê binavkirin.

Dema ku malikên helbestê li nik hev bêne nivîsandin, malik bi dabeşê jihev têne veqetandin.

MÎnak:

Birîndarê eşqê me / Dûr im ji siha bihan / Di hizar tî yek sihan / Senaxwanê Melê me / Li hemû erd lî cihan (Feqiyê Teyran)

Carinan du tiştên hemwate bi *"dabeş"êji* hev têne cudakirin. Her wiha di cihê *"yan"* de tê bikaranîn.

Mînak:

kesk / heftreng / keskesor: gokkuşagt
Birc / Bedenên Amedê gelekî qedîmî ne.

Di navnîşanan de ji bo cudakirina tax û bajêr, jimarcya avahiyê û tebeqeyê tê bikaranîn.

Mînak:

Taxa Berfîn. Kolana Osman Sehrî, No: 25/3 *Rezan / Amed* **Di** matematîkê de wekî nîşaneya dabcşkirinê tê bikaranîn.

Mînak:
6/3=2, 100/5=20

FERHENGOKA TÊGIHÊN RÊZIMANÎ BI SÊ ZIMANAN

Tirkî	Îngilizî	Kurdî
çan	voice	avanî
ettirgen can	causativc	avan iya dançêker
etkcn çat:	active voice	avaniya lebatî
cdilgen can	passive VOlc~	avaniya tebatî
ûnlern	exclamation	baneşan
virgûl	comma, virgule	bêhnok
sozcuk	word	bêje! peyv / gotin
kesme işareti	hyphen	bendik
telaffuz etmek	pronunciation	bilêvkirin
karma yi.iksek	mixed high	bilinda navderkî
artçikrşh yuksek	back high	bil inda paşdcrki
cumlenin tigeleri	part of speech	birên hevokê
nesne	object	bireser (tişte)
çikak	place of articulation	ciderk /jêderka deng
goçûşme	metathcssis	cîguherîn
zamir, add	pronoun	cînavk / bernav
ek zamir	additional pronoun	cînavka qertafî
d6nUşIU zamir	reJ1exive pronoun	cînavka vegerok
sade zamir	direct pronoun	cînavka xwerû

iştcşlik zamiri	reciprocal pronoun	cînavkên berbihevîn
baglaç zamirler	rclative pronouns	cinavkên girekî
sayi zamirleri	quantati ve pronouns	cinavkên jimarîn
şahis ckleri	conj ugationa l pronouns	cinavkên kesandinê
şahis zamirleri	personal pronouns	cinavkên kesane
krsalu lnuş zamirler	abbrcvaiated pronouns	cinavkên kurtkiri
zamirle birlcşmiş edatlar	contracted prcpositions	cinavkên lihevxistî
belirtisiz zarnirler	indefinite pronouns	cînavkên ncbinavkiri
soru zamirleri	intcrogati ve pronoun	cinavkên pirsiyariyê
işaret zamirleri	indicative pronouns	cînavkên şanidanê
bûkûnlû zamirler	oblique case pronouns	cînavkên tewandî
iyelik zamirler	posesive pronouns	cinavkên xwedîtiyê
sade zamirler	direct case pronouns	cinavkên xwerû
ikileşme	gemination	cotbûn
sozcûklcrde eşleşme	pair ofwords	cotcbêje
ikilemc	double words	cotepeyv
-miş Ti yapih ortacr	past particip\c	çêbiwar
-rniş'li gcçrmşm rivaveti	distancc past doubtful	ya dûdar (.O.8
gclccckzamamn hikavesi	future perfcct tense	cirokiya dema bê
-di'li geçmişin hikayesi	past perfect tense	Ç.O.B ya têdeyi
taksim	slash	dabeş
kesme işareti	apostrophe	dabir
edat	preposition	daçek
bir\çşi k edatlar	cornpound prepositions	daçekên hevedudanî

olumsuzluk edatlar	negatrvc prepositions	daçekên neyîniyê
nedensellik edatlan	causal preposition	daçekên sedem î
sade edatlar	simple preposition	daçekên xweru
zamanlar	ten ses	dem
gelecek zaman	Iuture tense	dema bê
yakin gelecek zaman	furure continues tense	dema bê ya nêzîk
şimdiki zarnamn hikayesi	past continuous tense	dema borî ya berdest
duyulan geçmiş zaman	present perfect tense	dema borî ya dûdar
gorûlen geçmiş Laman	simple past tense	dema bor! ya têdcyi
şimdiki zaman	present tense	dema niha
sûrekli şimdiki zaman	present continuous tense	dema niha ya domdar
birleşik zamanI ar	compound tenses	demên hevedudanî
ses	sound	deng,
ses bilgisi	phoetics	denganî
ûnsûz, sessiz	consonant	dengdar
yumuşak sessizler	unasprative consonant	dengdarên nehilmî (nerm)
burun ûnsûzleri	nasal consonants	dengdarên difinî
dişsel ûnsuzler	dental eonsonants	dengdarên dirankî
damak ûnsûzlcri	palatal consonant	dengdarên ezmandevî
seri scssizler	asprati ve consonant	dengdarên hilmî (hişk)
diş dudak ûnsûzleri	1ebiodental consonants	dengdarên lêvi û diranî
dudak ûnsûzleri	lebial consonants	dengdarên lêvkî
ûnlû, sesli	vowel	dengdêr

yuksek çikrşh ûnlûler	high vowcIs	dengdêrên bilind
uzun ûnlûler	long vowels	dengdêrên dirêj
krsa On lûler	short vowels	dengdêrên kurt
orta çikişh ûnlûler	middle	dengdêrên navincî
alçak çrkişlr ûnlûler	low	dengdêrcn nizm
scsbilim	phonology	dengzanî
karşrt anlamh	antonym(ous)	dijwate
êtûmsûz sûrekli	voicelcss continuous	domdara hişk
otûmlû sûrekli	voiced continuous	domdara nerm
sûrekli otumlû	bilabial continuous	dulêviya domdar
tirnak işareti	quotation marks	dunik
olumlu	affirmative	erênî
ergatiflik	crgative	crgativî
damak	hard palate	csmandev
damaksilar ve girlaksilar	palatal	esmandevî û qirikî
damaksilar	palatal	czmandevî
otûmsûz SIZ1CI	voiceless spirant	fizeka hişk
otûmlû SIZICI	voiced spirant	fizeka nerm
geçişli	transitive	gerguhêz, têper
bogaz	pharynx	gewrî / hefik
baglaç	conjunction	gihanek
genizsel kapanti II	nasal occlusive	girtiya difinî
otumsuz kapanuh	voiceless occlusivc	girtiya hişk

otûmlû kapantih	voiced occlusivc	girtiya nerm
degişkenlik	inflection	guherbarî
anlamdaş	synonym	hemwate
titreşimli akici	vibrant liquid	herikiya lerzokî
akiciyan ûnsûz	latcral liquid	herikiya rexkî
sifat, on ad	adjective	hevalnav, rengdêr
sayi sifatlan	numeral adjectives	hevalnavên j imarîn
işaret sifatlan	demonstrati ve adjec-tives	hevalnavên şanîdanê
niteleme stfatlari	qualityadjcctives	hevalnavên çawaniyê
sayi sifatlan	quantative adjectives	hevalnavên jimarîn
bclgisiz sifatlar	indcfinite adjectives	hevalnavên nebi-navkirî
soru srfatlan	intcrogativc adiectives	hevalnavên pirsiyariyê
sesteş	homophone	hevdeng
cins ISIm	cornrnon noun	bevenav
ci.imle	sentencc	hevok/riste
i.inlem ci.imlesi	exclamation sentcnce	hevokên baneşanî
olumlu cûmle	positive scntence	hevokên erênî
imperative sentcnces	emir cûmlcleri	hevokên fermanî
birleşik cumle	compound sentence	hevokên hevedudanî
fiil cûrnlesi	sentence of actions	hevokên lêkcrî
ara ci.imleler	intcnnediary sentcnce	hevokên navberÎ
isim ci.imlesi	nominal sentence	hevokên navdêrî
olumsuz cumle	negative sentence	hevokên neyînî

soru cûmleleri	interrogativc sentencc	hevokên pirsiyarî
bildirmc cûmlelcri	declarativc sentences	hevokên ragihandinî
sade cumle	simple sentencc	hevokên xwerû (sade)
soz dizimi	syntax	hevoksazî
yazirm ayrn olan sozcuklcr	homogragh	hevreng
zarf, belirtcç	adverb	hoker, hevalkar
yan ve yer belirtilen zarflar	adverbs of place and direction	hokerên cih û berckê
nitelik zarfi	adverbs of qual ity	hokerên çawaniyê
zaman bildiren zarflar	adverbs of the time	hokcrên demê
miktar belirten zarf1ar	adverbs quantity	hokerên mêjerî
soru zarflan	adverbs of interrogation	hokerên pirsiyariyê
kuçuk harf	small leucr, lower case	hûrdek
sayi ad	numbers	jrmarnav
tecrube eden	expnencer	jiyer
parantez, ayraç	bracket	kevanek
bzne	subject	kirde
vurgu	stress	kirpandin
fiil çekirni	conj ugation	kişandina lêkerê
hece	syllable	kîte
yardimcr cûm le	elause	komek
yan cumle	consequent	komeka alîkar
grub ismi	colleetivc noun	komenav
fiil	verb	lêker

temel fiil	fundamental vcrb	lêkera bingehîn
gcçişl i fiil	transitivc verb	lêkera gerguhêz
birleşik fiil	compound verb	lêkera hevedudanî
aktiffiil	active vcrb	lêkera lebatî
geçişsiz fiil	intransitivc verb	lêkera negerguhêz
tûretilmiş fiil	derivated verb	lêkera pêkhatî
edilgcn fiil	passive verb	lêkera tebatî
sade fiil. bas it fiil	simple verb	lêkera xwerû
yardunci liiller	auxiliary verb	lêkerên alîkar
dişil	feminine	mê
tekil-çogul	singular - plural	rnêjer
ara ek	interfix	navbend
ad. isim	noun	navdêr
birlcşik isimler	cornpound nouns	nav dêrên hevedudanî
tûretilmiş isim	dcrivatcd nouns	navdêrên pêkhatî
sade isirn	simplc nouns	navdêrên xwerû
orta çikrşh	mid-vowel	navderki
soyut isim	abstact nouns	navên razber
somut isirn	concretc nouns	navên şênber
iç ek	infix	navgir
belirsizlik	indcfinite	nebinavkiri
geçrşsiz	intransitive	negerguhêz
eril	mascu1ine	nêr

yumuşak damak	velum	nermika esmandev
notr	neutral	nêtar
olumsuz	negative	neyînî
yan ûnlû	semi-vowel	nîvdengdêr
luşiltrh yan kapantih	hissing semi-occlusive	nîvgirtiya bixişin
alçak on çikrşh	front low	nizma pêşderkî
son edat	post-position	paşdaçek
art çrkişh	back	paşdcrkî
artdamaksil	postpalatal	paşesmandevî
sonek	suffix	paşgir / parkît
derece	dcgree	paye
ûstûnlûk derece	superlative	payeya berztirîn
karşilaşurma dereccsi	cornparativc	payeya rûber!
on edat	preposition	pêşdaçek
on çikrşh	front	pêşderkî
on damaksilar	preplatal	pêşcsrnandevî
on ek	prefix	pêşgir / pêrkit
diftong	diphthong	pcvdeng
yûklem	predicate	pêveber
turetilmiş sozcûk	dcrivated word	peyva pêkhatî
sade sozcuk	simple word	peyva xwerû! sakor
sozcuk tûretme	word derivation	pcyvdariştin
morfolojî, şekilbilirn	morphology	peyvsazî

kûçûltûcû	diminutive	biçûkcr
ço gul	plural	… pirjimar
soru işareti	question mark	pirsnîşan
ek	affix	qertaf /xurdebêj
seslenme eklcri	vocativc case suffixes	qcrtafên baneşan îyê
yapim ekleri	derivational affixes	qertafên bêjesaz
çekim ekleri	conjugational affixes	qertafên kêşanê
olumsuzluk ckleri	negative affixes	qertafên neyiniyê
bûkûn eklcri	declcnsion affixes	qertafên tewangê
grrtlaksilar	glottal	qirikî
mastar	infinitive	rader
imla, yazrrn	orthography	rastnivîs
tamlanan	modified	raveber
izafe, tamlama	phrase	ravek
tamlayan	modifier	raveker
kip	mood	rawe
istek k ipi geçm iş zaman	past subjunctive	raweya daxwazî dema borî
istek kipi geç. 7.. hikayesi	pa st perfeet subjunctivc	raweya daxwazî dema boriya çîrokî
istek kipi şimdiki zaman	present subjunetive	raweya daxwazî dema niha
gereklilik kipi	should, shal]	raweya divêtî
şart kipi	conditional mood	raweya mercî (hckani)
dilek kipleri	subjunctive moods	raweyên daxwazî
birlçşik kipler	cornpound moods	raweyên hevedudanî

belirtme kiplcri	indieative moods	raweyên pêşkerî
geçmiş zaman koku	past tense stem	rayeka dema borî
şi mdiki zaman kokû	present tense stem	rayeka dema niha
liil kêkû	verb stem	rayeka lêkerê
nûans sesler	allophone	rengedeng
çagirma hali	vocative case	rewşa banglêkirinê
bûkûnlû hal	oblique case	rewşa tewandî
yalrn hal	direct case	rewşa xwerû
gramer, dilbilgisi	grammar	rêziman
ozel isim	proper noun	sercnav
üç nokta	ellipsis	sêxal
guzel yaz)	calligraphy	spchînivis
ana cumle	main clause	şahkornek
ses te!leri	vocal cords	jihên dengî
pasif	passive voice	tebatî
tûmleç	comlement	têrker
blikUn	declension	tewang
harf	lcttcr	tîp
bûyûk harf	capitalletter	tîpa girdek
şedde	double letter	tîpa dubare
kuçuk harf	small letter	tîpa hûrdck
kodlamak	spelling	tîpandin
kaynaştirma harfleri	approximate letters	tîpên alîkar

hecelernck	spelling	vekîtandin
tamlama takrsi	ezafch	veqetandek
anlam	mearung	wate
nokta	full stop	xal
noktalama	punctuation	xalbendî
noktalı vî rgûl	semi colon	xalcbêhnok
iki nokta Ust ûste	col on	xalecot
konuşma çizgisi	dash	xêzek
tekil	singular	yekjimar
tek nrnak işareti	singlc quotation marks	yeknik
cinsiyet	gender	zayend
gramatîk cinsiyet	grammatical gendcr	zayenda rêzimanî
adem elmast	Adam's apple	zengclork
dil	tonguc	ZIman
kuçuk dil	uvula	zimanê biçûk

I -Bcdir-Xan, Celadet; *Bingehên Gramera Kurdmanci.* Weşanên Nûdem, 1994. 2- Ciwan, Mûrad: *Tiirkçe Açiklamal! Kiirtçe Di/hi/gisi* (Kurmanc Lchçesi), Weşanên Jiyana Nû, Stockholm, 1992.

3- Sagniç, (hiseyn; *Hêmanê Rêzimanê Kurdi.* Melsa Yay .. 1991.

4- Kurd, Reşîd; *Rêzimana Zimanê Kurmancî.* Beyrûd. 1956.

5- Badtlh Kemal; *Tiirkçe Izahh Kûrtçe Grameri* (Kurrnançça Lehçcsi), Stenbol. 6- Barnas, Rojen: *"Lêkerên hevedudani". Kurmanci.* Weşana înstituya Kurdî ya Parîsê, hejmar 5. rûpel 2.

7- Barnas, Rojen: *"Termên Rêzimani. Kurmancî,* Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, hejmar 9- **I** 0-11-12-13.

8- Zîlan, Reşo: *"Li sel' rastnivisina çcnd tişton" Knrmanci,* Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, hejmar 7, rûpel 2- hejmar 9, rûpel 1.

9- Zîlan, Reşo; *"Çend Pirsên Rastnivîsinê (Pirsa ras tn ivîs Îna navên mirovan)* ", *Kurmancî.* Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, hejmar 20, rûpel 1.

10- L. Cheyct, Micheal: *"I Iin Şaşiyên Rezimani". Kurmancî.* Weşana Enstiuya Kurdi ya Parîsê, hejmar 24. rûpel 6.

11. Şucai, Behroz; *"Zimanê Parti* ". *Kurmancî,* Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, hejmar 28, rûpel 1.

12- Farqînî. Zana; *"Parkîtên di Zaravayê Kurmancî de* ". *Zend,* Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê. hejmar 5. r. 8-11.

13- Farqînî, Zana: *"Dahûrîna li ser Parkîtên di Kurmancî de* ". *Zend.* Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê. hejmar 1. 1'.61.

14- Mihemedî Hemîd; *"Çend Nişe li sel' Pêşveçûnên Fonolojîk ên di Kurdi de* ", *Zend,* Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, (werger **ji** ingilîz! Samî Berbang), hejmar 1, r. 66-69.

15- Farqînî, Zana; *"Di Kurmancî de Guherina Dengan* ". *Zend.* Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê. hejmar 2, r.87-91

16- Lêkulî/I. Weşana Enstîtuya Kurdî ya Berlinê, "Hejmara Taybet li ser Zimanê Kurdî", hejmar **I.**

17- Bedirxan Celadet- I.csco, Roger; *Kiirtçe Dilbllgisi,* Weşanên Doz, Stenbol. 1991.

18- Kurdo, Qanat; *Gramera Zimanê Kurdi,* Weşanên Roja N li, Stocholrn, 19<)0 19- Mackenzic, 0.01.: *Kurdish Dialect Studies-lo* Oxford University Press. London 1961

20- Blau. Joyce; *Le Kurde de Amadiya el de Djabal. Sindjai:*

21- Soane. L8.; *Grammar ofthe Kurmanji or Kurdish Language,* London. 1913 ~2- Ali Bedir-Xan; *Di: K(l/IIIII,(//I, Tûrkçe Izahh. Kûrtçe* GmI1J('/: Deng Yayinlarr, 19X6

23-Aykoç, Fêrgîn Melik: *KIII'(/;::al1. Rûbcrina Zaravên* AII/'(j;. Weşanên Lnstituya Kurdî ya Berlînê. Berlin. 1996

24- Amêdî. S.B.; *Rêzimaua Kurdî,* çapa yekê, Wezaret! Fêrkirdinî Bala Cl Lêkolînewey Zanyarî. Zankoy Selaheddîn.

25- '\Jasso. i.. *Şirovekirina Gramcru Kurd:* Zaraveya Kurmanci, Berlin. 2003. 2()-

Rizgar, Baran: *Dersên Kurdî (C\gll/<lJIIU/1 K[irl\,<, Dersleri),* Lithosphcfc Printing Cooperativc. London. 1996

27- Ozturk, Mursel: *Farsçu Vi/hi/gisi.* Murat Kitapev **i** Yaymlan, Ankara. 1995 2X-

Aksan, LJogan; *I ler liinfide Di], Ana Çizgilcrivlc Di/hilim* .. Ankara. 1995, 2C)- Farqînî.

Zana; *Ferhenga ":11/'(/;- Tirki,* Weşanên Enstîtuya Kurdî va Stenbolê. Stenbol, 20()4.

30- Tan Sami: *mll/Cl'CII R{;:::.im<l/l(' Kurmancî,* Weşanên Welat. Stenbol, 2000,

-' 1- Roxzadi, Elî; *"Ci/n; zimanê kurdi di zîncîrey« ::'1/11<l1l{;1I arvavi de"* gotara ku pêşkêşî Konferansa Zimanê Kurdi (2004) hatiye kirin .

. \2- Şucai, Behroz: *"Bundora Zimuniya I'eywendi-Xalibivet«, Peywendiya Newekhev li Tirk; li Kurdi* ", gotara ku pêşkêşi Konferansa Zimanê Kurdî (~004) hatiye kirin.

33- Yule, George. The Study of Language. Cambrige University Press. 1996. London.

34- Yildmrn, Nimet, Farsça Dilbilgisi, Ekirn 2009. Bizim BUro HaSIII1C\ i. Ankara.

35- '\.McCarus. Ernest, A Kurdish Grammar (Descriptivc Analysis of The Kurdish Or Sulaimaniya, Iraq), American Council Or Learned Socictics, New York. 195K 36- Thackston, W. '.1., - Kurmanji Kurdish- A Reference Grammar with Sclected Readings.

37- Chyet. L. Michael; Kurdish Fnglish Dictionary, Yale University Press '\e\\ I lax en and London. 200

.1X- Ferhenga Yekbûn, hllp:!I\\ \\ \\ .yckbun.com

39- Farqînî. Zana: *"Bidestxistina Rayeka !,(;k('I'I/I1·'.* Kovara Zend, Weşana Fnstituya Kurdî ya Stenbolê, *Li*\ istan 2()()6, r. 42-63

40- Lkici, Deniz, Kurrnancji Kurdish Reader, Dunwoody Press. 2007. I;SA, 41- Ehmedê Xanî. Mem Cl lîn. Amadekar Huseyn Şemrexî. Weşanên Nûbihar, Stenbol. ~() 1 0.

42- Sadinî, M. Xalid. Feqiyê Teyran. *"Liyan. Berhem li Helbestên Wr'.* Weşanên :\îbihar. Çapa Sêyem. Stenbol. 2009,

43- Mele Ahmedê Ci/iri. Diwan, Wesanên Nûbiharê. Çapa Yekem, Stenbol, 201 () 44- Km ara Hawar. Wesanên Nûdem, Cild 2, Stockholm. 199X.

45- Ferhengê Kirmanckî (Zazaki) - Tirkî. Grûba Xebate ya Vateyî. Weşanên Vatcyi,(apa Hirêycne). Stenbol, 2009.

46- http://w\\w.nefel.comicpi rtuk/pd I~ccladct_ al î_ bedîl' xan el fabcugral1ler_02.pdf?NR: 122

Di ser çapa yekem a vê pirtûkê re pênc sal derbas bûn. Di vê çapa nû de min hemû mijar ji nû ve di ber çavan re derbas kirin, hinek mijar hatin berfirehkirin, di hinek mijaran de guhartin pêk hatin. Di vê çapê de min hinekî zêdetir bala xwe da berhemên zimanzaniyê û rêzimana hinek zimanên din; bi taybetî jî rêzimana farisî, îngilîzî û tirkî.

Ji xeynî wan, xebat û lêkolînên min ên di domana pênc salan de û nîqaşên ku li ser warên cur bi cur ên rêzimana kurdî pêk hatin ji bo tekûzkirina hinek mijaran bûn bingeh. Di encamê de ez hêvî dikim ku vê pirtûkê hinek aliyên tarî yên rêzimana kurdî ronî kiribin û hinek alozî ji holê rakiribin.

ISNB-978-975-6282-54-0